

Seîd VEROJ

Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî

&

(Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî)

Weşanên AVA

Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî

&

(Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî)

Seîd Veroj

Edîtor: Çetîn Duran

Berg: Şener Özmen

Mîzanpaj: Seîd Veroj

Gulan/2014

Çap: Berdan Matbaası

Ji bilî danasînê û ji bilî destûra weşanxaneyê bi ti awayê

nayê kopîkirin û belavkirin.

ISBN: 978-605-4652-35-8

Weşanên AVA & Ava Yayınları

Selahattin Eyubî Mahallesi. 315. Sk

Helin Sitesi. A Blok altı

Bağlar/ Diyarbakır.

Tlf: 0542 689 61 26

avayayinlari@gmail.com

Seîd VEROJ

Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî

&

(Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî:

Dîyalekt, Alfabe û Fonetîk, Morfolojî)

TEDEYÎ / TÊDAYÎ

Vateyo Verên / 17

Pêşgotin/ 19

BEŞÊ I

A) DÎYALEKT (zazakî)/ 21

1. Ziwan û dîyalektî /23
2. Ziwanê kurdî bi dîyalektanê xo ra, koma ziwandê hînd-awrupa mîyan de şaxêk ziwandê aryanî (îranî) yo /26
 - 2.1. Şaxê hînd-awrupayî / 26
 - 2.2. Şaxê asyayî /27
3. Derheqê ziwandê dîyalektanê kurdî de, kê vato çî? / 30
4. Vateyê zaza û zazakî, dimil û dimilî, kird û kirdkî, kirmanc û kirmancî kamik mana de ameyê gurênayîş / 35
 5. Nûsteyê dîyalekta zazakî / 37
6. Cayê ke qisekerdoxê zazakî (dimilî) tede vila bîyê /38
 - Notê Beşê I / 41

DÎYALEKT (Kurmancî)

1. Ziman û dîyalekt / 46
2. Zimanê kurdî bi tevî dîyalektên xwe ve, di nav koma zimanên hînd-awrupayî de, şaxekî ji zimanên arî (îranî) ye /50
 - 2.1. Şaxê hînd-awrupayî / 50

2.2. Şaxê asyayî / 51

3. Derbarê ziman û dîyalektên kurdî de, kê çi gotine? / 54

4. Peyva zaza û zazakî, dimil û dimilkî, kird û kirdkî, kirmanc û kirmanckî di kîjan manayê de hatine bikaranîn / 59

5. Nûsteyê dîyalekta zazakî / 61

6. Ciyên ku axaftvanên zazakî tê de belav bûne / 62

Notên Beşê I / 64

BEŞÊ II

B) ALFABE Û FONETÎK/ 68

1. Alfabe yê ke zimanê kurdî û dîyalektê ey pê ameyê nûstîş / 69
(Alfabe yên ku zimanê kurdî û dîyalektên wî pê hatine nivîsandin) / 73

2. Fonetîka dîyalekta zazakî û kurmancî ser o kilmvateyêk / 77
(Li ser fonetîka dîyalekta zazakî û kurmancî kurtepeyvek) / 79

2.1. Pêbedêliyayîşê tayê vengên dîyalekta zazakî û kurmancî / 81
(Bihevguherîna hinek dengên dîyalekta zazakî û kurmancî)

2.2. Pêbedêliyayîşê tayê vengên şeweyandê zazakî / 88
(Pevguherîna hinek dengên şeweyên zazakî)

2.3. Vengê alfabeya zazakî û kurmancî / 92
(Dengên alfabeya zazakî û kurmancî)

2.3.1. Herfê venginî / 93

(Tîpên dengdar/bideng)

2.3.2. Herfê bêvengî / 97

(Tîpên bêdeng)

Notê Beşê II / 105

BEŞÊ III

MORFOLOJÎ

1. Çekuye (peyv) / 109

1.1. Çekuyê ke bi cidarana yenê viraştene / 110

(Peyvên ku bi qertafan çê dibin)

1.1.1. Çekuyê ke bi cidaranê vernî (prefîks) virazîyenê / 110

(Peyvên ku bi qertafên pêşîn çê dibin)

1.1.2. Çekuyê ke bi cidaranê peyênî virazîyenê / 112

(Peyvên ku bi qertafên paşîn çê dibin)

1.2. Çekuyê ke kokdê “kerdene/kirin”, “dayene/dayin”

û “bîyayene/bûyin/bûn, ... ra virazyenê / 114

(Peyvên ku ji kokên “kerdene/kirin”, “dayene/dayin”

û “bîyayene/bûyin-bûn”... çê dibin)

1.3. Çekuyê pêrabesteyî / 114

(Peyvên hevdudanî)

1.3.1. Çekuyê pêrabeste yê ke didi yan zî hîrê nameyan ra peyda benê / 115

(Peyvên hevdudanî yên ku ji du yan jî sê navan pêk hatine)

1.3.2. Çekuyê pêrabeste yê ke bi name û sîfetî ra peyda benê / 115

(Peyvên hevdudanî yên ku ji nav û rengdêrê pêk hatine)

1.3.3. Çekuyê pêrabeste yê ke di sîfetan ra peyda benê / 116

(Peyvên hevdudanî yên ku ji du rengdêran pêk hatine)

1.4. Çekuyê pêrabeste yê hemmana yê ke pêdima vajîyenê / 116

(Bêjeyên hevdudanî yên hemwate yên ku du hev têne gotin)

1.4.1. Çekuyê ke bi pêdima vatişê di namana peyda benê / 116

(Bêjeyên ku li peyhev gotina du navan pêk tên)

1.4.2. Pêdima vatişê di sîfetan / 117

(Li pey hev hatina du rengdêran)

- 1.4.3. Pêdima vatişê di fîlan / 117
(Li pey hev gotina du lêkeran)
- 1.4.4. Pêdima ameyişê hûmaran / 117
(Li pey hev hatina hejmaran)
- 1.5. Manaya çekuyan / 118
(Wateya peyvan)
- 1.5.1. Çekuyê ke manaya xo ya raştikên de yenê vatiş / 118
(Peyvên ku di wate xwe ya rastîn de têne bikaranîn)
- 1.5.2. Çekuyê ke manaya xo ya diyine de yenê vatiş / 119
(Peyvên ku di wateya xwe ya duyemîn de têne bikaranîn)
- 1.5.3. Çekuyê ke manaya mecazî de yenê vatiş / 119
(Peyvên ku di wateya xwe ya mecazî de têne gotin)
- 1.6. Têkilîya manaya çekuyan / 120
(Têkilîya wateya peyvan)
- 1.6.1. Çekuyê hemmanayî(hemwateyî) / 120
(Peyvên hemwate)
- 1.6.2. Çekuyê hemvengî / 120
(Peyvên hevdeng)
- 1.6.3. Çekuyê ku manaya ênan ravera yewbinan ê / 121
(Peyvên ku wateya wan raberê hev e)
- 1.6.4. Çekuyê ke manaya ênan şênber a / 121
(Peyvên ku wateya wan şênber e)
- 1.6.5. Çekuyê ke manaya ênan razber a / 122
(Peyvên ku wateya wan razber e)
- 1.6.6. Çekuyê ke vengandê tebiêtî ra peyda benê / 122
(Peyvên ku ji dengên xwezayî peyda dibin)
- 1.6.7. Çekuyê ke bi dibarekerdişê di çekuyan peyda benê / 123
(Peyvên ku bi dubarekirina du peyvan çê dibin)

2. **Name (Nav)** / 125
- 2.1. Nameyê xasî (taybetî) / 126
(Navên taybet)
- 2.2. Nameyê cinsî / 127
(Navên cinsî)
- 2.2.1. Nameyê cayan / 127
(Navên Ciyar)
- 2.2.2. Nameyê heywanan / 127
(Navên heywanan(ajelan))
- 2.2.3. Nameyê daran / 130
(Navên daran)
- 2.2.4. Nameyê vaş û nebatan / 130
(Navên giya û nebatan)
- 2.2.5. Nameyê hacet û aletan / 131
(Navên hacet û aletan)
- 2.2.6. Nameyê çekûyandê mêrdimayî/ 131
(Navên peyvên merivatîyê)
- 2.2.7. Nameyê çiyê(tebayê) werden û şimitene / 132
(Navên tiştên xwarin û vexwarinê)
- 2.2.8. Nameyê tarr û pincarî / 132
(Navên tarr û pincaran)
- 2.2.9. Nameyê cilûbelgî / 133
(Navên cil û bergan)
- 2.2.10. Nameyê çiyê ramitişî / 133
(Navên tiştên ajotî)
- 2.2.11. Nameyê organanê bedenê ma / 133
(Navên organên bedena me)

- 2.3. Nameyê muşexesî / 134
(Navên şênber)
- 2.4. Nameyê muceredî / 134
(Navên razber(nedîtbar))
- 2.5. Nameyê koman / 135
(Navê koman)
- 2.6. Nameyê pêrabesteyê / 136
(Navên hevdûdanî)
- 2.7. Nameyê yewhûmarî / 137
(Navên yekhejmar)
- 2.8. Pirhûmarîya (zafhûmarîya) nameyan / 137
(Navên pirhejmar)
- 2.9. Nêrî bîyene û makî bîyena nameyan / 142
(Nêrbûyin û makbûyina navan)
- 2.9.1. Nameyê nêrî / 143
(Navên nêr)
- 2.9.2. Nameyê makî / 148
(Navên mak)
- 2.10. Îzafeya nameyan / 152
(Îzafeya navan /Tewandina navan)
- 2.11. Halê nameyan / 156
(Halê Navan)
- 2.12. Halê vengdayena nameyan / 156
(Halê dengdana navan)

3. Sifet (Rengdêr) / 167

- 3.1. Sifetê wesfî (senînîye) / 169

- (Rengdêrên wesfî)
- 3.2. Sifetê dîyarkerdene / 170
(Rengdêrên dîyarkirinê)
- 3.2.1. Sifetê nîşankerdene / 170
(Rengdêrên îşarkî)
- 3.3. Sifetê hûmaran / 173
(Rengdêrên jimarîn)
- 3.4. Cinsiyeta sifetê ke fîlan ra viraziyenê û zey sifetî yenê xebitnayene /178
(Cinsiyetê rengdêrên ku ji lêkeran çêdibin û wek rengdêr têne bikaranîn)
- 3.5. Sifetan de pêveronayîş / 179
(Di rengdêran de berhevdanî)
- 3.6. Sifetê ke bi peyçidara “-ên” a viraziyenê / 181
(Rengdêrên ku bi qertafa “-în” têne çêkirin)
- 3.7. Sifetan ra name viraştîş / 182
(Ji rengdêran nav çêkirin)
- 3.8. Eke sifet cayê naman bigîro / 182
(Ku rengdêr ciyê navan bigire)
- 3.9. Sifetê aîdîyetî / 183
(Rengdêrên aîdîyetê)
4. **Zemîr (Cînavk/Pronav) / 1185**
- 4.1. Zemîrê kesî / 185
(Cînavkên kesan)
- 4.2. Zemîrê nîşankerdene (îşaretkerdene) / 188
(Cînavkên nîşandanê (îşarkî)
- 4.2.1. Grûba yewin / 188
(Grûba yekem)

- 4.2.2. Grûba diyin / 191
(Grûba duyem)
- 4.3. Zemîrê persî / 192
(Cînavkên pirsyarî)
- 4.4. Zemîrê nedîyarîye / 193
(Cînavkên nedîyarî)
- 4.5. Zemîrê agêrayoxî / 197
(Cînavkên vegerok)
- 4.6. Zemîrê wayîrîye / 199
(Cînavkên xweyîtiyê)
- 4.7. "Zemîrê <ê> / 200
(Cînavka <ê>)
- 4.8. Zemîrê hemmana / 201
(Cînavkên hemmane(hemwate))

5. Kar (Lêker) / 203

- 5.1. Tesnîfkerdena goreyê viraştene / 208
(Dabeşkirina li gor çêbûnê)
- 5.1.1. Karê sadeyî / 208
(Lêkerên sade)
- 5.1.2. Karê pêrabesteyî / 209
(Lêkerên hevedûdanî)
- 5.1.3. Karê pêrabeste yê ke bi veredatî ya virazîyenê / 210
(Lêkerên hevdûdanî yên ku bi pêşdaçêkek çêdibin)
- 5.1.4. Karê hetkarî / 211
(Lêkerên alîkar)
- 5.1.5. Karo nêmcet / 215
(Lêkera nîvçe/qertaf lêker)

5.2. Tesnîfkerdena karan goreyê wezîfe dayene yan zî objeyê ênan / 217

(Dabeşkirina lêkeran li gor wezîfe dayin yan jî objeyên wan)

5.2.1. Karê transîtîfî / 218

(Lêkerên gerguhêz (têper))

5.2.2. Karê înransîtîfî / 219

(Lêkerên negerguhêz (têneper))

5.3. Tesnîfkerdena karan goreyê kerdoxî / 221

(Dabeşkirina lêkeran li gor kirdar)

5.3.1. Karê aktîfî / 221

(Lêkerên lebatî)

5.3.2. Karê pasîfî / 222

(Lêkerên tebatî)

5.3.3. Karê agêrayena xo ser / 223

(Lêkerên veqerok)

5.3.4. Karê bê kerdoxî / 224

(Lêkerên bê kirde)

5.4. Tesnîfkerdena goreyê şiklî / 224

(Dabeşkirina li gor şiklî)

5.4.1. Karê bi qayde / 225

(Lêkerên lêkerên bi qayde/rêzdar)

5.4.2. Karê bê qaydeyî / 227

(Lêkerên bê qayde)

5.5. Rawe / 228

5.5.1. Raweya waştîşîye / 229

(Rewaya xwestekî/bilanî)

5.5.2. Raweya fermanî / 229

(Raweya fermanî)

- 5.5.3. Raweya gerekîye (ganîyîye) / 231
(Raweya gerekî)
- 5.5.4. Raweya werrekî (xwezîka) / 232
(Raweya xwezîka)
- 5.5.5. Raweya şertî / 232
(Raweya şert)
- 5.5.6. Raweya şênayene / 233
(Raweya karîne)
- 5.6.) Karan de dem(zeman) / 234
(Di lêkeran de dem)
- 5.6.1. Demo vîyarte / 235
(Dema raborî)
- 5.6.2. Demo nikayin / 236
(Dema nûha)
- 5.6.3. Demo hîra / 237
(Dema fire ya dewamî)
- 5.6.4. Demo vîyarteyo nedîyar / 238
(Dema raborîya nedîyar)
- 5.6.5. Demo vîyarteyo dewamî / 239
(Dema borîya berdewam)
- 5.6.6. Demo vîyarteyo nedîyaro verên / 239
(Dema raborîya çîrokî)
- 5.6.7. Demo vîyarte yo nîyetkerde / 240
(Dema raborîya nîyetkirî)
- 5.6.8. Demo ameyox / 241
(Dema dahatû ya sade)
- 5.6.9. Demo ameyox o nîyetkerde / 242
(Çîroka dema dahatû)

6. **Zerf (Hoker)** /243

6.1. Zerfê cayî-hetî / 244

(Hokerên cih-alî nîşandanê)

Zerfê zeman nîşandayîşî/ 246

(Hokerên zeman nîşandanê)

6.3. Zerfê vêşane û kêmaneye / 249

(Hokerên piranî û kêmanî)

6.4. Zerfê texmîn û perskerdişî / 250

(Hokerên texmîn û pirskarî)

6.5. Zerfê halan (rewşe) / 251

(Hokerên rewşî yan jî haldarê halan)

6.6. Zerfê waştîş û tesdîqkerdişî / 253

(Hokerên xwestin û tesdîqkirinê)

6.7. Zerfê neyîye / 254

(Hokerên neyîni)

6.8. Zerfê diletî / 255

(Hokerên cêwî)

6.9. Zerfê pêrêzbîyayîşî / 256

(Hokerên pevrêzbûnê)

6.10. Zerfê mesderan / 256

(Hokerên raderan)

7. **Edat (Daçek)** / 257

7.1. Veredatî / 259

(Pêşdaçek)

7.2. Peyedatî / 264

(Paşdaçek)

7.3. Koma/desteyê edatan / 270

(Koma/desteyê daçekan)

8. Bestoxî (Gihînek) / 277

8.1. Bestoxê sade yan zî yew heceyî / 278

(Gihînekên sade yan jî yek kîteyî)

8.2. Bestoxê diletî / 280

(Gihînekên cêwî)

8.3. Tayê bestoxê bînî yê ke bi di-hîrê çekuyan virazyenê / 283

(Hinek gihînekên ku bi du-sê peyvan têne çêkirin)

Notê Beşê Morfolojî/ 287

Goreyê cayanê cîyayan tayê mîsalê şeweyandê zazakî (dimilî)/ 293

(Li gor herêmên cihê hinek mîsalên şeweyên zazakî/dimilî)

Peynîye / 303

Dawî /306

Çimeyî (Çavkanî)/ 309

Vateyo Verên

Destpêkerdişê na kitabe de, wazena verê heme çî der heqê peydabîyena ziwani û têkilîya ey û komelî de, tayê fikir û vateyê mîyanê rîpelandê na xebate bi kilmîye bîyara şima vîrî. Ziwan, berhemê têkilîya tarîxî ya komelî yo. Heme çîyo ke aîdê mêrdimî yo û mêrdimî eleqeder keno, bi ziwani ya îfade beno û bi wasîteyê ziwani ya neqil beno. Tarîx de her komeyê cîya yê mêrdiman û her milletêk zî bi ziwandê xo şinasyena. Ziwan, hiş û “mueseseyêk tewr ganî yê millet o”. Milletê ke ziwane xo vindî bikê, ray û şopa ênan werte ra wedaryena û yê bi xo zî vindî benê. Bi wasîteyê ziwani ma şênê mîras û keda mêrdimandê verê xo bimusê, bişinasnê û dewrê neslandê neweyan bikê. Ewro roj mesûliyetîya şexsî û komelkî na ya, ke ma her yew bişênê nê mîrasî bipawê, aver berê û seba neslandê xo ra pey hîna dewlemend bikê.

Armanca na xebate, sey endamêk komeyê ziwandê hînd-awrupa û şaxêk komeyê zimwandê arî, bi umûmî ya cigêrayîşê tayê xûsusiyetê xas ê ziwane kurdî û xaseten zî veracêkerdena dîyalekta zazakî û kurmancî ya. Etîya de bi giranîye zazakî û kurmancî hetê fonetîk, alfabe û morfolojî ra ameyê cigêrayîş. Nê her di dîyalektî goreyê weqiyayê ziwani hetê veng, vate, viraştişê vateyan, bedêlîyayîş û rêzbîyayîşê vateyan, kar û goreyê deman antişê karan û tayê xusûsiyetê bingeyî yê gramerê ênan ra ameyê veracêkerdene.

Xebatêka winayêne, hem hetê ayê aktuel esto û hme zî bi çend hawayana muhîm a: Yewine; heta ewro bêxêrca tayê meqaleyen, veracêkerdena gramerê zazakî û kurmancî ser o, xebatêka ser û vera nêameye kerdiş. A didine; eyê ke vanê “zazakî û kurmancî di ziwane cîya yî” û “zazakî kurdî nîya, yew lehça farisî ya”. Ên do bivîne ke zazakî û kurmancî çiqas nîzdîyê yewbin î û çiqas yewbin ra dûrî yî. Ayê ke winî vanê zî, zafê ênan yan ziwane kurdî û dîyalektanê eye baş nêzanê yan zî goreyê tayê sebandê îdeolojîk û sîyasî hereket kenê. Ê hîrine zî; ewro qismêko muhîm ê çapemenî û derdorê akademî ya Tirkîya de, vateyê “kurd” û “kurdî” tena manaya “kurmancî” de yenê vatiş û nûstiş, bi zanayî ya wazenê vateyê “zaza” û “zazakî”, bi kurd û kurdî ra bîaqetnê, zazayan sey yew komeyo etnikî yo ciya

dîyar bikê. Na kitabe de ciwabê eyê ke winî vanê ameyo dayîş. Eynî wext na xebate de zazakî û kurmancî sey di dîyalektê kurdî ameyê qebulkerdiş û vateyê “zazakî”, “kirmancî”, “kirdkî” û “dimilî” eynî mana de ameyê vatiş.

Na xebate de: yew heta bi kilmîye têkilî û tayê xûsusîyetê tarîxî yê komeyê ziwandê hînd-awrupa û şaxê ênan ê arî ameyê veracêkerdene; heta bîna zî dîyalektê zazakî û kurmancî bi vate û rêzbiyayîşê vateyan, fonetîk û morfolojî ya ameyê veracêkerdene. Tenganîye û zahmetîya nê bêj xebatan, kemîbîyen û velabîyayena materyalandê veracêkerdena dîyalektandê kurdî û çinîbîyayîşê yew merkezê xebata ziwanzanîya kurdî ya.

Mi gelek materyalê na xebate rewna pêser kerdbî, labelê bi hawayêko sîstematîk destpêkerdişê nûstene, serra 2010 de, wextê dersdayena “Qursê Perwerdekerdena Berendamê Wanebêjanê Kurdî” ya Unîversîteya Artuklu ya Mardînî de dest bide kerd û nîzdî hîrê seran de tamam bîye. Qismê zazakîya na xebate de, bi giraniye şeweyê mintîqa başûrê cografya qiseykerdoxanê zazakî/dimilî ameyo girwenayîş.

Bîyayîşê dîyalektanê cîyayan, seba yew ziwani lawazîye û kemaniye nîya, eksê eye, bîyayîşê dîyalektanê cîyayan dewlemendîya ziwani dîyar kenê. Ewro zî milletê ke hetê nûstîş û edebiyatî ra ziwandê ênan sey ziwandê tewr dewlemendî qeub benê, hema zî dîyalektê cîya yê ziwandê ênan estî û zaf cayan de zî ke bi nê dîyalektanê cîyayan qisey bikê yewbine tam fam nêkenê.

Etiya de ez nêwazena vatişê xo derg bika, bi kilmîye, peynîya na xebate de dîyar bî ke, kes şêno vajo hem hetê xezîneya vateyan ra hem zî hetê prensîbandê gramerî ra nêzdîyîya nê her di dîyalektan, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Ferqê mabêna gelek dîyalektanê ziwandê bînan çiqas o seke, ê zazakî û kurmancî zî ehend o. Hetê tarîxî û komelnasî ra zî, qederê nê her di komeyê ziwanan û qisekerdoxanê ênan pêra beseteyo, kok û rûçikê etnîkî yê qisekerdoxanê nê ziwani û dîyalektan şino pêserê û yew o.

Na xebata verê destê şima, Şaxê Ziwani û Kulturê Kurdî yê Unîversîteya Artuklu ya Mardînî de, sereyê serra 2014 de sey tezê masterî ameyo qebulkerdiş. Çapkerdişê na kitabe de tena beşê peyên ê metnanê zazakî ameyo zêdnayîş.

Pêşgotin

Di destpêka vê kitêbê de, dixwazim berîya her tiştî der heqê peydabûna ziman û têkilîya wî ya bi civakê re, hinek fikir û bêjeyên di nav rûpelên vê kitêbê de bi kurtayî bînim bîra we. Ziman, berheme têkilîya dîrokî ya komelê ye. Her tiştê ku afdê mirov e û mirovî eleqeder dike, bi ziman têtê bilêvkirin û bi wasîteya ziman têtê ragihandin. Di dîrokê de her komeka cûda ya mirovan û her milletek jî bi zimanê xwe têtê nasîn. Ziman, hiş û “muese-seyeke tewr zindî ya milletê ye”. Milletên ku zimanê xwe wenda bikin, rê û şopa wan ji holê radibe û ew bi xwe jî wenda dibin. Bi wasîteya ziman em dikarin mîrat û keda merivên berîya xwe fêr bibin, binasin û dewrê neslên nû bikin. Îro mesûlîyetîya şexsî û komelî ev e, ku em her yek karibin vî mîratî bipên, pêş bixin û ji bo neslên li pey xwe dewlemendtir bikin.

Armanca vê xebatê, wek endamek koma zimanên hind-awrupa û şaxekî koma zimanên arî, bi giştî lêkolîna hinek xûsusîyetên xas ên zimanê kurdî û bi taybetî jî hevberkirina dîyalekta zazakî û kurmacî ye. Li vê derê, bi giranî dîyalektên zazakî û kurmacî ji aliyê fonetîk, alfabe û morfolojî ve hatine lêkolînkirin. Ev her du dîyalekt li gor weqiyayên ziman ji aliyê deng, peyv, çêkirina peyvê, guherîn û rêzbûna peyvvan, lêker û li gor deman kêşandina lêkeran û hinek xûsusîyetên bingehîn ên rêzimanî ve hatine hevberkirin.

Xebateke wisa, hem aliyê wê yê aktuel heye hem jî bi çend alîyan ve girîng e: Yekemîn; heta îro ji xeynî hin meqaleyan, li ser hevberkirina gramera zazakî û kurmacî, xebateke bi ser û ber nehatiye kirin. A duyemîn; ew ên ku dibêjin “Zazakî û kurmacî du zimanên cûda ne” û “Zazakî ne kurdî ye, lehçeyek farisî ye”. Ew dê bibînin ku zazakî û kurmacî çiqas nêzîkê hev in û çiqas ji hev dûr in. Ew ên wisa dibêjin jî, piraniya wan yan zimanê kurdî û dîyalektên wî baş nizanin yan jî li gor hin sebebên îdeolojîk û sîyasî tevdigerin. Ê sêyemîn jî; îro di beşeke girîng a çapemenî û derûdorên akademî ya Turkiyê de, peyvên “kurd” û “kurdî” tenê di manaya “kurmacî” de têtê gotin û nivîsandin, bi zanîna dixwazî peyvên “zaza” û “zazakî”, ji peyvên “kurd” û “kurdî”yê veqetînin, zazayan wek komeke etnîkî ya cihê dîyar bikin. Di vê xebatê de bersiva yên wisa dibêjin hatiye dayin. Herweha di vê xebatê de, zazakî û kurmacî wek du dîyalektên kurdî ha-

tine qebulkirin û peyvên “zazakî”, “kurmancî”, “kirdkî” û “dimilî” di eynî manayê de hatine gotin.

Di vê xebatê de: ji alîyek ve bi kurtayî têkilî û hin xûsîyetên dîrokî yên koma zimanên hind-awrupa û şaxê wan ê arî hatîye hevberkirin; ji aliyê din ve jî dîyalektên zazakî û kurmancî ji aliyê peyv û rêzbûna peyvan, fonetîk û morfolojî ve hatine hevberkirin. Tengasî û zehmetîya van cûre xebatan, kêmbûn û belavbûna materyalên hevberkirina dîyalektên kurdî û tûnebûna navendek xebatên zimanzanîya kurdî ye.

Min gelek materyalên vê xebatê ji zû ve berhev kiribûn, lêbelê bi awayek sîstematîk nivîsandina wê, sala 2010an, di dema dersdana “Qursên Perwerdekirina Berendamên Wanebêjên Kurdî” yê Unîversîteya Artuklu ya Mardînî de dest pê kirîye û bi nêzîkayî di nav sê salan de hatîye temamkirin. Di beşê zazakî ya vê xebatê de, bi giranî şêweyê herêma başûrê cografya axaftvanên zazakî/dimilî hatiye bikaranîn.

Hebûna dîyalektên cihê, ji bo zimanekî ne lawazî û kêmanî ye, eksê wê, hebûna dîyalektên cihê dewlemendîya zimanî dîyar dikin. Îro jî milletên ku ji aliyê nivîsîn û edebîyatê ve zimanê wan wek zimanekî tewr dewlemend tête qebulkirin, hîn jî dîyalektên wan ên cihê hene ku bi van dîyalektan bi-peyvin gelek herêm hevdu fam nakin.

Li vê derê ez naxwazim gotina xwe dirêj bikim, bi kurtayî, di dawîya vê xebatê de dîyar bû ku mirov dikare bêje, hem ji aliyê xezîneya peyvan ve hem ji aliyê prensîbên gramerê ve nêzîkayîya ev herdu dîyalektan, ji ferqa navbera wan gelek zêdetir e. Ferqa navbera gelek dîyalektên zimanên din çiqas be, yê zazakî û kurmancî jî ewqas e. Ji aliyê dîrokî û komelnasî ve jî, qe-dera ev herdu komên zimanan û axaftvanên wan bi hev ve girêdayî ye, kok û rîçîkê etnîkî yê axaftvanên ev ziman û dîyalektan jî digîje hev û yek e.

Ev xebata ber destê we, di Şaxê Ziman û Kulturê Kurdî yê Unîversîteya Artuklu ya Mardînê de, di destpêka sala 2014 de wek tezê masterê hatiye qebulkirin. Di çapkirina şiklê kitêbî de, tenê beşê dawî yê metnên zazakî hatîye zêdekirin. 20.02.2014

Seîd VEROJ

A) Dîyalekt (zazakî)

1. Ziwan û dîyalektî

Wexto ke mewzû ziwan bo, kilmevate bo zî gerek vernî de ziwanî ser o îzehatêk bêro kerdiş. Ziwan, tenîya xezîneyêk vateyan û sîstemê rêz-biyayîşê ênan û hacetêk têkilîya navbeyna mêrdiman nîyo, eynî wext vîrê ma yê tarîxî yo. Heme çîyo ke aîdê mêrdimî yo û bi mêrdimî ya têkildar o, bi ziwanî reyde îfade beno. Bi wasîteyê ziwanî ma şênê xebat û keda mêrdimandê verê xo bimusê, bişinasnê û dewrê neslandê neweyan bikê. Ewro zî her milletêk bi ziwanê xo şinasyena. Ziwan, hişê millet o, ay milletê ke ziwanê xo vinî bikê, ray û şopa ênan werte ra we-daryena, yê bi xo zî vinî benê.

Xebata der heqê ziwanî de, nîzdî 400 seran V. Z. ra bi xebatandê ziwanzan Panînî yê Hindî dest pê kerda. Labelê xebatê lînguîstîkî ancax peynîya seserra 19. de dekwetî çarçeweyêka ziwanzanistîye û xebatê dîyalektolojî zî hîna vêşî bîyê. Peydabîyayena ziwan û dîyalektan ser o, bêj bi bêj teorî ameyê pêşkêşkerdene. No nûste de yew bi yew dîyarkerdena nê bêj teorîyan mimkun nêbo zî, dîyarkerdena çarçewa û tayê xusûsîyetanê esasî yê bedêlîyayîşê ziwanî û peydabîyena dîyalektan, armanca nê beşê xebata ma ya. No beşê xebate xo de, ma do bi giranîye ser behsê bedêlîyayena ziwanî û dîyalektan bikê.

Bêguman mesela ziwan û dîyalektan, yew meseleya zaf mûhîm û kehan a xebata zanistîya lîngustîk a. Gama ke behsê ziwanî bibo, hawayê cîyayê ziwanan ê ke sey dîyalekt yan lehçe yenê namekerdiş zî vejîyenê vera ma. Heta ewro na mesela ser o munaqeşeyî bîyê, no derheq de tarîfê cîya-cîyayî bîyê, labelê yew tarîf û îzehato maqul o ke her kes ser o hemfikir bo nêbîyo.

Peydabîyena cîyayî û bedêlîyayîşê zîwanî, xusûsîyetêk tarîxî û esasî yê zîwanî yo. Çimkî zîwan zî sey çîdê ganî yo, zemanî mîyan de bedêlîyeno. Rojgaro ke zîwanî peyda bîyê û heta ewro, her bêj têkilîyê komanê mêrdiman bîyê sebebê bedêlîyayîşê zîwanan, peydabîyayîşê dîyalektan, kom û komikanê kulturî yê cîya-cîyayan. Eynî wext de têkilîyê komanê merdîman; têkilîya ênan a pêwa ciwîyayîşî, dînî, tarîxî, sîyasî, îqtîsadî, kulturî, qewimîyayîşê hedîseyandê xozayî û komelî zî bîyê sebebê dayîş û girewtîşî û bedêlîyayena zîwan û kulturandê cîyayan. Peynîya nê têkilîyan de, hem zîwanê welatandê cîya-cîyayan û hem zî goreyê ca û herêman, zîwan xo mîyan de bedêlîyeno. Seke zîwanzano namdar F. De Saussure zî vano: “Zemanî mîyan de bedêlîyayîşê zîwanî, bîyo sebebê peydabîyayena dîyalektandê cîyayan.”¹ Peynîya têkilîya zîwanan de, verê heme çî vate û tayê şêweyê vatişê ênan bedêlîyenê. Ray ray no bedêlîyayîş hende gird beno ke qîsekerdê eynî zîwanî zî zor yewbine fehm kenê yan zî nişênê yewbine fehm bikê. Goreyê ca û warandê cîyayan, bi no hawa bedêlîyayîşê yew zîwanî ra vajîyeno *dîyalekte (lehçe)*. Labelê tarîfêko standard ê dîyalekte çînî yo.

Zîwanzano almanij Ludwig Paul vano “bêntarê ‘zîwan’ û ‘dîyalekte’ de hîç sînorêko qethî û ‘xozayî’ çînî yo. Kes şêno di şêweyanê cîyayan yê yew zîwanî hetê kulturî ra sey dîyalekte, sewbî hetana zî sey di zîwanê cîyayan tarîf biko. Mesela “zîwan û dîyalekte”, goreyê tarîfkerdiş û xusûsîyetê ênan, mimkun o ke hetana yew dereca keyfî bo zî.”² John Loyns zî vano: “Bêntarê dîyalektandê zîwanêk de yan zî bêntarê dîyalektandê zîwananê hemberyanê yewbine de dîyarkerdişê sînorêkê mutleqî mimkun nîyo”³ Tayê zîwanzanî zî dîyalekte, sey “şêweyêk qîsekerdiş”ê zîwanî tarîf kenê. Bi kilmîye ma şênê vajê ke tarîfê “dîyalekte” ser o, yew çarçeweya dîyarkerde û sînorêko mutleq çînî yo. Gelek zîwanzanî nê tarîf û sînorî, goreyê fikir û ewniyayîşdê xo, tarîfêk kenê. Mîsal; “Zîwanê erebî yo ke ewro Sûriye ra bîgîre heta Misir û ewca ra heta rojavayê vakurê Behra Sipî, mîyanê Afrîqa û Nêmgirawa Erebi de yeno qîsekerdiş, dîyalektê erebî yê cîya-cîya yê.”⁴ Zaf cayan de qîsekerdê erebî ke bi dîyalekta xo ya qîsey bikerê, yewbine fehm nêkenê.

Ma şênê nê bêj mîsalan, qandê sewbî zıwan û milletan rê zî bidê.

Bîlhesa hetê sîyasî ra merkezîbîyayîşê dewletan yan zî peydabîyayîşê dewleta modern, mesela standardbîyayîşê zıwanî vet meydan û ey zî bi xo wa problemê dîyalektandê cîyayî ardî meydan. Çimkî wexto ke ma bala xo bidê xebatandê dîyalektolojî, dîyar beno ke nê tewir xebatî, peynîya seserra 19. de hîna vêşî bîyê.

No qisim de, ma do bi kilmî hetê tayê xusûsîyetandê zıwanî ra behsê têkilîya dîyalektandê kurdî; zazakî, kurmancî û tayê zıwanandê grûba Hind-Arî bikê. Gerek ma vernî de dîyar bikê ke na xebate de veteyê zazakî, dimilî, kirdî û kirmanckî eynî mana de ameyê vatiş. Kelîma kurd/kurdî zî, hem zaza/zazakî û hem zî kurmanc/kurmanckî gêna xo mîyan. Sey zıwanandê bînan, zıwanê kurdî de zî tayê şêwe û dîyalektê cîya-cîyayî estî. Bêguman sebebê tarîxî, sosyal, ekonomîk û sîyasî yê peydabîyayîşê nê dîyalektan estî. Tiya de ma do yew bi yew nê seban ser o nêvinderê, labelê sey ke cor ra zî ame dîyarkerdiş, ke rayna ma tarîfê dîyalekte bîyarê xo vîrî: ware û mintiqandê cîyayan ê yew koma qiseykerdoxandê zıwanî mîyan de, bi şêwe û hawayê cîya-cîyayan qiseykerdişê yew zıwanî, bi vateya dîyalekte (lehçe) yeno namekerdene.

Wexto ke ma nê tarîfî xo çıman vera bigîrê, rojgaro verên ra hetana ewro kurdî zî xo mîyan de gelek bedêlîyaya, tira dîyalektî û şêweyê cîya-cîyayî peyda bîyê. Labelê sey ke Kurdîyê Bîtlîsî zî vano: “nê lehçeyê cîyayî, xezîneyêka fewqalede ya çekûyandê zıwanî yî.”⁵

Gerek ma naye bizanê ke peydabîyayîş û bîyayena dîyalektanê cîyayan, rastîyêka tarîxî ya heme zıwanan a. Kurdî zî nê zıwanan ra yew a, zıwan û abirrîyayîşê dîyalektanê kurdî ser o zî fikrê cîya-cîyayî estî. Ferqê cîyabîyayena nê fikran çıyo? Ma do dewamê nê birrî de, fikrê cîya yê ke der heqê na babete de ameyê vatiş dîyar bikê û ciwabê persê cîyayey û nîzdîyeya dîyalektandê kurdî bigeyrê.

Ayê ke wazenê zıwanê “kurdî” tena sey kurmancî, soranî û yan zî yewna dîyalete nîşan bidê, armanca ênan çî bena wa bibo, mîyanê

çemberêk teng û tund ê linguîstîk ra nêvejyênê teber. Çimkî peydabî-yayîşê dîyalektan û şêweyanê cîya yê yew ziwani, tena bi qaydeyandê linguîstîkî ya îzah nêbenê. Bi xûsusîyetê linguîstîkî wa, tarîx, kultur, folklor, adet û toreyê yew komelgayî zî dîyarkerdişê ziwani û lehçeyê ênan de unsûrê esasî yî.

Ziwani ke dinya de peyda bîyê; wazenê wa merde yan zî ganî bibê, goreyê xusûsîyetê ênan ê xomîyan û pêroyî, kome bi kome cêra aqit-nayene yan zî tesnîfkerdena ênan, mewzûyê linguîstîkî yo. Tesnîfkerdena ziwani, yan goreyê xusûsîyetê gramere ênan yan zî goreyê mêrdimayîya ênan a tarîxî yena dîyarkerdiş. Ziwani kurdî zî bi dîyalektanê xo ya, berhemê têkilîya tarîxî ya kome û komikandê komelgaya kurdî yo. Wexto ke ma biwazê ziwaniandê dinya mîyan de cayê ziwani û dîyalektandê kurdî dîyar bikê, gerek ma verê heme çî têkilî û mêrdimayîya kurdî û ziwaniandê bînan dîyar bikê.

2. Ziwani kurdî bi dîyalektanê xo ya, koma ziwaniandê

hînd-awrupa mîyan de şaxê ziwani arî (aryani) yo.

Ziwaniandê dinya mîyan de koma ziwaniandê hînd-awrupa, komeka hera û dewlemend a û wayîrê çimeyandê tewr kehênan a. Ziwani kurdî zî bi dîyalektandê xo ra, koma ziwaniandê hind-awrupayî mîyan de ca gêno. Ziwani hind-awrupayî xo mîyan de benê di şaxî:

2.1. Şaxê Hînd-Awrupayî.

2.2. Şaxê Asyayî.

2.1. *Şaxê Hînd-Awrupayî*: “Ziwani hînd-awrupa, malbatêka tewr dewlemend a ziwaniandê dinya ya, û çimeyê ayê nûşte yê 4000 serrî estî.”⁶ Ziwani ke na grube mîyan de ca gêne, seke cêr de ameyê dîyarkerdiş, kome bi kome cêra abirîyenê;

2.1.1. *Ziwani germenî*: Almankî, îngilizkî, flamanî, norveçî, swêdî, îzlandayî, hollandî û danî.

2.1.2. *Ziwanê romenî*: Fransizî, îspanyolî, îtalyanî, portekîzî, katalanî, romenî, ladîno û provenalî.

2.1.3. *Ziwanê silavî*: Rusî, sirpî, xerwatî, boşnakî, lehî, bulgarî, makedonî û slovenî.

2.1.4. *Ziwanê keltî*: Bretonî, galî, îrlandayî û îskoçî.

2.1.5. *Ziwanê baltikî*: Lîtvani û letonî.

2.2. *Şaxê Asyayî*: Ziwanê asyayî zî xo mîyan de benê di şaxî; ziwanê hindî û ziwanê îranî. “Eserê tewr kehênê na grûbe Veda yî û bi ziwanê sanskrîtî ameyê nûstiş.”⁷ “Ziwanê hindî û ziwanê îranî, 2000 serre verê V. Z. cêra abirîyayê.”⁸

2.2.1. *Ziwanê hindî*: Na grube mîyan de ziwanê sey sanskrîtî, hindî, pencabî, bengalî, urduyî, seylanî, keşmîrî, sindî û sewbî ziwanî grûba hindî estî. Nê ziwanan mîyan de sanskrîtî, sey ziwanêko tewr verên yê grûba hindî yeno qebûlkerdiş.

2.2.2. *Ziwanê arî (aryanî-îranî)*⁹: Ziwanê tewr verên ê na grûbe, ziwanê Avesta yo. “Ziwanê Avesta û sanskrîtîya Veda gelek pê manenê”¹⁰. Ziwanê grûba arî, goreyê sazbiyayîşê gramerê xo, xo mîyan de benê çehar şaxî: 1-Grûba bakûr, 2- Grûba başûr, 3- Grûba rojhelat û 4- Grûba rojawayî.

Goreyê na tesnîfkerdene, kurdî dekwena mîyandê grûba rojawanê vakurê Îranî û farisî zî dekwene mîyandê grûba rojawanê başûrê Îranî. Na grube mîyan de zî kurdî û dîyalektê xo, pehlewî û farisîya verên û farisîya newa, peştûnî, belûcî, osetî... ca gênê.¹¹ Grûba ziwandê rojawanê vakûrê Îranî mîyan de kurdî¹²; ziwanêk xoser o, xusûsîyetê eyê xas û tarîxêk ayê kehên esto. Binya û eslê xo de heme xusûsîyetanê ziwanê arî xo mîyan de paweno. Ne şiklêkê herimîyaye yê ziwanê farisî û ne zî yew dîyalekta farisî ya. “Çimkî senî ke her ziwanê germanî, almanî nîyo, her ziwanê îranî jî farisî nîyo.”¹³

Seke cor de zî ameyo vatiş, grûba ziwanê hindî-arî mîyan de sanskrîtî,

avestayî, pehlewî û farisîya newa, kurdîya kehên û dîyalektê xo, peş-tûnî, belûcî û dêrî ca gênê. Sanskrîtî û avestayî, na grube mîyan de ziwane tewr qedîmî yê. Ziwanzan û cêgêrayoxî, ziwane avestayî û pehlewî, sey di çimeyê kevnare yê farisî û kurdî qebûl kenê. Labelê çimeyê kevnare yê nê her di ziwanan yew bo zî, gerek ma naye zî bizanê ke farisî û kurdî di ziwane xoser ê cîya yî. Seke Mc. Carus û Minorskî zî vanê, “Kurdî eslê xo de bi temami farisî ra cîya ya”¹⁴ Bêguman cigêrayoxê ke winî vanê gelekî yê, tenê Mînorskî nîyo. Wexto ke ma ewro roj zî şopa nê her di ziwandê qedîman (sanskrîtî û avestayî), hetê kelîman ra, hem bi dîyalekta zazakî û kurmancî ya û hem zî bi farisîya ewroyêna pê muqayese bikê, no xusûsiyet aşkera aseno.

Avestayî	Farisî	Zazakî (dimilî)	Kurmancî
“angušta	engošte	engište	pêçî, tilî
asman	asman	asmên	asîman
asta	estxuan	este, aste	hestî
âtar	ateş	adir	agir
awra	ebr	awr, hawr	ewr
azem	men	ez	ez
bara	bar	bar	bar
bereza	bolend	berz	bilind
cakuša	çakoş	çakûş	çakûş
çi, çina	çe	çi, çina	çi
daēwa	dîv	dêv/dêw	dêv
drajah	derazî	dergê	dirêjî
dujd	dozd	dizd, dijd	diz
duma	dim	dime	duv
gāo	gāv	ga	ga
garema	germ	garm, germ	germ
goşah	gûş	gweş, goş	guh
hapta	heft	hewt, hot	heft

hizū	zebân	zûn, zon	ezman
hunara	honer	huner	huner
huşka	hoşk	hûşk, wûşk	hişk
mazga	meğz	mezg	mejî
mizda	mojde	mijdanî, mizgîn	mizgîn ¹⁵
“pancan	ponc	panc	pênc
raeşa	rîş	rêş/rîş	rîş
raoxşna	rûşn	roşn	ronahî
sāra	ser	sare	ser
sarata	sard	sard	sar
ters	ters	ters	tirs
teşte	teşt	teşt	teşt
ūrî	se	hîrî	sê
wafra	berf	vewre	befr
wahrka	gorg	verg	gur
wohuna	xun	gunî	xun
xara	xer	her	ker
yewan	cewân	cewan, ciwan	ciwan
zairita	zerd	zerd	zer
žnā	danisten ¹⁶	zan	zanîn

Prof. Dr. Abidin İtil bale kaşkeno “pêmendîşeya mabêna ziwane sanskrîtî û ziwane hemberyanê ênan¹⁷ û seba dîyarkerdişê tesîr pêkerdena her di ziwana zî mîsalanê balkêşan dano.”¹⁸

Sanskritî	Avestayî	Zazakî(dimilî)	Kurmancî
“aşva	aspa	astor	hesp
bhrātar	bratar	bra	bra
cana	zana	za	za
duhitar	dughter	keyna	dot

go	gao	ga	ga
haridaya	zardaya	zare	dil
hima	zima	zimistan	zivistan
mātar	mātar	ma, maye	dê
pitar	pitar	pî	bav
şvasura	khusura	visture	xezur
vacra	vazra	virso	birûsk
varâha	varaza	xoz	baraz
vâta	bâda	va	ba
vayu*	vaya	va	ba ¹⁹

Seba ke ferqê mabêna koma ziwandê hînd-arî û şaxê ênan bi zela-lîya bêro dîyarkerdene, lazim o ca bi ca hawayê bedêlîyayîşeya veng, vate û rêzbîyena vateyan bêro bidegêrayîş.

Wexto ke ma bala xo bidê vateyandê corênan, dîyar beno ke hetê xezîna vateyan ra koma ziwandê hind-arî çiqas nîzdîyê yewbin ê. Na nîzdîyêye terefê gelek cêgêrayoxan ra zî ameya vînayîş û dîyarkerdiş.

3. Der heqê zivan û dîyalektanê kurdî de, kê vato çî?

Bêguman sey heme ziwanan der heqê zivan û dîyalektanê kurdî de zî fikrê cîyay estî. Ez wazena etîya de biney behsê tesnîfkerdişê dîyalektanê kurdî bika û no derheq de çî ameyo vatiş, bîyara şima vîrî. Qandê naye rê zî, ma do behsê fikirdê tayê nûştux û kurdologê ke zivan û dîyalektanê kurdî ser o xebitîyayê bikê. Heta ewro heme dîyalekt û şeweyandê kurdî ser o xebatêka bi serûbere û besbîyaya bi ma dest nêkewta yan zî xebatê winayênî zaf kemî bîyê. Belkî xebatê akademîk ê ke ewro ra pey bêrê kerdiş, bibê sebebê nawitiş û akerdişê yew rêçida newa. Labelê gerek ma na zî bizanê ke xebata ma ya ewroyêne zî çinîbiyaye ra dest pê nêkerda. Heta ewro der heqê zivan û dîyalektanê kurdî de gelek çî ameyê vatiş û nûstiş. Ez wazena ke bi kilmîye ênan ra behsê tayê vatiş, çime û xebatan bika.

Eke ma hawayêko kronolojîk behsê enî eseran û vatişan bikê, vernîya hemine de *Şerefname* yeno. *Şerefnameya Şerefxan Begî* de çehar dîyalektê zıwanê kurdî ameyê hûmartiş: 1- kurmanç, 2- lor, 3- kelhur, 4- goran.²⁰

Şerefname ra peye *Seyahetnameyê Ewliya Çelebî* yeno. Wexta ke ma *Seyhatnameyê Ewliya Çelebî* ra bewnî, kê şênê vajê ke der heqê kurdolojîyê de agadarîyê zaf mûhîmî tede estî, labelê etîya de ma wazenê giraneye ser hetê zıwanî ra bide bewnî. "Serra 1655 de seyah Ewliya Çelebî û Melek Ehmed Paşa, bi munasebeta seferêke ver bi Wanî ra kewenê ray û gelek cayanê welatê kurdan gêrenê. Çelebî der heqê na sefer û gêrayîşê xo de yew eser nûseno û nameyê eserê xo zî *Seyahatname* nano pa. *Seyahatname* de, behsê şiyês dîyalektanê zıwanî kurdî keno û nameyê ênan zî wina rêz keno: Mehmûdî, avnikî, zazayî, loloyî, cîloyî (hekkarî), şîrvanî, cîzrewî, pisanî, sincarî, harîrî, erdelanî, soranî, xalîfî, çekvanî, îmadî, rojkî."²¹ Wina aseno ke Çelebî nameyê eşîran, mintîqa, şêwe û dîyalektan têmîyan kerdo. Gama ke ma ênan sey dîyalektan tesnîf bikê; tena lurrî, soranî, erdelanî û zazakî manenê. Ê çekûyê bînî zî, kes şêno vêşaneyê ênan sey nameyê eşîran yan zî şêweyê kurmançî û soranî qebûl bikê.

Xebata pedagogê armenî Haçatur Abovyanî(1809-1848) zî tesîrêko giran îranologandê Rûsya sero kerdo. No semed ra Abovyan sey pîyê kurdolojîya Rusya yeno qebûlkerdiş. Abovyan zî dîyalektanê zıwanê kurdî bi namebê kurmançî û zazakî di şaxî keno.

Abovyanî ra pey, xebata Peter J. A. Lerchî (1828-2884) yena, ke sey hîmdar û viraşttoxê kurdolojîya Sovyetî yena qebûlkerdiş. Goreyê belgeyandê ewro, "metnê verênî yê zazakî (dimilî) zî ey bi xo, goreyê fek û vatişdê kurdê ke lejdê Rusya-Osmanîyan de esîr kewtibî, pêser kerdî. Serra 1857-58 de, nê nûste û metnî St. Petersburg de yenê çapkerdiş û vilakerdiş. Ferhengê vernî yê zazakî-rusî zî, serra 1858 de yeno nûstîş. Eynî wext de Albert von Le Cod zî, tayê metnê folklorê kurdî bi dîyalekta kurmançî û zazakî ya pêser kerdî û serra 1903ê Berlîn de dayê çapkerdiş û vila kerdî."²²

Bêguman mesela materyalê dîyalekta zazakî û nûstîşê aye, zaf mûhîm a. Ewro roj ma destê de eserê ke şiklê verên ê zazakî û tekamûlê ayê tarîxî binawênê çinî. Eke dokomentê arêkerde yê Peter J. A. Lerchî (1858) nêbê, agadarîya ewroyî gore, nûste û kitaba verêne ya zazakî *Mewlûdê* (1899) Mela Ehmedê Xasî yo. Naye ra pey zî, *Mewlûdê* mif-tîyê Sewêreke Mela Usman Efendîyê Babijî yo, ke serra 1903ê de nû-sîyawo û 1933 de zî Şam de ameyo çapkerdene.

Major E. B. Soane zî der heqê zîwanê kurdî û ferqê mabêna dîyalek-tandê ênan de vano:

“Lehçeya mukrî û gilandê aye ra teber Kurdistan de sewbîna lehçe û şêweyî zî estî û pêro zî xo sey kurdandê xasan qebûl kenê. Nê lehçan ra yewêda tewr mûhîm zî lehçeya zazakî ya. Za-zayî, kurdan mîyan de grûbêda gird a û derûdorê Diyarbekir, Ezirngan û tayê cayandê Anatolya de ciwîyenê. Vêşaneya ênan mintîqa koyan de ciwîyenê, zaf tund û cesûr î. Bi yew lehçeya saf a arî qalî kenê. Lehçeya ênan hem lehçeya mukrî ra û hem zî lehçeyandê bînan ê kurdî ra cîya ya. Winî fehm beno ke na lehça ênan, yew lehçeda xoser a û zaf rewna farisîya kehan ra abir-yaya. Sey zîwanandê arî, gerek na lehça ser o zî xebate bêro ker-diş. Lehçeya zazakî; farisî ra vêşêr nizdîyê zîwandê kurdî ya”²³

Sir H. C. Rawilson, benda “*Kurdistan*” a *Ansiklopedîya Britannica* de der heqê zîwanê kurdî de winî vano: “Ewro zîwanê esasî yê kurdan kur-mancî ya, zazakî û goranî zî dîyalektê cîya yî.”²⁴

M. Emîn Zekî Beg, Madson Grantî ra neqil keno û vano: “Esrê III. ê V. Z. ra na heta zîwanê kurdî de hîrê dîyalektî peyda bîyê: Dîyalekta kur-mancî, babanî û zazakî (dinbilî).”²⁵ Û eynî wext de Zîya Gokalp ke bi xo çêrmûgij o, dîyalektanê zîwanê kurdî no hawa tesnîf keno: 1- kur-mancî, 2- zazakî, 3- soranî, 4- gûranî û 5- lûrî.²⁶

Sernûşttoxê kovara *Kurdistan* Mehmed Mîhrî zî vano, “Esasen zîwanê kurdî di qismî yo: Kurdî û goranî. Goranî zî xo mîyan de bena di şaxî: hewramanî û zazakî.”²⁷

Roger Lescot û Celadet Alî Bedirxanî ke “*Gramera Kurdmancî*” hadirnaya, der heqê dîyalekt û şêweyanê zîwanê kurdî de vanê: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- dumilî (zazakî), 4- goranî (û gelek şêweyê herêmi yê ênan)”²⁸ estî.

Kemal Badilli zî, vano çehar birrê zîwanê kurdî estî: “1- kurmancî (kurd-manc/ kurmac/kirmanc/kirmaç), 2- lûrî(lûr, lor, ler), 3- goranî (hewramî, ewremanî, zaza/ dimilî), 4-kelhûrî yan zî soranî).”²⁹

Prof. Marûf Xeznedar zî, tesnîfkerdişê mamoste Tewfîq Wehbî esas qebûl keno û dîyalektanê zîwanê kurdî winî tesnîf keno: “1- kurmancî (a-kurmancîya serû, b-kurmancîya xwarû-soranî), 2-goranî (hewremanî)/zazayî, 3- lûrî (bextiyarî, feylî, kelhûrî, lekî zî sey fekê na dîyalekte qebûl keno).”³⁰

Sey zîwanêko kehan ê arî(îranî), têkilîya pehlewî û zîwanê kurdî û dîyalektandê ey ser o zî fikrê cîyayî estî. Wexto ke ma rind bala xo bidê vateyandê ênan, bi hawayêko zelal aseno ke zazakî çiqas nîzdî pehlewî û farisî ya, kurmancî zî ehende nîzdî ênan a. Mîsal;

Kirdkî (Zazakî)	Pehlevkî	Kurmancî
“acêr	azêr	jêr
adir	ater, atur, ateş	agir
ameyene	ameten	hatin
ard	ard	ard, arvan
asin	asên	hesin, asin
asmên, asmîn	asman, esman	asîman, asman
bes	ves	bes
ciwîyayîş	cîvîşnîh, zîsten, cenîh	jîyîn, jîyan, jîn
çere	çerek	çêre
çime	çeşmek	çavî, çavkanî
darû	darû, darûk	darû, derman
derg	derg, diraz, degr	dirêj

dest	dest	dest
mezg	mezg	mêjî
resayîş	resîten	gihîştin, gîhan
sêne	sênek	sîng
sole	şorek	xwê
şamî	şam	şîv
şane	şanek	şeh
şew	şep	şev
va	vay, vat	ba
varan	varan	baran
vazdayîş	vazîşin	bazdan
velg	velg, verg	belg
veng	vang	deng
verg	gurg	gur
vewre	vefr	befr
virso, bilîsk	virozak	birûsk ³¹

Nê agadarîyana pey ma şênê vajê ke helbet bi hawayêko mutleq dî-yarkerdena tarîxê cirabîyayîşê yew ziwani û dîyalektandê eye asan nîyo, labelê ma şênê vajê ke nê ziwani pêro tîmîyan de sey parçeyêk az-beta ziwandê arî (îranî) yenê qabûlkerdiş.

Ziwanzan Qanatê Kurdo zî kitaba xo ya *Gramera Ziwane Kurdî (Kur-mancî û Soranî)* de, ziwane kurdî sey çehar dîyalektan cêra abirrmeno: 1- kurmancî, 2- zaza, 3- lûrî, 4-goranî.³²

Cîgerxwîn zî zaf nûste û şîrandê xo de zazakî sey yew dîylekta kurdî qebûl keno û kitaba xo ya *Awa û Destûra Zimanî Kurdî* (1961) de zî eynî fikrî tekrar keno. A. Balî zî dîyalektanê ziwane kurdî sey hîrê şaxî dîyar keno: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- zazakî.”³³

Agadarî û bawerîya nê kordolog û zanyaran ra zî dîyar beno ke ma kur-dîya kevnare, sey yew azbat qebûl bikê kurmancî, soranî, hewramî û

zazakî zî dekiwenê mîyandê aye azbate. Kes şêno vajê ke nê dîyalektan mîyan de zî bîlhesa hewramî, goranî û zazakî hîna nîzdî yewbine asenê.

Nê agadarîyê corênan ra dîyar beno ke zîwanê kurdî zî xo mîyan de gelek dîyalektan ser o par beno. Ke ma baş bala xo bide, beşê “morfolojî” ya na xebate de zî dîyar beno ke nîzdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û komelnasî ra zî, kok û rûçikê etnîkî yê qisekerdoxanê nê zîwan û lehçeyan şîno pêser û yew o. Ayê ke çend dîyalektanê zîwanê kurdî û tayê xusûsiyetanê eyê esasî bizanê, ên (în) do bivînê ke ferqê dîyalektanê kurdî, ferqê dîyalektanê zîwanandê bînan ra vêşêr nîyo.

4. Vateyê zaza û zazakî, dimil û dimilî, kird û kirdkî,

kirmanc û kirmanckî kamcin mana de ameyê gurênayîş?

Wexto ke ma bala xo bidê belge û nûsteyandê tarîxî, seba zazakî/dimilî/kirdkî/ kirmanckî û qiseykerdoxandê zazakî rê, hem xo mîyan de û hem zî terefdê şarê xerîbî ra vate û kelîmeyê cîya cîyayî ameyê nûstiş û telafûzkerdiş. Ewro roj qisekerdoxê zazakî, ca bi ca xo bi nameyê “zaza”, “dimilî”, “kird” û “kirmanc” tarîf kenê, zîwan û dîyalekta xo zî bi namedê “zazakî”, “kirdkî”, “dimilî” yan zî “kirmanckî” danê şînasnayîş. Kelîmeya “kird”, mintîqa Gêl û Pîranî de mana dîyarkerdişê yew ferqê tebeqa sosyolojîk zî yena vatiş. No derheq de Zîya Gokalp zî vano: “Qewmanê kurdan nameyê cîya-cîyayî nayê xo ra û yewbîna. Mîsal; êyê ke kurmancî qisey kenê xo ra nêvanê “kurd”, vanê ma “kurmanc” î û zazayana zî vanê “dûnbûlî”. Ay ke zî zazakî qisey kenê xo ra vanê “kird” û kurmancan ra zî vanê “kirdasî”. Tirkî zî, “kurmanc”an ra vanê “kurd” û “dunbulî”yan ra zî vanê “zaza”. Bîzatîhî ne qisekerdoxê zazakî û ne zî ê kurmancî bi xo kelîma “zaza” nêxebitnenê.³⁴

Wexto ke ma bala xo bidê nûsteyandê verênan yê “zazakî”, na tespîta Zîya Gokalp û sewbî kesê ke winî vanê raşt vejîyena. Hem P. Lerch de

û hem zî Mewlûdê Mela Ehmedê Xasî de zî seba xo sinasnayîş dayene kelîma “kirdî” ameya xebitnayîş. Xoceyê Xasî peynîya *Mewlûdê* xo de winî vano: “Temam bi viraştişê *Mewlûdê kirdî*, bi yardimê Xaliqî û bereketê pêxemberê ma.”³⁵

Yew qismê dêrsimijê ke bi dîyalekta dimilî qisey kenê xo ra vanê “kirmanc”, bi umûmî kurmancan ra zî vanê “kirdas” û dîyalekta ênan ra zî vanê “kirdasî” yan zî “kirdaskî.”³⁶

Nûrî Dêrsimî zî zazakîya Dêrsimî sey ziwanê xas ê kurdan qebûl keno û vano: “Ziwanê zazakî yê ke Dêrsimijî qisey kenê, bêguman ziwanê bawkalandê înan ê Med û Arîyan o.”³⁷

Kemal Badilli zî vano: “Zazayê Turkiya, xo kurdê esil qebûl kenê û xo ra vanê kird û kurdandê bînan ra, yanî kurmancan ra zî -bi mana hûrdî vînayîşî de- vanê kirdasî.³⁸ Prof. Mehrdad R. Izady zî der heqê na mesela de vatişê Bazil Nikitinî neqil keno û vano: “semedo ke qiseykerdoxê dimilî zaf vêşî herfa /z/ xebitnenê, kurmancan ênan ra vato “zaza”.³⁹

V. Minorskî zî vateyê “dimilî” û “deylemî” pêwa girêdano û vano vatedê Andreasî gore, mabêndê “zazayan û deylemîyanê verênan de mêrdimayî esta.”⁴⁰ Gerek ma xo vîrê nêkê ke nûste û kitabandê cîyayan de, gelek formê cîya cîya yê nûstişê kelîma “dimilî” estî: “dimlî”, “dumbilî”, “dinbilî” û “dimilî”. Zaf cayan de zî formê kelîma “dimilî”, sey nameyê yew eşîre vêreno. Mîsal *Şerefname* de “dinbilî”, sey nameyê eşîrêka êzidî ya derûdorê Musil û Şamî vêrena.⁴¹ Ewro zî tayê mintiqan de bi nameyê “dumbilî”, “dimbilî” û “dumilî” eşîrî estî.

Robert Olson zî vateyê “zaza”, “deylem” û “goranî” sey vateyê pêwa têkildar qebûl keno û vano: “Zazayê ziwandê xo ra vanê dimilî, ke no zî, ihtimalê têkilîya ênan û deylemîyanê vakurê Îranî ano kesî vîrî. Lehça kurdî ya zazakî, kurmancî ra -ke vêşaneya eşîretandê Kurdistana Bakurî pê qisey kenê- vêşêr nizdîyê lehça goranî ya.”⁴²

Vateyê “zaza” û “dimilî”, tayê çimeyan de zî manaya nameyê eşîran û

cayan de ameyo nûstîş. Tayê nûstox û çimeyê bînî zî vateyê “zaza” bi vatedê “zevezan(zozan)”, “zevezanîye”, “zavzan”, “zewezan”, “zewzan”, “zozanîye” û “zûzan” ra girêdanê.⁴³

Wexto ke mesela “zaza” yan zî “zazakî”, “kurd” yan zî “kurmancî” bibo û kes behsê tayê nûşttoxandê îdeolojîya fermî ya tirkan nêkê, belkî ma-nîpûlasyonê ewroyênî zî raşt fehm nêbenê. Der heqê na mesela de Nazmî Sevgen vano: “zazakî zıwanêko tēmîyanek o û eslê xo de zî tirkî ra peyda bîyo.” Peydabîyayîşê kelîma “Zaza” zî tirkandê Oxuzan ra girêdano û vano: “Za” nameyê yew lajê Oxuzxanî bî. Qewmanê îptîdaî seba ke vatişê nameyê yewheceyî şidênaye telafûz kerdênê, nameyê “Za”yê lajê Oxuzxanî zî bi hawayê “za-za/zaza” ameyo vatiş.⁴⁴ Hayrî Başbuğ zî, na mesela ser o vateyê nızdî vatişdê Sevgenî tekrar keno û vano: “Tayê mêrdimî qestî ra, bi nîyeto xirab û pêşînhikum “zaza”yan mefhûma “kurd”an mîyan de mutala kenê. Labelê no hikum, vera realîta tarîxî tam tezatêk teşkîl keno... Kurmancî zî û zazakî zî di lehçeyê cîya yê tirkî yê. Goreyê fikirdê ma; nameyê “zaza (za-za)”, bi bedêlyayîşê nameyê “su/aw”(su-su) ra peyda bîyo.”⁴⁵

Kê şênê mîsalanê winasarênan hîna derg û vêşî bikê, feqet ez vana qey seba zelal kerdiş û aşkere kerdişê nê beşê xebata ma, agadarîyê corênî, têkilîya tarîxî û manaya xebitnayena nê vateyan bi zelalîye dîyar kenê.

5. Nûsteyê dîyalekta zazakî

Wexto ke mesela dîyalektê zıwanê kurdî û bîlhesa zî zazakî bo, gerek kes biney behsê dokument û nûsteyandê zazakî (dimilî) zî biko. Çimkî yew nîşanê dewlemendîya zıwanan zî, nûste û hecmê nûstîşê zıwanî yo. Ewro roj nûste û dokumentê zazakî yê ke ma destê de estî zaf kemî yê. Hetê nûstîşî ra dîyalekta zazakî lawaz a, henda kurmancî aver nêşîya. Eke ma nûsteyê hewramî û goranî xanedê zazakî ser o nêhesibnê û ewro ra pey sewbî dokumentê newe yê zazakî cayandê tarî ra nêvejî roşnayê, nûste û dokumentê ke mabênê serrandê 1856-58 de terafê

Peter Lerchî ra bi namedê “*Forschungen über die Kurden und die Iranisch-Nord-Chalder*” ameyê pêserkerdiş, sey dûkomentê verênî yê zazakî qebûl benê. Nê materyalandê folklorîkanê zazakî de, hem kelîma “kird” û hem zî “zaza” ameyê nûstîş. Vateya “kird”, pênasîya ênan bi xo ya. P. Lerc mesela “*Qauxê Nêrib û Hêynî*” de, vateyê Xelef Axay no hawa neqil keno: “*Xelef Axayî va ki eskerî xoe ra: Baunî (bawnî) axaler, ma şuenî kauxe, metirsî, eskerî Deqma Begî zavû, hema piyeru Tirk î, nişênî ma de kauxe bikî, ma piyerû canmirdî kirdan î, miyerdeî aşîran î, metersî, ma ha şuenî, heta ki sereî mi niwenu, şima çewîrî çî çinu...*”⁴⁶ Wexto ke ma bala xo bidê nê metnan, eke tayê kemaneya alfabeza nûstîşê metnan nêbo, sey zıwanê eyro yê mintıqa Nêrib o, qet nêbedêlîyayo.⁴⁷

Nînan ra teber, ma şênê vajê ke nûste û nûstîşê zazakî (dimilî, kirdkî, kirmancî), no demeyo nızdî de yanî serrandê 1975î ra na heta roj bi roj vêşî bîyê. Nê serran de kovara Tîrêj û rojnameyê Roja Welat de tayê helbest û nûsteyê folklorîk ê zazakî ameyê çapkerdiş. Ewro zî tayê kovaran û malperan de nûsteyê zazakî yenê çapkerdiş û velakerdiş. Wexto ke behsê xebat û nûstîşê zazakî bibo, hewceyo ma verê hemine xebata kovar û Grûba Vateyî bîyarê xo vîrî. Bêguman dîyalekta zazakî tena kovara Vate de nênasîyena, kovarê sey Armanc, Hêvî, War, Bîr, Tija Sodîrî û ê bînan de zî nûsteyê bi dîyalekta zazakî ameyê çapkerdiş û velakerdiş.

6. Cayê ke qiseykerdoxê zazakî(dimilî) tede vila bîyê

Ewro der heqê humara nifûsê qisekerdoxandê zazakî de fikrê cîya-cîyayî estî. Goreyê tayê vatişan, bi texmînî nızdî 2,5-3 mîlyonî qiseykerdoxê zazakî estî û tayêna zî reqamêka hîna girde vanê. Cêgêrayox û nûstox Osman Aydin zî vano “goreyê hûmartişê nifûsê serra 2000î (14.388.784), %6.54ê nifûsê Kurdistan Bakurî, bi lehça dimilî (zazakî) qisey kenê.”⁴⁸ Dîyar o ke der heqê na mesela de fikrê cîyayî estî. Bêguman heta ke xusûsî dew û şeharandê kurdan de û umumî zî tayê

şehar û metropolandê Turkiya de, bi hawayêko raşt û aşkera nifûsê qiseykerdoxê ziwani û dîyalektandê kurdî nêbêrê tesbîtkerdiş, xerîteya dîyalektanê kurdî nêvirazîyo, dîyarkerdişê nîsbetê qiseykerdoxandê zazakî zaf zehmet o. Çimkî zaf cayê ke bi nifûsê xo pêro zaza yenê qebûlkerdene, ke ma rind bala xo bidê dîyar beno ke ewcayan pêro zaza nîyê, nifûsêkê mûhîm ê kurmancan zî ewca de esto.

Wexto ke ma bala xo bidê cografa velabiyayîşê eşîretan û ziwani ênan, no hal hîna zelal dîyar beno. “Kurdistan de zaf eşîretî estî ke yew mintiqa de dimilî (zazakî), yew mintiqa de kurmancî, yewna mintiqa de zî soranî û hewramanî qisey kenê. Mesela: Eşîra Heyderan, Dêrsim de zazakî, Wan de kurmancî û başûrê Kurdistanî de zî soranî qisey kenê; eşîra Lolan, Dêrsim de zazakî, mintiqa Wan û Hekarî de zî kurmancî qisey kenê; eşîra Demenan, Dêrsim de zazakî, mintiqa Sêwaz, Wan û Hekarî de zî kurmancî qisey kenê; eşîra Şadiyan Dêrsim, Çewlîk, Muş û Qereqoçana Xarpête de kurmancî û qeza Madenî de zî zazakî qisey kenê; eşîra Îzolî Çewlîk, Dêrsim, Elazîz, Melêtiya û Sorek de kurmancî û qeza Pûtûrge ya Melêtiya de zî zazakî qisey kenê; Xormekê Çewlîke tayê dewê ênan zazakî û tayêna zî kurmancî qisey kenê... ”⁴⁹ Yanî cayê qisekerdoxanê dimilî(zazakî) yewpare nîyo.

Mehmed Mîhrî seha ewroyên a vilabiyayîşê zazayan sero winî vano: “Zazayî; binkîyê qismêk wîlayetandê sey Erzerom, Xarpêt, Dîyarbekir, Bedlîs û Azerbaycanî yê.”⁵⁰ Ay wîlayet û qezayê ke bi temami yan zî qismî zazakî qisey kenê: zafîya nifûsê sûka Çewlîke; zafîya nifûsê Dêrsimî bi zazakî qisey kenê; qismêke mûhîm ê mîyanê sûka Dîyarbekir û zafîya qezayanê sey Pîran, Hêne, Gêl, Çermûk, Çingûş û qismêk Lice û Qulp; qismêke mîyanê sûka Xarpête û qezayê ayê sey Palî, Maden, Xuleman û 15-20 dewê mintiqa Qerebegan; nîsbetêke kemî mîyandê sûka Ezirganî de û mintiqa Qerdere ya mabêna qeza Tekman û Pilûmurîye de nîzî 30 dewî zazakî qisey kenê; wîlayetê Semsûrî de tena qeza Aldûşî, Riha de qismêkê qezaya Sêwrege, Bedlîs de 15ê dewê Modkan, Mûş de zî qismêke kemî yê qeza Vartoye, qorî qezayandê Sêwaz, Erzirom, Sêrt û cayanê bînan de zî kolonîyê dîyalekta qisey-

kerdoxanê zazakî estî. Ma şênê vajê nê cayê ke cor ra ameyê hûmari-
tiş, ênan ra teber, dîyaspora de û metropolandê Tirkîya de zaf vêşî nêbo
zî tay nifûsêk qisekerdoxandê zazakî esto.

* * *

Peynîya nê beşî de, sey ke cor de gelek cigêrayoxan zî dîyar kerdo,
ma şênê vajê ke kurdî zî sey heme ziwanêndê dinya, xo mîyan de dî-
yalekt bi dîyalekt cêra abirryena. Zazakî zî enê dîyalektan ra yew a.
Gerek kê bîyayena dîyalektanê cîyayan sey çîdêk negatîf nê, sey xe-
zîneyêk dewlemend a ziwanî bivînê. Bîyayena dîyalektanê cîyayan, “te-
nîya xûsusîyetêk ziwanê kurdan nîyo; dinya de neteweyê ke ziwanê
ênan tewr sererast û dewlemend o, dewre bi dewre edebîyatêk ênan ê
se seran esto, hema zî lehçeyê ênan estî, ganî yê û sey wexto verên
qalî benê.”⁵¹ Dewamê na xebate de zî dîyar beno ke ferq û nîzdîyeya
ziwan û dîyalektandê bînan û bîlhesa zî yê koma arî çî hend o seke, yê
zazakî û kurmancî zî kemî-vêşî ehend o. Nîzdîyeya mabênê dîyalek-
tandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û
rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwan û dîyalektandê eye şino
pêser û yew o.

Beş I

Notê binênî:

1. Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. Baskı, Ankara, 1995, r. 145
2. Ludwig Paul, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2011, r. 20
3. F. De. Saussure, Neqilkerdix: Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 1995, r. 146
4. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. baskı, Ankara-1995, r. 142
5. Kurdîyê Bîtîlîsî, *Jîn*, hej: 14(1919), wergera M. Emîn Bozarlan, Weşanxaneyaya Deng, Sweden, 1985
6. Steven Roger Fischer, *Dilin Tarihi*, çev.: Muhtesim Güvenç, Türkiye İş Bankası Yayınları, İstanbul, Haziran 2013, r. 75
7. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. baskı, Ankara, 1995, r. 125
8. C. V. Ceram, *Tarırların Vatani Anadolu*, çev.: Esat Mermi Erendor, Remzi Kitapevi Yayınları. 2. baskı, Ankara, 1984, r. 184
9. Kelîma “îran”î, “aryanî”ya sanskrîtî ra peyda bîya. Na xebate de wexto ke ma vanê îranî, qestê ma tena zıwanê farisî (persî) nîyo.
10. Korhan Kaya, *Hindistan’da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 23, 24
11. “Belgeyê tewr kehên ê grûba hind-îranî, belgeyandê Mîtanîyan mîyan ra vejîyayê. Mîtanîyan, vakurê Mezopotamya de, nızdî 1500 serrî verê bîyayîşê Îsayî dewletêk viraşt bî.”(Korhan Kaya, *Hindistan’da Diller*, weş. İmge, 2005, r. 70)
12. No nûste de kelîma “kurdî”, cayê “kurdîya kehên” û dîyalektanê kurdî de ameya nûstiş. Etiya de wexto ke ma vanê “kurdî”, qestê ma, hem kurdîya kehên a û heme zar û lehçeyê ke kurdîya tewr verên ra peyda bîyê; sey kurmancî, kir-

manckî (kirdkî/ zazakî/ dimilî), soranî, hewramî, goranî, lurî, kelhurî û ayê bînî yê.

13. Zuhdi El Dahoodî, *Kürtler: Tarih Kültür ve Yaşam Mücadelesi*, Deng Yayınları, r. 162

14. Mc. Carus & Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt dili incelemeleri*, çeviren: Doğan Kılıç Şihhesenanlı, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul, 1963, r. 46

15. M. Sıraç Bilgin, *Zarahuştra Gathalar*, Doz Yayınları, r. 170, 184

16. Armîn Kesrevî, *Xud Amûzî Xetî Avestayî*, rûp: 4, 5, 7, 8, 9, 10, 14, 15, 17, 18, 19, 22, 23, 29, 31, 33, 34 <http://www.zoroaster7.persianblog.com>, <http://www.avesta.org/yasna/hasna.htm>

17. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79

18. Ke hembeyanê ênan Mîtanî û Kassîdî yê. Mîtanî, V. Z. serrê 1500-1300 de, vakurê Mezopotamya de Sûrya ewroyên ra bigîre heta Filîstin vela bîbî. Kassîdî zî, V. Z. serrê 1750-1170 de, Babîl de hukûm kerdo (Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79)

* No vate, zıwanê sanskrîtî de yeno mana "Homayê Vayî". bn. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*. İmge Yayınları, 2005, r. 27

19. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, r. 24-25, İmge Yayınları, Ankara, 2005. Wexto ke ma bala xo bidê bedêliyayîşê vengandê mabêna zıwanê sanskrîtî-avestayî, ma veynenê ke vengê /s/ yê /h/ reyde, /h/ yê /z/ reyde, /c/ yê /z/ reyde, /şva/ yê /spa/ û /spa/ zî yê /xu/ reyde bedêliyenê. b., ç.v., İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 24-25

20. Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat, 4. Baskı, İstanbul, 1990, r. 20, Sewbî zî b.: Mc. Carus-Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul, 1963, r. 48

21. Martîn Bruinessen, *Studia Kurdîca, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları*, hej: 1-3, weşanên Enstituya Kurdî ya Parîsî, Nîsana 1985, r. 18

22. Joye Blau, *Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları*, *Studia Kurdîca*, No:1-

3, Paris, Nisana 1985, r. 65

23. M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı , çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 297

24. Neqilkerdox: Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük(1787-1923)*, Bilgi Yayınları. 3. Baskı, İstanbul/ 2009, r. 519

25. M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çev.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 290

26. Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, r. 27

27. Mehmed Mîhrî(M.M), *Mukaddimet-ül İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, bew. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 15/06/2013

28. Emîr Celadet Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 9

29. Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri (Kurmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1992, r. 22, 23

30. Prof. Maruf Xeznedar, *Zimanê Kurdî*, <http://www.kovarabir.com/dr-maruf-xeznedar-zimane-kurdi/>, 17/06/2013

31. Malmîsanij, *Ferhengekê Kirdkî(Zazakî)-Pehlevkî-Kurmanckî*, Çapxaneya Apec, Sweden, 1997

32. Qanatê Kurdo, *Gramera Zimanê Kurdî (Kurmançî-Soranî)*, Koral Yayınları, İstanbul, 1990, r. 7

33. A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi (Türkçe İzahli)*, Alan Yayınları, Mart 1992, r. 35

34. Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisan 1992, r. 27

35. Mela Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Nebî*, Fırat Yayınları, İstanbul, 1994, r. 42

36. Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, İstanbul, 1996, r. 11
37. Dr. Nûrî Dersimî, *Kurdistan Tarihinde Dersim*, Doz yayınları, İstanbul, r. 65
38. Kemal Badilli, *Türkçe İzahlî Kürtçe Geramerî(Kurmançça Lehçesi)*, Dipnot: 2, Med Yayınları, r. 22
39. Izady, Mehرداد R, *Bir el Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları. r. 299
40. *İslam Ansiklopedisi*, Cilt: 6, r. 1112
41. Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat yayınları, 4. Bask, 1990, r. 21
42. Robert Olson, *Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said Ayaklanması*, Özge yayınları. Ankara, 1992, r. 145-46
43. Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Kasım 1996, Deng Yayınları, b. notê binên ê 153, r. 11
44. Nazmî Sevgen, *Zazalar ve Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*, Kalan Yayınları, Ankara, r. 34
45. Hayri Başbuğ, *İki Türk Boyu: Zazalar ve Kurmanclar*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara-1984) , r. 17-33
46. Peter J. A Lerch, *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. Band I, St. Petersburg 1857, r. 78
47. b., qismêk çîroka ke ay metnan mîyan de ameya velakerdiş: “Zemanê veriyê yew(yau) mêrde û cênîyay (cênîai) xoe bî, yew (yau) keîna û yew lac tera bî. Cenîya eyî merde, peynîde mêrde şî yewna cênî arde. Di serrî vînerî, yew keyna aya cênî ra bî. Na cênî bîye dişmenê lacek û keyneka veryêne.
- Keîneke şuena golikan de; keîneke rocêkî yereyî golikana yena, ek birayê xoe çinu, persêna cênîyay bawukî xoe, vana ki: Birayê mi ça yo? Cenêke keynek ra vana ki: Birayê tue şiyu key xalanê xoe.
- Keînek aya şu ra kuwena, hau(hawn) veyênena, ek birayê xoe kiştu, eiştu zîndan. Sibah wardena, baukê xoe ra vana: Bawo mi emşewe yew hewn dî, eki

cenîyay tue(to) birayîê mi kişto, eîşto zîndan. Baukê keyneke xoe ra va ki: Xêr bo, senî birayê tue(to) kişêno?

Keînek va ki: bau(bawo), mi haunê(hawunê) xoe de dî, birayê mi kişto, eîştu zîndan, ez ha warzenua, şuena golikan de, yerey yena keîye, eke birayê mi ameu (amewo), ez zama weşu, xeyir ke biraê mi nêameû ez hênî tuerî golikande nêşuêna, ez etîya nêvîndena.

Baûkê keyneke xoe ra va ki: Ewru ti şue golikande, ez gêrena, eke mi biraî tue dî, bizani ki: Ek cenfa mi şima de saxe na, xeîr ki mi biraî tûe nêdî, ne ez vîndena ne ti viunde.” Lerch, Peter J. A.: Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar. r.: 80-81. Band I St. Petersburg 1857

48. Osman Aydın, *Li Kurdîstana Bakûr Struktura Demografîk*, www.lemondekurdi.com, hej.:19

49. Seyîdxan Kurij, *Zazalar ve Zazaca Yazîninî Tarihçesi*, <http://www.kovarabir.com/seyid-xan-kurij-zazaca-yazininin-traihcesi-II>, 18/06/2013

50. Mehmed Mîhrî (M. M.), *Mukaddimet-ûl Îrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, b. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>, 15/06/2013

51. Kurdîyê Bîtîsî, *Jîn*, hej: 14(1919), wer.: M. Emîn Bozarslan, Weşanxaneya Deng, Sweden,1985

A) Dîyalekt (kurmancî)

1. Ziman û dîyalekt

Dema ku mewzû ziman be, bi kurtayî be jî divê pêşiyê li ser ziman pênaseyek bête kirin. Ziman, tenê ne xezîneyek peyvan û sistemek rêzbûna wan û navgînek têkilîya navbera mirovan e, heman demî bîra me ya dîrokî ye. Her tiştê ku aîdê mirov e û bi mirov ve têkildar e, bi ziman îfade dibe. Bi wesîteya ziman em dikarin xebat û keda mirovên berîya xwe fêrbibin, binasin û ragihînin nêslên nû. Îro jî her milletek bi zimanê xwe tete nasîn. Ziman, hişê millet e, ew milletên ku zimanê xwe winda bikin, rê û şopa wan ji holê radibe, ew bi xwe zî winda dibin.

Xebatên der heqê ziman de, nêzîkê 400 sal B. Z. bi xebatê zimanzan Panînî yê Hindî dest pê kirîye. Lê belê xebatên lengustîkî ancax di dawîya sedsala 19an de ketîne nav çarçoveyê zimanzanistîyê û xebatên li ser dîyalektolojî zêdetir bûne. Li ser peydabûna ziman û dîyalektan teorîyên cîyawaz hatine pêşkêşkirin. Di vê nivîsê de yek bi yek dîyarkirina van teorîyên cîyawaz wê nemimkun be, lê belê dîyarkirina çarçove û hin xusûsiyetên esasî yên guherîna ziman û dîyalektan, armanca vê beşê xebata me ye. Di vê beşê de, em dê bi giranî behsa guherîna ziman û dîyalektan bikin.

Bêguman mesela ziman û dîyalektan, meseleyê gelek girîng û kevnare ya xebata zimanzanistî ye. Gava ku mijar ziman be, awayên cuda yê ziman jî ku wek dîyalekt yan jî lehçe tene binavkirin dertê pêşiya me. Heta îro li ser vê meseleyê gelek gengeşî çêbûne, derheqê vê mijarê de pênaseyên (tarîfên) cihê

cihê hatine kirin, lê belê îzehat û pênaseyeke maqul a ku her kes li ser hemfikir be çênebûye.

Peydabûna cihêti û guherîna ziman, xusûsiyetekî dîrokî û esasî yê ziman e. Ji roja ku ziman peyda bûne û heta îro, her cure têkilîya navbera komên mirovan, bûne sebebê guherîna ziman, peydabûna zar, kom û komikên kulturî yên ciyawaz. Têkilîya komeyên mirovan; têkilîya tarîxî, îqtîsadî, pêkhatina bûyerên xwezayî û komelî, bûne sebebê danûstendin û guherîna ziman û kulturên cîyawaz jî. Ji ber ku ziman di nav demê de diguhere. Wekî ku zimanzanê navdar F. De Saussure jî dibêje: “Di nava demê de guherîna ziman, bûye sebebê peydabûna dîyalektên cihê”¹ Li gorî pileya (asta) têkilîya kom û komikên mirovan; wekî têkilîya wan a bi hev re jiyînê, dînî, ticarî, sîyasî û kulturî, danûsendinên wan ên zimanî jî çêbûne. Di dawîya van têkilîyan de zimanek, hem li gor cî-herêman û hem jî li gor rewşa welatên cuda di nava xwe de diguhere; berîya her tiştî jî bilêvkirina hin peyv û şeweyên wan diguhere. Carna ev guherîn ewqas zêde dibe, ku axaftvanên eynî zimanî pir bi zahmetî hevûdu têdigîjin yan jî tînağîjin. Li gor cî û warên cuda, bi vî awayî guherîna zimanekî, bi peyva dîyalekt (lehçe, zarava) tête binavkirin. Lê belê tarîfeke standard ê dîyalektê nîne.

Zimanzanê Almanî Ludwig Paul jî dibêje, “di navbera ‘ziman’ û ‘dîyalekt’ de hîç sînoreke qethî û ‘xwezayî’ nîne. Em dikarin du şeweyên cuda yên zimanekî, ji aliyê kulturî ve wek dîyalektek û ji aliyên din ve jî wek du zimanên cuda tarîf bikin. Mesela “ziman û dîyalekt”, li gor tarîfkirin û xusûsiyetên wan, mimkune ku hetanî radeyek keyfî be jî.”² John Loyns jî dibêje: “Di navbera dîyalektên zimanekî de yan jî di navbera dîyalektên zimanên cîran de dîyarkirina sînoreke mutlaq mumkun nîne.”³ Hin zimanzan jî dîyalekt, wek “şeweyeye axaftina” ziman tarîf dikin. Bi kurtayî em dikarin bibêjin ku li ser pênase û çarçoveya “dîyalekt”ê, fikrek sabît û sînoreke mutlaq nîne. Gelek zimanzan li gor lîstîkên xwe tarîf û pênaseyek tîne. Mîsal; “Zimane erebî yê ku ji Sûriyê bigre heta Misir û ji wê derê jî heta rojavayê bakurê Behra Sipî, di Afrîqa û Nîvgirava Erebi de tête axaftin, dîyalektên erebî yên cuda cuda ne.”⁴ Di gelek cîyan de ku axaftvanên erebî bi dîyalekta xwe bipeyvin, hevûdu tînağîjin. Em dikarin van cure mîsalan, ji bo ziman û milletên wekî din jî nîşan bidin. Bîlhesa ji aliyê sîyasî ve merkezîbûna dewletan yan jî peydabûna dewleta modern, mesela standartbûna ziman anî meydanê û vî yekê bi xwe jî problema dîyalektan derxist holê. Çimku

dema em bala xwe didin xebatên li ser dîyalektolojiyê, dîyar dibe ku ev cure xebat, di dawîya sedsala 19. de hîn bêtir bûne.

Di vê beşê de, em ê ji aliyê hin xusûsiyetên ziman ve bi kurtayî behsa têkilîya hin dîyalektên kurdî; zazakî, kurmançî û hin zimanên gruba hind-îranî bikin. Divê pêşiyê em dîyar bikin ku di vê xebatê de peyvên zazakî, dimilî, kirdkî û kirmanckî di eynî manayê de hatine bikaranîn. Herweha peyva kurd/kurdî jî, zaza/zazakî û kurmanç/ kurmanckî digre nava xwe. Wekî zimanên din, di zimanê kurdî de jî hin şêwe û dîyalektên cuda hene. Bêguman sebebên tarîxî, civakî, aborî û sîyasî yê peydabûna van dîyalektan hene. Li vê derê em dê yek bi yek li ser van sebebên nerawestî, lê belê her wekî li jorê jî hate dîyarkirin, ku cardin em pênaseya giştî ya peydabûna dîyalektê bînin bîra xwe: Di nava war û herêmên cuda yê koma axaftvanên zimanekî de, bi şêwe û awayên cuda cuda peyvîna zimanekî, bi peyva dîyalekt têtê binavkirin.

Dema ku em vê pênaseyê di ber çavê xwe re digirin, ji rojagara pêşiyê heta îro zimanê kurdî jî di nav xwe de gelek guherîye, jê dîyalekt û şêweyên cuda cuda peyda bûne. Wekî ku Kurdiyê Bîtlîsî jî dibêje: “ev lehçeyên cuda, xezîneyeka fewqalede ya peyvên zimanî ye.”⁵

Divê pêşiyê em vê yekê bizanin ku peydabûn û hebûna dîyalektên cuda, ji bo hemû zimanên rastîyeke dîrokî ye. Kurdî jî yek ji wan zimana ye, ku dîyalektên wî yê cuda hene û li ser van dîyalektan jî nêrînên cuda hene. Di derbarê ziman û dîyalektên cuda yê kurdî de çi hatiye gotin? Em ê di berdewamiya vê beşê de, lénêrînên cuda yê der heqê vê mijarê de dîyar bikin û li bersîva pirsên cudahî û nêzikayîya dîyalektên kurdî bigerin.

Ew ên ku dixwazin zimanê kurdî tenê wek kurmançî, soranî yan jî dîyalekteke dî nîşan bidin, armanca wan çi dibe bila bibe, ji nav xeletên teng û tûnd a lênguîstîkê dernakevin. Çimku peydabûna dîyalekt û şêweyên cuda yê zimanekî, tenê bi qeydeyên lênguîstîk îzah nabin. Bi tevî xusûsiyetên lênguîstîkî ve tarîx, kultur, folklor, adet û toreyên komelekî jî unsurên herî girîng ên dîyarkirina ziman û dîyalektên wê ne.

Zimanên ku li ser dinyayê peyda bûne; dixwazî mirî yan jî zindî bin, li gor xusûsiyetên wan ên navxwe û giştî, kom bi kom ji hev veqetandin yan jî tesnîf-

kirina wan, babeta lenuîstîk e. Tesnîfkirina zimanan, yan li gor xusûsiyetên gramera wan yan jî li gorî merivatîya wan a dîrokî têtê dîyarkirin. Zimanê kurdî jî, bi tevî dîyalektên xwe ve berhemê têkilîya dîrokî ya kom û komikên civaka kurd e. Eger em bixwazin di nav zimanên dinyayê de cîyê ziman û dîyalektên kurdî dîyar bikin, gerek em berîya her tiştî têkilî û merivatîya kurdî û zimanên din dîyar bikin.

2. Zimanê kurdî bi tevî dîyalektên xwe ve di nava koma

zimanên hînd-awrupayî de, şaxekî ji zimanên arî (îranî) ye.

Di nav zimanên dinyayê de koma zimanên hînd-awrupa, komeke berfireh û dewlemend e û xwedîyê çavkaniyên herî kavname ye. Zimanê kurdî jî bi dîyalektên xwe ve di nav koma zimanên hind-awrupayî de cî digre. Zimanên hind-awrupayî, di nav xwe de dibin du şax:

2.1. Şaxê hînd-awrupayî.

2.2. Şaxê asyayî.

2.1. **Şaxê hînd-awrupayî:** “Zimanên hind-awrupayê, malbateke herî dewlemend a zimanên diya ye, û çavkaniyên wê yên nivîsandî yên 4000 salan hene.”⁶ Zimanên ku di nava vê grubê de cî digrin, wekî ku li jêrê hatine dîyarkirin, kom bi kom ji hev cuda dibin;

2.1.1. *Zimanên Germanî:* Almanî, îngilizî, flemenî, norveçî, swêdî, îzlandayî, hollandî û danî.

2.1.2. *Zimanên Romenî:* Fransizî, îspanyolî, îtalyanî, portekîzî, katalanî, romenî, ladîno û provencalî.

2.1.3. *Zimanên Silavî:* Rusî, ukranyanî, sirpî, xerwatî, boşnaqî, lehî, bulgarî, makedonî, slovenî û slovaî.

2.1.4. *Zimanên Keltî:* Bretonî, galî, îrlandayî û îskoçî.

2.1.5. *Zimanên Baltîqî:* Lîtvani û letonî.

2.2. **Şaxê asyayî:** Zimanên asyayî jî di nav xwe de dibin du şax; zimanê hindî û zimanê îranî. “Eserên herî kevnare yê vê grûbê *Veda* ne û bi zimanê sanskrîtî hatine nivîsandin.”⁷ “Zimanê hindî û zimanê îranî, 2000 sal B. Z. ji hev veqetyane.”⁸

2.2.1. *Zimanên hindî:* Di nav vê grûbê de zimanên wekî sanskrîtî, hindî, pencabî, bengalî, urduyî, seylanî, keşmîrî, sindî hene. Di nava van zimanan de sanskrîtî, wek zimanê herî dêrîn ê gruba Hindî tê qebûlkin.

2.2.2. *Zimanên arî (aryanî-îranî)*⁹: Zimanê herî kevnare yê vê grûbê zimanê Avesta ye. “Zimanê *Avesta* û sanskrîtîya *Veda* gelek dişibin hev”¹⁰ Zimanên grûba arî, li gor sazûna gramera xwe, di nav xwe de dibin çar şax: 1-gruba bakur, 2- gruba başûr, 3- gruba rojhelat û 4- gruba rojavayî.

Li gorî vê tesnîfkirinê kurdî dikeve nav gruba rojavayê bakurê îranî û farisî jî dikeve nav gruba rojavayê başûrê îranî. Di nava vê grûbê de jî kurdî û dîyalektên xwe, persî, pehlewî û farisîya berê û farisîya nû, peştûnî, belûcî, osetî... cî digrin.¹¹ Di nav gruba rojavayê bakurê arîyanî de kurdî¹²; zimanekî xweser e, xusûsiyetên wê yên xas û dîrokek wê ya kevnare heye. Di binya û resenîya xwe de hemû xusûsiyetên zimanê aryanî di nava xwe de dipê. Ne şiklekî xerabûyî yê zimanê farisî ye û ne jî dîyalekteke farisî ye. “Çimku çawa ku her zimanê germanî ne almanî ye, her zimanê îranî jî ne farisî ye.”¹³

Her wekî ku li jorê jî hate dîyarkirin, di nav gruba zimanên hindî-arî de sanskrîtî, avestayî, persî, pehlewî û farisîya îroyîn, kurdîya kehên (verêne) û dîyalektên xwe, peştûnî, belûcî û derî cî digrin. Di nav vê grûbê de sanskrîtî û avestayî, zimanên herî qedîm in. Ji aliyê zimanzan û lêkolîneran ve zimanê avestayî û pehlewî, wekî du çavkanîyên kevnare yên kurdî û farisî têne qebûlkin. Lê belê çavkanîyên kevnare yên van herdu zimanan yek bin jî, divê em vê yekê jî bizanin ku farisî û kurdî du zimanên xweser ên cuda ne. Her wekî ku Mc. Carus û Minorsky jî dibêjin: “Kurdî di resenîya xwe de bi temamî ji farisî cuda ye.”¹⁴ Bêguman lêkolînerên ku wisa dibêjin gelek in, ne tenê Minorsky ye. Dema ku em îro jî şopa vî zimanê qedîm (avestayî), ji aliyê peyvan ve hem bi dîyalekta zazakî û kurmancî re û hem jî bi farisîya îroyîn re muqayese bikin, ev xusûsiyeta wan bi hêsanî xuya dibe.

Avestayî	Farisî	Zazakî (dimilî)	Kurmancî
“angušta	engoşte	engişte	pêçî, tilî
ap	ab	aw	av
asman	asman	asmên	asîman
asta	estxuan	este, aste	hestî
âtar	ateş	adir	agir
awra	ebr	awr, hawr	ewr
azem	men	ez	ez
bara	bar	bar	bar
bareziş	baliş	barzîn, balişna	balgî
bereza	bolend	berz	bilind
cakuşa	çakoş	çakûş	çakûş
çi, çina	çe	çi, çina	çi
daēwa	dîv	dêv/dêw	dêv
drajah	derazî	dergê	dirêjî
dujd	dozd	dizd, dijd	diz
duma	dim	dime	duv
gão	gâv	ga	ga
garema	germ	garm, germ	germ
goşah	gûş	gweş, goş	guh
hapta	heft	hewt, hot	heft
hizû	zebân	zûn, zon	ziman
hunara	honer	huner	huner
huşka	hoşk	hûşk, wûşk	hişk
mazga	meğz	mezg	mejî
mizda	mojde	mijdanî, mizgîn	mizgîn” ¹⁵
“pancan	ponc	panc	pênc
raeşa	rîş	rêş/rîş	rîş

raoxšna	rûşn	roşn	ronahî
sāra	ser	sare	ser
sarata	sard	sard	sar
ters	ters	ters	tirs
teşte	teşt	teşt	teşt
ūrî	se	hîrî	sê
wafra	berf	vewre	befr
wahrka	gorg	verg	gur
wohuna	xun	gun	xun
xara	xer	her	ker
yewan	cewân	cewan, ciwan	ciwan
zairita	zerd	zerd	zer
žnã	danisten” ¹⁶	zan	zanîn

Prof. Dr. Abidin Îtil jî balê dikşîne ser “mînanîhevîya navbera zimanên sanskrîtî û zimanên cîranên wan¹⁷ û ji bo dîyarkirina tesîr lihevkerina herdu zimanan jî mîsalên balkêş dide.”¹⁸

Sanskritî	Avestayî	Zazakî(dimilî)	Kurmancî
“soma	haoma	homay	xuda, xwedê
aşva	aspa	astor	hesp
bhrâtar	bratar	bra	bra
cana	zana	za	za
duhitar	dughter	keyna	dot
go	gao	ga	ga
haridaya	zardaya	zare	dil
hasta	zatsa	dest	dest
hima	zima	zimistan	zivistan
mâtar	mâtar	ma, maye	dê
pitar	pitar	pî	bav

şvasura	khusura	visture	xezur
vacra	vazra	varso, virso	birûsk
varâha	varaza	xoz	baraz
vâta	bâda	va	ba
vayu*	vaya	vayo	ba'' ¹⁹

Ji bo ku ferqa navbera komeyên zimanên hind-arî û şaxên wan bi zelalî were dîyarkirin; lazime cî bi cî awayê guherîna deng, peyv û rêzbûna peyvan bête lêkolandin û herweha nexşeya ziman û seha belavbûna dîyalektan bête dîyarkirin.

Ku em bala xwe bidin peyvên jorîn, dîyar dibe ku ji aliyê xezîneya peyvan ve komên zimanên hind-arî çiqas nêzîkê hev in. Ev nêzîkayî ji aliyê gelek lêkolîneran ve hatiye dîtin û dîyarkirin.

3. Der heqê ziman û dîyalektên kurdî de, kî gotine çî?

Bêguman wekî hemû zimanan, derheqê ziman û dîyalektên kurdî de jî fikrên cuda hene. Em dixwazim li vê derê hinek behsa tesnîfkirina dîyalektên kurdî bikin û derbarê vê yekê de çî hatiye gotin, bînin bîra we. Ji bo vê yekê, bi giranî em ê ji nivîsandina Şerefnameyê vir de, behsa nêrîna hin nivîskar û kurdologên ku li ser ziman û dîyalektên kurdî xebitîne bikin. Heta îro li ser hemû dîyalekt û şeweyên kurdî xebateka bi serûber û têrhatî bidest me neketîye yan jî xebatên wisa zaf kêm çêbûne. Belkî xebatên akademîk ên ku ji îro şûnde bêne kirin, bibin sebebê nîşandan û vekirina rêçeke nû. Lê belê gerek em vê jî dîyar bikin, ku xebata me ya îroyîn ji tunebûnê dest pê nekirîye. Heta îro li ser ziman û dîyalektên kurdî gelek tişt hatine gotin û nivîsandin. Ez dixwazim bi kurtayî hin behsa wan gotinan, çavkanî û xebatan bikim.

Eger em bi awayekî kronolojîk behsa van berhem û gotinan bikin, li pêşîya hemûyan *Şerefname* tê. Di *Şerefnameya Şerefxan Begî* de, çar dîyalektên zimanê kurdî hatine hejmartin: 1-Kurmanç, 2- Lor, 3- Kelhur, 4- Goran.²⁰

Li pey *Şerefnameyê*, *Seyhetnameya Ewliya Çelebî* têtê. Dema em li Seyhatna-

meya Ewlîya Çelebî dinêrin, em dikarin bêjin ku di derbarê kurdolojîyê de agadarîyên gelek girîng tê de hene, lê belê li vê derê bi piranî em ê ji alîyê ziman ve lê binêrin. “Di sala 1655an de seyah Ewlîya Çelebî û Melek Ehmed Paşa, bi munasebeta seferek ber bi Wanê ve, rê dikevin û gelek ciyên welatê kurdan digerin. Çelebî di der heqê vê sefer û gera xwe de pirtûkek dinivîsîne û navê pirtûka xwe jî dike Seyhatname. Di *Seyhatnameyê* de, şanzdeh(16) dîyalektên kurdî têne jimartin û navê wan jî wisa tê rêzkirin: Mehmûdî, avnikî, zazayî, loloyî, cîloyî (hekkarî), şîrvanî, cîzrewî, pisanî, sincarî, harîrî, erdelanî, soranî, xalîfî, çekvanî, îmadî, rojkî.”²¹ Wisa xuya dike ku Çelebî navê eşîran, mintîqa, şêwe û dîyalektan tevlihev kirîye. Heke em vana wek dîyalekt tesnîf bikin tenê loranî, soranî, erdelanî û zazakî dimînin. Ew peyvên din jî, em dikarin pira-nîya wan wek navê eşîr û şêweyên kurmancî qebûl bikin.

Xebata pedegogê armen Haçatur Abovyan(1809-1848) tesîrek giran li ser îranologên rusî kirîye. Ji ber vê yekê Abovyan wek bavê kurdolojîya Rusyayê tê qebûl kirin. Abovyan jî dîyalektên zimanê kurdî bi navê kurmancî û zazakî wek du şaxan parve dike.

Piştî Abovyan, Peter J. A. Lerc(1828-2884) yek ji hîmdar û sazkerên kurdolojîya Sovyetê tê qebûl kirin. Li gor belgeyên îro, “metnên pêşîn ê zazakî, wî bi xwe, li gor devok û gotina kurdên ku di şerê Rusya-Osmanîyan de esîr ketibûn, daye berhev kirine. Sala 1857-58ê, ev nivîs û metnên berhev kirî di St. Petersburg de hatine çap kirin û belav kirin. Ferhenga pêşîn a zazakî-rusî jî, sala 1858ê hatiye çap kirin. Heman demî Albert von Le Codî jî, hin metnên folklorê kurdî bi dîyalekta kurmancî û zazakî berhev kirine û sala 1903 li Berlînê dane çap kirin û belav kirin.”²²

Bêguman mesela materyalên dîyalekta zazakî û nivîsandina wê zaf mûhîm e. Îro di ber destê me de berhemên ku şiklê kevnare yê zazakî û tekamûla wê ya dîrokî dîyar bike nîn in. Eke dîkomentên berhev kirî yê Peter Lercî (1858) nebin, li gor agadarîyên îroyîn, nivîs û pirtûka pêşîn a zazakî Mewlûdê (1899) Mela Ehmedê Xasî ye. Ji vê şûn de jî Mewlûdê miftîyê Soregê Mela Usman Efendîyê Babîj heye, ku sala 1903 hatiye nivîsandin û sala 1933yê jî li Şamê hatiye çap kirin.

Major E. B. Soane jî di der heqê zimanê kurdî û ferqên navbera dîyalektên wî de dibêje: “Ji xeynê lehçeya mukrî û şaxên wê, di Kurdistanê de lehçe û şêweyên din jî hene û hemû jî xwe wek kurdên xas qebûl dikin. Ji van lehçeya yeka herî mûhîm jî zazakî ye. Zaza di nav kurdan de grubeke gewre ye û li derûdora Dêrsim, Ezirgan û hin cîyên Anatolyayê de dijîn. Pirañiya wan di herêmen çiyayî de dijîn, pir tund û dijwar in. Bi lehçeyê arî ya saf qise dikin. Lehçeya wan hem ji lehçeya mukrî û hem ji lehçeyên din ên kurdî cuda ye. Wisa tê fêmkirin ku lehçeya wan, lehçeyê xweser e û di pir kevnare de ji farisîya kevnare veqetyaye. Wekî zimanên arî, divê li ser vê lehçeyê jî xebat bête kirin. Lehçeya zazakî; ji farisî bêtir nêzîkê zimanê kurdî ye.”²³

Sir H. C. Rawilson, di benda “Kurdistan” a Ansiklopediya Britannica’yê de der heqê zimanê kurdî de weha dibêje: “îro zimanê esasî yê kurdan kurmancî ye, zazakî û goranî jî dîyalektên cûda ne.”²⁴

M. Emîn Zekî Beg jî, ji Madson Grant neqil dike û dibêje: “Ji esra 3. ya B. Z. û vir de ji zimanê kurdî sê dîyalekt peyda bûne: Dîyalekta kurmancî, babanî û zazakî (dinbilî).”²⁵ Û her weha Zîya Gokalpê ku bi eslê xwe ji Çêrmûgî ye, dîyalektên zimanê kurdî bi vê awayê tesnîf dike: 1- kurmancî, 2- zazakî, 3- soranî, 4- gûranî û 5- lûrî.²⁶

Sernûserê kovara *Kurdistan* Mehmed Mîhrî jî dibêje: “Di resenîya xwe de zimanê kurdî du qisim e: Kurdî û goranî. Goranî jî di nava xwe de dibe du şax: hewramanî û zaza.”²⁷

Roger Lescotê û Celadet Alî Bedirxan ê ku “Gramera Kurdmancî” amade kirine, der heqê dîyalekt û şêweyên zimanê kurdî de dibêjin: “1- Kurmancî, 2- soranî, 3- dumilî (zazakî), 4-goranî (û gelek şêweyên wan ên herêmî)”²⁸ hene.

Kemal Badillî jî dibêje çar birrên zimanê kurdî hene:

“1- kurmancî (kurdmanc, kurmac, kirmanc, kirmaç), 2- lûrî(lur, lor, ler), 3- goranî (hewremanî, ewremanî, zaza-dimilî), 4-kelhûrî yan jî soranî).”²⁹

Prof. Marûf Xeznedar jî, tesnîfkirina mamoste Tewfîq Wehbî esas qebûl dike û dîyalektên zimanê kurdî wisa tesnîf dike:

“1-Kurmancî (a-kurmancîya serû, b-kurmancîya xwarû-soranî), 2-goranî/ hew-remanî/ zazayî, 3-lorî (bextîyarî, feylî, kelhûrî, lekî jî wek devoka vê dîyalektê qebûl dike).”³⁰

Wek zimaneke kevnare yê arî (îranî), li ser têkilîya pehlewî û zimanê kurdî û dîyalektên wî jî lînêrînên cuda hene. Dema em baş bala xwe didin peyvên wan, bi awayekî zelal xuya dibe ku zazakî çiqas nêzîkê pehlewî û farisî be, kur-mancî jî ewqas nêzîkê e. Mîsal;

Zazakî	Pehlewî	Kurmancî
“acêr	azêr	jêr
adir	ater, atur, ateş	agir
ameyene	ameten	hatin
ard	ard	ard, arvan
asin	asên	hesin, asin
asmên, asmîn	asman, esman	asîman, asman
bes	ves	bes
ciwîyayîş	cîvîşnîh, zîsten, cenîh	jiyîn, jîyan, jîn
çere	çerek	çêre
çime	çêsmek	çavî, çavkanî
darû	darû, darûk	darû, derman
derg	derg, diraz, degr	dirêj
dest	dest	dest
hûmaritiş	hemarişn	hejmartin
mezg	mezg	mêjî
resayîş	resîten	gihîştin, gîhan
sêne	sênek	sîng
sole	şorek	xwê
şamî	şam	şîv
şane	şanek	şeh
şew	şep	şev

va	vay, vat	ba
varan	varan	baran
vazdayîş	vazîşin	bazdan
velg	velg, verg	belg
veng	vang	deng
verg	gurg	gur
vewre	vefr	befr
virso, bilîsk	virozak	birûsk ²³¹

Piştî van agadarîyan em dikarin bêjin ku helbet bi awayekî mutlaq dîyarkirina dîroka jihevûna zimanek û dîyalektên wî ne hêsan e, lê belê em dikarin bêjin ku ev ziman hemû di nav hev de wek parçeyek azbeta zimanên arî têne qebûl-kirin.

Zimanzan Qanatê Kurdo jî di pirtûka xwe ya *Gramera Ziwanê Kurdî (Kur-mancî û Soranî)* de, zimanê kurdî li ser çar dîyalektan parve dike: 1-kurmancî, 2- zaza, 3- lûrî û 4- Goranî.³²

Cîgerxwîn jî di gelek nivîs û helbestên xwe de zazakî wek dîyalektek kurdî qebûl dike û di pirtûka xwe ya *Awa û Destûra Zimanî Kurdî* (1961) de jî heman nêrînê tekar dike. A. Balî jî di pirtûka xwe ya bi navê *Rêzimana Kurdî* de, sê dîyalektên zimanê kurdî dijimêre: “1- kurmancî, 2- soranî, 3- zazakî.”³³

Ji van agadarîyan jî dîyar dibe ku em kurdîya kevnare wek malbatek qebûl bikin kurmancî, soranî, lûrî, hewramî/goranî, zazakî û azerîya kevin jî dikevin nava vê malbatê. Meriv dikare bibêje ku di nav van dîyalektan de jî bîlhesa hewramî, goranî û zazakî hîn bêtir nêzîkê hevûdin in.

Ji van agadarîyan dîyar dibe ku zimanê kurdî jî di nava xwe de li ser gelek dîyalektan parve dibe. Ku em baş bala xwe bidinê, di beşê “morfolojî” ya vê xebatê de jî xuya dibe ku nêzîkayîya navbera dîyalektên kurdî, ji ferqa navbera wan gelek zêdetir e. Ji alîyê dîrokî û komelnasî ve jî, kok û rîçîkê etnîkî yê axaftvanên vî zimanî û dîyalektên wî digîjin hev û yek e. Ew ên ku çend dîyalektên zimanê kurdî û hin xusûsiyetên wî bizanin, ew dê bibînin ku ferqa navbera dîyalektên kurdî, ji ferqa navbera dîyalektên zimanên din zêdetir nîne.

4. Peyva zaza û zazakî, dimil û dimilkî, kird û kirdikî,

kirmanc û kirmanckî di kîjan manayê de hatine bikaranîn

Dema ku em bala xwe didin belge û nivîsarên dîrokî, ji bo zazakî/dimilî/kirdî/kirmanckî û axaftvananên wê, hem di nava xwe de û hem ji terafê gelên bîyanîyan ve peyv û gotinên cuda cuda hatine gotin û nivîsandin. Îro axaftvanên zazakî, cî bi cî xwe bi navê “zaza”, “dimilî”, “kird” û “kirmanc” didin nasandin; ziman û dîyalekta xwe jî bi navê “zazakî”, “kirdkî”, “dimilî” yan zî “kirmanckî” didin nasandin. Peyva “kird”, li herêma Gêl û Pîranê di mana dîyarkirina ferqêk çînî yê sosyolojîk de jî tête bikaranîn. Di der heqê vê de Zîya Gokalp jî dibêje: “Qewmên kurdan navên cuda cuda li xwe û li hevûdu kirine. Mîsal; ew ên ku kurmancî dipeyvin ji xwe re nabêjin “kurd”, dibêjin em “kurmanc” in û ji “zazayan” re dibêjin “dûnbûlî”. Ew ên ku bi zazakî dipeyvin ji xwe re dibêjin “kird” û ji kurmancan re dibêjin “kirdasî”. Tirk jî, ji “kurmancan” re dibêjin “kurd” û ji “dunbulî”yan re jî dibêjin “zaza”. Bîzathî axaftvanên zazakî û kurmancî bi xwe, peyva “zaza” bikarnaînin.³⁴

Dema em bala xwe bidin nivîsên destpêkî yên “zazakî”, ev tespîta Zîya Gokalp rast derdikeve. Hem di xebata P. Lerc û hem jî *Mewlûda* Mela Ehmedê Xasî de ji bo xwe nasandinê peyva “kird” hatiye bikaranîn. Xoceyê Xasî di dawîya *Mewlûda* xwe de wisa dibêje: “Temam bû çêkirina *Mewlûda* **kirdî**, bi alîkarîya Xaliq û bereketa pêxemberê me.”³⁵

Qismekî dêrsimî yên ku bi dîyalekta dimilî dipeyvin ji xwe re dibêjin “kirmanc”, bi giştî ji kurmancan re jî dibêjin “kirdas” û ji dîyalekta wan re jî dibêjin “kirdasî” yan jî “kirdaskî”³⁶

Nûrî Dêrsimî jî zazakîya Dêrsimê wek zimanê xas ê kurdan qebûl dike û dibêje: “Zimanê zazakî yê ku Dêrsimî dipeyvin, bêguman zimanê bavkalê wan ên Med û Arîyan e.”³⁷

Kemal Badillî jî dibêje “Zazayên Turkiyeyê, xwe wek kurdên esil qebûl dikin û ji xwe re dibêjin kird û ji kurdên din re jî yan ji kurmanca re -di mana piçûk dîtîne de- dibêjin kirdasî.”³⁸

Prof. Mehrdad R. Izady jî der heqê vê meselê de gotina Bazil Nikitîn neqil dike û dibêje: “Ji ber ku axaftvanên dimilî tîpa /z/ pirr zêde bikartînin, kurmancan ji wan re gotîye “zaza”.³⁹

V. Minorsky jî peyva “dimilî” û “deylemî” pev girêdide û dibêje li gor gotina Andreas di navbera “zaza û deylemîyên berê de merivatî heye.”⁴⁰ Divê em ji bîr nekin ku di nivîsar û kitêbên cuda de, gelek formên cuda cuda yên nivîsandina peyva “dimilî” hene: “dimlî”, “dumbilî” “dailamî”, “deylemî”, “dinbilî” û “dimilî”. Di gelek cîyan de jî formên peyva “dimilî”, wek navê eşîrek derbas dibe. Mesela di Şerefnameyê de “dinbilî”, wek navê eşîreka êzidî ya derûdora Musil û Şamê derbas dibe.⁴¹ Îro jî di hin herêman de bi navê “dumbilî”, “dimbilî” û “dumilî” eşîr hene.

Robert Olson jî peyva “zaza”, “deylem” û “goran” wek peyvên bi hev re têkildar qebûl dike û dibêje: Zaza ji zimanê xwe re dibêjin dimilî û ev jî ihtimala têkilîya wan û Deylemîyên Bakurê Îranê tîne bîra meriv. Lehçeya kurdî ya zazakî, ji kurmancîyê -ku piraniya eşîretên Kurdîstana Bakur pê dipeyvin- zêdetir nêzîkê lehçeya goranî ye.”⁴²

Peyva “zaza” û “dimilî”, di hin çavkanîyan de jî li şûna cî û eşîran de hatine nivîsandin. Hin nivîskar û çavkaniyên din jî peyva “zaza”, bi peyva “zevezan (zozan)”, “zevezanîye”, “zavzan”, “zewezan”, “zewzan”, “zozanîye” û “zûzan” ve girê didin.⁴³

Wexta ku meseleya “zaza” yan jî “zazakî”, “kurd” yan jî “kurmancî” tê rojevê, meriv behsa hin nivîskarên îdeolojîya fermî ya turkan neke, belkî manîpûlasyonên îroyîn jî rast neyin têgehîştin. Di derheqê vê mijarê de Nazmî Sevgen dibêje: “Zazakî zimanekî tevlihev e û bi eslê xwe jî, ji tirkî peyda bûye.” Peydabûna peyva “zaza” jî, bi tirkên oxuz ve girêdide û dibêje: “Za”, navê lawekî Oxuzxan bû. Qewmên îptîdaî ji bo ku gotina peyvên yekhece bi şidandî telafûz dikirin, navê “Za”yê lawê Oxuzxan jî bi awayê “za-za/zaza” hatiye gotin.”⁴⁴ Hayrî Başbug jî li ser vê meselê, gotinên nêzîkê Sevgen tekrar dike û dibêje: “Hin mirov ji qestîka ve, bi nîyeteke xerab û pêşînhikum “zaza”yan di nav mefhuma “kurd”an de mûtala dikin. Lê belê ev hikum, li hemberê realîteya tarîxî tam tezatêk teşkîl dike... Kurmancî jî û zazakî jî du lehçeyên cuda yên

tirkî ne. Li gor fikra me navê “zaza/za-za”, bi guherîna navê “su/aw”(su-su) peyda bûye.”⁴⁵

Meriv dikare mîsalên werkîno hîna dirêj û zêde bike, feqet ez dibêjim qey ji bo zelalkirin û aşkerakirina vî beşê xebata me, agadarîyên li jorê, têkilîya dîrokî û manaya bikaranîna van peyvên bi zelalî dîyar dike.

5. Nivîsên dîyalekta zazakî

Wexta ku mijar dîyalektên zimanên kurdî û bîlhesa jî zazakî be, gerek em hinek jî behsa nivîsîn û dîkomentên zazakî jî bikin. Çimku nîşanek dewlemendîya ziman jî, nivîs û hacmê nivîsandina ziman e. Îro nivîs û dîkomentên zazakî yên ku li ber destê me ne gelek kêr in. Ji aliyê nivîsandinê ve dîyalekta zazakî lawaz e, qasê kurmancî pêşve neçûye. Heke em nivîsên hewramanî û goranî li ser xaneyê zazakî nehesibînin û ji îro şûn de jî dîkomentên nû yên zazakî ji ciyên tarî dernekevin ronahîyê, dîkomentên ku di navbera salên 1856-58an de ji aliyê Peter Lerch ve bi navê “Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nord-Chalder” hatine berhevkirin, wek nivîs û dîkomentên pêşîn ên zazakî tene qebûlkin. Di van materyalên folklorîk ê zazakî yên ku ji aliyê Peter Lerch ve hatine berhevkirin de, hem peyva “kird” û hem jî “zaza” hatine nivîsandin. Peyva “kird”, pênasîna wan bi xwe ye. P. Lerch di mesela “Qauxê Nêrib û Hêynî” de, gotina Xelef Axa bi vî awayê neqil dike:

“Xelef Axa ji eskerê xwe re got: Binêrin axalera, em diçin qawxe, netirsîn, eskerên Deqma Beg zaf in, hema giş tirk in, nikarin bi me re qawxe bikin, em giş ciwanmêrdê kirdan in, mêrê eşîran in, netirsîn, em waye diçin, heta ku serê min neçe ji çî kesî re tişteki tune...”⁴⁶

Wexta ku em bala xwe didine van metnan, heke hin kêmaniyên alfabeya nivîsandinê tune bin, zimanê mintîqa Nêribê wek ya îro ye, qet neguherîye.⁴⁷

Ji bilî vana, em dikarin bibêjin ku nivîs û nivîsandina zazakî (dimilî/ kirdkî/kurmancî) di van demên nêzik de yanî ji salên 1975an şûnde roj bi roj zêdetir bûne. Di van salan de kovara *Tîrêj* û rojnameya *Roja Welat* de hin helbest û nivîsên folklorîk ên zazakî hatine çapkirin. Îro di gelek malperên înternet û ko-

varan de nivîs û xebatên li ser zazakî têne çapkirin û belavkirin. Dema ku behsa xebat û nivîsandina zazakî dibe, hewce ye em berîya her tiştî xebata kovar û Gruba Vateyê bînin bîra xwe. Bêguman bi dîyalekta zazakî tenê di kovara Vate de nayê nivîsandin, di kovarên wekî *Armanç*, *Hêvî*, *War*, *BÎR*, *Tija Sodiri* û wd. de jî nivîsên bi dîyalekta zazakî hatine û têne çapkirin û belavkirin.

6. Ciyên ku axaftvanên zazakî têde belav bûne

Îro der heqê nifûsa axaftvanên zazakî de fikrên cuda cuda hene. Li gor gotina hin lêkolîner û nivîskarên bi texmînî nêzîkê 2.5-3 mîlyon axaftvanên zazakî hene û hin jî reqameke hîn zêdetir dibêjin. Lêkolîner û nivîskar Osman Aydin jî dibêje: “Li gor serjimêriya sala 2001ê, ji %6.54ê nifûsa Kurdistana Bakur, bi lehçeya dimilî (zazakî) dipeyvin.”⁴⁸ Diyar e ku der heqê vê meselê de fikrên cuda hene. Bêguman heta ku bi taybetî di gund û bajarên kurdan de û bi giştî jî di hin bajar û metropolên Turkiyê de, bi rêbazeke rast û aşkera nifûsa axaftvanên ziman û dîyalektên kurdî neye tespîtîkirin, xarîteya dîyalektên kurdî çênebe, dîyarkirina nîsbeta axaftvanên zazakî gelek zahmet e. Çimkî gelek eşîr û ciyên ku bi nifûsa xwe gişk zaza têne qebûlkirin, wan deran saf ne zaza ne, mîqdarek girîng ê nifûsa kurmançan jî li wê derê heye.

Dema ku em bala xwe didin ciyên belavbûna nifûsa eşîretan û zimanê wan ê axaftinê, ev yek hîn bi zelalî dîyar dibe. “Di Kurdistanê de gelek eşîr hene li herêmek bi dimilî (zazakî), li herêmekê din bi kurmançî, li herêmekê din jî bi soranî û hewremanî dipeyvin. Mesela: Eşîra Heyderan, li herêma Dêrsimê bi zazakî, li Wanê kurmançî û li başûrê Kurdistanê jî soranî dipeyvin; eşîra Lolan, li herêma Dêrsimê zazakî, li Wanê û Hekarî jî kurmançî dipeyvin; eşîra Demenan li Dêrsimê bi zazakî, li herêma Sêwaz, Wan û Hekarîyê jî kurmançî dipeyvin; eşîra Şadîyan li Dêrsim, Çewlîk, Muş û Qereqoçana Xarpêtê kurmançî û li qeza Madenê jî zazakî dipeyvin; eşîra Îzolî li Bîngol, Dêrsim, Elazîz, Melêti û Sorekê bi kurmançî û qeza Pûtûrge ya Melêtiyê jî zazakî dipeyvin; eşîra Xormekan, li Çewlîkê hin gundên wan bi zazakî û hin ên din jî bi kurmançî dipeyvin...”⁴⁹ Yanî em dibînin ku ciyên axaftvanên dîyalektên kurdî ne yekpare ye.

Mehmed Mîhrî li ser seha îroyîn a belavbûna zazayan weha dibêje: “Zaza; bi-necîyên qîsmek wîlayetên wek Erzerom, Xarpêt, Dîyarbekir, Bedlîs û Azerbaycanê ne.”⁵⁰ Ew wîlayet û qezayên ku bi temamî yan jî qîsmekî wan bi zazakî dipeyvin: piranîya nifûsa nava bajarê Çewlîk û qezayên wê; li aliyê bakur piranîya nifûsa Dêrsimê; qîsmeke mûhîm ê nava sûka Dîyarbekir û piranîya qezayên wî yên wekî Pîran, Hêne, Gêl, Çermûk, Çingûş, qîsmêke Licê û Qulp û hin gundên Erxenî; qîsmeke hindik ê nava sûka Xarpêt û qîsmekê girîng ê qezayên wî yên wekî Pale, Maden, Xulêman û 15-20 gundên herêma Qerebegan; di nava sûka Ezirganê de qîsmeke hindik û di herêma Qeredere ya navbera Tekman û Pûlûmurê de nêzikê 30 gund; li Semsûrê tenê qeza Gerger (Aldûş) û li Rihayê jî piranîya qeza Soregê; li Mûşê qîsmeke hindik ê qeza Varto û li Bedlîsê jî nêzikê 15 gundên Modkan bi zazakî dipeyvin. Herweha li hin qezayên bajarên wekî Sêrt, Erzerom, Sêwaz û hwd. jî kolonîyên axaftvanên zazakî hene. Em dikarin bêjin ku ji dervayê ciyên li jorê hatine hejmartin, li dîaspora û metropolên Turkiyê jî nifûseka girîng a axaftvanên zazakî hene.

* * *

Di dawîya vê beşê de, wek li jorê gelek lêkolîneran jî dîyar kirîye, em dikarin bibêjin ku kurdî jî wekî hemû zimanên dinyayê di nav xwe de dîyalekt bi dîyalekt ji hev cuda dibe. Zazakî jî ji van dîyalektan yek e. Divê hebûna dîyalektên cuda ne wek tiştê negatîf, wek xezîneyeke dewlemend a zimên bête dîtîn. Hebûna dîyalektên cuda “tenê xûsusîyetêk zimanê kurdî nîye; di dinyayê de neteweyên ku zimanê wan herî serrast û dewlemend e, dewre bi dewre edebîyatek wan ê sed salan heye, hîn jî lehçeyê wan hene, zindî ne û wek wextên berê têne axaftin.”⁵¹ Di berdewamiya vê xebatê de jî dê xuya bibe ku ferq û nêzikayîya ziman û dîyalektên din û bilhesa jî yê zimanên koma arî çiqas be, yê zazakî û kurmançî jî kê-m-zêde ewqas e. Nêzikayîya navbera dîyalektên kurdî ji ferqa navbera wan gelek zêdetir e. Ji aliyê dîrokî û kulturî ve jî, kok û rûçikê etnikî yê axaftvanên vî zimanî û dîyalektên wî diçe ser hev û yek e.

Beş I

Notên binî:

1. Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları: 439, 1995, Ankara, r. 145
2. Ludwig Paul, *I. Uluslar arası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 2011, r. 20
3. Neqilker: Prof. Dr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları: 439, Ankara, 1995, r. 146
4. Prof. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, 5. Baskı, Ankara, 1995, r. 142
5. Kurdîyê Bitlîsî, Jîn, h.: 14 (1919), wergera M. Emîn Bozarslan
6. Steven Roger Fischer, *Dilin Tarihi*, çev.: Muhtesim Güvenç, Türkiye İş Bankası Yayınları, Haziran 2013, İstanbul, r. 75
7. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, 5. baskı, Ankara-1995, r. 125
8. C. V. Ceram, *Tanrıların Vatanı Anadolu*, çeviren: Esat Mermi Erendor, Remzi Kitapevi Yayınları, İkinci Baskı, 1984, Ankara, r. 184
9. Peyva “îran”, ji “aryan”îya sanskritî peyda bûye. Di vê xebatê de dema ku em dibêjin “Îranî”, qesta me tenê ne zimanê farisî ye.
10. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 23, 24
11. “Belgeyên herî kevnare yê gruba Hind-Îranî, ji nava belgeyên Mîtanîyan derketine. Mîtanîyan, di bakurê Mezopotamyayê de, nizîkê 1500 sal berîya bûyine Îsa dewletek ava kiribû.”8 (Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 70)
12. Di vê nivîsînê de peyva “kurdî”, di ciyê “kurdîya kevin” û hemû dîyalektên wê de hatiye bikaranîn. Li vê derê dema ku em dibêjin kurdî, qesta me ev e, hemû zarava û dîyalektên ku ji kurdîya kevnare peyda bûne; wekî kurmançî, kirmanckî (kirdkî/ zazakî/dimilî), soranî, hewramanî, goranî, lûrî, kelhûrî û wd. ne.
13. Zuhdî El Dahoodî, *Kürtler: Tarih, Kültür ve Yaşam Mücadelesi*, Deng Yayınları, İstanbul, r. 162
14. Mc. Carus & Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, çeviren: Doğan Kılıç Şihhesenanlı, Sönmez Neşriyat ve matbaacılık, 1963, İstanbul, r. 46
15. M. Sıraç Bilgin, *Zarahuştra Gathalar*, Doz Yayınları, İstanbul, r. 170, 184,
16. Armîn Kesrevî, *Xud Amûzî Xetî Avestayî*, r.: 4, 5, 7, 8, 9, 10, 14, 15, 17, 18, 19, 22, 23, 29, 31, 33, 34 <http://www.zoroaster7.persianblog.com>, <http://www.avesta.org/>

yasna/hasna.htm, 12/11/2012

17. Ku cîranên wan Mîtanî û Kassîdî ne. Mîtanî, B. Z. di salên 1500-1300î de, di bakurê Mezopotmayayê de ji Sûriya îroyîn bigre heta Filistinê belav bûbûn. Kassîdî jî, B. Z. di navbera salên 1750-1170 de, li Babîlê hikum kirine. (Korhan Kaya, Hindistan'da Diller, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79)
18. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 79
□ Ev peyv, di zimanê sanskrîtî de tê wateya “Xudayê Bayê”. bn. Korhan Kaya, Hindistan'da Diller, İmge Yayınları, Ankara, 2005, r. 27
19. Korhan Kaya, *Hindistan'da Diller*, r. 24-25, İmge Yayınları, Ankara, 2005. Dema ku em bala xwe bidin guherîna dengên navbera zimanê sanskrîtî-avestayî, em dibînin ku dengê /s/yê bi /h/ re, /h/yê bi /z/, /c/yê re, dengê /şva/yê /spa/ û /spa/ jî yê /khu/ re diguhere. b.: J.b., r. 24, 25
20. Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 1990, r. 20, Wekî din jî: Mc. Carus-Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, Sönmez Neşriyat ve Matbaacılık, İstanbul, 1963, r. 48
21. Martin Bruinessen, *Studia Kurdica, Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebi'nin Notları*, sayı: 1-3, Paris Kürd Enstitüsü Yayınları, Nisan-1985, r. 18
22. Joye Blau, *Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları*, *Studia Kurdica*, No: 1-3, Paris, Nisan 1985, r. 65
23. M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çeviren: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 297
24. Neqilkar: Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük(1787-1923)*, Bilgi Yayınları, 3. Baskı, İstanbul, 2009, r. 519
25. M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, çeviren: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012, r. 290
26. Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, İstanbul, Nisan 1992, r. 27
27. Mihmed Mihri (M.M.), *Mukaddimet-ül İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, b. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>
28. Emîr Celadet Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 9
29. Kemal Badıllı, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri (Kurmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, 2. Baskı, 1992, İstanbul, r. 22-23

30. Prof. Maruf Xeznedar, *Zimanê Kurdî*, <http://www.kovarabir.com/dr-maruf-xeznedar-zimane-kurdi/>
31. Malmîsanij, Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî, weşanên Apec, 1997, Sweden
32. Qanatê Kurdo, Gramera Zimanê Kurdî (Kurmancî-Soranî), Koral Yayınları, 1990, İstanbul, r. 7
33. A. Bali, Kürtçe Dilbilgisi (Türkçe İzahli), Alan Yayınları, 1992, İstanbul, r. 35
34. Ziya Gokalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, İstanbul, Nisan 1992, r. 27
35. Mela Ehmedê Xasî, *Mewlûdê Nebî*, Fırat Yayınları, İstanbul, 1994, r. 42
36. Malmisanij, Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları. İstanbul, 1996, r. 11
37. Dr. Nûrî Dersimî, *Kurdistan Tarihinde Dersim*, Doz Yayınları, İstanbul, İkinci Baskı, 2004, r. 65
38. Kemal Badilli, *Türkçe İzahli Kürtçe Gerameri (Kurmançça Lehçesi)*, Dipnot: 2, Med Yayınları, İstanbul, r. 22
39. Izady, Mehرداد R, *Bir el Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları. r. 299
40. İslam Ansiklopedisi, Cilt:6, r. 1112
41. Şeref Xan, *Şerefname*, Hasat Yayınları, 4. Baskı, 1990, r. 21
42. Robert Olson, *Kürt milliyetçiliğinin kaynakları ve Şeyh Said ayaklanması*, Özge Yayınları, Ankara, 1992, r. 145-46
43. Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Kasım 1996, Deng Yayınları, b. notê jêrîn ê 153, r. 11
44. Nazmi Sevgen, *Zazalar ve Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*, Kalan Yayınları, Ankara, r. 34
45. Hayri Başbuğ, *İki Türk Boyu: Zazalar ve Kurmanclar*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara-1984), r. 17-33
46. Peter J. A Lerch, *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar*. r. 78, Band I St. Petersburg 1857:
47. b., qışmêk çîroka ke ay metnan mîyan de ameya velakerdiş: “Zemanê veriyê yew (yau) mêrde û cênîyay (cênîai) xoe bî, yew (yau) keîna û yew lac tera bî. Cenîya eyî merde, peynîde mêrde şî yewna cênî arde. Di serrî vînert, yew keyna aya cênî ra bî. Ena cênî biye dişmenê lacek û keyneka veryêne.

sêna cênîyay bawukî xoe, vana ki: birayê mi ça yo? Cenêke keynek ra vana ki: Birayê tue şiyu key xalanê xoe.

Keînek aya şu ra kuwena, hau(hawn) veyênena, ek birayê xoe kiştu, eîştu zîndan. Sibah wardena, baukê xoe ra vana: bawo mi emşewe yew hewn dî, eki cenîyay tue (to) birayê mi kiştu, eîştu zîndan. Baukê keyneke xoe ra va ki: xêr bo, senî birayê tue (to) kişêno?

Keînek va ki: bau(bawo), mi haunê (hawunê) xoe de dî, birayê mi kiştu, eîştu zîndan, ez ha warzenua, şuena golikan de, yerey yena keîye, eke birayê mi amewo (amewo), ez zama weşu, xeyir ke biraê mi nêameû ez hênî tuerî golikande nêşuêna, ez etîya nêvinda.

Baûkê keyneke xoe ra va ki: ewru ti şue golikande, ez gêrena, eke mi biraî tue dî, bizani ki: ek cenîa mi şima de saxe na, xeîr ki mi biraî tûe nêdî, ne ez vindena ne ti vîunde.” Lerch, Peter J. A.: Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar. r. 80-81. Band I St. Petersburg 1857

48. Osman Aydın, *Li Kurdistanê Bakûr struktura demografîk*, www.lemondekurdi.com, hej.: 19

49. Seyîdxan Kurij, *Zazalar ve Zazaca Yazınının Tarihçesi*, <http://www.kovarabir.com/seyid-xan-kurij-zazaca-yazininin-traihcesi-II>

50. Mehmed Mîhrî, (M.M.), *Mukaddimet-ûl İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918, b. <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>

51. Kurdîyê Bîtîsî, *Jîn*, h.: 14(1919), Wer.: M. Emîn Bozarslan, Weşanxaneyê Deng, Sweden, 1985

B) Alfabe û Fonetîk

1. Alfabeyê ke zîwanê kurdî û dîyalektê ey pê ameyê nûstîş

“Mefhuma ‘alfabe’, bi pêgirewtena di herfê vernî yê Yunanî; alfa û beta ameya viraştene.”¹ Peydabîyayîşê alfabeyan, sey yew sîrrê tewr gird ê tarîxê însanetîye, hema tam zelal nêbîyo û no derheq de teorî û fikrê cîya cîyayî estî. Wexto ke bahsê peydabîyayîşê alfabe û nûsteyo alfabetîk beno, lazimo ke peydabîyayîşê nûsteyî û alfabe têmîyan nêbo, çinku verê alfabe zî nûste bînê û no nûste bi resm û sembolana ameynê dîyarkerdiş. Wazenê wa bi sembolan yan zî bi nûstena alfabetîk bo, eger zîwan nêameynê nûstîş, nêresaynê rojo ewroyên û ancax zîwan bi raya nûstene bîyo mende (mayînde). “Rojgaro ke nûste peyda bîyo, her zîwanî goreyê fonolojîya xo nûsteyêk peyda kerdo yan zî nûsteyê ke estî bide ardî.”² Nûste û materyalê nûsyayeyî, çimeyê tewr muhîm ê tarîxdê zîwanî yê. “Senî ke zîwanî, însan resnayo halê bîyayenêk tarîxî, çîyo ke zîwanî keno mayîndeyêk dewamî û bîyayenêko tarîxî zî, nûste yo. No sebeb ra tarîxê zîwanî û tarîxê nûstîşî, têmîyan de wo.”³

Ewro alfabeya ke sey “alfabeya tewr verên û tekamulbîyaye yena zanayîş, alfabeya zîwanê sanskrîtî ya û verê 4000 serran başûrê Asya de ameya vînayîş. Goreyê na alfabe, vengê zîwanê sanskrîtî bi 50 sembolana ameyê nawitene.”⁴ Naye ra pey, vernî de “alfabeya Fenîkî û gelek alfabeyê bînî yê ke virazyayê îlhamê xo na alfabe ra girewto.”⁵

Wexto ke bahsê yew zıwanê alfabetîk û nûstîşê ey bibo, verê heme çî alfabe û şıklê ke seba nûstîşê zıwanî yenê xebitnayîş, kewenê kê vîrî. Ma nêzanê ke tewr vernî de kurdan kamcîn alfabe xebitnaya, labelê rojgaro ke nûstîşê mêxî dest bide kerdo û heta ewro seba nûstîşê zıwanê kurdî û dîyalektanê ey, gelek alfabeyî ameyê xebitnayîş.

Belgeyê verdestî çinî bê zî, goreyê vaten û agadarîya qismêk cigêrayoxan, kurdan verê qebulkerdena Îslamîyete alfabeyê nûsteyê mîxan, alfabeya Aramî, alfabeya Avesta, alfabeya Pehlewî û alfabeya Bînûşad û Masî Sûratî xebitnayê. Alfabeya Avesta, seke namedê aye ra zî dîyar beno, pê kitaba pîroz a Avesta ameya nûstîş û “na alfabe terafê gelek qewmandê îranîyan ra ameya xebitnayîş û 45 herfê aye estî.”⁶ Goreyê neqilkerdena M. Emîn Zekî Begî, kitaba *Cografîyet Meltabrun* de winî vajyeno: “Zıwanê Zend û Pehlewî, zıwanê tewr kehan ê gruba arî yê.”⁷

Goreyê nûstena qismêk cigêrayoxan, alfabeyandê tewr kehênan ra yew zî alfabe Bînûşad û Masî Sûratî ya. “Na Alfabe 37 sembolan ra peyda bîya, vera 30 sembolandê aye de teqabûlê ênan ê erebî ameyê nûstene û 7ê bînî zî sembolê ênan ê erebî nêameyê dîyarkerdene, bi ihtimalêko gird teqabûlê ênan ê erebî çinî yê.”⁸ Bi na alfabe 30 kitabî ameyê nûstîş û wexto ke nûstox bi xo Şam de bîyo, nê kitabî ra di teneyî kitabxanedê ey de bîyê û bi xo nê her di kitabî kurdî ra açarnayê zıwandê erebî ser. Dina kitabê ke Ebu Henîfe ed-Dînewerî bi lehçeya goranî ya nûstî, sey çimeyê tewr kehan ê nûstena na alfabe qebl benê.”⁹ Kitaba *Cilwe* û *Mishefa Reş* a kurdandê Êzidîyan zî bi yew alfabeya sirrî ameyê nûstene. “Kurdistan de velabîyayena Îslamîyete ra pey, heta destbidekerdena seserra vîstine (20.) nûstîşê kurdî, binya û bingeyê alfabeya erebî ser o bîyo. Ey ra pey zî, seba nûstîşê û viraştîşê alfabeya kurdî xebitayî ke alfabeyanê miletandê bînan tetbîqê kurdî bikê.”¹⁰

Ey ra teber seyah, kurdnas û mîsyonerê xerîbê ke Kurdistan ra gêrayî, tekstê edebî yê ke pêser kerdî, çîyê ke kurdan û zıwanê kurdî sero nûştî, bi alfabe ay wextên a kurdî yan zî bi alfabe zıwandê xo nûştî. Ma şênê vajê ke nêmeyê seserra newêsine(19.) û sereyê seserra vîstine (20.) ra na heta zî tayê tekstê zıwanê kurdî û dîyalektanê ey bi al-

fabeya Arebî, Latîni, Krîlî, Armenkî û Îbranî ameyê nûstîş.

No sebeb ra serencama alfabeya zîwanê kurdî û dîyalektandê eye, dergûdila ya. Labelê efîya de ma do dergûdila behsê tarîxê alfabeya kurdî nêkerê, tena bi kilma der behsê alfabeyê ke pê tekstê kurdî û dîyalektê ey ameyê nûstîş bikê.

Ewro roj cografyaya tarîxî ya ke kurdî ser o ciwîyenê, bîya parçe û her yew parçe dekewto mîyanê sînorê sîyasî yê dewletandê cîyayan. Na parçebîyene, heme hawa ra tesîr bi civata (komeleya) kurdan kerdo; bi hetê zîwan û alfabeya zî ên yewbina cira kerdî. No sebeb ra parçebîyena komeleya kurdan, bîyo sebeb ke zîwanê kurdî zî bi heme lehçeyandê xo ya bi alfabeyandê cîyayan bêro nûstene.

Eke ma destnûsteyê kehan ê dîyalekta hewramanî û dukomentê ke hetê mîsyoner, seyah û nûşttoxandê xerîban (ejnebîyan) ra ameyê pêserkerdiş û nûstîş, xo çîman vera nêgîrê, heta ewro zazakî, bi Alfabeya Erebi û Latîni ameya nûstîş. Labelê gerek ma xo vîrê nêkê dukomentê ke serra 1856 de terafê Peter Lerch ya ameyê pêserkerdene, bi Alfabeya Lînguîstîk a Lepsiusî nûsyayî. Goreyê na alfabe “kurmancî de 37 vengê cîyay estî: ênan ra 9 teneyî vengin û 28 zî bêveng î. Dîyalekta zazakî de zî 39 vengî estî: ênan ra 9 teneyî vengin û 30 zî bêveng î.”¹¹ Fahrî Pamukçu zî vano “ziwandê zazakî di hîris û yew (31) herfî estî: heştê nînan herfê vengînî, ê bînî zî herfê bêvengînî yê.”¹² Munzur Çem zî xebata xo ya *Gramerê Zazakî* de, alfabe Celadet Bedirxanî bingeh qebul keno.

Nê se serrandê peyênan de zazakî bi Alfabeya Erebi û Latîni ameya nûstîş. Alfabeya Erebi, vêşî der seba nûsten û açarnayena metnandê dîni (mewlûd) û nûstena tayê şîiran ameya xebitnayîş. Metnandê dîni ra teber, ayê ke bi alfabeya latîni nûsenê, vêşaneyê ênan alfabeya latîni ya ekola *Haware* esas (bingeh) qebul kenê. Eger ma çîroka ke Mîr Celadetî serra 1933 de bi şeweyê zazakîya Palo û Sêwreke daya açarnayîş nêhesibnê, kê şênê vajê ke na alfabe serrandê 1975î ra na heta ameya xebitnayîş. Kovar û rojnameyê sey *Roja Welat* û *Tîrêj* de nûs-

teyê zazakî yê bi Alfabe Latînî ameyê velakerdene. Ewro roj alfabeya latînî ya ke pê zazakî nûsyena, hîris û yew herfê aye estî.

Gerek ma naye bizanê ke hûmara herfandê vengîne kurdî ser o cîya-yîye çinî bo zî, hûmara herfandê bêvengan ser o fikrê cîyayî estî. Alfabeya Erebî ya ke ewro roj pê kurmancî nûsyena, binya aye 1909 de terefê Xelîl Xeyalî ra ameya viraştiş. “Alfabeya Xelîl Xeyalî, alfabeya yewin a kurdî ya, ke bi herfandê erebî ya ameya hadirnayîş û 34 herfê aye estî.”¹³ Sernûserê rojnameya *Kurdistan Mihemed Mîhrî Hîlav* (Hêlav) zî vano; “Herfê alfabeya kurdî 32 yî, labelê nê herfî qîm nêkenê, lazimo tayê îşaretî zî bi înanan bêrê nûstiş.”¹⁴ “Ziwanzan Qanatê Kurdo, humara herfandê bêvengan 28, Celadet Bedirxan 23, Tewfîq Wehbî seba lehça soranî 31 û Evdirehman Hacî Me’ruf 29 qebul kenê.”¹⁵ “Alfabeya Krîlî ya ke seba kurmancî ameyê viraştiş, tede vengî û bêvengî pêsero 40 herfî ameyê dîyarkerdiş.”¹⁶ Kemal Badilli zî vano; “Kurmancî de 38 vengî estî.”¹⁷ Ewro, Alfabeya Erebî ya ke pê lehçeya soranî nûsyena 37 herfî tede estî; ênan ra 29 herfî bêveng û 8 herfî zî vengî î.

Ewro alfabeya latînî, heme cayê dinya de bîya yew sîstemêko muhîm ê nûstişî. Pêroyê na xebate de, şiklo peyin ê alfabeya latînî ya ke kovara *Haware* de tetbîq bîya, sey binyad amyeya qebulkerdene. Goreyê binya na çarçewa, rastnûstişê zazakî de zî, xebata gruba Vate sey bin-yayêka ûmumî ameya qebulkerdiş.

(Alfabeyên ku zimanê kurdî û dîyalektên wî pê hatine nivîsandin

“Peyva ‘Alfabe’, bi yekgirtin du tîpên pêşî yên Yunanî; ‘alfa’ û ‘beta’ yê hatîye çêkirin.”¹ Peydabûna alfabeyê, wek sirrekî tewr gewre yê dîroka însanetîyê, hîn zelal nebûye û di derheqê vê yekê de teorî û nêrînên cihê cihê hene. Dema ku behsa peydabûna alfabe û nivîsa alfabetîk bibe, lazime ku peydabûna nivîs û alfabeyê tevlihev nebe, çimku berîya alfabeyê jî nivîs hebû û ev nivîs bi wêne û sembolan dihate nîşandan. Dixwazî bi sembolan yan jî nivîsa alfabetîk be, eger ziman nehatibana nivîsandin, nedigihîşt roja îro û ancax ziman bi rêya nivîsandinê bûye mayînde. “Rojgara ku nivîs peyda bûye, her zimanî li gor fonolojîya xwe nivîsek peyda kirîye yan jî nivîsên heyî lê anîye.”² Nivîs û materyalên nivîskî, çavkanîyên herî girîng ên dîroka ziman in. “Çawa ku ziman, mirov gihandîye halê hebûneka dîrokî, tiştê ku zimanî dike mayîndeyek berdewamî û hebûneke dîrokî jî, nivîs e. Ji ber vê yekê dîroka ziman û dîroka nivîsê, di nav hev de ye.”³

Îro alfabeya ku “wekî alfabeya tewr kevnare û tekamulbûyî tête zanîn, alfabeya zimanê sanskrîtî ye û berîya 4000 salan li başûrê Asyayê hatîye dîtin. Li gor vê alfabeyê, dengên zimanê sanskrîtî bi 50 sembolan hatine nîşandan.”⁴ Ji wê şunde, “destpêkê, ji alfabeya Fenîkî bigre û gelek alfabeyên din ên ku hatine çêkirin, îlhama xwe ji vê alfabeyê girtine.”⁵

Dema ku behsa zimanek alfabetîk û nivîsandina wî bibe, berîya her tiştî alfabe û şiklên ku ji bo nivîsandina ziman têne bikaranîn, tê bîra me. Em nizanin ku di kevintirîn zemanî de kurdan kîjan alfabe bi kar anîne, lêbelê rojgara ku nivîsandina Mîxî destpêkirîye û heta evro ji bo nivîsandina kurdî û dîyalektên wî, gelek alfabe hatine bikaranîn.

Belgeyên berdest tune bin jî, li gor gotin û agadarîyên qismêk lêkolîneran, kurdan berîya qebulkirina Îslamîyetê alfabeya nivîsandina Mîxî, alfabeya Aramî, alfabeya Bînûşad û Masî Sûratî, alfabeya Avestayî û alfabeya Pehlewî bi kar anîne. Alfabeya Avesta, wekî ku ji navê wê jî diyar dibe, pê kitêba pîroz a Avesta hatîye nivîsandin û “ev alfabe ji alîyê gelek qewmên îranî ve hatîye bikaranîn û 45 tîpên wê hene.”⁶ Li gor neqilkirina M. Emîn Zekî Beg, di kitêba

bi navê *Cografîyet Meltabrun* de hatîye gotin ku “zimanê Zend û Pehlewî, zimanê herî kevnare yê gruba arî ye.”⁷

Li gor nivîsandina hinek lêkolîneran, ji kevintirîn alfabeyan yek jî alfabeya Bî-nûşad û Masî Sûratî ye. “Ev alfabe ji 37 sembolan pêkahtîye, di binê 30 sembolan de teqabûlê wan ên erebî hatine nivîsandin û 7ê din jî sembolê wan ê erebî nehatine dîyarkirin, bi îhtimalek mezin teqabûlê wan ên erbî nîn in.”⁸ Bi vê alfabeyê 30 kitêb hatine nivîsandin û dema ku nivîskar bi xwe li Şamê bûye, ji van kitêban du heb di kitêbxaneyaya wî de hebûne û bi xwe ev herdu kitêb wergerandîye ser zimanê erebî. Du kitêbên din ên ku Ebu Henîfe ed-Dînewerî bi lehçeya goranî nivîsandine, wek çavkanîya kevintirîn a nivîsandina vê alfabeyê têne qebulkirin.”⁹ Kitêba Cilwe û Mishefa Reş a kurdên Êzîdî jî bi alfabeyek sirrî hatine nivîsîn. “Di Kurdistanê de ji piştî belavbûna Îslamîyetê bigre heta destpêkirina sedsala bîstî (20.) nivîsandina kurdî, li ser binyad û bingeha Alfabeya Erebi çêbûye. Ji wê şûnde jî, ji bo nivîsîn û çêkirina alfabeya kurdî, xebitîne ku alfabeyên miletên din tetbîqê kurdî bikin.”¹⁰

Ji xeynî vê, ew gerok, kurdnas û mîsyonerên ku li Kurdistanê geryane, bi alfabeya wê demê ya ku kurdî pê hatîye nivîsîn yan jî bi alfabeya zimanê xwe, tekstên edebî û folklorîk berhev kirine, û hinek not û nivîs li ser kurdan û zimanê kurdî nivîsandine. Em dikarin bibêjin ku ji nivê sedsala nozdemîn (19.) û destpêka sedsala bîstan (20.) vir de jî hinek tekstên zimanê kurdî û dîyalektên wî bi alfabeya Arebî, Latînî, Krîlî, Armenî û Îbranî hatine nivîsandin.

Ji ber vê yekê serencama alfabeya zimanê kurdî û dîyalektên wî, dûr û dirêj e. Lêbelê di vir de em dê bi dûr û dirêjayî behsa tarîxa alfabeya kurdî nekin, tenê bi kurtayî behsa alfabeyên ku tekstên kurdî û dîyalektên wî pê hatine nivîsandin bikin.

Îro cografa tarîxî ya ku kurd li ser dijîn, parçe bûye û her yek parçeyê wê ketîye nav sînoren sîyasî yên dewletên cuda. Vê parçebûnê, bi hemû awayan tesîr li ser komela kurd kirîye; ji alîyê ziman û alfabeyê ve jî ew ji hev cuda kirine. Ji ber vê yekê parçebûna komela kurd, bûye sebeb ku zimanê kurdî jî bi hemû lehçeyên xwe ve bi alfabeyên cuda bêne nivîsandin.

Heke em destnivîsên kevnare yên dîyalekta hewramanî û dukomentên ku ji

alîyê mîsyoner, gerok û nivîskarên bîyanî ve hatine berhevkerin û nivîsandin li ber çavê xwe negrin, heta îro zazakî (dimilî) bi Alfabeya Erebi û Latîni hatîye nivîsandin. Lêbelê divê em ji bîr nekin, dukomentên ku di sala 1856an de ji terefê Peter Lerch ve hatine berhevkerin, bi Alfabeya Lînguîstîk a Lepsiusî hatine nivîsandin. Li gor vê alfabeyê, “Di kurmancî de 37 dengên cuda hene: ji wan 9 tîp dengdar in û 28 tîp jî bêdeng in. Di dîyalekta zazakî de jî 39 deng hene: ji wan 9 tîp dengdar in û 30 tîp jî bêdeng in.”¹¹ Fahrî Pamukçî jî dibêje “Di zimanê zazakî de sîh û yek (31) tîp hene: heşt ji wan dengdar in û yê din jî bêdeng in.”¹² Munzur Çem jî di xebata xwe ya *Gramerê Zazakî* de, alfabeya Celadet Bedirxan binyad qebul dike.

Di van sed salên dawî de jî zazakî, bi Alfabeya Erebi û Latîni hatîye nivîsandin. Alfabeya Erebi, bêtir ji bo wergerandina hinek metnên dîni(mewlûd) û nivîsandina helbestan hatîye bikaranîn. Ji dervayê metnên dîni, ew ên ku bi alfabeya latîni dinivîsinin piraniya wan alfabeya latîni ya ekola Hawarê esas(binyad) qebul dikin. Eger em çîroka ku Mîr Celadet di sala 1933ê de bi şeweyê Palo û Sêwrekê daye wergerandin hesab nekin, dikarin bibêjin ku ev alfabe ji salên 1975an vir de hatîye bikaranîn. Di kovar û rojnameyên wekî Roja Welat û Tîrêj de, nivîsarên zazakî yê bi alfabeya latîni hatine belavkerin. Îro alfabeya latîni ya ku zazakî pê tete nivîsandin, 31 tîpên wê hene.

Divê em vê yekê jî bizanin ku li ser hejmara tîpên dengdar ên kurdî cudatî tune be jî, li ser hejmara tîpên bêdeng nêrînen cuda hene. Alfabeya Erebi ya ku îro pê kurmancî tete nivîsandin, ji alîyê Xelîl Xeyalî ve hatîye çêkirin. Xelîl Xeyalî, di sala 1909an de bi navê Elîfbayê Kurmancî yekemîn alfabe bi tîpên erebi ji bo kurmancî çêkirîye. “Elfabeya Xelîl Xeyalî yekemîn elfabe ya kurdî bi tîpên erebi ye û ji 34 tîpan pêk tê.”¹³ Sernivîskarê rojnameya Kurdistan Mihemed Mîhrî Hîlav (Hêlav) dibêje, “Tîpên alfabe ya kurdî 32 ne, lêbelê ev tîp qîm nakin, divê hinek îşaret jî li ser bêne zêdekirin”¹⁴ “Zimanzan Qanatê Kurdo, hejmara tîpên bêdeng 28, Celadet Bedirxan 23, Tewfîq Wehbî ji bo soranî 31 û Evdirehman Hacî Me’ruf 29 qebul dikin.”¹⁵ “Alfabeya Krîlî ya ku ji bo kurmancî hatîye çêkirin, tede dengdar û bêdeng li ser hev 40 tîp hatine qebulkirin.”¹⁶ Kemal Badillî dibêje, “Di kurmancî de 38 deng hene.”¹⁷ Îro, Alfabeya Erebi ya ku zaravayê soranî pê tete nivîsandin 37 tîp in; ji wan 29 tîp bêdeng û 8ê din jî dengdar in.

Îro alfabeya latînî, li hemû dinyayê bûya sîstemeke herî girîn a nivîsandinê. Di vê xebatê de, bi giştî alfabeya latînî ya ku di kovara Hawar de hatîye tetbîqkirin, wek bingeh hatîye qebulkirin. li ser vê bingehê, di nivîsandina zazakî de jî xebata gruba *Vate* wek bingehê giştî hatîye qebulkirin).

2. Fonetika (vengsaziya) diyalakta zazakî û

kurmancî ser o kilmvateyêk

Wexto ke behsê fonetîk yan zî fonolojîya ziwanî bibo, lazimo vernî de îze-hatê ênan bêro kerdiş, wezîfe û çarçeweya cigêrayîşê aye diyar bibo. Bê-guman fonolojî û fonetîka ser o fikir û îzehatê cîyayî estî û nê termî zî gelek ameyê munaqeşekerdene. Fonetîk, zanyarîya cigêrayîşîya bedêliyayîşê veng (fonem) a. Fonolojî, zanyarîya cigêrayîşêya vengê (fonem) tewr hûrdî yê ziwanî ya. Seha cigêrayîşê fonolojî veng (fonem) o. “Wezîfeyê fonolojî zî no yo: Cêbigêro ke bedêliyayîşê kamcin xusûsîyetandê vengî benê sebebê cîyawazeya mana; xusûsîyetê ke benê sebebê cîyawazîye, ma-bênê xo de senî hereket kenê û seba viraştene vate û cumleyan (hevo-kan) goreyê kamcin qeydeyan yewbîyayena ênan mimkun bena.”¹⁹ No çarçewe de wexto ke behsê xebata gramerê ziwanî bibo, fonolojî û fonetîk sey parçeyêk esasî yê xebata ziwanî vejîyenê vera ma.

Ziwanzano namdar ê esrê 20. Fe. De Saussure, ziwanî sey sîstemêk qebul keno. Wexta ke ziwan sey sîstemêk qebul bo, no sîstem de unsûrê cîya cîyayî estî û wezîfeyê ênan her yewî zî cîya yo. Unsûro tewr hûrdîyê ziwanî veng o û ziwanî mîyan de wezîfeyê her yew vengî zî cîya yo. Heme ziwanan mîyan de zaf vengê cîya-cîyayî estî, feqet nê vengî pêro nînê xebitnayîş. “Mêrdim eşkeno nêzdî 200 veng (fonem) telafuz biko û ênan hîss biko; labelê qiseykerdoxê komeyê ziwanan, seba hezaran vateyan tenya 40 veng (fonem) esasî xebitnenê”¹⁹

Vengê ke behs beno yew bi yew yan zî yew ra vêsêr bêrê pê hete, tira vatey peyda benê. Her yew veng manayanê cîyayî dano ziwanî û cîyayeya vateyan zî diyar keno. Vateyê ke ma fek ra vejênî, cîyayîya vengê ênan ê vernî û peynîye sey cê nîyê; ke tena vengê peyên ê vateyan bibedêliyî rewarew manaya ênan nêbedêliyena, ke vengê verên ê vateyan bibedêliyî manaya ênan zî bi tamamî bedêliyena. Mîsal; ke ma vateyê /roj/ û /roz/, /ruz/... bîyarê xo çiman ver, bedêliyayîşê vengê /j/ û /z/ yan zî /o/ û /u/ mana de ferqêk muhîm diyar nêkeno, labelê ke ma vateyanê /pîr/, /bîr/, /vîr/, /tîr/, /nîr/, /jîr/ û /şîr/ yan zî /dar/, /bar/, /jar/, /war/, /mar/ û /har/ sey sembolê vengandê

cîyayan nê bieşnawê, ma nişênê ferqê manaya ênan yewbine ra biaqitnê.

Yew vate tena zî, xo ser yew mana dîyar nêkeno. Seba ke mana peyda bibo, gerek yew ra vêşêr vateyî goreyê qeydeyê ziwani pêwa bêrê rêstene, ke na rêstena vateyan ra vajyeno cumle yan zî hevoke. Cumle û rêstena cumle, binya mesacdê ma virazenê. Awayê rêstena hevoke, ca û giraneya vateyan dîyar keno. Feqet veng û vateyê ke sîstemê ziwani mîyan de ca gênê mutlak nîyê. Rojgaro ke ziwani peyda bîyê û heta ewro, heme ziwani hetê veng û vateyan ra bedêlîyayê û peynîya na bedêlîyayene de formê ênan ê cîyay peyda bîyê. Wexto ke ma bala xo bide dîyalektandê kurdî, gelek çekûyî (vateyî) estî ke manaya ênan seycê ya, feqet formê ênan berdêlîyenê. Mîsal; seba nameyê organê (weslê) hilm (bûy) girewtene, ke bi tirkî vanê “burun”, yewindes (11) formê cîyayî estî: “Vinî, zincî, pirnikê, pîrnos, poz, vinikê, difn, bêvil, kepoz, lut, birnax”²⁰; seba vateya “nezle” des (10) formê cîyayî estî: “zekem, bapêş, persî, şobe, asirm, zikam, peta, miqaw, nezle, baper”²¹ û seba vateya kokî zî diwyes (12) formê cîyayî estî: “kok, reh, bineke, resen, rêl, rîşe, retewe, binetu, rek, binye, reya, rîçik.”²² “Ray rayan yew çekûye tamamî yan zî qismêk aye verapey bena, no hal sebebê gird ê cêrabîyayîşê ziwani kurdî yo: kin/nik, lêr/rêl, befr/berf, pîrasî/parsû.”²³ Kê şênê nê bêj mîsalan gelek vêşî bikê, labelê bawer kena qandê dîyarkerdişê berdêliyayena formê vateyan nê mîsalî bes î.

Armanca no birrê xebata ma zî, aşkerekerden û dîyarkerdena tayê form û xosereya umûmî (hemeyî) ya mabêna zazakî û kurmançî ya. Labelê tayê cayan de zî ma do behsê têkilîya ziwaniandê hînd-awrupayî û şaxê ênan o hînd-aryani û kurdî zî bikê.

Bêguman fonetîk, yew beşê muhîm ê xebata ziwanzanistî ya. Etîya de ma do bi hawayêko hera û xorîn fonoljîya ziwani kurdî ser o nêvinderê. Ma wazenê çarçewa na xebate de tenîya tayê qeydeyê fonetîka dîyalekt û şeweyandê kurdî bîyarê şima vîrî. Ma no nûste de, di hetana behsê fonetîka ziwani û dîyalektandê kurdî kenê. Yew heta, cîyabîyayîş û bedêliyayîşê vengê navbeyna dîyalekta kurmançî û zazakî bi tayê mîsalana yeno miqayesekerdiş; û heta bîna zî, cîyabîyayîşê fek û şeweyanê zazakî/dimilî/ kirmanckî ser o tayê qeyde û mîsalî ameyê dîyarkerdiş.

(Li ser fonetîka/dengsazîya dîyalekta zazakî û

kurmancî kurtepeyvek

Dema ku behsa fonolojî yan jî fonetîka ziman bibe, divê pêşîyê pênaseya fonolojîyê bête kirin, wezîfe û çarçeweya lêgerîna wê dîyar bibe. Bêguman li ser fonolojî û fonetîka nêrîn û pênaseyên cuda hene û ev terim pir hatine gengeşî kirin. Fonetîk, zanyarîya lêgerîna guherîna dangan(foneman) e. Fonolojî, zanyarîya lêgerîna dengên (fonemên) herî piçûk ên zimanî ye. Seha lêgerîna fonolojîyê deng (fonem) e. “Wezîfeyê fonolojîyê ev e: lê bigere ku guherîna kîjan xusûsiyetên dangan dibe sebebê cîyawazîya mana; xusûsiyetên ku dibin sebebê cîyawazîyê, di navbera xwe de çawa hereket dikin û ji bo çêkirina peyv û hevokan li gor kîjan qeydeyan yekbûna wan mimkun dibe.”¹⁸ Di vê çarçovê de dema ku behsa xebata gramera ziman bibe, fonetîka wek parçeyek esasî yê vê xebatê derdikeve pêşîya me.

Zimanzanê navdar ê esra 20an Fe. De Saussure, ziman wek sîstemek qebl dîke. Dema ku ziman wek sîstemek bête qebulkirin, di vê sîstemê de unsurên cîyawaz hene û wezîfeyê wan her yekî jî cuda ye. Unsûrê tewr piçûk ê ziman deng(fonem) e û di nav ziman de wezîfeyê her yek deng jî cuda ye. Di nav hemû zimanan de gelek dengên cuda hene. Lakin ev deng hemû nayên xebitandin. “Mîrov dikare nêzikê 200 dangan telafuz bike û wan hiss bike; lêbelê axaftvanên komên zimanan, ji bo hezaran peyvyan tenê 40 dengên esasî dixebitînin.”¹⁹

Ev dengên ku behsa wan dibe yek bi yek an jî yekî zêdetir werin ber hev, ji wan peyv peyda dibin. Her dengekî manaya cihê dide ziman û cudabûna peyvyan jî dîyar dikin. Peyvên ku ji devê me dertên, cudatîya dengê wan ê pêşîn û paşîn ne wekhev in; ku tenê dengê paşîn ê peyvyan biguherin zû bi zû manaya wan naguhere, ku dengê pêşîn ê peyvyan biguherin manaya wan jî bi temamî diguhere. Mîsal; ku em peyvên /roj/ û /roz-ruz/... bînin ber çavê xwe, guherîna dengê /j/ û /z/ yan jî /o/ û /u/ di manayê de ferqek girîng dîyar nake, lêbelê ku em peyvên /pîr/, /bîr/, /vîr/, /tîr/, /nîr/, /jîr/ û /şîr/ yan jî /dar/, /bar/, /jar/, /war/, /mar/ û /har/ wekî sembolên dengên cuda nebihîzin, em nikarin cudayîya manaya wan ji hev veqetînin.

Peyvek bi serê xwe jî, manayek dîyar nake. Ji bo ku mana peyda bibe, divê ji yekî zêdetir peyv li gor qeydeyên ziman bi hev re bêne rêstin, ku ji vê rêstina

peyvyan ra dibêjine hevok. Hevok û rêstina hevokê, bingeha mesaja me çêdike. Awayê rêstina hevokê, cî û giraniya peyvyan dîyar dike. Feqet deng û peyvên ku di nav sîstema ziman de cî digrin ne mutlaq in. Ji rojgira ku ziman peyda bûye û heta evro, hemû ziman ji aliyê deng û peyvyan ve guherîne û di encama vê guherînê de formên wan ên cuda peyda bûne. Dema ku em bala xwe didin dîyalektên kurdî, gelek peyvên ku manaya wan wekhev in, formê wan diguhere. Mîsal; ji bo navê organê me yê bîngirtin, ku bi tirkî dibêjin “burun”, yanzdeh (11) formên cuda hene: “vinî, zincî, pîrnike, pîrnos, poz, vinike, difn, bêvil, kepoz, lut, birnax”²⁰; ji bo peyva “nezle” deh (10) formên cuda hene: “zekem, bapêş, persî, şobe, asirm, zikam, peta, miqaw, nezle, baper”²¹; û ji bo peyva “kok” jî diwanzde formên cuda hene: “kok, reh, bineke, resen, rêl, rîşe, retewe, binetu, rek, binye, reya, rîçik.”²² “Car caran peyvek bi temamî yan jî qîsmeke wê perûpaş dibe, ev hal sebebê gewre yê jihevûna zimanê kurdî ye: kin/nik, lêr/rêl, befr/berf, pîrasî/parsû.”²³ Em dikarin van cûre mîsalan gelek zêde bikin, lêbelê bawer dikim ji bo dîyarkirina guherîna formên peyvyan ev mîsal bes in.

Armanca vê beşê xebata me jî, aşkerekirin û dîyarkirina hinek form û xweserîya giştî ya navbera zazakî û kurmançî ye. Lêbelê di hinek cîyan de jî em dê behsa têkilîya zimanên hînd-awrupayî û şaxê wan ê hînd-aryanî û kurdî jî bikin.

Bêguman fonolojî û fonetîk, du beşên girîng ê xebata zimanzanistî ne. Di vir de em dê bi awayek kûr û berfireh li ser fonolojî û fonetîka zimanê kurdî ranewestin. Em dixwazim di çarçeweya vê xebatê de tenê hinek qeydeyên fonetîka dîyalekt û şeweyên kurdî bînin bîra we. Di vê nivîsarê de, em ji du alîyan ve behsa fonetîka ziman û dîyalektên kurdî dikin. Ji alîkî ve, bi hinek mîsalan raberîhevkirina guherîn û cudabûna dengên di navbera dîyalekta kurmançî û zazakî; û ji aliyê din ve jî, li ser cudabûna devok û şeweyên zazakî/dimilî/ kirmanckî hinek qeyde û mîsal hatine dîyarkirin).

2.1. Pêbedêliyayîşê tayê veng û vateyandê dîyalekta zazakî û kurmancî

(Bihevguherîna hinek deng û peyvên dîyalekta zazakî û kurmancî)

Sey ke cor de zî ame vatiş, unsurê tewr hûrdî yê ziwani veng (fonem) o, rayrayan tena bi yew vengî ya û rayrayan zî bi pêgirewtena vengandê cîyayan vateyî peyda benê. Goreyê şêwe, dîyalekt û mintiqeyandê cîyayan ê qiseykerdoxandê ziwani, tayê vengî bi vengandê nêzdîyê xo ya bedêliyênê yan zî cê ra kemîyenê, peynî de vatey bi xo zî form bedilnenê, rayrayan hîna sivik û sade benê.

(Wekî li jorê jî hatibû gotin, unsûrê tewr piçûk ê ziman deng (fonem) e, carna tenê bi dengekî û carna jî bi yekgirtina dengên cuda peyv peyda dibin. Li gor şêwe, dîyalekt û herêmên cuda yê axaftvanên ziman hinek deng bi dengên nêzîkê xwe re diguherin yan jî dadikevin, di encam de peyv bi xwe jî form diguherîne, carna hîn sivik û sade dibe).

2.1.1. Mabênê gelek vateyandê zazakî û kurmancî de vengê /b/, /v/ û /m/ pê bedêliyênê; cadê /v/ya zazakî de, kurmancî de vengê /b/ û ray rayan zî /p/ yeno.

(Di navbera gelek peyvên zazakî û kurmancî de dengê /b/, /v/ û /m/ pev diguherin; di cîyê /v/ya zazakî de, di kurmancî de /b/ û carna jî /p/ tê).

Zazakî	Kurmancî
vewr	berf
velg	belg
vîst	bîst
vîr	bîr
va/yay	ba
varan	baran
vaz	baz
vela	bela
verapey	berûpaş
virso	birûsk

venikyayîş	ponijîn
zimistan	zivistan
zama	zava
xam	xav

2.1.2. Tayê cayan de mîyanê şêweyandê kurmancî de zî vengê /b/ û /v/ pê bedêliyênê.

(Li hinek herêman di navbera şêweyên kurmancî de jî dengê /b/ û /v/ pev diguherin).

Mîsal: cewab	cewav
kebanî	kevanî
xirab	xirav
sibe	sive
hesab	hesav

2.1.3. Vengê /v/ zazakî û kurmancî de zaf yeno xebitnayene lê kurmancîya Verarojî (sorani) de kemî yeno xebitnayene. Kurmancîya verarojî de, cayê herfa /v/ de, /w/ hîna vêşî yeno vatiş. Zazakîya Gêl de zî zaf rayan cadê /v/ de, vengê /w/ yeno vatiş.

(Dengê /v/ di zazakî û kurmancî de pir têtê bikaranîn û di kurmancîya başûr(sorani) de kêmtê têtê bikaranîn. Di kurmancîya başûr(sorani) de, di cîyê herfa /v/ de /w/ hîn bêtir têtê bikaranîn. Di zazakîya Gêlê de jî li şûna dengê /v/, bêtir dengê /w/ têtê gotin).

Zazakî	Sorani	Kurmancî
aw	aw	av
şew	şew	şev
awan	awan	avan
awî	awî	avî
lew	-	lêv
baw	baw	bav

2.1.4. Navbeyna zazakî, kurmancî û zîwanê Avesta de zî vengê /v/ û /m/ ca bedêlnenê.

(Di navbera zazakî, kurmancî û zîwanê Avestayê de jî dengê /v/ û /m/ pev diguhere).

Zazakî	Avesta	Kurmancî
name	naman	nav
nîm/nême	naêma	nîv
zama	zmtar	zava
gam	gama	gav
hamnan	hamin	havîn
zimistan	zyam	zivistan

2.1.5. Vengê /x/ heme dîyalektanê kurdî de esto û qirike ra vejîyeno. Zîwanê kurdî û dîyalektanê ey de, wexto ke /x/ û /w/ pê dima bêrê, nê her di vengî pêwa sey /xw/ telafuz benê, ke tira vajyeno dîftong. Zaf vateyê ke bi dîftongê /xw/ dest bide kenê, zazakî de sivik benê û vengê /x/ yê vernîya /w/yî de keweno.

(Dengê /x/ di hemû dîyalektên kurdî de heye û ji qirikê dertê. Di zîwanê kurdî û dîyalektên wî de dema ku dengê /x/ û /w/ li pey hev werin, ev herdû deng bi hev re wek /xw/ bilêv dibin, ku ji wî re dibêjin dîftong. Gelek peyvên ku bi dîftongê /xw/ dest pê dikin, di zazakî de sivik dibin û dengê /x/ya pêşîya /w/yê dikeve).

Kurmancî	Zazakî (Dimilî)
xwar	wer
xwarin	werden
xweş	weş
nexweş	nêweş
xwelî	wele
xwah	waye
xwendin	wendene
xweyî	weyî

2.1.6. Vengê /j/ya kurmancî, bi vengê /z/ û /c/ya zazakî û ziwane Avesta pê bedêlîyenê, ge benê /c/ û ge ge zî benê /z/. Nê vengî, mabênê şêweyandê zazakî bi xo de zî bedêlîyenê.

(Dengê /j/ya kurmancî, bi dengê /z/ û /c/ya zazakî û zimanê Avestayê pev diguherin, geh dibin /c/ û geh geh jî dibin /z/. Ev dengana di navbera şêweyên zazakî bi xwe de jî diguherin).

Kurmancî	Zazakî	Avesta
jêr	cêr	-
jin	cinî/ cenî	canay
jentin	cena! cenayene	cana
bêj	vace	vaçah
roj	roj-roz-ruz	-
jî	zî	zî
mejî	mezg	mazga

2.1.7. Vengê /h/ya kurmancî, ziwane Avesta de bi dîftongê /dh/, /th/ û vengê /x/ rey de bedêlîyenê, zazakî de zî vengê /h/ û /ş/ pê bedêlîyenê.

(Dengê /h/ya kurmancî, di zimanê Avestayê de bi dîftongên /dh/, /th/ û dengê /x/ re diguherin, di zazakî de jî dengê /h/ û /ş/yê bi hev re diguherin).

Kurmancî	Avesta²⁴	Zazakî
rohnî	raoxşna	roşna/roşnayî
sihur/sor	suxra	sur
reh/rê	raithya	rayir
pahtin	pathana	pewtene
goh/go	gaoşa	goş
mih/mî	maêşa	mêşna
tihnî	tarşna	têşanê

2.1.8. Mîsalandê corênan de zî aşkera aseno ke vengê /h/, vengêdo kehan ê dîyalektandê kurdî yo. Kurmancî û zazakîya ewroyîne de, hem

/h/yê sereyê vateyan û hem zî ê mîyanê ênan de kiweno û vetey sivik benê.

(Di dengên jorîn de jî bi aşkerayî xuya dibe ku dengê /h/, dengekî kevnare yê dîyalektên kurdî ye. Di kurmancî û zazakîya îroyîn de, hem dengê /h/ yê serê peyvê û hem jî yê nava peyvê dikeve û peyv sivik dibe).

Kurmancî	Zazakî
fireh/fire	hambaz/ambaz
şeh/şe	hestor/estor
goh/go	havil/avil
mih/mî	herê/erê
hêş/êş	herey/erey
hêvar/êvar	heynî/eynî
dergahvan/dergavan	hewnîya/ewnîya
mêhman/meyman	mêhvan/mêvan
mirhov/mirov	rehwan/rewan
bihên/bîn	

2.1.9. Yewna xusûsîyeto balkêş ê kurmancîya corî, kurmancîya cêrî (sorani) û zazakî esto ke, kê eşkenê vajê xusûsîyetêko kehan ê zîwanê kurdî yo. Vengê /d/ yê peynîya nameyan û halê vîyarte yê karan, dîyalekta zazakî û kurmancîya verarojî (sorani) de xo paweno, feqet kurmancîya corî de kewto û kelîma bîya sivik.

(Xusûsîyeteke din a balkêş a kurmancîya jorî, kurmancîya jêrî(sorani) û zazakî heye, ku meriv dikare bêje xusûsîyeteke kevnare ya zîwanê kurdî ye. Dengê /d/yê dawîya navan û halê raborî ya lêkeran, di dîyalekta zazakî û sorani de hebûna xwe diparêze, feqet di kurmancîya jorî de ketîye û peyv sivik bûye).

Zazakî	Kurmancîya verarojî	Kurmancîya corî
kerd	kird	kir
kerdene	kirdin	kirin

berdene	birdin	birin
werdene	xwardin	xwarin
sard	sard	sar
pir	pir	pir

2.1.10. Mabênê zazakî û kurmancî de vengê /d/, /v/ û /g/ zî pê bedêlî-yenê. Michael L. Chyet zî vano: “Pîta /g/ya kurmancî vera /v/ya zazakî û /w/ya hewramî ya.”²⁵

(Di navbera zazakî û kurmancî de dengên /d/, /v/ û /g/ jî pev diguherin. Michael L. Chyet jî dibêje: “Pîta /g/ya kurmancî beramberî /v/ya zazakî û /w/ya hewramî ye.”²⁵)

Zazakî	Kurmancî
va/vat	go/got
vatene	gotin
deng	veng
verg	gurg
vil	gul
veleke	gurçik

2.1.11. Bi vatena Michael L. Chyet, “Vengê r û d bîyê l, z û r zî bi vê-yartena wextî ya benê l. Na pê bedêlîyayena r û d yê ke bîyê l, hem seba kurdî û hem zî seba farisî raşt a.”²⁶

(Bi gotina Michael L. Chyet, “dengên r û d bîye l, z û r jî digel derbasbûna wextê dibite l. Ev pêguherîna r û d bi l re, hem bo kurdî û hem jî bo farisî rast e.”²⁶)

Zazakî	Kurmancî	Farisî
zerr	dil	del
çar/çewres	çil/çihel	çehel
zana	zana	dâna
sare/serre	sal	sal
serdar	serdar/salar	salar

2.1.12. Kurmancî de vangê /d/ yê ke demeyo nikayin de seredê tayê karan de yeno nûstiş, bi vengê /t/ ya bedêlîyenê: derim/terim, dixum/texum, dikim/tekem.

(Di kurmancî de dengê /d/ ya ku di dema niha de li pêşîya lêkeran de tête nivisîn, bi dengê /t/yê diguhere: derim/terim, dixum/texum, dikim/tekem, dihêm/têm).

2.1.13. Mabênê dîyalekt û şêweyê kurmancî û zazakî de vengê /y/, /w/ û /h/ pê bedêlîyenê. Nê vengî wezîfeyê pêgirewtene zî vînenê.

(Di navbera dîyalekt û şêweyên kurmancî û zazakî de dengên /y/, /w/ û /h/ pev diguherin. Ev deng wezîfa pevgirêdanê jî dibînin).

Zazakî	Kurmancî
giya	giha
siwar	siyar
wûrdek	hûrdek
hûrdî	hûr
wirdî/her di	herdu
wişk	hişk
wiro	herro

2.1.14. Tayê cayan de zî “vengê /e/ bedêlîyeno beno /y/: esîr/yesîr, exte/yexte/”

(Di hinek cîyan de jî dengê /e/ diguhere dibe /y/: esîr/yesîr, exte/yexte/”27)

2.1.15. Hereketê “kelkewten” û “herikyayene” bi vengandê l-, r-, s-, ya taswîr benê.

(Hereketên “kelkevtin” û “herikînê” bi dengên l-, r-, s- yê taswîr dibin28).

Zazakî	Kurmancî
laser	lehî
pêl	pêl

lêl	şêlo
liv	liv
ling	ling
rem	rev
herik	herik
ray	rê
rayan	rêwî
rişna	rijand
neseb	neseb
ro	robar
rokerdene	rokerdiş
pilor	pilor

2.1.16. Hem navbeyna zazakî û kurmancî de hem zî navbeyana şêweyandê zazakî de vengê /ş/, /s/ û /j/ pê bedêlîyenê.

(Hem di navbera zazakî û kurmancî de hem jî di navbera şêweyên zazakî de dengê /ş/, /s/ û /j/ pev diguherin).

Zazakî	Kurmancî
raşt	rast
rişte	riste
rişt	rist
riştên	ristin
rişna	rijand

2.2. Pêbedêlyayîşe tayê vengên şêweyandê zazakî

(Pevguherîna hinek dengên şêweyên zazakî)

2.2.1. Sey şêweyandê kurmancî, şêweyandê zazakî de zî vengê /b/ û /v/ pê bedêlîyenê.

(Wekî şêweyên kurmancî, di şêweyên zazakî de jî dengên /b/ û /v/ pev diguherin).

Mirdasî(Pîran-Gêl)	Dersim	Çewlig (Bîngol)
hesab	hesav	hesav
kitab	kitav	kitav
yewbin	zuvin	yobîn/juvin
xirabe	xirave	xirawe

2.2.2. Mabêna şêweyandê zazakî/dimilî de vengê /z/, /j/, /y/ û /c/ pê bedêlîyenê. Seke Celadet Ali Bedir-Xan zî vano: “Lehçeya dumilî de zî çend birrî estî, nê birran mîyan de zî bi hawayêko aşkera ferqê mabêna veng û qaydeyan estî. Hetê vengana şêweyê Sêwreke de herfa /j/ bi qasê kurmanckî çinî bo zî, tayê çekuyan de no veng yeno dîyayîş. La şêweyandê bînan de sey şêweya Paleyî, vengê /j/ bin ra çinî yo û cayê ey de vengê /z/ yan zî /c/ yeno vatene.”²⁹

(Di navbera şêweyên zazakî de dengên /z/, /j/, /y/ û /c/ bi hev diguherin. Her wekî ku Celadet Ali Bedir-Xan dibêje: “Di zarê dumilî de jî çend bir hene. Di bingehê de ev birrên ha dudo ne. Di nav van biran de, di dangan û qewaidê de ferqinî eşkere têne dîtin. Di danganîyê de: di zarê Sêwrekê de herfa /j/ bi qasê kurmancîyê nîn be jî, di hin peyvan de tete dîtin. Lê di dumilîyên din de mîna zarê Paloyê de /j/ yekcar nîne û şûna wê /z/ yek an /c/ yek rabûye.”²⁹)

Mîsal: zî/ jî

mij / miz

nêzdî / nijdî

mizgîn/ mijdane

roj / roz/ruc

berzîn/ berjîn

zewac/zewaz

yewbin/jewbin/zuvin

yewna/jewna

ziwa/jiwa

jew/yew

2.2.3. Mabêna şêweya Dêrsim û mintiqandê bînan de vengê /k/ û /ç/ pê bedêlîyenê.

(Di navbera şêweya Dêrsim û herêmên din de dengên /k/ û /ç/ pev diguherin).

Pîran-Gêl-Çermûg

Dêrsim

keye

çeye keyna

çeyna keber/ber

çeber

kêf

çêf

2.2.4. Vengê /ş/yê cayandê bînan, şêweya Dêrsimî de beno /s/.

(Dengê /ş/ya cîyên din, di şêweya Dêrsimê de wek dengê /s/ tê bilêvkerin).

Mîsal: şenik / senik

weş / wes

derguş / dergus

şeş / ses

şima / sima

şew / sew

2.2.5. Mabêna şêweyandê zazakî de vengê /c/ û /g/ zî pê bedilyenê.

(Di navbera şêweyên zazakî de dengên /c/ û /g/ jî pev diguherin).

Mîsal: veng/venc

Gan/can

gêno (girewotiş)/cêno

bigîr/bicî gêrayene/cêrayene

2.2.6. Hem mabêna şeweyandê zazakî û hem zî mabêna zazakî û kur-mancî de vengê /a/, /û/, /o/ û /u/yî pê bedilîyenê.

(Hem di navbera şeweyên zazakî de û hem jî di navbera zazakî û kurmancî de dengên /a/, /û/, /o/ û /u/ pev diguherin).

Mîsal: ban/bon/bûn

manga/monga (moga/munga)

maker/moker/mûnker

giran/giron/girûn

panc/ponc/ponj/pûnc

varan/varon/varûn

2.2.7. Vateyê zazakî zaf rayan bi hawayê xo yo sade nê, bi pabesteyê xo yê nerîyîye û makîyîye yenê nûstiş û bîlhesa zî vateyê makî winî yenê nûstene. Ke ma raştê no hawa nûstişê çekûyan ameyê, gerek ma halê sade yê vate û pêrebesteyê aye têmîyan nêkê.

(Peyvên zazakî gelek caran bi awayê xwe yê sade na, bi qertafên xwe yê nê-rîtî û makîyîye têne nivîsandin û bi taybetî jî peyvên mak wisa têne nivîsandin. Ku em rastî nivîsandinên bi vî awayî hatin, divê em halê peyva sade û qertafa wê tevlihev nekin).

Zazakî **Kurmancî**

dar/dare

dar

dew/dewe

gund

şew/şewe

şev

biz/bize

bizin

her/here (mankere)

ker

par/pare

par

2.2.9. Seke ma cor de zî dîyar kerd, senî ke navbeyna her di dîyalek-

tanê kurdî de vengê /l/ û /r/ bedêlîyeno, navbeyana şêweyandê zazakî bi xo de zî vengê /l/ û /r/ bedêlîyeno.

(Her wekî ku me li jorê jî dîyar kir, çawa ku di navbera herdû dîyalektên kurdî de dengên /l/ û /r/ pev diguherin, di navbera şêweyên zazakî bi xwe de jî dengê /l/ û /r/ pev diguherin).

Mîsal: mîrçike/mîlçike

rojine/lojine

zerr/dil/dill/zil/şêrzil

velg/berg

emserr/emsal

belûy/berûy

çiray/çilay

perçîn/pelçîn

qereçî/qeleçî

2.3. Vengê alfabeya zazakî û kurmancî

(Dengên alfabeya zazakî û kurmancî)

Heme “Vengê ziwandê hînd-awrupayî, qirike ra vejîyenê.”³⁰ Sey şaxêk ziwandê hînd-awrupayî, vengê zazakî û kurmancî zî, qirik û heta xorîneya qirik ra vejîyenê. Her vengo ke qirikda ma ra vejîyeno(peyda beno) goreyê virazîyayîşê qirik-xirtike, livyayîşê fek û ziwandê û lewan dekiweno teqlê vengêko manîdar. Alfabeyan de nê her yew vengî bi yew sembolî ya yenê nîşandayîş.

Ewro alfabeya latînî ya ke pê zazakî (dimilî, kirdî, kirmancî) û kurmancî nûsyena, 31 herfê aye estî. Celadet Alî Bedir-Xan vano: “Nê vengan ra teber di herfê xerîbî (bîyanî) estî ke yew qismê kurdan ênan telafûz keno. Labelê nê herfî eslê xo de kurdî nîyê. Enî herfî: h (hhê, hhêl), x/ğ (ğar, ğele).”³¹

Nê hîris û yew herfan (vengan) ra, heşt (8) herfî vengin û vîst û hîrê (23) yê bînî zî bêvengin î.

(Dengên alfabeya zazakî û kurmancî: Hemû “dengên zimanên hînd-awrupayî, ji qirikê dertên.”³⁰ Wek şaxekî zimanên hînd-awrupayî, dengê zazakî û kurmancî jî, ji qirikê û heta ji kûrayîya qirikê dertên. Her dengê ku ji qirika me dertê (peyda dibe) li gor çêbûna qirik/xirtikê, livandina dev û ziman û lêvan dikeve teqlê dengê watedar. Di alfabeyan de ev her yek deng bi sembolek tête nîşandan.

Evro alfabeya latînî ya ku zazakî (dimilî, kirmancî, kirdî) û kurmancî pê têne nivîsandin, 31 tîpên wê hene. Celadet Alî Bedir-Xan dibêje. “Ji dervayê van dangan du tîpên bîyanî hene ku qismekê kurdan wan telafûz dikin. Lêbelê ev tîp di eslê xwe de ne kurdî ne. Ev tîpan: h (hhê, hhêl), x/ğ (ğar, ğele).”³¹

Ji van sîh û yek (31) dangan, heşt (8) jê bideng in û bîst û sisê (23) yê din jî bêdeng in).

2.3.1. Herfê venginî:

(Tîpên bideng):

Zazakî (dimilî): **a, e, ê, i, î, o, û, û**

Kurmancî: **a, e, ê, i, î, o, û, û**

Herfê venginî xo mîyan de sey di koman abiryenê:

(Tîpên bideng di nava xwe de li ser du koman parve dibin):

2.3.1.1. Herfê vengin ê dergî (vengdergî): a, ê, î, o, û

(Tîpên dengdar ên dirêj: **a, ê, î, o, û**)

A-a: Sey gelek alfabeyanê ziwandê bînan zazakî de zî herfa (tîpa) verên a alfabe ya. Hem zazakî û hem zî kurmancî de na herfe dûz, derg û hera wanîyena. “Sereyê alfabe de cagirewtena /a/ no sebeb ra

yo; ke /a/ hem bê kert, teqil, birr û çengê nefesê însanan û hem zî sey gelek birayandê ênan ê heywan bê livnayîşê lewan, ziwana, çene û dindanan û venganeya qirike ra vejîyena.”³²

(**A-a:** Wekî gelek alfabeyên zimanên dinyayê, di kurdî de jî tîpa yekemîn a alfabê ye. Hem di zazakî û hem jî kurmancî de tîpa /a/ dûz, dirêj û fire tê xwendin. “Cîgirtina /a/ ya di serê alfabeyan da; ji ber ku /a/ bê kert, teqil, birr û çengê nefesê însanan hem jî bê livandina lêv, ziman, çene û dindana ji valahîya qirika insan û gelek birayên wan yên heywan bi hêsayî tete der.”³²)

Zazakî	Kurmancî
aw	av
awdar	adar
aga	aga
amnan	havîn
asmên	asman
adir	agir
agoz	agoz
sawa/saba	sawa
arîye	aş

Ê-ê: Na herfe sere û vernîya ziwani de peyda bena, derg û dûz wanîyena.

(**Ê-ê:** Ev tîp li pêşîya ziman peyda dibe, dirêj û dûz tê xwendin).

Zazakî	Kurmancî
êxle	êxle
êre	êvar
bêwar	bêwar
hêvî	hêvî

êl	êl
êzim	êzing
êxlemûr	êxlemûr
mêrdek	mêrik

Î-î: Na herfe vernîya ziwani de peyda bena, derg, teng û dûz wanîyena.

(**Î-î:** Ev tîp li pêşîya ziman peyda dibe, dirêj, teng û dûz tê xwendin).

Zazakî	Kurmancî
îre	lûrî, lîr, lîl, alerjî
îsot	îsot
îcaze	îcaze
mîr	mîr
sîr	sîr
pîr	pîr
pîyanz	pîvaz
pîne	pîne
nîre	nîr

O-o: Na herfe peynîya qirike ra vejîyena, derg, gilor û hera wanîyena û şêna bêro vernî yan zî peynîya yew herfêda bêvenge.

(**O-o:** Ev tîp li dawîya gewrîyê der tê, dirêj, gilor û fire tê xwendin û dikare were pêşî yan jî paşîya tîpeke bêdeng).

Zazakî	Kurmancî
ode	ode
ox	ox
oxir	oxir

kom	kom
bostan	bostan
moxile	moxil
mojela	murcele
lorik	lorik
dorûnore	hawîrdor

Û-û: Na herfe peynîya qirike ra vejîyena, gilor, teng û derg wanîyena.

(**Û-û:** Ev tîp li dawîya gewrîyê der tê, gilor, teng û dirêj tê xwendin).

Zazakî	Kurmancî
---------------	-----------------

dûr	dûr
nûr	nûr
mû	mû
hûrdî/hûrdî	hûr
rûwen	rûn
serdûpûk	sarûpûk

2.3.1.2. Herfê vengin ê kilmî(vengkilmî): **e, i, u**. Nê herfî zazakî û kur-mancî de seycê wanîyenê. “Wextê vatişê nê herfan de zîwan werteyê fekî de beno.”³³

(Tîpên bideng ên kin: **e, i, u**. Ev tîp di zazakî û kurmancî de wekhev têne xwendin. “Di dema zarkirina wan da ezman li nîveka devî da dibit.”³³)

E-e: Na herfe dûz û kilm wanîyena, şêna bêro vernî yan zî peynîya yew herfêda bêvengine.

(**E-e:** Ev tîp dûz û kin tê xwendin, dikare were pêşî yan jî paşîya tîpeka bê-deng).

Zazakî**Kurmancî**

eger

eger

ewro

evro

erd

erd

dest

dest

fek

dev

emşew

emşew

ser

ser

ver

ber

I-i: Kurdî de zemîrê persan, cidaranê verenî yê emir û edatan vêşêr vateyê ke bi na herfe dest pê bikê û biqedîyê çinî yê, ayê ke estî zî ziwandê bînan ra dekwetî kurdî mîyan. Na herfe zî zazakî û kurmancî de seycê wanîyena; wertê fekî de dûz, teng û kilm wanîyena.

(**I-i:** Di kurdî de ji xeynî cînavkên pîrsan, pêşqertafên emir û edatan peyvên ku bi vê tîpê dest pê bikin û biqedin nîn in, ew ên ku hene ji zimanên din ketine nav kurdî. Ev tîp jî di zazakî û kurmancî de wekhev tê xwendin; di nava devî de dûz, teng û kin tê xwendin).

Zazakî**Kurmancî**

insan

insan

imza

imza

kilm(kirr)

kin

bi

bi

çi

çi

çirê

çima

birik

birek

bize

bizin

bin	bin
birîn	birîn

U-u: Na herfe werteyê fekî de gilor û teng wanîyena. Ayê kelîmeyê ke bi na herfe dest pê bikê zaf kemî yê, yan zî ziwanandê bînan ra veyartî kurdî mîyan. Zazakî de vateyê ke bi herfa /u/ biqedîyê çinî.

(**U-u:** Ev tîp di nava dev de gilor û teng tê xwendin. Ew peyvên ku bi vê tîpê dest pê bikin zaf kêr in, yan jî ji zimanên din derbasê nav kurdî bûne. Di zazakî de peyvên ku bi tîpa /u/ xelas bin nîn in).

Zazakî	Kurmancî
kulav	kulav
kulm	kulm
gul	gul
xulam	xulam
gun	xun

2.3.2. **Herfê bêvenginî:** b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z.

(**Tîpên bêdeng:** b, c, ç, d, f, g, h, j, k, l, m, n, p, q, r, s, ş, t, v, w, x, y, z.)

Goreyê vejyayîşê cadê ênan, herfê bêvenginî xo mîyan de çehar bêjî yê:

(Li gor derketina cîyê wan, tîpên bêdeng di nav xwe de çar cûre ne):

2.3.2.1. Herfê bêvengî ke bi pêgûnyayîşê lewan yan zî lew û dindana telafûz benê: **b, f, m, p, v, w**.

(Tîpên bêdeng ên ku bihevduketina lêvan yan zî lêv û diranan tene bilêvkinin: **b, f, m, p, v, w**).

Zazakî	Kurmancî
bawkal	bavkal

berz	bilind
bes	bes
ferd	fer
fes	fes
mewt	mewt
mar	mar
marî	marî
ma [°] F/makî	mak
merde	mirî
pank	pak
pewtene	pehtin
peya	peya
pel	pel
pêl	pêl
pûç	pûç
varike	varûk
veng	vala
virso	birûsk
vitene	wêtin
ware	war
welat	welat
weniştiş	veniştin
wişk	hişk
wekerdene	vêxistin

2.3.2.2. Herfê bêvengî ke bi pêgûnyayîşê ziwan û dindana telafûz benê:
d, l, n, s, t, z.

(Tîpên bêdeng ên ku bihevduketina diranan têne bilêvkirin: **d, l, n, s, t, z**).

Zazakî	Kurmancî
dar	dar
darû	derman
derg	dirêj
dizd	diz
dîk	dîk
desmal	desmal
laser	lehî
liv	liv
lêl	şêlo
lew	lêv
lerzayene	lerizîn
name	nav
newe	nû
nale	nal
nişkava	nişkêve
sard	sar
serkuy	seku
solaw	şorav
say	sêv
silo	silgo
tarî	tarî
tarr	pincar
teng	teng
tîje	tîj
tîr	tîr

til	til
toraq	toraq
za	za
zanaye	zana
zend	zend
ziwan	ziman
zinar	zinar
zama	zava
zuwa	zuha
zozan	zozan

2.3.2.3. Herfê bêvengî ke bi pêgûnyayîşê ziwan û vernîya asmênê fekdê (xizmakî) ma wa telafûz benê: **c, ç, ş, j, y**.

(Tîpên bêdeng ên ku bihevduketina ziman û pêşîya esmanê devê me têne bi-lêvkirin: **c, ç, ş, j, y**).

Zazakî	Kurmancî
ca	cî
cew	ceh
cil	cil
cewrik	cewrik
çere	çêre
çem	çem
çepraşt	çeprast
çim	çav
şamî	şîv
şew	şev
şewşewik	şevşevok
şit	şîr
şîre	şîre

şop	şop
jahr	jahr
jan	jan
jêhatî	jêhatî
yew	yek
yewane	yekane
yarî	yarî
yewndes	yanzdeh
yadîgar	yadîgar

2.3.2.4. Herfê bêvengî ke qirik ra vejîyenê: **h, q, x**.

(Tîpên bêdeng ên ku ji qirikê der tên: **h, q, x**).

Zazakî	Kurmancî
gakovî	gakovî
hak	hêk
hamnan	havîn
hewsar	hevsar
hengimên	hingivîn
qelun	qelun
qam	qam
qanik	qanik
qor	qor
qirik	qirik
qelew	qelew
qer	qer
qifle	qifle
xal	xal
xem	xem
xêv	xêv

xîz	xîz
xençer	xençer

2.3.2.5. Herfê bêvengî ke xizmakî ra vejîyenê: **g, k**.

(Tîpên bêdeng ên ku ji esmanê dev der tî: **g, k**).

Zazakî	Kurmancî
ga	ga
garan	garan
giran	giran
gawan	gavan
gemar	gemar
germ	germ
gav	gam
gurr	gurr
kewarî	kewar
kehan	kevn
kom	kom
kam	kî/kê
kelaw	kûmik

2.3.2.6. “Sewtê lertzokî”³⁵ : r, rr. /R/, eslê xo de hereket û têvgerê dîyar keno û zaf rayan zî vengê /r/ û /l/ pê bedêlîyenê. Nê her di vengên ra yew nerm û yew zî wişk vajîyenê, hem zazakî û hem zî kurmancî de estî. Vengê /r/ wexto ke mîyandê di herfandê venginan yan zî peynîya vate de bimano, qalind wanîyeno.

(“Sewtên lertzokî”³⁵: r, rr. /R/, di eslê xwe de hereket û tevgerê dîyar dike û gelek car jî dengê /r/ û /l/ pev diguherin. Ji van herdu dengên yek nerm û yek jî hişk tê bilêvkirin, hem di zazakî û hem jî kurmancî de hene. Dengê /r/ dema ku di navbera du tîpên dengdar de bimîne yan jî bête dawîya wan, qalind tê xwendin).

Zazakî

bar

rem

rûwen

roj

raşt

resne

pîrr

virr

dirrik

birrnayîş

Kurmancî

bar (nerm)

rev (nerm)

rûn (nerm)

roj (nerm)

rast (nerm)

werîs (nerm)

pîrr (wişk/hişk)

virr/derew (wişk/hişk)

dirrî (wişk/hişk)

birrîn (wişk/hişk)

Beş II

Notê binênî (Notên binî)

- 1 Steven Roger Fischer, *Dilin Tarihi*, ç.: Muhtesim Güvenç, Türkiye İş Bankası yay., İstanbul, 2013, r. 93
2. j. b., r. 104
3. Prof. Dr. Günay Karaağaç, *Dil, Tarih ve İnsan*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2005, r. 18
4. Paul Von Ward, *Tanrılar, Genler Ve Bilinç*, Kozmik Yayınları, 2006, İstanbul, r. 267
5. j. b., r. 267
6. Kadri Yıldırım, *Kürt Tarihi*, say: 5, *Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni*, r. 28
7. M. Emin Zekî Beg, *Kürtler ve Kurdistan Tarihi*, 4. Baskı, ç.: Vahdettin İnce, Mehmet Dağ, Reşat Adak, Şükrü Aslan, weşanên Nûbihar, İstanbul, 2012, r. 284
8. Kadri Yıldırım, *Kürt Tarihi*, say: 5, *Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni*, r. 27
9. Wisif Zozanî, www.gazetekurd.com, Nameyê nê her di kitabê ke ameyê açarnayîş: 1-Eflahu'l-Kermi we'n Naxil, 2-Îlelu'l-Miyah we Keyyfiyyetu İstixraciha we İstinbatîha mine'l-Erdî'l-Mechuleti'l- Asl. Ebu Hanife ed-Dinewerî: 1-Kitabu'n-Nebat, 2-Kitabu'n-Nahl ve'l-Asel, 10/06/2013
10. Prof. Maruf. Xeznedar, *Zimanê Kurdî*, kovara Bîr, h: 3, 2005, r. 76,
11. Peter J. A. Lerch, *Savaş Esiri Kürtler Hakkında Hazırlanan Rapor (20 Haziran-2 Temmuz 1856/ Roslow)*, Almanî ra açarnayox: Seyîdxan Kurij, <http://www.kovarabir.com/seyidxan-kurij-zazaca-yazininin-traihcesi-ii/>
12. Fahri Pamukçuç, *Gramerê Zazakî*, vej. Tîjî, 2001, İstanbul, r. 43
13. Qedrî Mamoste, *Elfabeya Xelîl Xeyalî*, kovara Bîr, h.: 3, Diyarbakir, 2005, r. 94
14. Mihemed Mihîrî Hîlav, *Mukaddimet-ûl İrfan*, <http://www.kovarabir.com/meh->

met-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/, 12/03/2012

15. Sadiq Behaeddînê Amêdî, *Rêzimana Kurdî*: Hevberkirina Kurmancî-Soranî, Dîwan Yayınları, 2012, İstanbul, r. 55

16. A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi (Rêzimana Kurdî)*, Alan Yayınları, İstanbul, 1992, r. 45

17. Kemal Badıllı, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Med Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1992, r. 25

18. Mehmet Rifat, *XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergebilim Kuramları*, Kuram Yayınları, 2000, İstanbul, r. 44

19. Zeynel Kıran, *Dilbilim Akımları*, Onur Yayınları, 1996, r. 27

20. Seîd Veroj -Uçaman Abdurrahman, *Ferheng-Vajname: Kurmancî-Hewramanî-Dimilî-Senendajî*, weşanên War, 2002, İstanbul, r. 146

21. ç. v. r. 146

22. ç. v. r. 202

23. Mihemed Mîhrî Hîlav, *Mukaddimet-ûl Îrfan*, <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/>

24. M. Sıraç Bilgin, *Zarahuştra Gathalar*, Doz Yayınları, İstanbul, r. 170-184

25. Michael L. Chyet, *Rûpelek ji dengsazîya dîrokî ya zimanê kurdî*, kovara Bîr, hej.: 3, 2005, r.109

26. J. b., r.110

27. Mihemed Mîhrî Hîlav, *Mukaddimet-ûl Îrfan*, <http://www.kovarabir.com/mehmet-mihrim-m-mukaddimet-ul-irfan/> , 12/03/2013

28. Walter Porzîng, *Dil Denen Mucize*, cild: 1, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990, r. 21

29. Celadet Alî Bedirxan, *Hawar*, h.: 23, çapakerdîşê weşanê Nûdem, Stockholm,1998

30. Paul Von Ward, *Tanrılar, Genler Ve Biliş*, Kozmik Yayınları, İstanbul, 2006, r. 249

31. Celadet Alî Bedir-Xan, *Elfabêya Kurdî*, Bingehên Gramera Kurdmancî, Doz Yayınları, 1998, r. 12
32. Abdurrahman Uçaman, *Ferhenga Etîmolojîya Zimanê Kurdî*, weşanên Bîr, Dîyarbekir, 2008, r. 16
33. Sadiq Behaeddînê Amêdî, *Rêzimana Kurdî: Hevberkirina Kurmancî-Soranî*, Dîwan Yayınları, 2012, İstanbul, r. 52
- * Gelek ziwanandê dinya de vengê “ma” û “mama” ya ke mana dayik û werî danê, eslê xo de vengê hereketê lewnayîşî ra peyda bîyê. (Di gelek zimanên dinyayê de dengê “ma” û “mama” ya ku mana dayik û xwarinê didin, di resenîyê de ji dengê hereketa mêjandinê peyda bûne). Bn. Walter Porzîng, *Dil Denen Mucize*, cild: 1, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1990, r. 21
34. “Dimilî de vengê /z/, gora kurmancî hîna vêşî yo.” bn. Emîr Celadet Bedirxan & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, r. 33
35. Qanatê Kurdo, *Gramera Zimanê Kurdî: Kurmancî-Soranî*, Koral Yayınları, 2. Baskı, 1991, İstanbul, r. 21, Celadet Alî Bedirxan & Roger Lescot, dengdêra /r/ wek dengê navbera diranan dîyar dîkin. Bn. Kürtçe Gramer(Gramera Kurdî), Avesta Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2009, r. 4

Beşê III

C) Morfolojî

1. Çekuye (Peyv)

Yew veng yan zî sewt o ke mana eya xoser esta, ey ra vajîyeno çekuye (vate, qiseke). Her yew çekuye, qet nêbo yew hece (kîte) ra peyda bena. Çekuyê ke yew hece ra ameyê pê, ênan ra vajîyeno çekuyê sade yan zî çekuyê yewheceyî.

(**Peyv/bêje**: Dengêk yan jî sewtê ku xwediyê manayekî xweser be, jê re dibêjin peyv. Her peyvek, qet nebe ji heceyek (kîteyek) peyda dibe. Peyvên ku ji kîteyek pêk hatine, ji wan re dibêjin peyvên sade yan jî peyvên yekhece/bêjeyên yekkîte).

Mîsal:

Zazakî

ban

ca

gan

war

bar

dar

bin

ser

roj

ro

Kurmancî

ban

cî

can

war

bar

dar

bin

ser

roj

ro, çem

kom	kom
vîr	bîr
kaş	kaş

Veng û heceyê newe û cidarî bêrê vernî û peynîya çekuyandê sadeyan, tira çekuyê newey peyda benê.

(Deng û kêteyên nûh û qertaf werin pêşî û paşîya peyvên sade, ji wan peyvên nûh peyda dibin).

Zazakî û kurmancî de çekuyî bi hîrê hawayana yenê viraştene

(Di zazakî û kurmancî de peyv bi sê awayan têne çêkirin)

1.1. Çekuyê ke bi cidarana yenê viraştene

Nê bêj çekuyî, bi girewtena cidaranê vernî û cidaranê peynî ya yenê viraştene.

(Peyvên ku bi qertafan (pêvekan) çê dibin: Ev cûre peyv, bi girtina pêşqertafên û paşqertafan çêdibin).

1.1.1. Çekuyê ke bi cidaranê vernî (prefîks) virazyenê

Tayê cidarê vernî yê zazakî û kurmancî nê yî:

(Peyvên ku bi pêşqertafan çêdibin: Hin pêşqertafên zazakî û kurmancî ev in):

Zazakî	Kurmancî
a-	ve-
bê-	bê-
bin-	bin-
cê-/ci-	jê-
de-	da-
nê-	ne-
ra-	ra-

ro-	rû-/ro-
ser-	ser-
ver-	ber-
we-	ve-
a-birnayîş	ve-qetandin
a-bîyayîş	ve-bûn
a-çarnayîş	ve-gerandin
a-gêrayîş	ve-gerîn
bê-name	bê-nav
bê-sere	bê-serî
bê-wayîr	bê-xwedî
bin-adir	bin-agir
bin-dest	bin-dest
cê-kerdiş	jê-kirin
cê-gêrayîş	jê-gerîn
cê-birnayene	jêbirîn
de-vistiş	da-kirin
de-girewtene	da-girtin
nê-weş	ne-xweş
ne-zan	ne-zan
ra-kewtene	ra-kevtin
ra-vistene	ra-xistin
ro-niştene	rû-niştin
ro-kerdiş	ro-kirin
ser-govendî	ser-govend
ser-pol	ser-mil
ser-mîyan	ser-mîyan
ver-bend	ber-bend

ver-dayene	ber-dan
ver-kewtene	ber-ketin
ver-pal	ber-pal
we-bîyayîş	ve-bûn
we-girewtîş	ve-girtin
we-nîştîş	ve-nîştin
we-kerdene	ve-xistin

1.1.2. Çekuyê ke bi cidaranê peyênî virazîyênê

(Peyvên ku bi paşqertafên çê dibin)

Tayê cidarê peyênî yê zazakî û kurmancî nê yî:

(Hin paşqertafên zazakî û kurmancî ev in):

Zazakî	Kurmancî
-ek	-ik
-ek	-ek
-wan	-van
-dar	-dar
-baz	-baz
-bend	-bend
-stan	-stan
-xane	-xane
-ên	-în
-î	-î
-ij(-ic)	-î
-an	-an
-ene	-in
-êr	dar

-kar	-kar
-waz	-xwaz
-ane	-ane
laj-ek	law-ik
keyn-ek	keç-ik
cinî-y-ek	jin-ik
vir-ek	vir-ek
keçel-ek	keçel-ek
newêr-ek	newêr-ek
pars-ek	pars-ek
ga-wan	ga-van
seyid-wan	seyid-van
birîn-dar/dirvet-in	birîn-dar
ders-dar	ders-dar
nam-dar	nav-dar
dek-baz	hîle-baz
qumar-baz	qumar-baz
saz-bend	saz-bend
nal-bend	nal-bend
dar-ên	dar-în
zerr-ên	zêr-în
sêm-ên	zîv-în
kird-î	kurmanc-î
dew-ij	gund-î
sûk-ij	bajar-î
maz-êr	dar-mazî
goz-êr	dar-gûz
dar-an	dar-an

key-an	mal-an
xêr-waz	xêr-xwaz
yew-ane	yek-ane
mêrd-ane	mêr-ane
şîr-ane	şîr-ane

1.2. Çekuyê ke kokdê “kerden”, “dayene”, “bîyayene”, .. ra virazyenê

(Peyvên ku ji kokên “kirin”, “dayin” û “bûyin-bûn”... çê dibin)

Zazakî	Kurmancî
vela-keden/vela-kerdiş	belav-kirin
weş-kerdene/weş-kerdiş	xweş-kirin
germ-kerdiş	germ-kirin
aw-dayene/aw-dayîş	av-dan
vera-dayene/vera-dayîş	ber-dan
vaz-dayene/vazdayîş	baz-dan
weşbîyayene/weş-bîyayîş	xweş-bûn
vinî-bîyayene/vinî-bîyayîş	wenda-bûn
newe-bîyayene/newe-bîyayîş	nû-bûn

1.3. Çekuyê pêrabesteyî

Çekuyê ke bi pêgirewtena çekuyandê newan peyda benê, ênan ra vajîyeno çekuyê pêrabesteyî. Mîsal: mîyan, ser-, bira-, bin- ...

(**Peyvên hevdudanî:** Peyvên ku bi hev girtina peyvên din peyda dibin, ji wan re dibêjin peyvên hevdudanî. Mîsal: nav, ser-, bira-, bin- ...)

Zazakî

ser-newe
 ser-govend
 ser-mîyan
 mîyan-ber
 bira-za
 ware-za
 ded-keyna
 azadî-waz
 zerr-weş
 çep-raşt
 bin-aw
 bin-dest

Kurmancî

ser-sal
 ser-govend
 ser-mîyan
 nav-der
 bira-za
 xwar-za
 dot-mam
 azadî-xwaz
 dil-xweş
 çep-rast
 bin-av
 bin-dest

1.3.1. Çekuyê pêrabeste yê ke didi yan zî hîrê nameyan ra peyda benê

(Peyvên hevduyanî yên ku ji du yan jî sê navan pêk hatine)

Zazakî

aw+bend
 aw+dest+xane
 aw+do
 bira+cenî
 dat+keyna/ded+keyna

Kurmancî

av+bend
 av+dest+xane
 av+do
 bira+jin/jin+bira
 dot+mam

1.3.2. Çekuyê pêrabeste yê ke bi name û sîfetî ra peyda benê

(Peyvên hevduyanî yên ku ji nav û rengdêrê pêk hatine)

Zazakî

por+sûr
 sere+gird

Kurmancî

por+sor
 ser+mezin

sere+wûşk	ser+hişk
şîr+germ	şîr+germ
zar+weş	zar+xweş

1.3.3. Çekuyê pêrabeste yê ke di sîfetan ra peyda benê

(Peyvên hevdudanî yên ku ji du rengdêran pêk hatine)

Zazakî	Kurmancî
cêr-e- cor	jêr-e-jor
çep-raşt	çep-rast
serd-germ	sar-germ
ver-a-pey	ber-û-paş

1.4. Çekuyê pêrabeste yê hemmana yê ke pêdima vajîyenê:

Nê vateyî goreyê kar, amor, sîfet û name bîyayena xo bêj bi bêj î.

(**Bêjeyên hevdudanî yên hemwate yên ku li pey hev têne gotin:** Ev peyv li gorî lêker, hejmar, rengdêr û nav bûyina xwe cûr bi cûr in).

1.4.1. Çekuyê ke bi pêdima vatişê di naman a peyda benê

(Bêjeyên ku li pey hev bi gotina du navan pêk tên)

Zazakî	Kurmancî
dew bi dew	gund bi gund
gam bi gam	gav bi gav
hewte bi hewte	hefte bi hefte
roj bi roj	roj bi roj
serre bi serre	sal bi sal
şew bi şew	şev bi şev

1.4.2. Pêdima vatişê di sifetan

(Li pey hev hatina du rengdêran)

Zazakî	Kurmancî
ge-ge	geh-geh
kemî-kemî	kêm-kêm
lete-lete	lete-lete
leza lez	leza lez
nême-nême	nîve-nîv
rew-rew	zû-zû
tayn-tayn	hindik-hindik

1.4.3. Pêdima vatişê di karan

(Li pey hev gotina du lêkeran)

Zazakî	Kurmancî
zirr-zirr (zirrayene-zirayîş)	zirr-zirr
xuş-xuş	xuş-xuş
teq-teq	teq-teq
wît-wît	wît-wît
pite-pite	pite-pite
hişe-hişe	hişe-hişe
nale-nale	nale-nal

1.4.4. Pêdima ameyîşê hûmaran

(Li pey hev hatina hejmaran)

Zazakî	Kurmancî
yew-yew	yek-yek

des-des	deh-deh
se-se	sed-sed
henzar-henzar	hezar-hezar
hewtsey-hetsey	heftsed-heftsed

1.5. Manaya çekuyan/vateyan

Heze ke ma nûsteyo corên de zî kilma dere behs kerd, hewceyo ma di hetan ra behsê çekuyan bikê; ê yewine, viraştîşê çekuyan û didin zî manaya çekuyan a. Verê ke ma behsê mana çekuyan bikê, cor de behsê viraştîşê çekuyan kerd. Çimkî viraştîşê çekuyan rewarew nê bedêlyano, labelê cumle mîyan de mana ênan bedêlyena. Ayê vengê ke xoser yan zî mîyandê yew cumle de manayêk ênan esta, tira vajiyeno çekuye. Zaf çekuy mîyandê cumle de mana ênan a xoser est a, tayê çekuyî zî mana ênan a xoser çinî ya, mana ênan goreyê têkilî û mana çekuyandê bînan dîyar bena. Tayê çekuyê zî mîyandê cumle de mana xo ya raştikên û mana xo ya didin ra dûrî kewenê û manayêka newe ya mecazî qezenc kenê.

(Wateya bêjeyan-peyvan: Herwekî ku me li jorê jî bi kurtayî behs kir, divê em jî du alîyan ve behsa peyvan bikin; ê yekemîn çêkirina peyvan û yê duyemîn jî wateya peyvan e. Berîya ku em behsa wateya peyvan bikin, li jorê me behsa çêkirina peyvan kir. Çimkû çêkirina peyvan zû bi zû naguhere, lêbelê di nava hevokê de wateya wan diguhere. Ew dengên ku li xweser yan jî di nava hevokê de wateyek wan heye, jî wan re dibêjine peyv. Gelek peyv di nav hevokê de xwedî wateyek xweser in, hinek peyv jî wateya wan a xweser nîne, wateya wan li gor têkilî û wateya peyvên din dîyar dibe. Hinek peyv jî di hevokê de jî wateya xwe ya rastîn û wateya duyemîn dûr dikevin û wateyeke mecazî ya nû qezenc dikin).

1.5.1. Çekuyê ke manaya xo ya raştikêne de yenê vatiş

Nê bêj çekêyî mana ênan dîyar û aşkere ya, wexto ke bêrê vatiş herkes tira eynî mana vejeno û eynî çî fam keno.

(Peyvên ku di mana xwe ya rastîn de têne bikaranîn: Ev cûre peyv wateya wan dîyar û aşkere ye, dema ku tên gotin, herkes eynî manayê ji wan derdixîne û heman tiştî fam dike).

Mîsal:

Wexto ke şamî werdênê fekê ey yew vîncew abînê. (z)

Dema ku şîv dixwar devê wî bihûstekî vedibû. (k)

Wexto ke Evdalê Zeynike deyrî vatê, to vatê qey anka qirika yê diryena. (z)

Dema ku Evdalê Zeynikê kilam digot, te digo qey nûka qirika wî didire. (k)

Awe 100 oC de kel kewena. (z)

Av di 100 oC de dikele. (k)

Awa lêle çîman de ameya. (z)

Ava şêlû di çavê wî re hatiye. (k)

1.5.2. Çekuyê ke manaya xo ya diyine de yenê vatiş

(Peyvên ku di wateya xwe ya duyemîn de têne bikaranîn)

Zazakî

Kurmancî

Kinê awe heta fekan ver dekerd.

Kûnê avê hata ber dev tije kir.

Şûşa awe heta qirike dekerde.

Şûşa avê heta qirikê tije kir.

Biza gerrine çîme ra aw şîmena.

Bizina gûrrî ji çavîyê av vedixwe.

Amnanî Dîyarbekir german vera kelyena.

Havînê Dîyarbekir ji ber germê dikele.

1.5.3. Çekuyê ke manaya xo ya mecazî de yenê vatiş

(Peyvên ku di wateya xwe ya mecazî de têne gotin)

Zazakî

Kurmancî

Kela deyrbazî kela dêza ya, rew yena.

Kela dengbêjan kela dêzikê ye, zû tê.

Barê nezanî sivik o, barê zanayî giran o.

Barê nezan sivik e, barê zana giran e.

Qalê to qalê veng î.

Gotinên te gotinên vala ne.

Ti wîrdî çimê min ê.

Tu herdu çavê min î.

1.6. Têkiliya manaya çekuyan

(Têkilîya wateya peyvên)

1.6.1. Çekuyê hemmanayî (hemwateyî)

Çekuyê ke nûstîş û wendîşê ênan cîya yo û mana ênan sey cê(pê) ya, ênan ra vajyeno çekuyê hemmana.

(**Peyvên hemwate:** Peyvên ku nivîsandin û xwendina wan cihê ye û mana wan wekhev e, ji wan re dibêjine peyvên hevmana).

Zazakî

aroş-arwêş

asnawe-aznake

hindî-zebeşe

kûçlan-adirgan

leyîr-pit-qij

mijmewle-morcele

misafir-meyman

pîl-gird-xîşin

ziwan- zar

Kurmancî

hergûş-kerge

avjenî-soberî-melevanî

keç-dot

-

pis-law

kûrmûrî-mûrîk

misafir-mêvan

mezin-gewre

ziman-zar

1.6.2. Çekuyê hemvengî:

Çeku (kelîme)yê ke vatiş û nûstîşê ênan seycê bo û mana ênan cîya bo, tira vajyeno çekuyê hemvengî.

(Peyvên hevdeng: Peyvên ku gotin û nivîsandina wan wekhev e û mana wan cihê ye, ji wan re tê gotin peyvên hevdeng).

Zazakî

sere-sere (zeman)

zere-zere (dil)

war(cêr)-war (ware)

her-her (heywanê barî)

par-par

Kurmancî

pir-pir

kirin-kirîn

xwelfî-xwelfî (ax)

ker- kerr

par-par

1.6.3. Çekuyê ke manaya ênan zîtê (ravera) yewbinan ê

(Peyvên/bêjeyên ku wateya wan raberê hev in)

Zazakî

akerde-girewte

berz-nizim

dûr-nizdî

giran-sivik

kilm-derg

newe-kehên

raşt-zûrî

rew-erey

rind-xirab

serd-germ

şinik(hûrdek)-gird

weş-nêweş

Kurmancî

vekirî-girtî

bilind-nizim

dûr-nêzîk

giran-sivik

kin-dirêj

nû-kevn

rast-derew

zû-dereng

rind-xerab

sar-germ

piçûk-mezin

xweş-nexweş

1.6.4. Çekuyê ke manaya ênan şênber (muşexes) a

(Peyvên ku wateya wan şênber e)

Zazakî

aw

Kurmancî

av

dar	dar
defter	defter
hêga	zevî
kewçike	kevçî
keye	xanî
ko	çîya
rez	rez
ro	robar

1.6.5. Çekuyê ke manaya ênan razber (muceret) a

(Peyvên ku wateya wan razber e)

Zazakî	Kurmancî
hewn	xewn
vîr	bîr
ruh	ruh
aqil	aqil
hiş	hiş
heyecan	heyecan
hes	hes

1.6.6. Çekuyê ke vengandê tebîetî ra peyda benê

Nê bêj çekuyê bi teqlîtkerdena vengandê tabîatî ya peyda benê.

(Peyvên ku ji dengên xwezayî peyda dibin: Ev cûre peyv bi teqlîtkirina dengên xozayî peyda dibin).

Zazakî	Kurmancî
xuş / xuşîne	xuş / xuşîn
rep / repîne	rep / repîn

tep / tepîne

çelp / çelpîne

xir / xirîne

teq / teqîne

nik / nikûl

gurm / gurmîne

tep / tepîn

çelp / çelpîn

xir / xirîn

teq / teqîn

nik / nikil

gurm / gurmîn

1.6.7. Çekuyê ke bi dibarekerdena di çekuyana peyda benê:

Nê bêj çekuyî, seba xurtkerdena mana çekuyan û balkaşkerdene yenê xebitnayîş û viraştene ênan awa bi awa beno.

(Peyvên ku bi dubarekirina du peyvan çê dibin: Ev cûre peyv, ji bo bihêzkirina mana peyvan û balkêşandinê têne bikaranîn, çêkirina wan jî awa bi awa çêdibe).

1.6.7.1. Ay çekuyê ke bi dibarekedişê eynî çekuye virazyenê

(Ew peyvên ku bi dubarekirina heman peyvê çê dibin)

Zazakî

rewa-rew

rema-rem

hêdî-hêdî

vera-vera

gam-gam

ray-ray

Kurmancî

zû-zû

reva-rev

hêdî-hêdî

bera-bera

gav-gav

car-car

1.6.7.2. Çekuyê ke bi dibarekedişê çekuyandê zitê yewbinan virazyenê

(Peyvên ku bi dubarekirina peyvên zitê (beravajî) hev çê dibin)

Zazakî

vêşî-kemî

aver-apey (tepa)

hewl-xirab

newe-kehên

pîl (gird)-wûrdêk

Kurmancî

kêm-zêde

pêş-paş

baş-xirab

nû-kevin

gir-hûr (mezin-piçûk)

1.6.7.3. Çekuyê ke yew çekuyêda bi mana û yewêda bêman ra virazyenê

(Peyvên ku ji peyvekî bi mana (wate) û yeka bêmana çê dibin)

Zazakî

doman-momanî

dewij-mewij

dizd-mizd

hêga-mêga

kitab-mitab

şaşo-maşo

Kurmancî

zaro-maro

gundî-mindî

diz-miz

zevî-mevî

pirtûk-mirtûk

şaşo-maşo

1.6.7.4. Çekuyê ke bi dibarekedena vengadê tebîetî ra virazyenê

(Peyvên ku bi dubarekirina dengên xwezayî çê dibin)

Zazakî

xuş : xuşexuş

xir : xirexir

şirr : şirreşir

gur : guregur

vîz : vîzevîz

Kurmancî

xuş : xuşexuş

xir : xirexir

şirr : şireşir

gur : guregur

vîz : vîzevîz

2. Name (Nav)

Çekuyê (vateyê) ke bîyayena heme çîdê ganî-merdî, asaye-nêasaye, hadîse û mefhûman, kes yan zî heywanan dîyar bikê û bidê sinasnayîş, ênan ra vajîyeno name. Name û name panayîşê bîyayenan, tarîxê aver-şîyayêşê zîwan û mêrdimayî de gamêka zaf muhîm a. Eger name peyda nêbînê, mêrdiman nişênaynê xo, waztişê xo, hadîse û tebayê xo ra teber îfade bikê û belkî şarezayîya ewroyên zî peyda nêbînê.

(**Nav:** Ew peyvên ku hemû hebûnên zindî-mirî, dîyar-nedîyar, bûyer û mefhûman, kes yan jî heywanan dîyar dikin û didin nasandin, ji wan re dibêjin nav. Nav û navlêkirina hebûnan, di tarîxa pêşveçûna zîwan û mirovayetîyê de gavêka pir girîng e. Eger nav peyda nebûna, mirovan nedikarî xwe, xwestinên xwe, bûyer û tiştên dervayê xwe îfade bikira û belkî şarezayîya îroyîn jî peyda nebûya).

Zazakî

aw

şew

beye

Zîn

Pîran

Gêl

Kurmancî

av

şev

bîyok

Zîn

Pîran

Gêl

Botan	Botan
cinî	jin
waye	xweh, xûşk
rez	rez
vile	gul
perperik	perperik
wesar	bihar
serre	sal
serrnewe	sersal
zimistan	zivistan
darûxane	dermanxane
astare	stêrk
hamnan/anman	havîn
şewşewik	şevşevok

Hawayê viraştene û goreyê xûsusiyetandê xo bêj bi bêj nameyî estî.

(Ji aliyê çêbûn û xûsusiyetên xwe ve navên cure bi cure hene).

2.1. Nameyê xasî (taybetî)

Nameyê ke dinya de yew bîyayene yan zî yew mefhûm tenya nîşan kenê, ênan ra vajyeno nameyê xasî(taybetî).

(**Navên taybet (xas):** Navên ku di dinyayê de hebûnek yan jî mefhumek tenê nîşan bidin, ji wan re dibêjin navên taybet).

Mîsal:

Mela Ehmedê Xasî, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Nûredîn Zaza, Nûrî Dêrsimî, Pîremêrd, Şerefname, Şêx Evdirehmanê Axtepi, Kela Dimdim, Gêl, Pîran, Dêrsim, Hewraman, Mahabad, Hewlêr, Behra Sipî, Gola Wanî, Birca Belek, Dara, Botan, Xerzan, Barzan, Hawar, Vate, Tîrêj, BÎR, War, Zend, Nûbihar.

2.2. Nameyê cinsî (giştî)

Nameyê xasan ra teber heme nameyê bînî, nameyê cinsî yî. Nê nameyî, bêj û komeyê bîyayanê cêrênan nîşan kenê.

(**Navên cinsî:** Ji xeynê navên taybet hemû navên din, navê cinsî ne. Ev nav, cure û komên hebûnên jêrîn nîşan dikin).

2.2.1. Nameyê cayan:

Her cayo ke tayê xûsuyet û sînore ey bibê, yew nameyê eyê xas zî esto.

(Navê cayan: Her ciyê ku hinek xûsuyet û sînoren wî hebin, navekî wî yê taybet jî heye).

Zazakî

Deşta Gewran

Serhed

Behdînan

Gêl

Pîran

Mergesor

Bexçe Gawan

Tilsûr

Koyê Sîpanî

Kurmancî

Deşta Gewran

Serhed

Behdîna

Gêl

Pîran

Mêrgesor

Bexçeyê Gawan

Tilsor

Çîyayê Sîpan

2.2.2. Nameyê heywanan:

Nameyê heywanan goreyê bêj û hawayê jiwîyayîşê ênan bedêlfiyenê.

(Navê heywanan (ajelan): Navê heywanan li gorî cure û awayê jiyana wan diguhere).

2.2.2.1. Heywanê keyî

(Heywanên kedî)

Zazakî

biz

mêşna

her

mankere

hergûş/arwêş

kerq

bewran

manga/moga

mayîne

Kurmancî

bizin

mîh/mêşin

ker (keher)

maker

kerqûh

mirîşk

kevok

manga

mehîn

2.2.2.2. Heywanê kovî

(Heywanên kovî)

Zazakî

verg

xoz

heş

peskovî

lûy

mar

kesa

Kurmancî

gur (k)/gurg (s)

beraz

hirç

pezkovî

rovî

mar

kûsî

2.2.2.3. Heywanê bejî

(Heywanên bejî)

Zazakî

morcela, mijlewr

Kurmancî

kûrmorî

merre	mişk
kormişk	kormişk
karmik	kûrm,
mar	mar

2.2.2.4. Heywanê awî

Heywanê ke awe de ciwîyenê. Labelê tayê bêjê heywananê awîyan cayo bejayî de; tayê bêjê heywananê bejîyan zî cayo awî de zî jiwyenê.

(Heywanên avî: Heywanên ku di avê de dijîn. Lêbelê hinek cureyê heywanên avî di ciyê bejayî de; hinek cureyên hewanên bejayî jî di ciyên avî de dijîn).

Zazakî	Kurmancî
mase	masî
marmase	narmasî
kerekince	kevjal
qilîncire	beq
kessa awî	req

2.2.2.5. Dewarê keyî (destî)

(Dewarên kedî)

Zazakî	Kurmancî
ga	ga
manga	manga, çêlek
kûtik	kûçik
beran	beran
golik	golik
hestor/estor	hesp
her	ker

2.2.2.6. Nameyê teyran

(Navên teyran)

Zazakî

bewran

koter

şewşewik

kund

mîrçik

Kurmancî

kevok

qûmrî

şevşevok

kund

çûçik

2.2.3. Nameyê daran

(Navên daran)

Zazakî

say-sayêr

bey-beyêr

mazî-mazîyêr (mazêr)

henar-henarêr

goz-gozêr

Kurmancî

sêv- dara sêvê (darsêv)

bîyok-dara bîyokê

mazî-dara mazî

hinar-dara hinarê

gûz-dara gûzê

2.2.4. Nameyê vaş û nebatan

(Navên giya û nebatan)

Zazakî

herxenek (palax)

vil

gêleziwane

xazîk

vizdewre

Kurmancî

kerxenek

gul

guriz

axbandir

tûzik

zahtire	catirî
nane	nane
pirpar	pirpar
pûne	pûng
sûrgul	şîlan
rîhan	rîhan

2.2.5. Nameyê hacet û aletan

(Navên hacet û aletan)

Zazakî	Kurmancî
birrik	birrek
gurz	gurz
gaz	gaz
mêx	mîx
resne	werîs
meqes	hevrîng
hangaje (hengaz)	berûabûr
pirjin	bêjing
gasar	sendan
kondêz	heskî

2.2.6. Nameyê çekuyandê mêrdimayî

(Navên peyvên merivatîyê/xezimatîyê)

Zazakî	Kurmancî
bawkal	bavkal
bira	bira
ded, dat	ap, mam
dedkeyna	dotmam
dedza, datîza	pismam

keko	kek (kekê)
laj-laz	law
xal	xal
vistewre	xezûr
vistîrî, vistûrî	xesû
waye	xweng/ xûşk

2.2.7. Nameyê çîyê (tebayê) werden û şimitene

(Navên tiştên xwarin û vexwarinê)

Zazakî	Kurmancî
şit	şîr
mast	mast
penîr	penîr
do	dew
aw	av
şorbaw, şorba	şorbe
sîraw	sîravk
malês, pilor	malêz
helîsa	helîse
tirşike	tirşik

2.2.8. Nameyê tarr û pincarî

(Navên tarr û pincaran)

Zazakî	Kurmancî
îsot	îsot, bîber, firfir
pîyanz	pîvaz
kûy	kûndir
perpar	pirpar
sîr	sîr

balcan	balcanê reş
firengî	şamik
xiyar	xiyar
xazîk	axbandir

2.2.9. Nameyê cilûbelgî

(Navên cil û bergan)

Zazakî	Kurmancî
saqo	saqo
pirên	kiras
pirênbaz	hevalkiras, derpê
kelaw	kûm
timan	tûman
sewl, sol	pêlav, sol
çarox	çarox
lepik	lepik

2.2.10. Nameyê çîyê ramitişî

(Navên tiştên ajotî)

Zazakî	Kurmancî
xele	tene
cew	ceh
gilgil	garis
mercûye	nîsk
cewek	cehik(cehê banî)

2.2.11. Nameyê organanê bedenê ma

(Navên organên bedena me)

Zazakî

dest

fek

rî

goş

lew

dindan

pirnike, zincî

ziwan, zon

Kurmancî

dest

dev

rû

guh

lêv

diran

poz, difn, bêvil

ziman

2.3. Nameyê muşexesî

Nameyê ay bîyayenan o, ke ma şênê bi organandê xo hîs bikê, bi çimandê xo bivînê û destê xo pêwa nê.

(**Navên şênber:** Navê ew hebûnan e, ku em dikarin bi organên xwe hîs bikin; bi çavê xwe bibînin û destê xwe pêve bidin).

Zazakî

kerra

asin

dês

dar

desmal

ro

Kurmancî

kevir

hesin

dîwar

dar

desmal

robar, çem, ro

2.4. Nameyê muceredî

Nameyê ay bîyayenan o, ke ma nişênê ênan bi organandê xo hîs bikê, labelê ma şênê bi fikir û aqlê xo bîyayenan înan qebûl bikerê.

(**Navên razber/nedîtbar:** Navê ew hebûnan e, ku em nikarin bi organên xwe hîs bikin, lêbelê dikarin bi fikir û aqlê xwe hebûna wan qebûl bikin).

Zazakî	Kurmancî
aqil	aqil
azadî	azadî
bawerî	bawerî
çikûs	çikûs
çimnebareye	çavnebarî
ciwanmêrdeye	ciwanmêrdî
heskerdiş	heskirin
hewl	baş
xerabeye	xerabî
xîyal	xîyal
rindeye	rindî
xem	xem

2.5. Nameyê koman

Nê bêj nameyî, hem qandê (seba) nameyê ganîyan û hem zî seba nameyê çîyandê (tebanyandê) merdî vajyenê.

(**Navên koman:** Ev navên han, hem ji bo navên zindîyan û hem jî ji bo navê tiştên mirî (nezindî) têne gotin).

Zazakî	Kurmancî
şar	xelq, gel
bol	kerî
kurd	kurd
tirk	tirk
karwan	karwan
naxir	naxir

milet	milet
mêrdim	mirov
pes	pez, pes
dewar	dewar
dew	gund
dar	dar

2.6. Nameyê pêrabesteyî

Didi ya zî hîna vêşî nameyê ke pêdima bêrê vatiş, ênan ra namey pêrabestey peyda benê.

(**Navên hevdûdanî**: Du yan jî hîn zêdetir navên ku li pey hev bêne gotin, ji wan navên hevdûdanî peyda dibin).

Zazakî	Kurmancî
dat+keyna	dot+mam
ded (dat)+za	pis+mam
bir+cinî	bir+jin (jin+bir)
aw+dest+xane	av+dest+xane
bir+za	bir+za(ê)
bir+keyna	bir+keç
kitab+xane	kitab+xane

2.7. Nameyê yewhûmarî

(**Navên yekhejmar**)

Zazakî	Kurmancî
gawan	gavan
keyna	qîz, keç
şew	şev
say	sêv

vil	kûlîlk
hak	hêk
ko	çîya
kel	nêrî
astare	stêrk

Mîsal:

Gewendeyê dewe.	Gewendeyê gund.
Keynaya mi.	Qîza min./ Keça min.
Şewa tarî.	Şeva tarî.
Saya sûre.	Sêva sor.
Vilika wesarî.	Kûlîlka biharê.
Hakê kesa.	Hêkê kûsîyê.
Koyê Sîpanî	Çîyayê Sîpanê.
Kelo hîrê serre.	Nêrîyê sê salî.
Astareyo Çelek.	Stêrka Çilek.

2.8. Pirhûmarîya (zafhûmarîya) nameyan

Dîyalekta zazakî de nameyê sadeyî bi cidaranê peyênana (peycidarana) benê vêşî. Pirhûmariya (zafhûmariya) nameyan bi peycidarandê /-an/ , /-ê, -yê/ û /-î, -yî/ virazyenê. Ke name bi yew herfa vengine bi-qedyo, seba pêgirewtena herfan, /y/ ya pêbestene dekiwena mîyandê ênan û bena /-yan, -yên/.

Kurmancî de zî, mintiqe û şêweyandê ciyayan de peycidarê pirhûmariye nê yî: /-an/, /-ên/ û /-êd, -êt/. Pratîk de zaf rayan vengê /n/, /d/ û /t/ yê peynîya /-an/ û /-êd, -êt, -ên/î kiwenê û cadê ênan de /-ê/ û /-a/ yenê xebitnayîş.

(Pirhejmarîya navan: Di dîyalekta zazakî de navên sade bi girtina qertafan dibin pirhejmar. Pirhejmariya navên cinsî bi qertafên /-an/1, /-ê, -yê/ û /-î, -yî/ têne çêkirin. Ku nav bi tîpeke bideng biqede, ji bo kelijandinê tîpa /y/ dikeve navbera wan û wê demê qertaf dibe /-yan, -yên/.

Di kurmancî de jî, li gor herê m û şeweyên cuda, qertafên pirhejmariyê ev in: /-an/, /-ên/ û /-êd, -êt/. Di pratîkê de gelek caran dengên /d/, /t/ û /n/ dikevin û di ciyê wan de tenê dengê /-ê/ û /-a/ tene bikaranîn).

2.8.1. Nameyê ke bi herfa bêvenge qedyenê

(Navên ku bi tîpa bêdeng diqedin)

Zazakî		Kurmancî	
Yewhûmar	Pirhûmar	Yekhejmar	Pirhejmar
rez	rezan	rez	rezan
çim	çiman	çav	çavan
kurd	kurdî	kurd	kurdan
vam	vamî	behîv	behîvan
dew	dewî	gund	gundan
laj	lajî	law	lawan
dest	destî	dest	destan
şew	şewî	şev	şevan
roj	rojî	roj	rojan

Zazakî

Dewan veng kenê.

Keran varnenê.

Bindê çimana ewniyeno.

Kurdê rojava.

Rezê mîran.

Kurmancî

Gundan vala dîkin.

Keviran dibarînin.

Di bin çavan re dinêre.

Kurdên rojava.

Rezên Mîran.

Şewê dergî.	Şevên dirêj.
Domanê jêhatî.	Zarokên jêhatî.
Rojê weşî.	Rojên xweş.
Risîyayê welatî.	Rureşên welat.

Nameyê eşîr, malbet û herêman bi hawayê pirhûmarî nusîyenê.

(Navê eşîr, malbat û herêman bi hawayê pirhejmariyê têne nivîsandin)

Mîsal:

Zazakî	Kurmancî
Qerebegan	Qerebegan
Kîkan	Kîkan
Bûtîyan	Bûtîyan
Şadîyan	Şadîyan
Hevêrkan	Hevêrkan
Barzan	Barzan
Soran	Soran
Botan	Botan
Keyê Qeran.	Mala Qeran.
Keyê Simoyan.	Mala simoyan.
Keyê Keleşan.	Mala Keleşan.
Keyê Barzanîyan.	Mala Barzanîyan.
Keyê Bedirxanîyan.	Mala Bedirxanîyan.

2.8.2. Nameyê ke bi herfa /-î/ qedyenê

Nameyê ke bi herfa /-î/ qedyenê, wexta ke formê pirhûmariya ênan nusyenê, hem dimilî û hem zî kurmancî de herfa /y/ ya pêgirewtene dekiwena mabênê peycidara /-an/, /-ên/, /-î/ û ay wext nê peycidarî zey /-yên/, /-yan/ û /-yî/ yenê nustiş.

(Navên ku bi herfa /-î/ diqedin: Navên ku bi tîpa /-î/ diqedin, wexta ku formê

pirhejmariya wan tê nivisîn, hem di dimilî û hem jî kurmancî de tîpa /-y/ ya pevgirêdanîyê(kelijandinê) dikeve navbera /-an/, /-ên/, /-î/ û wê demê van qertafan wekî /-yan/, /-yên/ û /-yî/ têne nivisîn).

Zazakî	Kurmancî
sirsî/ sirsîyî	gîsin/ gîsinan
kardî/ kardîyî	mejî/ mejîyan/mejîyên
şamî/ şamîyî	şîv/ şîvan
heynî/ heynîyî	kanî/kanîyan/kanîyên
mundî/ mundîyî	piştî/ piştîyan

2.8.3. Nameyê ke bi herfa /-e/ qedyenê

Zazakî de seba pirhûmareya nê bêj naman goreyê halê ênan peycidarê /-yan, -yê, -yî/ yenê. Kurmancî de zî /-yan/ û /-yên/ yenê peynîya nameyan.

(Navên ku bi herfa(tîpa) /-e/ diqedin: Di zazakî de ji bo pirhejmarîya van navan qertafên /-yan, -yê, -yî/ têne û di kurmancî de jî /-yan/ û /-yên/ têne dawîya navan).

Zazakî	Kurmancî
pale/ paleyan	pale/paleyan/paleyên
bende/bendeyî	bende/bendeyan/bendeyên
giştane/giştaneyî	pêçî/pêçîyan/pêçîyên
mase/maseyî	masî/masîyan/masîyên
merde/merdeyî	mirî/mirîyan/mirîyên

Mîsal:

Paleyan ewro qebaleyê xo qedêna. Paleyan îro qebaleya xwe qedandin.

Herê merdeyî dîyê ti ra nalan. Kerê mirî dîtine jê nalan dikşînin. kaşkenê.

Ma bendeyê destê neyaran î. Em bendeyên destê neyaran in.

Panc giştaneyê ma seycê nîyê. Pênc pêçîyên me newekhev in.

2.8.4. Nameyê nêrî yê ke bi herfa /-e/ qedyenê

Zazakî de pirhûmareya nê bêj nameyan goreyê haldê xo bi peycidarane /-yan/, /-yî/, /-yê/ û kurmancî de zî bi peycidarane /-yan/ û /-yên/ vi-razîyenê.

(Navên nêr ên ku bi tîpa /-e/ diqedin(xelas dibin): Di zazakî de pirhejmarîya van navan li gorî halê xwe bi qertafa /-yan/, /-yî/, /-yê/; di kurmancî de jî bi qertafa /-yan/ û /-yên/ tê nivîsandin).

Zazakî

astare

goşare

şane

şiwane

xane

Astareyê raya pîre.

Şaneyê darênî.

Şiwaneyî bolê bizan çerênenê.

Xaneyan yew bi yew amorenê.

Kurmancî

perde

mase

şe

xane

xane

Stêrkên kadizê.

Şeyên darîn.

Şivan kerîyê bizinan diçêrînin.

Xaneyan yek bi yek dihejmêrin.

2.8.5. Nameyê makî yê ke bi herfa /-a/ qedyenê

Zazakî de pirhûmareya nê bêj naman bi peycidara /-yan/, /-yî/ û /-yê/; di kurmancî de zî bi /-yan, -yên/ bena.

(Navên mê yên ku bi herfa (tîpa) /-a/ diqedin: Di zazakî de pirhejmarîya ev navan bi qertafa /-yî/-yê/; di kurmancî de jî bi qertafa /-yan, -yên/ çêdibin).

Zazakî

balışna/balişnayî

manga/mangayî

makîna/makînayî

zurna/zurnayî

Kurmancî

belîf/belîfan

manga/magayan

makîne/makîneyan

zurna/zurnayan

zama/zamayî
ga/gayî

zava/zavayan
ga/gayan

2.8.6. Pirhûmarîya nameyê ke bi herfandê /-û/, /-u/ û /-o/ qedyenê

(Pirhejmarîya navên ku bi tîpên /-û/, /-u/ û /-o/ diqedin)

Zazakî

lû/ lûyî/ lûwî

ko/ koyî

tû/ tûyî

mu/ muyî

ro/ royî

Kurmancî

rovî/ rovîyan

çîya/ çîyayan

tû/ tûyan /tûwan

mu/ muyan

co/ coyên kûr

2.9. Nêrî bîyene û makî bîyena nameyan

Hem zazakî û hem zî kurmancî de yew çekûye yan zî name, mutleq yan nerî û yan zî makî yî. Teniya kurmancî de çend veteyê notrî estî. Dimilî de makîyeya nameyan, halê sade yê ênan de zî dîyar bena, labelê kurmancî de halo sade yê nameyan de nerîyê û makîyê dîyar nîya, qandê ke cinsê nameyan dîyar bibo, gerek name îzafê bigîro. Zazakî de wexto ke halo sade yê nameyan peyçidara /-e/ bigîro, makîbîyayena ay nameyan û çekûyan dîyar kena. No vengê /-e/, tayê cayan de zey vengê /-i/ vajyeno. “Tayê mintiqeyan de, gama ke xoser bibî zî nê çekuyanê makîyan ra pey /-e/ û /-i/ çin î.”

Gerek ma naye zî vajê ke hemin şeweyandê zazakî de nêrîyê û makîyê seycê nîya. Miqayesekerdişê zazakî û kurmancî de zî nêrîyê û makîyêya hemin name û çekûyan seycê nîyê. Tayn name û çekûyî estî ke dimilî de makî yî, kurmancî de nêrî yî; yan zî kurmancî de makî yî û dimilî de nerî yî.

Kurmancî de nêrî û makîyêye, halo sade yê naman de dîyar nêbenê, halo îzafê bîyaye de cinsê naman dîyar beno.

(**Nêr û mak bûna navan:** Hem di zazakî û hem jî kurmancî de peyvek an jî navek, mutleqe yan nêr e û yan jî mê(mak) ye. Tenê di kurmancî de hinek peyvên pir hindik ên nêtar hene. Di dimilî de nêrîtî û mêyîtîya navan, di halê sade yê wan de dîyar dibe, lêbelê di kurmancî de ji bo ku cinsê navan diyar bibe, gerek nav îzafê bigrin. Di dimilî de wexta ku halê sade yê navan qertafa /-e/ bigre, ev mêyîtîya wî navî dîyar dike. Ev dengê /-e/, di hinek ciyan de jî wek /-i/ tête gotin. “Di hinek mintiqeyan de, gava ku xweser bibin jî, li pey peyvên mê /-e/ û /-i/ nîn in.”

Gerek em vê yekê jî bibêjin ku di hemû şêweyên zazakî de nêrîtî û mêyîtî ne wekhev e. Di miqayesekirina dimilî û kurmancî de jî, nêrîtî û mêyîtîya hemû nav û peyvên ne wekhev in. Hinek nav û peyv hene ku di dimilî de mê ne û di kurmancî de nêr in; di kurmancî de nêr in û di dimilî de mê ne.

Di kurmancî de nêrîtî û mêyîtî, di halê sade yê navan de dîyar nabe, di halê îzafeyê de cinsê navan (peyvên) dîyar dibe)

Zazakî

Kurmancî

dew/ dewi/ dewe: Dewa dapîrda mi.	gund	: Gundê bavê min.
dar/ dari/ dare : Dara mazêre.	dar	: Dara mazî.
şew/şewe : Şewa tarî.	Şev	: Şeva tarî.
lû/lûye : Lûya zexele.	rovî	: Rovîya zexel.
vam/vame : Vama şêrîne	behîv	: Behîva tahl.

2.9.1. Nameyê nêrî

Zazakî de heme nameyî, yan nêrî û yan zî makî yî. Nameyê yewhûmar û nêrî, peycidara /-o, -yo/ gênê, nameyê pirhûmarî zî goreyê haldê xo peycidaranê /-an, -yan/, /-î, -yî/ û /-ê, -yê/ gênê. Kurmancî de zî nameyê yewhûmar ê nêrî, peycidara /-ê/ û pirhûmarî zî /-an/ û /-ên/ gênê.

(Navên nêr: Di zazakî de hemû nav yan nêr in û yan zî mak in. Navên yekhejmar ên nêr, qertafa /-o/ digrin, navên pirhejmar jî li gorî halê xwe qertafên /-î, -yî/, /-ê, -yê/ û /-an, -yan/ digrin. Di kurmancî de jî navên yekhejmar ên nêr, qertafa /-ê/ û pirhejmar jî /-ên/ û /-yên/ digrin).

2.9.1.1. Nameyê xûsusî yê ganîyandê nerîyan

(Navên xûsusî yên zindîyên nêr)

Zazakî	Kurmancî
Gayo sîya.	Gayê reş. (yh.)
Kûtiko qer.	Kûçikê qer. (yh.)
Hero boz.	Kerê boz. (yh.)
Lajo sîya.	Lawê reş. (yh.)
Maro sîya.	Marê reş. (yh.)
Maseyo sûr.	Masîyê sor. (yh.)
Estorê rewanî.	Hespên rewan. (ph.)
Dewê xopanî.	Gundên xopan. (ph.)
Domanê ma girdî.	Zarokên me mezin in. (ph.)
Şagirtan karê xo kerdo.	Şagirtan karê xwe kirîye. (ph.)
Gemîyan barê xo veng kerd.	Gemîyan barê xwe vala kirin. (ph.)
Koyan ra ameyê deşte.	Ji çiyayan hatine deştê. (ph.)
Kûtikanê dewda ma pê girewt.	Kûçikên gundê me pev girtin. (ph.)
Lajekî welatê ma derg î.	Lawên welatê me dirêj in. (ph.)
Wendoxê mi.	Xwendevanên min. (ph.)
Ciwanî ameyî.	Ciwan hatin. (ph.)
Lewî ey bîyê wişk.	Lêvên wî hişk bûne. (ph.)
Destî nayê pêser.	Destên xwe daye serhev. (ph.)
Çimî aye bîyê a.	Çavên wê vebûn. (ph.)
Şewî bîyê derg, rojî bîyê kilm.	Şev bûne dirêj, roj bûne kin. (ph.)

2.9.1.2. Heme bêj nameyê cinsî yê mêrdeyan, nerî yê.

(Hemû cûreyê navên cinsî yê mêran, nêr in).

Zazakî	Kurmancî
pî(pêr, bawik)/ Pîyo hewl.	bav/ Bavê qenc.

ded/ Dedo çimsûr.

bira/ Birayo çıcek.

biraza/ Birazayo gird.

hembaz/ Hembazo erjiyaye.

ap/mam/Mamê çavsor.

bira/ Birayê piçûk.

biraza/ Birazayê gewre.

heval/ Hevalê hêja.

2.9.1.3. Nameyê hemin heywanandê nêrîyan, hem bi peycidara nêrî-yîye dîyar benê û hem zî nameyê înan ê xasî estî.

(Navên hemû heywanên nêr, hem bi qertafa nêrîtiyê dîyar dibin û hem jî navê wan ên xas hene).

Zazakî

ga : Gayo sûr.

her : Hero boz.

kûtik : Kûtiko qer.

vîştira : Vîştirayo sîya.

xone : Xoneyo pirçin.

dîk : Dîko poçqol.

kel : Kelo qoçin.

Kurmancî

ga : Gayê sor.

ker : Kerê boz.

kûçikê : Kûçikê qer.

paronge: Parongeyê reş.

xone : Xoneyê bipirç.

dîk : Dîkê dûvkinik.

nêrî : Nêrîyê biqiloç

2.9.1.4. Yew ra teber, nameyê hemin hûmar û reqaman nerî yê.

(Ji dervayê reqama yek, navê hemû hejmar û reqaman nêr e).

Zazakî

yew : Yewa to, yewa mi.

hîrê : Hîrêyê to, hîrêyê mi.

des : Desê pancasî.

pancês : Pancêsê to, pancê mi.

vîst : Vîstê to û yewa min.

hewtay : Hewtayê to û hewtê mi.

hîrsey : Hîrseyê to û hîrêyê mi.

Kurmancî

yek : Yeka te, yeka min.

dido : Sisêyê te, sisiyê min

deh : Deh ji pêncîyê.

panzdeh: Panzdehê te pêncê min.

bîst : Bîstê te û yeka amin.

heftê : Heftêyê te û heftê min.

sêsed : Sêsedê te û sisêyê min.

2.9.1.5. Nameyê hemin rengan nerî yê.

(Navê hemû rengan nêr e).

Zazakî	Kurmancî
kiho /kihoyê dara mazêr.	sewz, kesk
sûr/ sûrê gulan.	sor
zerd	zer
sîya	reş
gewr	gewr

2.9.1.6. Mûyê heywanan ra teber, wer û berê ke heywanandê keyî ra vi-razyenê, şit û çîyê ke şit ra peyda benê (şijî û germî ra teber) hema hema pêro nerî yê.

(Ji derê mûyê heywanan, ber û xwarinên ku ji heywanên kedî çêdibin; şîr û tiştên ji şîr çêdibin (ji derê avdewşo) hema hema giş nêr in).

Zazakî	Kurmancî
şit	şîr
mast	mast
toraq	toraq
penîr	penîr
terrne-terrêne	çotran
rûwenê keyî	nivîşk
goşt	goşt
hengimên	hingivîn
hak	hêk
rense (mûyin)	werîs
palas	palas
tewre	tûrik

ciwal	çewal
xeyşa	xirar
vezd	bez

2.9.1.7. Tayê çekuyê estî ke bi eslê xo nerî yê, labelê wexta ke çîyê makî nîşan bikê benê makî.

(Hinek peyv hene ku bi eslê xwe nêr in, lêbelê dema ku tiştên mak dîyar bikin dibin mak).

Zazakî

hembaz: Hembazo hewl (hol).
 : Hembaza hewle (hole)
 hemberîyan : Hemberîyano baş.
 : Hemberîyana xerabe.
 dost : Dostê mi.
 : Dosta mi.
 dişmen: Dişmena to.
 : Dişmenê to.
 deyrbaz: Derybaza dewe.
 : Deyrbazê dewe.

Kurmancî

heval : Hevalê baş.
 : Hevala baş.
 cîran : Cîranê baş.
 : Cîrana xerab.
 dost : Dostê min.
 : Dosta min
 dijmin : Dijmina te.
 : Dijminê te.
 dengbêj: Dengbêja gund.
 : Dengbêjê gund.

Cîrano xerab, kê keno wayîrê haceta hewle (z).

Cîranê xerab, meriv dike xwedîyê haceta baş (k).

2.9.1.8. Bêxêrca laye, nameyê ko, ro û çeman nerî yê.

(Ji xeynê newala, navê çîya, robar û çeman nêr in).

Zazakî

Laya Hêrsinî.

Kurmancî

Newala Hêrsînê

Royê Dîjle.

Royê Zê.

Koyê Cûdî.

Çemê Dîjle.

Çemê(robarê) Zê.

Çîyayê Cûdî.

2.9.1.9. Zazakî de nameyê tayê cismandê atmosferî û hereketê ênan nerî yê û yê tayine zî makî yê.

(Di zazakî de navên hinek cismên atmosferîk û hereketên wan nêr in û yê hinekan jî mê ne).

Zazakî

asmên :Asmêno hewt qat.

astare : Astoreyo çilek.

hewr : Hewro sîya.

serd : Serdê Sibate.

va : Vayo kurr.

şilope : Şilopeyê wesarî.

virso : Virsoyî da piro.

şewe : Şewa tarî.

vewre : Vewra zimistanî.

torge : Torga wisarî.

Kurmancî

asîman: Asîmanê heft qat.

stêrk : Stêrkê çilek.

ewr : Ewrê reş

serma : Sermayê Sibatê.

ba : Bayê kurr.

şilope : Şilopeyê adarê.

birûsk : Birûskê lê da.

şev : Şeva tarî.

berf : berfa zivistanê.

teyrok : Teyroka biharê.

2.9.2. Nameyê makî

Hem zazakî û hem jî kurmancî de, heme nameyî yan makî û yan zî nerî yî. Nameyê makî bi yew sîfetîya bêre vatiş, herfa /a/ yena peynîda ênan.

(Navên mak: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de, hemû nav yan mak û yan jî nêr in. Navên mak bi tevî sîfetekî bêne gotin, herfa /a/ tê dawîya wan.)

2.9.2.1. Nameyê xûsusî yê hemin cinîyan makî yê.

(Navê taybet ên hemû jinan mê ne)

Zazakî

Gule : Gula dedkeyna.

Xane : Xana girde.

Berîvane : Berîvana derge.

Keje : Keja bêkese.

Delale : Delala dewe.

Eyşane : Eyşana Elî.

Kurmancî

Gul : Gula dotmam.

Xana : Xanêya mezin.

Berîvan: Berîvana dirêj.

Kejê : Keja bêkes.

Delal : Delala gumd.

Eyşan : Eyşana Elî.

2.9.2.2. Nameyê xûsusî yê hemin heywanandê makîyan.

(Navên taybetî yên hemû heywanên mê (mak).

Zazakî

bize

makere

mayîne

mêşna

dêlike

dêleverge

Kurmancî

bizin

maker

mehîn

mêşin

dêlik

dêlegur

2.9.2.3. Zazakî de nameyê hemin mewsîman nerî yî û kurmancî de zî makî yî. Zazakî û kurmancî de aşma Çele (Çile) ra teber, nameyê hemin aşman (mengan) zî makî yî.

(Di zazakî de navên hemû mewsîman nêr û di kurmancî de jî mak in. Herweha di zazakî û kurmancî de ji xeynî meha Çileyê, navên hemû mehan jî mak in).

Zazakî

Wesar

Kurmancî

Bihar

Hamnan (Amnan)

Havîn

Payîz

Payîz

Zimistan

Zivistan

Wesaro parên varan nêvara.

Bihara par baran nebarî.

Hamnano emsarên germ o.

Havîna îsal germ e.

Payîzo pêrarên zaf serd bî.

Payîza pêrar gelek serma bû.

Zimistano tewr serd pitirpar bî.

Zivistana tewr serma pitirpar bû.

Çileyo Peyên

Çile (1.)

Sibate

Sibat (2.)

Adare

Adar (3.)

Nîsane

Nîsan (4.)

Gulane

Gulan (5.)

Hezîrane

Hezîran (6.)

Temmuze

Tîrmeh (7.)

Tebaxe

Tebax (8.)

Êlule

Îlon (9.)

Çileyo Verên

Çirîya Pêşîn (10.)

Teşrîne

Teşrîn (11.)

Kanûne

Kanûn (12.)

Çileyo parên zaf serd bî.

Çileyê sala par zaf serma bû.

Gulana emsarî rew veyarte.

Gulana îsalê zû derbas bû.

2.9.2.4. Nameyê hemin mêwe û fêkiyan makî yî.

(Navên hemû mêwe û fêkiyan mak in).

Zazakî

Kurmancî

Engure: Engura şerabî.

tirî : Tirîya şerabî.

saye : Saya sûre.

sêv : Sêva sor.

miroye : Miroya zimistanî.

hirmê : Hirmêya zivistanî.

zeytune: Zeytuna sîyaye.

zeytun : Zeytuna reş.

xox : Xoxa girde.

xox : Xoxa gewre.

tûye : Tûya bêdendike.

tû : Tûya bêdendik.

2.9.2.5. Tayn nameyê cayandê ronîştene û starebîyene makî yî:

(Hinek navê cîyên rûniştin û starebûnê mak in):

Zazakî

Kurmancî

kome

kepir

mereke

kađîn

heyate

eywan

şikefte, zage

şikeft

nawise

nawis

dike

dik

2.9.2.6. Nameyê tayê aletandê mûzîkî makî yî.

(Navê hinek aletên mûzîkê mak (mê) ne).

Zazakî

Kurmancî

lûlîye : Lûlîya Mişoyî.

bilûl : Bilûla Mişo.

defe : Defa Derwêşan.

def : Defa Derwêşan.

tûtike : Tûtika Gêlijan.

tûtik : Tûtika Gêlîyan.

zirna : Zirna Zilfoyê aşîkî.

zirna : Zirna Zilfoyê Aşîq.

2.9.2.7. Bêxêca çend nameyan, nameyê hemin wesîteyan makî yî.

(Xeynî çend navan, navên hemû wesîteyan mak in).

Mîsal: Temafil, teyara, trêna, gemî, kelek, vapur, tramvay, ...

2.9.2.7. Mesdarê ke cayê nameyan de yenê xebitnayîş pêro makî yê.

(Mesderên ku di ciyê navan de têne xebitandin hemû mak in).

Zazakî

merdene : Merdena kaloyî.

werdene : Werdena şamî.

remayene : Remayena arwêşî.

dayene : Dayena Homayî.

şiyayene : Şiyayena kesa.

Kurmancî

mirin : Mirina kalo

xwarin : Xwarina şîvê.

revîn : Revîna kergu.

dayin : Dayina Xwedê.

çûyin : Çûyina kusî.

2.9.2.9. Zazakî de nameyê ke bi peyçidara(suffîksî) /-ey/ yan zî /-îye/ û yê kurmancî de zî bi /-î/ virazîyenê, pêro makî yê.

(Di zazakî de navên ku bi qertafa /-eye/ yan jî /-îye/ û di kurmancî de jî bi /-î/ diqedin hemû mak in).

Zazakî

rind/ rindey/ rindîye

xoser/ xoserey/ xoserîye

hembaz/ hambazey/ hambazîye

azad/ azadey/ azadîye

ciwanmêrdey/ ciwanmêrdîye

Kurmancî

rind/ rindî

xweser/ xweserî

heval/ hevalî

azad/ azadî

ciwanmêrd/ ciwanmêrdî

2.10. Îzafeya nameyan

Nameyî goreyê yewhûmarî û pirhûmarîya xo, nêrî û makî bîyayena xo, bi yew sîfet yan zî yew nameyî ya bîyayena xo, îzafe gênê.

(**Tewardina/raveya navan:** Nav li gorî yekhejmarî û pirhejmarîya xwe, nêr û mak bûyina xwe, bi tevî rengdêrek yan jî navekî ve bûyina xwe, tête tewandin).

2.10.1. Nameyo temambîyaye pirhûmar bo:

Nameyo temambîyaye pirhûmar bo, zazakî de peynîya ey de peyçidara /-ê/ û kurmancî de zî /ên/ yena. Ke nameyo temambîyaye û temamkerdox pêwa (pîya) zafhûmar bibê, peynîya nameyê temabîyayî de /-ê/ û temamkerdoxî de zî /-an/ yenê. Kurmancî de zî /-ên/ û /-an/ yenê.

(Navê tewandî pirhejmar be: Navê ku îzafê girtîye pirhejmar be, di zazakî de de qertafa /-ê/ tê dawiyî û di kurmancî de jî /ên/ tê dawiyê. Ku navê îzafê bûyî (temambûyî) û temamker pêve pirhejmar bin, di zazakî de li dawîya navê temambûyî /ê/ û yê temamker /-an/ tê. Di kurmancî de jî /-ên/ û /-an/ tên).

Zazakî

Domanê Şêrgoyî.

Kûçeyê Mêrdînî.

Dîyalektê zîwanê kurdî.

Şewê zimistanî.

Dewê koyan.

Şeharê kurdan.

Qelemê şagirtan.

Kurmancî

Zarokên Şêrgo.

Kûçeyên Mêrdînê.

Dîyalektên zîmanê kurdî.

Şevên zivistanê.

Gundên çîyayan.

Bajarên kurdan.

Qelemên şagirtan.

2.10.1.1. Temambîyena nameyan bi yew sîfeti ya

(Îzafeya/raveka navekî bi rengdêrekî/hevalnavekî re)

Zazakî

Hestoro (estoro) kehêl.

Kurmancî

Hespê kehêl.

Nano wişk.

Gošto teze.

Koyo berz.

Keyna rinde.

Şewa tarî.

Awa germe.

Dara hêşîne.

Kerga qelewe.

Nanê hişk.

Goştê teze.

Çiyayê Bilind.

Qîzika delal.

Şeva tarî.

Ava germ.

Dara hêşîn.

Mirîşka qelew

2.10.1.2. Temambîyena di nameyan

(Îzafeya navekî bi navekî dî re)

Zazakî

Nanê tenûre.

Koyê Nemrudî.

Goştê golikan.

Lajê Bedirxan Begî.

Mûyê bizan.

Keyna Gurgînî.

Şewa wesarî.

Awa heynî.

Kerga Pîre.

Raya dewe.

Kurmancî

Nanê tenûrê.

Çiyayê Nemrudê.

Goştê golikan.

Kurê Bedirxan Begê.

Mûyê bizinan.

Qîza Gurgîn.

Şeva adarê.

Ava kanî.

Mirîşka Pîrê.

Rêya gund.

2.10.1.3. Temambîyena nameyan bi yew zemîrî ya

(Îzafeya navan bi cînavekî re)

Zazakî

Hestorê(estorê) mi.

Kurmancî

Hespê min.

Nanê to.	Nanê te.
Goştê şima.	Goştê we.
Koyê ma.	Çîyayê me.
Lajê ênan(înan).	Kurê wan.
Keyna mi.	Qîza min.
Şewa to	Şeva te.
Awa ey/ayê.	Awa wî/wê.
Dara ma.	Dara me.
Kerga şima.	Mirîşka we.

2.10.2. Pirhûmareya nameyandê nêrî û makî

Zazakî de seba dîyarkerdişê pirhumareya nameyê temambîyaye yê nêrî û makî peycidarê /-ê/ û /-yê/, kurmancî de zî seba hûrdî cinsan peycidara /-ên/ yenê nûstene.

(Pirhejmarîya navên nêr û mak: Di dimilî(zazakî) de ji bo dîyarkirina pirhejmarîya navên nêr û mak temambîyî qertafên /-ê/ û /-yê/, di kurmancî de jî qertafa /-ên/ tê dawîya navan).

2.10.2.1. Temambîyena nameyêk pirhûmarî bi yew sîfetî ya

(Îzafeya navanekî pirhejmar bi rengdêrekî re)

Zazakî	Kurmancî
Keyneyê rindî.	Qîzên delal.
Şewê dergî.	Şevên dirêj.
Nanê giloverî.	Nanên gilover.
Rojê weşî.	Rojên xweş.
Domanê jêhatî.	Zarokên jêhatî.
Darê girdî.	Darên mezin (gewre).
Şiwaneyê ceribnayê.	Şivanên ceribandî.

2.10.2.2. Temambîyena di nameyan

(Îzafeya du navan)

Zazakî

Keyneyê Qencoyî.

Şewê zimistanî.

Nanê roşanî.

Rojê hamnanî.

Domanê xalcinî.

Darê gozêrî.

Kurmancî

Qîzên Qenco.

Şevên zivistanê.

Nanên cejnê.

Rojên havînê.

Zarokên jinxalê (xalojinê).

Darên gûzê.

2.10.2.3. Temambîyena nameyan bi yew zemîrî ya

(Îzafeya navan bi cînavekî re)

Zazakî

Keyneyê mi.

Şewê to.

Nanê yê/ya.

Rojê ma.

Domanê şima.

Darê ênan.

Kurmancî

Qîzên min.

Şevên te.

Nanên wî/wê.

Rojên me.

Zarokên we.

Darên wan.

2.11. Halê Nameyan

Cumle mîyan de nameyî, her wext xoser û halê sade de nîyê, gama ke bi vateyandê bînana (name, sîfet, kar) bêrê vatiş, tayê peycidarî pêwa benê. Her cidara ke bêro pey nameyan, yew halê ênan nîşan kena.

(**Halê Navan:** Di nav hevokê de nav, her wext xweser û di halê sade de nîn in, dema ku digel peyvên din(nav, rengdêr, lêker) bêne gotin hinek qertaf pêve têne nivisîn. Her qertafa ku were dawîya navan, halekî wî nîşan dike).

2.11.1. Antişê (tewênayişê) nameyan halo dîyarkerde de

Hem zazakî û hem zî kurmancî de goreyê halê naman (hûmar û cins) cidarê ênan bedêlyenê. Peycidarî yewhûmareya nêrî û makîyê ciya yî, pîrhûmareya wûrdî cinsan zî seycê yî.

(Tewandina navan di halê dîyarkirî de: Hem di zazakî û hem zî kurmancî de li gor zayend û jimara navan qertafên wan jî diguhêrin. Qertafên nêrîtî û makê-tîyê cihê ne, yê pirhejmarîya herdu cinsan jî wekhev in).

2.11.2. Halê xweser ê naman yan zî halê rast ê naman

Cinsê ênan çi beno wa bibo, nameyî halê xoser yan zî halê kerdoxeye de peycidar nêgênê.

(Halê serbixwe yê navan yan jî halê rast ê navan: Cinsê wan çi dibe bila bibe, nav di halê xweserî yan jî kirdarîyê de qertaf nagrin).

2.11.3. Nameyê yewhûmar ê nêrî

(Navên yekhejmar ên nêr)

Zazakî

Dîk waneno.

Ko berz o.

Hestor ame.

Roj akewt.

Mêrdim rakûweno.

Kurmancî

Dîk dixwîne.

Çiya bilind e.

Hesp hat.

Roj hilhat.

Mirov radikeve.

Ga cite keno.
Azad bermeno.

Ga cot dike.
Azad digrî.

2.11.4. Nameyê yewhûmar ê makî

(Navên yekhejmar ên mê/mak)

Zazakî

Marî wanena.
Şew tarî ya.
Manga şit dana.
Mayîn vazdana.
Datkeyna wîyena.
Aşme berz bîya.

Kurmancî

Marî dixwîne.
Şev tarî ye.
Manga şîr dide.
Mehîn dibeze.
Dotmam dikene
Hîv bilind bûye.

2.11.5. Pirhûmarîya her di cinsan

Wexto ke zazakî de pirhumareya nameyan yena dîyarkerdiş, hem name û hem zî fiil peycidar gêno. Labelê kurmancî de tena fiilî peycidaran gênê.

(Pirhejmarîya herdû cinsan: Wexta ku di zazakî de pirhejmarîya navan tête dîyarkirin, hem nav û hem jî lêker qertaf digrin. Lêbelê di kurmancî de tenê lêker qertaf digrin).

Zazakî

Dîkî wanenê.
Mêrdimî remenê.
Dadkeyneyî wîyenê.
Datîzayî ameyê
Hestorî vazdenê.
Dewî veşenê.
Kûtîkî lawenê.

Kurmancî

Dîk dixwînin.
Mirov direvin.
Dotmam dikenin.
Pismam hatin.
Hesp dibezin.
Gund dişewitin.
Kûçik diewtin.

2.11.6. Halê îzafeyê nameyan

(Halê îzafeyê navan)

2.11.6.1. Ke name yewhûmar û nêrî bo:

Nê halê nameyan, hem zazakî de û hem zî kurmancî de peyçidara /-î, -yî/ gêno.

(Ku nav yekhejmar û nêr be: Ev halê navan, hem di zazakî û hem jî kurmancî de qertafa /-î, -yî/ digrin).

Zazakî

Ez lajî vînena.

Ez koyî vînena.

Ez Gurgînî musnena.

Ma royî vêrenê.

Kurmancî

Ez lawî dibînim.

Ez çîyayî dibînim.

Ez Gurgînî fêr dikim.

Em çemî derbas dibin.

2.11.6.2. Ke name yewhûmar û makî bo:

Nê halê nameyan, hem zazakî de û hem zî kurmancî de peyçidara /-ê/ gêno.

(Ku nav yekhejmar û mê/mak be: Di vî halî de nav, hem di zazakî û hem jî kurmancî de qertafa /-ê/ digre).

Zazakî

Ez keyneke vînena.

Ez deşte vînena.

Ez dare vînena.

Ma keyneke dî.

Kurmancî

Ez keçikê dibînim.

Ez deştê dibînim.

Ez darê dibînim.

Me keçikê dî.

2.11.6.3. Pirhûmarîya her di cinsan: Hem zazakî û hem zî kurmancî de peyçidara /-an/ gêne.

(Pirhejmariya her du zayendan: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de qertafa /-an/ digrin).

Zazakî

Şima hestoran çerênenê.
Ez mêrdiman ra hes kena.
Ez koyan vîna.
Ma mayînan xar danê.
Ma domanan musnenê.

Kurmancî

Hun hespan diçêrînin.
Ez ji mirovan hes dikim.
Ez çîyayan dibînim.
Em mehînan didin xarê.
Em zarokan hîn dikim.

Tayê çekuyê zî estî ke eslê xo de bi /an/a qedyenê, ewca de /an/ pey-
cidara pirhûmarîye nîya.

(Hinek peyv jî hene ku di eslê xwe de bi /-an/ê dawî tên, /-an/a dawîya ev cure
peyvnan nayê wateya qertafa pirhejmariyê).

Zazakî

varan
garan
diran
rewan
rewan
xopan
wêran

Kurmancî

baran
garan
diran
rewan
rewan
xopan
wêran

Vêşaneya nameyê ca û eşîran bi /an/a qedîyenê. Nê bêj naman mîyan
de nameyê cayan nêtwîyenê, tena nameyê eşîran tewîyenê.

(Piranîya navê cî û eşîran jî bi /an/ê diqedin. Di nav van cure navan de navên
cîyan natewin, tenê navên eşîran ditewin).

Zazakî

Ma nişênê vajê:
“Ez Botanî ra yeno(a).”
Vatişo raşt ê na cumle:

Kurmancî

Em nikarin bibêjin;
“Ez ji Botanê têm.”
Rast gotina vê hevokê:

“Ez Botan ra yeno(a).”

“Ez ji Botan tēm.”

2.11.7. Antişê (îzafeyê) nameyan halo nedîyarkerde

Nameyê ke terafê wendox û goşdarîkrdoxî ra halê ênan bi tamamî nîno zanayîş, ênan ra vajyeno nameyê nedîyarî. Zazakî de nadîyareya naman, hem bi peycidarandê /-êk/ û /-ên/ û hem zî ke kelîma /yew-jew/ bêro vernîya ênan; kurmancî de zî peycidarê /-ek/ û /-êk/ bêrê peynîya naman û çekuyê /yek-êk/ bêrê vernîya naman, halê nadîyariya ênan virazyenê.

(Tewandina navan di halê nedîyarkirî de: Navên ku ji aliyê xwendakar û guhdaran ve halê wan bi tamamî nayin zanîn, ji wan re dibêjin navên nedîyar. Di zazakî de nedîyarîya navan, hem bi qertafa dawî ya /-êk/ û /-ên/, hem jî ku peyva /yew-jew/ were pêşiya wan; di kurmancî de jî qertafên dawîn ên /-ek/ û /-êk/ û heman demî jî peyva /yek/ were pêşiya navan, halê nedîyarkirî yê wan çêdibe).

Zazakî

Kurmancî

“Rojê rojan di dewên di ...” Rojek ji rojan di gundekî de...

“Rwecî rweca dewêkî de ...” Rojek ji rojan di gundêkî de ...

Yew laj û yew keyna seyeye bîyê. Yek lawik û yek keçika sêwî hebûn.

Wexto ke name halê kerdoxî de bo:

(Dema ku nav di halê kirdar de be):

2.11.7.1. Wexto ke kerdox nêrî û yewhûmar bo:

Zazakî de cidarê nedîyar ê yewhûmerîya nameyan, goreyê mintiqe û şêweyan pê bedêlyenê. Wexto ke /yew-jew(z), yek/ bêro vernîda naman yan zî peycidara /-êk/-êko/ û /êd-êdo/ bêro peynîda naman halê nedîyar ê namandê yewhûmarîye virazyeno. Kurmancî de zî hem bi çekûya /yek/ û hem zî bi peycidara /-ek/-êk/ halê nedîyar ê naman virazyeno.

(Dema ku kirde nêr û yekhejmar be: Di zazakî de qertafên nedîyarî yê yekhej-mariya navan, li gor mintiqe û şêweyan diguherin. Wexta ku /yew-jew/ were pêşîya navan yan jî qertafa /-êk, -êko/ û “êd-êdo” werin paşîya navan, halê nedîyar ê navên yekhejmar çêdibe. Di kurmancî de jî, hem bi peyva “yek” û hem jî bi qertafa /-ek, -êk/ halê nedîyarî yê navan çêdibe).

Zazakî	Kurmancî
mêrdimêko/mêrdimêdo	mirovek
hestorêko/hestorêdo	hepsek
lajêko/lajêdo	lawek
Yew koyêko/koyêdo berz û bel.	Yek çîyakî bilind û bel.
Gayêko gird.	Gayekî mezin.
Yew şiwane (şiwaneyêko)	Yek şivan (şivanek)
Yew mêrdimo hol./Mêrdimêdo hol.	Yek merivê baş.
Rojêko xirab.	Rojeke xirab.
Peyayêko şidênaye.	Peyayêk şidandî.
Koyêdo berz.	Çîyayekî bilind.

2.11.7.2. Wexto ke kerdox makî û yewhûmar bo

Zazakî de peycidara halê yewhûmar ê namandê makî /-êk/, /-êka/, /-êda/ û çekûya /yew/ a. Kurmancî de zî sey namandê nerîyan, ê makî zî bi peycidara /-ek/ û çekûya /yew/ virazyenê.

(Dema ku kirde mak û yekhejmar be: Di zazakî de qertafa halê yekhejmar ê navên mak, /-êk/, /-êka/, /-êda/ û peyva /yew/jew/ e. Di kurmancî de jî wek navên nêr, yên mê/mak zî bi qertafa /-ek/ û peyva /yek/ çêdibe).

Zazakî	Kurmancî
Dewêka/ Dewêda girde.	Gundek/ Gundekî mezin.
Keynayêka/ Keynayêda rinde.	Keçikek/ Keçikeke rind.
Şewêka/şewêda tarî.	Şeveke tarî.

Qelemêka/Qelemêda tûje.

Qelemeke tûj.

Darêka/darêda kevnare.

Dareke kevnar.

Yew mayîne.

Yek mehîn.

2.11.7.3. Semedê pirhûmarîya her di cinsan

Zazakî de pirhûmarîya her di cinsan, bi peycidara /-êdê/, çekûya /tayê/ û /qatî/ virazyenê. Nê bêj vateyî bi yew sîfetiya bêrê tamamkerdiş, sîfet bi xo zî peycidara /î/ ya pirhûmariye gêno. Kurmancî de zî bi peycidara /-ina/, /-in/ û çekûya /hin-hinek/ virazyenê. Qisekerdoxê kurmancî, çekûya /hin-hinek/ pratîk de hîna vêşî xebitnenê, labelê peycidara /-in/ eserê klasîk ê kurmancî de zî ameya nûstiş. Ehmedê Xanî kitaba *Mem û Zîne* de vano: Mîrin hene, aqil in, ezîz in. Tayê şeweyê kurmancî yê ke cadê peycidara /-in/ de /-ina/ xebitnenê, labelê qisekerdiş de herfa /i/ kiwena û /-na/ manena. Mîsal: vatena /mirovina/, bena /mirovna/.

(Ji bo pirhejmarîya herdu cinsan: Di zazakî de pirhejmarîya herdu cinsan bi qertafa /-êdê/, peyva /tayê/ û /qatî/ çêdibe. Ev cure peyv bi sîfetekî re bêne tamamkirin, sîfet bi xwe jî qertafa /-î/ ya pirhejmarîyê digre. Di kurmancî de jî bi qertafa /-ina/, /-in/ û peyva /hin-hinek/ çêdibe. Axaftvanên kurmancî, di pratîkê de bêtir peyva /hin-hinek/ bikartînin, lêbelê qertafa /-in/ di berhemên klasîk ên kurdî de jî hatiye nivîsîn. Ehmedê Xanî di *Mem û Zîna* xwe de dibêje: Mîrin hene, aqil in, ezîz in. Hinek şeweyên kurmancî yên ku di ciyê qertafa /-in/ de /-ina/ bikartînin, di axaftinê de jî tîpa bideng dadixin û dimîne /-na/: Mîsal: peyva “mirovina” dibe “mirovna”).

Zazakî

Kurmancî

Dewêdê girdî.

Gundine gewre.

Hestorêdê rewanî.

Hespine rewan.

Şewêdê tarî.

Şevine tarî.

Keyeyêdê renginî.

Xanîyine rengîn.

Merdimêdê zıwanşîrînî.

Mirovin zımanşîrîn.

Tayê merdimî./Qatî merdimî.

Hin mirov.

Mêrdimêdê hewlî bî.

Mirovin baş bûn.

Qatî şewî derg î û rojî kilm î.

Hinek şev dirêj in û roj kin in.

2.12. Halê vengdayena nameyan

(Halê dengdana navan)

2.12.1. Nameyê yewhûmar û nêrî

Hem zazakî û hem zî kurmancî de wexto ke xîtabê nê bêj nameyan beno, peycidara /-o/ yena peynîya ênan. Ke /lo/ bêro vernîya çekûye, ay zî eynî mana dana.

(Navên yekhejmar û nêrî: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de dema ku xîtabê van cure navan dibe, qertafa /-o/ tê dawîya wan. Ku /lo/ were pêşîya peyvê, ew jî eynî manayê dide).

Zazakî

Kurmancî

Dewijo!

Gundîyo!

Kalo!

Kalo!

Lajo!

Lawo!

Lo birawo!

Lo birawo!

Lo lajo!/ Lo lawo!

Lo lawo!

Lo Xorto!

Lo Xorto!

Mêrdimo!

Mirovo!

Paleyo!

Paleyo!

Xorto!

Xorto!

2.12.2. Nameyê yewhûmar û makî

Hem zazakî û hem zî kurmancî de wexto ke xîtabê nê bêj naman beno, peycidara /-ê/ yena peynîya ênan, yan zî /lê/ ya nîşanê nîda yena vernîya naman.

(Navên yekhejmar û mak: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de dema ku xîtabê van cure navan dibe, qertafa /-ê/ tê dawîya wan, yan jî /lê/ ya nîşanê nîda tê pêşîya navan).

Zazakî	Kurmancî
Dayikê!	Dayikê!
Wayê!	Xûşkê!
Dewijê!	Gundîyê!
Paleyê!	Paleyê!
Lê dayê!	Lê dayê!
Lê keynê!	Lê keçê!
Lê rindê!	Lê rindê!

2.12.3. Pirhûmarîya her di cinsan

Hem Zazakî û hem zî kurmancî de çekûya /gelî/ bêro vernîya namandê pirhûmaran, mana nîda û vengdayene dana ênan. Nê ra teber, ke zazakî de peyçidara /-êno/ û kurmancî de zî /-ino/ bêrê peynîya naman, mana pirhûmareya hûrdî cinsan danê.

(Pirhejmariya herdu cinsan: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de peyva /gelî/ were pêşîya navên pirhejmar, mana nîda û dengdanê dide wan. Ji xeynê vê, ku di zazakî de qertafa /-êno/ û kurmancî de jî /-ino/ were dawîya navan, mana pirhejmariya herdu cinsan dide).

Zazakî	Kurmancî
Gelî dewijan!	Gelî gundîyan!
Gelî hembazan!	Gelî hevalan!
Xortêno!	Xortino!
Mêrdimêno!	Mirovino!
Lajekêno!	Lamikino!
Wayêno!	Xwişkino!
Birayêno!	Birayino!

8.12.4. Ke vateyê sey /her/ û /heme/ zî bêrê vernîya naman, mana nedîyareye danê ênan.

(Ku peyvên wekî /her/ û /hemû/ werin pêşîya navan, mana nedîyarîyê didin wan.)

Zazakî

Her roj.

Her şew.

Heme mêrdimî

Heme dewî.

Heme hênî(eynî) peysayî.

Her vaş kokdê xo sero kiho beno.

Kurmancî

Her roj.

Her şev.

Hemû mirov.

Hemû gund.

Hemû kanî çikyane.

Her giya li ser koka xwe şîn dibe.

3. Sifet (Rengdêr)

Kelîmeyê(vateyê) ke wesfê bîyayenan yan zî nameyan û tayê xûsusi-yetê ênan; hal, reng, fesal, hûmar û rêzeyê ênan bi hawayêko aşkere dîyar kenê, ênan ra vajyeno sifet (çitewrok). Wexto ke nê bêj vateyî naman reyde bêrê nûstîş û ênan biwesifnê, benê sifet. Hem zazakî û hem zî kurmancî de tayê sifetê ke zaf yenê vatiş û xebitnayîş nê yî:

(Rengdêr/Xesîyetnav: Rengdêr ew peyv in, ku wesfê hebûnan yan jî navan û hinek xûsusi-yetên wan; hal, reng, dirûv(teşe), hejmar û rêzeyê wan bi awayek aşkere dîyar dîkin. Wexta ku ev cure peyv bi navan re werin nivîsandin û wan biwesifînin, dibin rengdêr. Hem di zazakî û hem jî kurmancî de hinek rengdêrên ku pir têne gotin û bikaranîn ev in):

Zazakî

asan

bed

berz

çend

çewt

derg

gemar

germ

Kurmancî

hêsan

bed

bilind

çend

çewt

dirêj

gemar

germ

gewr	gewr
gilover	gilover
giran	giran
gird	gir
hera, hîra	fire, fireh
hewl	baş
hûrdêk/wûrdêk	hûrek, piçûk
kemver	kêmbêr
kilm/kirr	kin
nizim	nizim
pak/ pank	pak
pehn	pehn
raşt	rast
rind	rind
roşn	ronî
serd	sar
sivik	sivik
sîya	reş
sûr	sor
şikte	şikestî
tarî	tarî
teng	teng
war, çewt	xwar
xirab	xirab
xoser	xweser
zerd	zer
Zazakî	Kurmancî
Rayiro teng.	Rêya teng.
Şewa tarî.	Şeva tarî.

Welato xoser.

Bazaro serbest.

Keyeyo pak.

Aqlo sivik baro giran o.

Dinya gilovere.

Şero gird.

Mêrdimo xirab.

Welatê serbixwe.

Bazara serbest.

Xaniyê pak.

Aqlê sivik barê giran e.

Dinya gilover.

Şerê mezin.

Mirovê xirab.

Sifetî goreyê wesifdê xo di texlît (bêj) î:

1- Sifetê wesifnayîşî,

2- Sifetê dîyarkerdişî.

(Rengdêr li gor wesfên xwe du texlît in:

1- Rengdêrên wesifandinê,

2- Rengdêrên dîyarkirinê).

3.1. Sifetê wesfî (senîniye)

Ay sifetê ke wesfê naman hetê reng, şekil û haldê ênan ra dîyar kenê, ênan ra vajyeno sifetê wesfan. Wexto ke yew name yan zî vate bi yew sifetîya wesifyeno, ewilî name û ci ra pey zî sifet nûsyeno.

(**Rengdêrên çawanîyê:** Ew rengdêr in, ku wesfê navan ji aliyê reng, şikil û halê wan ve dîyar dikin. Wexta ku navek yan jî peyvek bi rengdêrek bête wesifandin, pêşiyê nav û jê şûn de jî rengdêr tête nivîsîn).

Zazakî

Temaffla sûre.

Dêso zerd.

Kurmancî

Temaffla sor.

Dîwarê zer.

Keyeyo gird.	Mala mezin.
Rayîro derg.	Riya dirêj.
Kebero newe.	Derîyê nû.
Mêrdimê hewlî.	Merivên baş.
Keyna xaseke.	Qîza delal.
Şewa tarî û menga roşne.	Şeva tarî û meha rohnî.

3.2. Sifetê dîyarkerdene

Xo mîyan de çehar bêjê nê sifetan estî:

(Rengdêrên dîyarkirinê:

Di nav xwe de çar cûryê van rengdêran hene):

3.2.1. Sifetê nîşankerdene

Di bêjê nê sifetan estî; ayê ke çîyê nîzî nîşan kenê û ayê ke çîyê dûrî nîşan kenê.

(Rengdêrên îşarkî: Du cureyên van rengdêran hene; ew ên ku tiştên nêzîk nîşan didin û ew ên ku tiştên dûr nîşan didin).

3.2.1.1. Semedê tebayê nîzî:

Zazakî de, halê xoserî de semedê bîyayenanê yewhûmarê nêrî yê nîzî "no /eno ", makî "na/ena " û semedê pirhûmareya hûrdî cinsan zî vateyê "nê/enê " yenê xebitnayîş. Semedê halê oblîke yê ênan zî, vateyê "nê/enê", "na/ena" û "nê/enê" yenê xebitnayîş. Kurmancî de zî semedê haldê sade yê nîzî "ev" û halê anteyê eye "vî" û "vê", semedê halê sade yê dûrî "ew" û halê anteyê eye zî "wî" û "wê" yenê xebitnayîş. Semedê pirhûmareya ênan zî "van (nîzî)" û "wan (dûrî)" yenê xebitnayîş.

(Ji bo tiştê nêzîk: Di zazakî de, di halê xweser de ji bo hebûnên yekhejmar ên nêr û nêzîk “no/eno”, mak ên nêzîk peyvên “na/ena”, û ji bo pirhejmariya herdu cinsan jî peyvên “nê/enê” têne bikaranîn. Di kurmancî de, ji bo halê sade yê nêzîk “ev” û halê wî yê tewandî “vî” û “vê”, ji bo halê sade yê dûr “ew” û halê wî yê tewandî jî “wî” û “wê”, ji bo pirhejmariya herduyan jî “van (nêzîk)” û “wan (dûr)” têne bikaranîn).

Zazakî

No (eno): No (eno) lajek waneno.

Vî : Vî lawikî. (yh. n.)

Na (ena) : Na (ena) keyneke wîyena.

Vê : Vê keçikê. (yh. m.)

Nê (enê) : Nê (enê) domanî kay kenê.

Nê meymanî ra vaje.

Nê şagirtan vat.

Na keyneke werd.

Kurmancî

Ev : Ev lawik dixwîne.

Ev : Ev keçik dikene.

Ev : Ev zarok dileyzin. (ph.)

Van : Van zarokan.

Ji vî mêvanî re bêje.

Van şagirtan got.

Vê keçikê xwar.

3.2.1.2. Semedê çiyê/tebayê dûrî

Zazakî de, halê xo serî de semedê belîkerdişê tebayê nêrî yê dûrî “o”, tebayê makî yê dûrî “a” û pîrhûmareya hûrdî cinsan zî “ê” yenê vatiş. Semedê halê oblîke yê ênan zî “ê”, “a” û “ê” yenê xebitnayîş. Kurmancî de, semedê belîkerdişê tebayê dûrî yê nêrî û makî “ew” û halê eyê ante “wî (nêr)” û “wê (mak)”, pîrhûmareya ênan zî “wan” yeno xebitnayîş.

(Ji bo tiştên dûr: Di zazakî de ji bo belîkirina tiştên nêr ên dûr “o”, tiştê mak ên dûr “a” û pirhejmariya herduyan jî “ê” têne bikaranîn. Ji bo halê tewandî yê wan jî “ê”, “a” û “ê” têne bikaranîn. Di kurmancî de, ji bo belîkirina tiştên dûr ên nêr û mak “ew”, halê wan ê tewandî “wî (nêr)” û “wê (mak)”, pîrhejmariya herdu cinsan jî “wan” têtê bikaranîn).

Zazakî**Kurmancî**

o	: O mêrdek. Ê şagirtî ra vaje.	Ew	: Ew mêrik. (yh. n.) Wî : Ji wî şagirtî re bêje. (yh. n.)
a	: A cinêke yena. A (aya)cinêke ra vaje.	Ew	: Ew jinik tê. (yh. m.) Wê : Ji wê jinikê re bibêje. (yh. m.)
ê	: Ê domanan vat. Ê hembazan ra vaje.	Wan	: Wan zarokan got. (ph. herdu) : Ji wan hevalan re bêje.

Zazakî de wexto ke sifetê îşaretkerdene yê sey eno/no, ena/na, ayo/yo/o û aya/ya/a bêrê xebitnayîş, nameyî nişkenê peycidara zafhûmareye bigîrê. Ancax nameyê ke “enê/nê”, “ayê/ê”, “enînan”, “ênan/înan” ra pey bêrê eşkenê peycidara zafhûmareye bigîrê. Kurmancî de zî ayê nameyê ke “ev” û “ew” ra pey bêrê, eşkenê peycidara zafhûmeriye bigîrê. Semedê zafhûmareya hûrdî cinsan zî “van” û “wan” yenê xebitnayîş.

(Di zazakî de wexta ku rengdêrên îşarkî yên wekî eno/no, ena/na, ayo/o û aya/ya/a bêne bikaranîn, nav nikarin qertafa pirhejmariyê bigrin. Ancax navên ku piştî “enê/nê”, “ayê/ay/ê”, “enînan”, “ênan/înan” werin dikarin qertafa pirhejmariyê bigrin. Di kurmancî de jî ew navên ku piştî “ev” û “ew” werin, dikarin qertafa pirhejmariyê bigrin. Ji bo pirhejmariya herdu cinsan jî “van” û “wan” têne bikaranîn).

Zazakî**Kurmancî**

Na temafîle zaf kehan bîya.	Ev temafil pîrr kevn bûye.
No hêga yê bawkalandê ma wo (yo).	Ev zevî yê kalikên me ye.
Enê (nê) şinasîyê ma yê (nizdî).	Ev nasên me ne.
Ayê (ay) keynekî xasek î. (dûrî).	Ew keçik delal in.
Enî rojan hewa zaf germ o.	Van rojan hewa pîr germ e.
Ênan (înan) heme çiyê xo roto.	Wan her tiştê xwe firofîye.
Ênan ra dime yew nê ameyo.	Ji wan şûnde kes ne hatîye.

3.3. Sifetê hûmaran

Ke sifetê hûmaran xoser bibê, name yî, labelê ke nameyan reyde bêrê vatiş, benê sifet.

(**Rengdêrên hejmarîn:** Ku rengdêrên jimarîn li serbixwe bin, nav in, lêbelê ku bi tevî navan bêne gotin dibin rengdêr).

Zazakî

Yew ame keye.

(“yew” cayê nameyî de ameyo vatiş)

Yew merdim ame.

(“yew” cayê sifetî de ameyo vatiş)

Kurmancî

Yek hate malê.

(“Yek” di ciyê nav de hatiye bikaranîn)

Yek meriv hat.

(“Yek” di ciyê rengdêr de hatiye bikaranîn)

Ma eşkenê sifetê hûmaran zey ke cêr de ameyê dîyarkerdiş dabeş bikê:

(Em dikarin rengdêrên hejmarîn wekî li jêrê dabeş bikin):

3.3.1. Sifetê hûmarî yê “çend”:

Nê bêj sifetê hûmaran, yenê vernîda naman û çiqaseya bîyayena ênan dîyar kenê.

(Rengdêrên hejmarîn ên “çend”: Ev cureyên rengdêrên hejmarî, têne pêşiya navan û çiqasîya hebûna wan dîyar dikin).

Zazakî

Hîrê hembazî.

Des qelemî.

Vîst û hewt serrî.

Çaresy dewî.

Çewres km rayîr.

Pancas kg engûre.

Kurmancî

Sê heval.

Deh qelem.

Bîst û heft sal.

Çarsed gund.

Çil km rê.

Pêncî kg tirî.

3.3.2. Sifetê hûmarî yê rêzkî yan zî “çendin”e:

Nê bêj sifetî naman ra pey yenê nûstiş û zazakî de peyçidara “-in/-ine” gênê; kurmancî de zî goreyê mintiqeyê cîyayan peyçidaranê “-an” “-em” û “-emîn” gênê.

(Rengdêrên hejmarî yê rêzkî yan jî “çendan/çendemîn”: Ev cure rengdêr li pey navan têne nivisîn û di zazakî de qertafê “-in/-ine” digrin; di kurmancî de jî li gor herêmên cihê qertafên “-an” “-em” û “-emîn” digrin).

Zazakî

Kûçeya yewin (yewine).

Serra desin (desine).

Şewa vîst û yewin.

Qoro pancêsîn.

Rêzeyo çewres û heştin.

Qato hewtin.

Şewa şeşine.

Çewres û pancin.

Hezar û newsey û vîstin.

Na kitaba aya yewin a.

Kurmancî

Kûçeya yekemîn(an).

Sala dehan./Sala dehem./Sala dehemîn.

Şeva bîst û yekan.

Qorê panzdehan.

Rêzeyo çil û heştan.

Qata heftemîn.

Şeva şeşemîn.

Çil û pêncemîn.

Hezar û nehsed û bîstemîn.

Ev kitêba wê ya yekemîn e.

Tayê kelîmeyî estî ke hem “hete” nîşan kenê û hem zî cayê sifetandê hûmarîye gênê. Zazakî de nê bêj kelîmeyî bi zerfê cayana nusyenê û peyçidara “-ên” gênê; kurmancî de zî bi peyçidara “-în” viraziyenê.

(Hinek peyv hene ku hem “alî” nîşan dikin û hem jî ciyê rengdêrên hejmarî digrin. Di zazakî de ev cure peyv bi tevî hokerên ciyan têne nivisîn û qertafa “-ên” digrin; di kurmancî de jî bi qertafa “-în” çêdibin).

Zazakî

verên

peyên

Kurmancî

pêşîn

dawîn

mîyanên	navîn
corên	gorîn
cêrên	jêrîn

3.3.3. Sifetê parhûmarîye

Nê bêj sifetî, parbîyayena seycê ya tebyan nîşan kenê. Nê sifetî bi di hawayana yenê nûstene: a yewine, bi tekrarkerdişê humar û mîqdarê ênan; a didine zî, beyntarê hûrdî humaran de nustişê “bi” reyde beno.

(Rengdêrên parhejmarî: Ev rengdêr parvebûna wekhev a tiştan dîyar dîkin. Ev rengdêr bi du awayan têne nivîsandin: a yekem, bi tekrarkirina hejmar û mîqdarê wan; a duyem jî, di navbera herdu hejmaran de bi nivîsandina “bi” dibe).

Zazakî

çarsey bi çarsey
 çewres çewres
 des bi des
 hewt bi hewt
 hewt hewt
 hîrê bi hîrê
 hîrê hîrê
 newsey bi newsey
 vîst bi vîst
 vîst vîst
 yew bi yew
 yew yew
 bar bi bar
 Ta bi ta
 Ciwal bi ciwal
 Kod bi kod
 Wirdês bi wirdês

Kurmancî

çarsed bi çarsed
 çil çil
 deh bi deh
 heft bi heft
 heft heft
 sisê bi sisê
 sisê sisê
 nehse bi nehse
 bîst bi bîst
 bîst bîst
 yek bi yek
 yek yek
 bar bi bar (mîqdar)
 Ta bi ta (mîqdar)
 Çewal bi çewal (mîqdar)
 Kod bi kod (mîqdar)
 Kulm bi kulm (mîqdar)

3.3.4. Sifetê parhûmarî yê kesrî:

Nê bêj sifetî, birr û mîqdarê tûmîyek dîyar kenê.

(Rengdêrên parhejmarî yên kesrî: Ew rengdêr in, ku birr û mîqdarê tûmîyek dîyar dikin).

Zazakî

Yewê desî (1/10)

Des ra yew (1/10)

Çeharê çewresî (4/40)

Vîstê diseyî (20/200)

Yewê Çeharî /Çehar ra yew (1/4)

Di ra yew(nîme) (1/2)

Şeş ra çehar (4/6)

Şeşê tumî û des ra hîrê (6.3/10)

Kurmancî

Yekê dehê (1/10)

Ji dehan yek (1/10)

Çarê çilê(Ji çilî çar)(4/40)

Bîstê dusedî (20/200)

Ji çaran yek (çaryek) (1/4)

Ji didoyan yek(nîv) (1/2)

Ji şeşan çar (4/6)

Şeşê tumî û ji dehan sisê (6.3/10)

Zazakî de peycidara “-la” bêro peynîya humaran çiqaseye û qatê ay re-qame dîyar kena. Kurmancî de mana na peycidare, kelîmeyê zey “qat, qasî, car” dîyar kenê.

(Di zazakî de qertafa “-la” were dawîya hejmaran, çiqasî û qatê wê dîyar dike. Di kurmancî de mana vê qertafê, peyvên wekî “qat, qasî, car” dîyar dikin).

Zazakî

di/dila

hîrê/hîrêla

çehar/çeharla

şeş/şeşla

hewt/hewtla

new/newla

des/desla

Kurmancî

du/du qat(qasî)

sê/ sê qat

çar/çar qat

şeş/ şeş qat

heft/ heft qat

neh/ neh qat

deh/deh qat

vîst/vîstla

Rezê mi dilayê rezdê şima yo.

bîst/ bîst qat

Rezê min du qatê rezê we ye.

3.3.5. Sifetê hûmarî yê dîyarnêbîyayî

Nê bêj sifetî, humar û mîqdarê bîyayenan bi hawayêko sergirewte dîyar kenê û vernîya naman de yenê nûstîş.

(Rengdêrên hejmarî yê nedîyar: Ev cure rengdêr, hejmar û mîqdarê hebûnan bi awayekî sergirtî dîyar dikin û li pêşiya navan têne nivisandin).

Zazakî

To çend kitabî wendî?

Ay taynekî werd.

Mi hende mêrdimî pêhete nêdî yê.

Ewro pir/zaf germ o.

Ma pêro asnawe kenê.

Her bêj hengûre esta

Heme rengê tîje.

Kurmancî

Te çend pirtûk xwendîne?

Wê hindik xwar.

Min ewqas meriv bi hev ra nedîtine.

Evro pir germ e.

Em hemû avjenîyê dikin.

Her cure tirî heye.

Hemû rengên tîjê.

3.3.6. Sifetê perskerdişî

Nê sifetî, bi raya perskerdişî ya hal, ca, humar û sewbî xûsusetanê bîyayenan danê dîyar kerdene.

(Rengdêrên pirsyarkî: Ev rengdêr, bi rêya pirskirinê hal, cî, hejmar, mîqdar û hwd. xûsusetên hebûnan didin dîyarkirin).

Zazakî

çi

kam

kamcin

çi tewir

Kurmancî

çi

kî/kê

kîjan

çi tewir

çi bêj	çi cure
çito	çawa
çend	çend
kûra/kamca	kû der
senî	çawa
çiqas	çiqas
hêç	hêç

Kamcin roj roşanê Newroz o?	Kîjan roj cejna Newrozê ye?
Kam ame keyê şima?	Kî hat mala we?
Ti çend ray şîyê welat.	Tu çend caran çûyî welat.
Şima senî ameyê etiya?	Hun çawa hatin vira?
Ferzan sinifa çendin de waneno?	Ferzan di pola çendan de dixwîne?
Hêç yewekî nêwerd?	Hêç yekî nexwar?

3.4. Cinsiyetê sifetê ke fîlan (karan) ra virazîyenê û

sey sifetî yenê xebitnayene:

Zazakî de, goreyê nêrî û makîyêya naman, nê bêj sifetî zî benê nêrî û makî. Labelê kurmancî de ferqê nêrîyê û makîyê çinyo, hûrdî zî peyci-dara “-î” gêne.

(Cinsiyetê rengdêrên ku ji lêkeran çêdibin û wek rengdêr têne bikaranîn: Di zazakî de li gor nêrîyê û makîyêya navan ev cure rengdêr jî dibin nêr yan jî mak. Lêbelê di kurmancî de ferqa nêr û mak bûna wan nîne, herdu jî qertafa “-î” digrin).

Zazakî

Keyneka nîşankerda.

Cenêka rakewta.

Şamîya pewta.

Kurmancî

Qîzika nîşankirî.

Jinika raketî.

Şîva pijandî.

Rayîro peymawite.

Domano wende.

Hêgayo ramite.

Goşto sûrkerde.

Riya pîvandî.

Zarokê xwendayî.

Zevîya ajotî.

Goştê qelandî.

3.5. Sifetan de pêveronayîş (veracêkerdiş)

Nê bêj sifetî semedê pêveronayîşê di nameyan û di tebyan yenê xe-bitnayîş û goreyê halê ênan bedêlyenê.

(Di rengdêran de hevberkirin: Ev cure rengdêr ji bo muqayesekirina du navan û tiştan têne bikaranîn û li gor halê wan diguherin).

3.5.1. Pêveronayîşê çiyê ke pê manenê

Seba nîşankerdişê pêmendişeya di çîyan zazakî de vateyê “henda, sey, zey, se, ze, zê, jê”; kurmancî de zî vateyê “qasî, bi qasî, wek” yenê xe-bitnayîş.

(Hevberkirina tiştên ku dişibin hev: Di zazakî de ji bo nîşankirina du tiştên ku dişibin hev peyvên “henda, sey, zey, se, ze, zê, jê”; di kurmancî de jî peyvên “qasî, bi qasî, wek” têne bikaranîn).

Zazakî

Gurgîn henda mi nan weno.

Rewîn henda Gurgînî keweno ra.

Şevîne zî sey Rojîne azeb a.

Bira zî zey(zê) waya xo kilm o.

Keyna zî sey mara xo derg a.

Kurmancî

Gurgîn bi qasî min nan dixwe.

Rewîn bi qasî Gurgînî radikeve.

Şevîn jî wek Rojînê azeb e.

Bira jî wek xuşka xwe kin e.

Qîzik jî wek dayika xwe dirêj e.

3.5.2. Pêveronayîşeya ke bi peycidara “-êr” virazyena

Kurmancî de miqabilê peycidara “-êr” a zazakî, “-tir” yena peynîya kelîman.

(Berhevdanîya ku bi qertafa “-tir” çêdibe: Di kurmancî de li hemberê qertafa “-êr” a zazakî, qertafa “-tir” tê dawîya peyvê).

Zazakî	Kurmancî
gird/girdêr	mezin/mezintir
derg/dergêr	dirêj/dirêjtir
wîşk/wîşkêr	hişk/hişkîr
Roj aşme(menge) ra girdêr o.	Roj ji heyvê mezintir e.
Zelale Delal ra dergêr a.	Zelal ji Delalê dirêjtir e
No nan ayê bînî ra wîşkêr o.	Ev nan ji yê dî hişkîr e.
Tûyê hengûr ra şîrînêr î.	Tû ji tirîyê şîrîntir in.
Peme peşmî ra nermêr o.	Pemû ji hirîyê nermtir e.
Koyê Sîpanî koyê Hesarî ra berzêr o.	Çîyayê Sîpanê ji çîyayê Hesarê bilindtir e.
Asin kera ra giranêr o.	Hesin ji kevir girantir e.

Zazakî de peycidara “-êna” bêro peynîda qatî sifetandê nedîyaran, mana vêşîkerdişê mîqdarê ênan dana. Ke peycidara “-êna” bêro peynîda kelîmeyê ke wext nîşan kenê, bîyayena ênan seba wextêdo nedîyar derg kenê. Miqabilê “-êna” zazakî, kurmancî de “-ek” û “-ina” ya ke çekûya “hina” ra virazyayê yenê.

(Di zazakî de qertafa “-êna” were pey rengdêrên nedîyar, mana zêdekirina mîqdarê wan dide. Ku qertafa “-êna” were dawîya peyvên ku wext nîşan dikin, hebûna wan ji bo demeke nedîyar dirêj dike. Di kurmancî de li hemberê “-êna” zazakî, qertafa “-ek” û “-ina” ya ku ji peyva “hina” peyda bûye çêdibe).

Zazakî	Kurmancî
tay/tayêna	hin/ hina
xîç/xîçêna	xîçek/ xîçekina

wirdês/wirdêsêna	kûlm/ kûlmina
çap/çapêna	çap/ çapina
çeng/çengêna	çeng/çengina
kod/kodêna	kod/ kodina
şew/şewêna	şev/ şevina
roj/rojêna	roj/rojina
gam/gamêna	gave/ gavina
serre/serrêna	sal/ salina

3.6. Sifetê ke bi peycidara “-ên” a virazyenê

Sifetê ke bi na peycidare reyde virazyenê, hete û wextêdo belîkerde nîşan kenê.

(Rengdêrên ku bi qertafa “-în” têne çêkirin: Rengdêrên ku bi vê qertafê çêdibin, alî(ber) û wextêk belîkirî nîşan dikin.)

Zazakî

nika/nikayên
ewro/ewroyên
vizêr/vizêrên
perey/pereyên
emserr/emserên
par/parên
pêrar/pêrarên
êre/êreyên
cor/corên
cêr/cêrên
pey/peyên
ver/verên

Kurmancî

nûka/ nûkayîn
evro/evroyîn
do/doyîn
pêr/pêrîn
îsal/evsal/îsalîn
par/parîn
pêrar/pêrarîn
êvar/êvarîn
jor/jorîn
jêr/jêrîn
dawî/dawîn
pêş/pêşîn

3.7. Sifetan ra name viraştiş

Semedo ke yew sifet bibo name, zazakî de goreyê cayan peynîya sifetî de peyçidara /-ey, -îy/ û kurmancî de zî /-î/ yeno nûstiş.

(**Ji rengdêran nav çêkirin:** Ji bo ku rêngdêrek bibe nav, di zazakî de li dawîya rengdêr qertafa /-ey, -îy/ û di kurmancî de jî /-î/ tête nivîsîn).

Zazakî

rind/ rindey/ rindîy
xirab/ xirabey/ xirabîy
gird/ girdey/ girdîy
germ/ germey/ germîy
nizim/ nizmey/ nizmey
zerd/ zerdey
derg/ dergey
hera/ herayey
berz/ berzey
sivik/ sivikey
giran/ giraney
asan/ asaney
roşn/ roşney

Kurmancî

rind/rindî
xirab/xirabî
gird/girdî
germ/ germî
nizm/ nizmî
zer/ zerî
dirêj/ dirêjî
fire/ fireyî
bilind/ bilindî
sivik/ sivikî
giran/ giranî
hêsan/ hêsanî
rohnî/ rohnayî

3.8. Eke sifet cayê nameyan bigîro

Wexto ke sifetî wezîfeyê wesifdayen û belîkerdene nêkê, cayê naman bigîrê û abo gore kar bikê, wezîfeyê naman anê ca.

(**Ku rengdêr ciyê navan bigre:** Dema ku rengdêr wezîfeyê wesifandin û belîkirinê nekin, wek nav bêne bikaranîn, wezîfeyê navan tînin cî).

Zazakî

Yewêdo xwîyteng bîyo mamosteyê ma.
Yewêda bejinderge bîya mudirê banka.
Kino bîyo wayîrê keyî.

Kurmancî

Yekê xwîteng bûye mamosteyê me.
Yeka bejindirêj bûye mudirê bankê.
Kino bûye xwedîyê malê.

Raştîye vermedênê.
Qıcekê keyî des serre yo.
A Pîran de bîya mudir.

Rrastî bernedin.
Piçûkê malê deh salî ye.
Ew di Pîranê de bûye mudir.

3.9. Sifetê aîdiyêti

Sifetê ke aîdyetê tayê wesf û xûsuyetanê şexis û tebyan (çîyan) dîyar kenê, ênan ra vajyeno sifetê aîdyeteye. Nê bêj sifetî bi peycidarandê ciyawazan virazyenê:

(**Rengdêrên aîdiyêtiyê:** Rengdêrên ku aîdiyêtiya hinek wesf û taybetiyên şexisan û tiştan dîyar bikin, ji wan re dibêjin rengdêrên aîdiyêtiyê. Ev cure rengdêr bi qertafên ciyawaz çêdibin).

3.9.1. Sifetê ke zazakî de bi peycidara “-ij/-ic” ya virazyenê, kurmancî de bi peycidara “-î” virazyenê.

(Rengdêrên ku di zazakî de bi qertafa “-ij/-ic” tên çêkirin, di kurmancî de bi qertafa “-î” çêdibin).

Zazakî

dew/ dewic-dewij
sûk/ sukic-sûkij
şehar/ şeharic-şeharij
Pîran/ pîranic-pîranij
Xarpêt/xarpêtic/xarpêtij
Botîyan/ botîyanij
Kurdistan/ Kurdistanij(ic)
Amerîkan/Amerîkanij(ic)

Kurmancî

gund/ gundî
sûk/ sùkî
bajar/ bajarî
Pîran/ pîranî
Xarpêt/ xarpêtî
Botan/ botanî
Kurdista/ Kurdistanî
Amerîkan/Amerîkanî

3.9.2. Sifetê ke zazakî de bi peycidara “-ên” virazyenê, kurmancî de bi peycidara “-în” virazyenê.

(Rengdêrên ku di zazakî de bi qertafa “-ên” çêdibin, di kurmancî de bi qertafa “-în” çêdibin).

Zazakî

dar/ darên
 asin/ asinên
 zer/ zerên
 sêm/ sêmên
 hare/ harên

Kurmancî

dar/darîn
 hesin/hesinîn
 zêr/ zêrîn
 zîv/ zîvîn
 ax/ axîn

3.9.3. Tayê sifetê ke zazakî de bi peycidara “-wan” virazîyenê, kurmancî de zî bi peycidara “-van” virazyenê:

(Hinek rengdêrên ku di zazakî de bi qertafa “-wan” çêdibin, di kurmancî de bi qertafa “-van” çêdibin):

Zazakî

ga/ gawan
 naxir/ naxirwan
 golik/ golikwan
 ray /raywan/ rayan
 Seyid/ seyidwan

Kurmancî

ga/ gavan
 naxir/ naxirvan
 golik/ golikvan
 rê/ rêwî
 nêçîr/ nêçîrwan

3.9.4. Zazakî de bi peycidarandê “-ey, -yey, -aney”, sifetan ra sifetî virazyenê; kurmancî de zî bi peycidara “-î, -yî, -ayî(-anî)” virazyenê.

(Di zazakî de bi qertafên “-ey, -yey, -aney”, ji rengdêran rengdêr çêdibin; di kurmancî de jî bi qertafên “-î, -yî, -ayî/-anî” ev rengdêr çêdibin).

Zazakî

hera/ herayey
 berz/ berzey/ berzaney
 teng/ tengey/ tenganey
 derg/ dergey/ derganey
 nizim/ nizimey/nizmaney

Kurmancî

fire/ fireyî
 bilind/ bilindî/ bilindayî
 teng/ tengî/ tenganî
 dirêj/ dirêjî/ dirêjayî
 nizim/ nizmî/ nizmayî

4. Zemîr (Cînavk)

Vateyê ke miweqet cayê naman gênê û sey ênan guryenê, tira vajyeno zemîr (pronav). Zemîrî qandê ke wezîfeyê naman vînenê, ay cidarê (hal, aîdyet, ...) ke bi naman pêwa nûsyenê, yenê peynîya zemîran zî. Goreyê vate û manaya xo zemîrî cîya-ciyayî estî:

(Cînavk/pronav: Bêjeyên ku miweqet ciyê navan bigirin û wekî wan bêne bikaranîn, ji wan re dibêjn cînavk. Ji ber ku cînavk wezîfeya navan dibînin, ew qertafên (hal, aîdyet, ...) ku têna dawîya navan, têne dawîya cînavkan jî.

Li gor gotar û wateya xwe cînavkên cûda hene):

4.1. Zemîrê kesî (şexisî)

Vateyê ke cayê kerdox û vatoxî de bêrê xebitnayîş ênan ra vajyeno zemîrê kesan. Hem zazakî û hem zî kurmancî de, di grubê zemîrê kesan estî; wûrdî grûban de zî hîrê teneyî yewhûmar û hîriyê bînî zî pirrhumar (zafhumar) î.

(Cînavkên kesan: Bêjeyên ku di ciyê kirdar û gotar de bêne bikaranîn ji wan re dibêjin cînavkên kesan. Hem di dimilî û hem jî kurmancî de, du grubên cînavkên kesan hene; di herdu grûban de jî, sisê ji wan yekhejmar û sisê jî pirhejmar in).

4.1.1. Ke zemîrê kesî halê kerdoxî de bibê yan zî grûba yewina zemîran:

(Ku zemîrê kesan di halê kirdar de be yan jî grûba yekemîn a zemîran):

Zazakî	Kurmancî	
ez	ez	n. û m. yh.
ti ¹	tu	n. û m. yh.
o (we, yo, wo ²) n. yh.	ew	n. û m. yh..
a (ay) m. yh.	ew	
ma	em	n. û m. ph.
şima	hûn	n. û m. ph.
în (ên, ê, yê)	ew	n. û m. ph.

4.1.2. Ke zemîrê kesî halê temamkerî de bibê yan zî grûba diyina zemîran:

(Ku cînavkên kesan di halê kirdar de bin yan jî grûba duyemîn a cînavkan):

Zazakî	Kurmancî	
mi	min	n.û m. yh.
to (tû)	te	n.û m. yh.
ey (yê, jê) ³	wî	n.û m. yh.
aye (ya, ja) ⁴	wê	m. yh.
ma	me	n. û m. ph.
şima ⁵	we	n. û m. ph.
înan (ênan, aynan) ⁶	wan (ewan)	n. û m. ph.

Tayê xûsusiyetê zemîrê kesan:

(Hinek xûsusiyetên cînavkên kesan):

4.1.2.1. Grûba yewin a zemîran: - heme demê karê bîyayene pê yenê antiş; - heme demê karandê nêvêrdeyan (intransitif) yenê antiş; - û

demo nika û demo bêro yê karandê vêrdayan yenê antiş; - çendek zemîrê na grube pêwa şênê bibê kerdoxê karêk.

(Grûba yekemîn a cînavkan:

- hemû demên lêkera bûn pê têne kêşandin;
- hemû demên lêkerên negerguhêz (têneper) tên kêşandin;
- dema nûka û dema dahatûya lêkerên gerguhêz (têper) têne kêşandin;
- çendek cînavkên kesan bi hev re dikarin bibin kirdarê (kirdeyê) lêkerêk).

Zazakî

Ez, ti û o ameyê.

Ez, ti û Rewîn ameyê.

Ez û ti zimistanî nêweş kewtî.

O do şewra bêro.

A par şiya dewe.

Kurmancî

Ez, tu û ew hatin.

Ez, ti û Rewîn hatin.

Ez û tu zivistanê nexweş ketin.

Ew dê serê sibê were.

Ew par çûye gund.

4.1.2.2. Bi grûba didin a zemîrana, demê mazî yê pêrin fîilandê vêrdayan (transitif) yenê antiş.

(Bi grûba duyemîn a cînavkan re, demên rabirdû yên hemû lêkerên gerguhêz têne kêşandin).

Zazakî

Mi o sûke de dî.

Ey lingê dîkî tawe de dîyê.

To ciwên da vay.

Mi şamî werde.

Kurmancî

Min ew di sûkê de dît.

Wî lingê dîk di taweyê de dîtine.

Te bênder da bayê.

Min şîv xwar.

4.1.2.3. Goreyê cayanê ciyayan û bêxêca tayê îstisnayan, eger yew cumle de kerdox (fail, subje) zemîrêko grûba yewin bo, meful zemîrêko grûba didin o; eger meful zemîrêko grûba didin bo, kerdox zemîrêko grûba yewin o.

(Li gor ciyên cûda û ji xeynê hinek îstisnayan, eger di hevokê de kirdar (faîl) cînavkek grûba yekem be, mefûl (subje) cînavkekî grûba duyem e; eger meful cînavkek grûba duyem be, kirdar cînavkekî grûba yekem e).

Zazakî

Doman awe şimeno

(O aye şimeno.)

Dewijî firêze veşnenê.

(Ên (ê) ey veşnenê.)

Ferzanî engûre werde.

(Yê a werde.)

Domanan mamuse zîyaret kerd. Zarokan mamoste zîyaret kir.

(Ênan ey zîyaret kerd)

Kurmancî

Zarok avê vedixwe

(Ew wê vedixwe)

Gundî pirêze dişewitînin.

(Ew wê dişewitînin)

Ferzan tirî xwar.

(Wî ew xwar.)

(Wan ew zîyaret kir.)

4.2. Zemîrê nîşankerdene (îşaretkerdene)

Nê bêj (texlît) zemîrî cayê çîyan, dûr û nêzdîyêya ênan bi îşaretkerdene dîyar kenê. Hem kurmancî û hem zî zazakî de, di grubê (komê) zemîrê nîşandayene estî.

(**Cînavkên nîşankirinê (îşarkî)**: Ev cure cînavk ciyê tiştan, dûr û nêzîkayîya wan bi îşaretkirinê dîyar dikin. Hem di kurmancî û hem jî di zazakî de, du grubên (komên) cînavkên nîşandanê hene).

4.2.1. Grûba yewin

Kurmancî de seba îşaretkerdişê çîyê(tebayê) nîzdî û yewhûmar ê nêrî û makî /ev/, çîyê yewhûmar ê dûrî /ew/ û seba pirhumarîya nîzdî /van/ û yê dûrî zî /wan/ yeno gurênayîş(xebitnayîş). Na grûba zemîran kurmancî de notr î. Labelê nêrî û makîyêya çîyê ke yenê nîşandayîş, bi halo oblîke yê zemîran /ev → evî, vî, vîna / û /ew → ewê, wê/ yenê dî-yarkerîş. Dimilî de, nîzdîyey û dûreyayîş çîyandê yewhûmaran goreyê nêrî

û makîyêya ênan bedilyenê yanî notr nîyê. Seba tebayandê yewhûmar ê makî yê nîzdî vateyê na/ena, seba nêrî û nîzdî no/eno û seba pirhûmarîya ênan zî nê/enê yenê gûrênayîş.

(Grûba yekem: Di kurmancî de ji bo nişankirina tiştên nêzîk û yekhejmar ên nêr û mak /ev/, tiştên yekhejmar ên dûr jî /ew/ û ji bo pirhejmarîya nêzîk /van/ û yê dûr jî /wan/ tête bikaranîn. Ev grûba cînavkan di kurmancî de notr(nêtr) in. Lêbelê nêr û makîtiya tiştên têne nişandan bi halê tewandî yê cînavkên /ev/ → evî, vî, vîna û /ew/ → ewê, wê dîyar dibe. Di zazakî de, cînavkên nêzîkî û dûriya tiştên yekhejmar, li gor nêrîti û makîtiya wan diguhere, yanî ne notr in. Ji bo tiştên yekhejmar ê nêzîk û nêr peyva no/ eno, ji bo yê makîti yê nêzîk na/ena û ji bo pirhejmarîya wan jî nê/enê tête bikaranîn).

Nîşandayena nêzdî û dûrîya grûba yewine:

(Nîşandana nêzîk û dûrîya grûba yekem):

Zazakî

Nêzdî

no⁷, eno yh. û n.

na⁸, ena yh. û m.

nê⁹, enê ph. n. û m.

Dûr

o (we, awo, ayo)¹⁰ yh. û n.

a (aya) yh. û m.

ê (eyê)¹¹ ph. n. û m.

Kurmancî

Nêzîk (halê tewandî)

ev (evî, vî) yh. û n.

ev (evê, vê) yh. û m.

ev (evan, van) ph.

Dûr (halê tewandî)

ew (ewî, wî) yh.

ew (ewê, wê) yh.

ew (ewan, wan) ph.

Grûba diyine:

Nêzdî

ney (enî)¹² : Ney va.

Grûba duyem:

Nêzîk

vî : Vî got. yh. û n.

naye (ena)¹³ : Naye va.

nînan : Nînan va.

vê : Vê got. yh. û m.

van(vana): Van got. ph. n. û m

Dûr

ey : Ey ra vaje.

aye¹⁴ : Aye ra vaje.

aynan, înan: Aynan ra vaje.

Dûr

wî : Ji wî re bêje.

wê : Ji wê re bêje.

wan : Ji wan ra bêje.

Mîsal:

No do şiro mekteb.

Na rind a.

Nê ameyê keydê ma.

O (we) dew ra yeno.

A rewna ameya.

Ê çay şimenê.

Înan arayî nêkerda.

Enînan goşê ma berdî.

Naye ra pey, keyneka gewre vejyena. Li du vê re, keçika gewr dertê.

Newba aye mi ra ver bî.

Ey mi ra pey(dime) ameyê.

Ev dê here dibistanê.

Ev rind e.

Ev hatine mala me.

Ew ji gund tê.

Ew ji zû ve hatiye.

Ew çay vedixun.

Wan arayî nekirine.

Vana guhê me birin.

Dora wê li pêşîya min bû.

Ew di pey min re hatin.

Kurmancî de wexto ke ma biwazê çîyêk teyîd bikê, hem nê zemîrê pey- cidara temamkerdişî gênê û hem zî ênan ra pey vateyî /ha/ û /han/ yenê. Ay wext nê zemîrî sey ê cêrênan nûsyenê:

(Di kurmancî de wexta ku em bixwazin tiştêkî teyîd bikin, ev cînavk hem qer- tafa tewandinê digrin û hem jî bêjeya /ha/ û /han/ tête dawîya wan. Wê demê ev cînavk wekî li jêrê têne nivîsandin):

Ev

Evê ha	→ vîna	(n. yh.)
Eva ha	→ vêna	(m. yh.)
Evên ha	→ vanan	(ph.)

Ew

Ewê ha	→ wîna	(n. yh.)
Ewa ha	→ wêna	(m. yh.)
Ewên ha	→ wanan	(ph.) ¹⁵

4.2.2. Grûba diyin

Kurmancî de vateyê sey /yê, ya, yên/ hem wezîfeyê nê bêj zemîran û hem zî yê sifetan vînenê. Na grûba zemîran dût û nîzdîyê nê, kes û bî-yaye û tebyan dîyar kenê. Zazakî de zî miqabilê na grûba zemîran, halê xoserî de vateyê /o, a, ê/ û halê oblîkeyî de zî yê/ê, ya/a, yên/yê/ê yenê gûrênayîş.

(Grûba duyem: Di kurmancî de peyvên wekî /yê, ya, yên/ hem wezîfeyê van cure cînavkan û hem jî yê rengdêrên îşarkî dibînin. Ev grûba cînavkan ne dût û nêzikîyê, kes û hebûn û tiştan dîyar dike. Di zazakî de miqabilê vê grûba cînavkan, di halê xweser de peyvên /o, a, ê/ û halê tewandî de jî yê/ê, ya/a, yên/yê/ê têne bikaranîn).

Zazakî

Oyo ke ame hembazê min o.
Aya ke etiya ra şî keyna mi bî.
Yê (ê) ke yenê şinasîyê ma yê.
A peyêne maya min a.
Ma şiyê sûke.
“Înan ra vaje”.
Ayo pîyê mi bî.

Kurmancî

Yê ku hat hevalê min e. (sf.)
Ya ku ji vir çû qîza min bû. (sf.)
Yên ku tên nasê me ne. (sf.)
Ya dawî dayika min e. (sf.)
Em çûn sûkê. (zm.)
Ji wan re bêje. (zm.)
Ew bavê min bû. (rd.)

4.3. Zemîrê persî

Zemîrê persan bi xo raşte raşt cayê naman nêgênê, bi persayîşê nê bêj persan tena şexis, cins, wesif, zeman, mekan, mîqdar û humara çîyan dîyar bena. Kelîmeyê (vateyê) ke wezîfeyê zemîrê perskerdişî vî-nenê:

(**Cînavkên pirsyarî:** Cînavkên pirsyarî bi xwe raste rast ciyê navan nagrin, bi pirskirina van cure pirsan tenê şexis, cins, wesif, zeman, mekan, mîqdar û hej-mara tiştan tête dîyarkirin. Peyvên ku wezîfeyê cînavkên pirsyarî dibînin):

Zazakî

kam
kê
kamcin
kamca
kûra
çend
çi
çiq
çi bêj
çi tewir
çito
senî

Kurmancî

kî-kê¹⁶
kê
kîjan
kû der
li kû
çend
çi
çiqas
çi cure
çawa(çi hawa)
çito
çer, çawa

Mîsal:

Çend kitabê to estî?
rezî rê çende wazenê
Çi esto?
No çi yo?
Ti çi vanê?(Ti vanê çi?)
Çiyê to yo?

Çend pirtûkên te hene? Ti qandê
Tu ji bo rez çendî dixwazî?
Çi heye?
Ev çi ye?
Tu çi dibêjî?
Çiyê te ye?

No kam o?	Ev kî ye?
Perey kam ame etiya?	Pêr kî hat vira?
Kamî kê remna?	Kî kê revand?
Keyna kamî?	Keça kê?
Zera to kamcine wazena?	Dilê te kîjanê dixwaze?
Ti do kamcine deyre vajê?	Tu dê kîjan kilamê bêjî?
Zerra to kamcinan wazena?	Dilê te kîjanan dixwaze?
Ti senî şîyê?	Tu çawa (çera) çûyî?
Çiqasî ameyê veyve?	Çiqasî hatine dawetê?

4.4. Zemîrê dîyarnêbiyaye

Vateyê ke bi hawayêko sergirewte (neaşkera) hûmar û mîqdarê teba-yan nîşan kenê, cayê teba û şexisê ke nameyê ênan dîyar nîyo gênê, ênan ra vajyeno zemîrê nedîyarî. Tayê vateyê ke wezîfeyê zemîrandê nedîyaran vînenê, goreyê ca û manaya xo, şênê wezîfeyê zerf û sife-tan zî bivînê.

(**Cînavkên nedîyar:** Ew peyvên ku bi awayekî sergirtî hejmar û mîqdarê tiş-tan nîşan didin, ciyê tişt (hebûn) û şexisên ku nehatine binavkirin digrin, ji wan re dibêjin cînavkên nedîyar yan jî cînavkên nebinavkirî. Hinek peyvên ku we-zîfeyê cînavkên nedîyar dibînin, li gor cî û manaya xwe, dikarin wezîfeyê reng-dêr û hokeran jî bibînin).

Zazakî	Kurmancî
bêvan	bêhvan
bêvankes	bêhvankes
ay bîn, ayê bînî	ew ê dî/din
çend	çend
çendayî	çendîn
filan	filan
filankes	filankes

hêç	hêç
her çî	her tişt
heme	hemû, hemî
heme ca	hemû cî
hemin, pêrin	hemûyan, hemîyan
herçî	herçî, heçî
herkes	herkes
heme kes	hemû kes
kes	kes
pêro	gi, giş, gişk
qet	qet
sewbî, bêxêca	xênc, xeyn, xeyr
temamî	temamî
tayn	hin (sf., zm.)
tayine	hinek, hinka, hinekan

Tayê xûsuyetê nê zemîran:

(Hinek xûsuyetên van zemîran):

4.4.1. Vateyê sey filan, bêvan, filan kes û bêvan kes hem wezîfeyê zemîran û hem zî yê sifetan vînenê.

(Peyvên wekî filan, bêvan, filan kes û bêvan kes hem wezîfeyê cînavkan û hem jî yê rengdêran dibînin).

Mîsal:

Filankes û bêvankes ameyê keydê ma.
me. To ewro filankes dî? (zm.)

Filankes û bêvankes hatin mala
Te îro filankes dît? (cînavk)

Filan mêrdim.

Filan meriv. (sf.)

Lajê filankesî yo û filan ca ra yo.

Lawê filankes e û ji filan derê ye. (zm.)

4.4.2. Vateyê sey heme, her, pêro, tamamî, herkes û hêç goreyê ca û manaya xo wezîfeyê zemîr, sîfet û zerfan zî vînenê.

(Peyvên wekî hemû, her, giş, tamamî, herkes û hêç li gor cî û mana xwe wezîfeyê cînavk, rengdêr û hokeran jî dibînin).

Zazakî

Heme ewca de bî.

Pêro dewijê ma bî.

Hemine ti ra hes kerdê.

Heme dewî veng bîyê.

Her şew tarî ya.

Dewijî pêro ameybî.

Hêç yewî nêvato.

Hêç nêwendo.

Mi hêç nêkerdo.

Tayn ameyê û tayn şîyê.

Ez taynekî xebityaya.

Kurmancî

Hemû li wê derê bûn. (zm.)

Giş gundiyê me bûn. (zm.)

Hemûyan jê hes dikir. (zm.)

Hemû gund vala bûn. (sf.)

Her şev tarî ye. (sf.)

Gundî hemû hatibûn. (zerf-hoker)

Hêç yekî negotîye. (sf. nedîyar)

Hêç nexwendîye. (zm.)

Min hêç nekirîye. (zerf)

Hinek hatin û hinek çûn. (zm.)

Ez hinekî xebitîme. (zerf-hoker)

4.4.3. Vateyê sey her, herkes û heryew zaf rayan wezîfeyê sîfetan zî vînenê.

(Peyvên wekî her û herkes, heryek û gelek caran wezîfeyê rengdêran jî dibînin).

Mîsal:

Her mêrdim wayîrê nefsi yo.

Her meriv xwedîyê nefse ye.

Her zivan yew kultir o.

Her ziman kulturek e.

Heryew ênan ra xoser o.

Heryek ji wan biserêxwe ye.

Xeylî cinî kom bîyê.

Gelek jin kom bûne.

4.4.4. Vateyê sey tayn, çend, çendayî hem wezîfeyê zemîran û hem zî yê zerfan vînenê.

(Peyvên wekî hinek, çend, çendîn hem wezîfeyê cînavkan û hem jî yê hokeran dibînin).

Mîsal:

Çendekî domanî ameyê keye.	Çendek hatin malê. (zm.)
Tayê ma ra veyartî.	Hinek ji me derbas bûn. (zm.)
Çendan vatî û şî.	Çendan got û çû. (zm.)

4.4.5. Vateyê sey pêro, heme û tamamî goryê ca û manaya xo wezîfeyê zemîr û zerfan vînenê.

(Peyvên wekî giş, hemû û tamamî li gor cî û mana xwe wezîfeyê cînavk û hokeran jî dibînin).

Mîsal:

Heme ameyê şehar.	Hemû hatine bajêr. (zm.)
Heme azayê meclîsî bî.	Hemû endamên meclîsê bûn. (zm.)
Walî tamamê şeharî gêra.	Walî li tamamê bajêr gerya.
Pêro ameyê dewda ma.	Gişk(giş) hatin gundê me. (zm.)

Tayê mîsalê têmîyanekî:

(Hinek mîsalên têkel):

Zazakî

Heme pêdima remayê.
Herçî kesê ke vajê nika honik o, zûrî ya derew e. Herkes pê hesîyayo.
Heme çî hadre bî.
Heryew sey dêwî bî.
Heryewî pesnê xo daynê.

Kurmancî

Hemî li peyhev reviyân. (zm.)
Herçî kesên ku bêjin niha hênik e, Herkes bi wê hesyaye. (zm.)
Hemû tişt amade bûn.(rengdêr)
Heryek wekî dêv bûn. (zm.)
Heryekî pesnê xwe dida. (zm.)

Taynê yenê.	Hin tên. (zm.)
Taynê bînî estî.	Hinên(hinekên) din hene. (zm.)
Hêç nêameyê cadê ma.	Hêç(hîç) nehatina cîyê me. (zm.)
Kes nêwazeno.	Kes naxwaze. (zm.)
Kesî nêvato.	Kesî negotîye. (zm.)
Yew ame.	Yek hat. (zm.)
Yewî yewnayê ra vatê.	Yekî digota yekê din. (zm.)
Yewî werd û yewî temaşe kerd.	Yekî xwar û yekî temaşe kir.
Yewêna ame.	Yekê dî hat. (zm.)
Yew bi yew ameyê keye.	Yek bi yek hatin malê.
Tikes nêame.	Tukes nehat.
Tikes nêzano mesela çiya.	Tukes nizane mesele çiya.
Ey ra teber tikes xo nêdano barî ver.	Ji xeynê wî tukes xwe nade ber bar.
Xeylî şîyî.	Gelek çûn. (zm.)

4.5. Zemîrê agêrayoxî

Nê bêj zemîrî hem dimilî û hem zî kurmancî de estî. Dimilî de, wexta ke zemîrê kesan ra pey vateyê sey /xo/, /bi xo/ û /xo bi xo/; kurmancî de zî vateyê sey /xwe/, /bi xwe/ û /xwe bi xwe/ bibê tamamkerê karî, wezîfeyê zemîrê kesan vînenê. Zemîrê xo/xwe, hem seba nêrî û makîyê, hem seba pêrin humaran(yh. û ph.) û hem zî seba heme hîrê şexisan yeno xe bitnayîş. Wexta ke cumle de zemîrê cayê kerdoxî bigîrê û xo/xwe wezîfeyê tamamkerdena karan bivîno, ay wext cayê heme zemîranê şexisan gêno.

(**Cînavkên vegerok:** Ev cure cînavk hem di dimilî û hem jî di kurmancî de hene. Di dimilî de dema ku li pey cînavkên kesan peyvên wekî /xo/, /bi xo/ yan zî /xo bi xo/; di kurmancî de jî peyvên /xwe/, /bi xwe/ û /xwe bi xwe/ bibin tamamkerê lêkerê, wezîfeyê cînavkên kesan dibînin. Cînavkên xo/xwe, hem ji bo nêr û makîtyê, hem ji bo yekhejmarî û pirhejmarîyê, hem jî ji bo her

sê şexsan tête bikaranîn. Dema ku di cumleyê de ciyê kirdar bigre û xo/xwe wezîfeyê temamkirina lêkeran bibîne, wê demê ciyê hemû cînavkên kesan digre.)

Tayê xûsîyetê zemîrê xo/xwe:

(Hinek xûsîyetên cînavkê xo/xwe):

4.5.1. “xo/xwe”, cayê heme zamîranê kesan gêno:

(/xo-xwe/, ciyê hemû cînavkên kesan digre):

Zazakî

Bi xo şîya.

Bi xo şîyê.

Bi xo şîyo. (n.)

Bi xo şîya. (m.)

Bi xo şîyê.

Bi xo şîyê.

Bi xo şîyê.

Kurmancî

Bi xwe çûm.

Bi xwe çûyî.

Bi xwe çûye.

Bi xwe çûye.

Bi xwe çûn.

Bi xwe çûn.

Bi xwe çûn.

4.5.2. “xo/xwe” halê temamkerî de bo:

(“xo/xwe” di halê bireser de be):

Zazakî

Ez xo vîna.

Ez xo musnena.

Ti xo nêhesyayî.

Mi bi xo nan werd.

Mi xo vîna.

Şima xo betilnenê.

Kurmancî

Ez xwe dibînim.

Ez xwe hîn dikim.

Tu xwe nehesyayî.

Min bi xwe nan xwar.

Min xwe dît.

Hun xwe dibetilînin.

4.5.3. Wexta ke “xo/xwe” bibo zemîrê aîdiyetîye, cayê hemin kerdoxan gêno:

(Wexta ku “xo/xwe” bibe cînavkê aîdiyetîyê, ciyê hemû kirdaran digre):

Zazakî

Kurmancî

Ez keyeyê xo vîna.

Ez xanîyê xwe dibînim.

Ti kitaba xo wanenê.

Tu kitêba xwe dixwînî.

Ma şînê dewda xo.

Em diçin gundê xwe.

O (we) dersê xo xebityeno.

Ew dursa xwe dixebite.

Ez û ti şîyê keyê cîrandê xo.

Ez û tu çûn mala cîranê xwe.

Şîma barê xo giran kerd.

We barê xwe giran kir.

4.6. Zemîrê wayîrîye

Hem zazakî û hem zî kurmancî de zemîrê grûba (koma) didine wayîrîye dîyar kenê. Wexta ke name, cins û hûmara çîyan dîyar nêbo cayê ênan de sîfetê wayîrîye yenê xebitnayîş.

(**Cînavkên xweyîtîyê**: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de cînavkên grûba (koma) duyem xweyîtîyê dîyar dikin. Wexta ku nav, cins û hejmara tiştan dîyar nebe di ciyê wan de sîfetên xweyîtîyê têne bikaranîn(xebitandin).

Zazakî

Kurmancî

Mi

Min

To

Te

Ey (yê, jê)

Wî

Aye (ya, ja)

Wê

Ma

Me

Şîma

We

înan (ênan)

Wan

Ê (yê, êdê) mi. → Dewa mi.	Ê min. → Gundê min.
Ê to. → Qelema to.	Ê te. → Qelema te.
Ê ey. → Kitaba ey.	Ê wî. → Pirtûka wî.
Ê aye. → Giştaneya aye.	Ê wê. → Gustîla wê.
Ê ma. → Keyeyê ma.	Ê me. → Xanîyê me.
Ê şima. → Rezê şima.	Ê we. → Rezê we.
Ê înan. → Şeharê înan.	Ê wan. → Bajarê wan.

4.7. “Zemîrê <ê>

Kurmancî de, bi kesê yewhûmar ê hîrin û grûba diyin a zemîrana, tayê halê karan de yeno xebitnayîş û mutleqe karî ra pey yeno.

(**Cînavka <ê>**: Di kurmancî de, bi kesê yekhejmar ê sêyem û grûba duyem a cînavkan ra di hinek halên lêkeran de tête bikaranîn û mutleqe ji lêkerê şûn de tê).

4.7.1. Eke zemîr /ê/ sey temmakerê yew karî bêro xebitnayîş.

(Ku cînavka “ê” wekî birasera lêkerê bête bikaranîn).

Kurmancî

Zazakî

Min got wî (wê) : Min got ê. Mi ey (aye) ra vat.

Ez didim wî (wê) : Ez didim ê. Ez dana ey (aye).

Min da wî (wê) : Min da ê.¹⁷ Mi da ey (aye).

4.7.2. Eke bi yew edatîya bêro xebitnayîş, halêdo anasarên de yeno tewênayîş.

(Heke bi tevî daçekê bête bikaranîn, di halekî wisa de tête tewandin.)

Kurmancî

Zazakî

Pê : bi wî (nêr.), bi wê (m.)

Pê : bi yê (nêr.), bi ya (m.)

Jê	: ji wî (nêr),	Jê (cê)	: ji yê (n.)
	: ji wê (m.)	Ja (ca)	: ji ya (m.)
Pê re	: bi wî re (nêr),	Pê ra	: bi yê ra (n.)
	: bi wê re(m.)		: bi ya ra (m.)
Jê re	: bi wî re (nêr),	Jê ra(ci ra)	: ji yê ra/ci yê ra (n.)
	: ji wê re(m.) ¹⁸	Ja ra	: ji ya ra (m.)

4.8. Zemîrê hemmana

Hem zazakî û hem zî kurmancî de goreyê ca û mintiqa vatişê nê zemîran biney bibedilîyo zî, mana ênan a esasî nêbedilîyena. Wazena wa kerdox û grubê kerdoxî dîyar bibê yan zî dîyar nêbê, zemîrê hemmanayî, cayê kerdox û grubê kerdoxanê cîyayî de yenê vatiş. Kurmancî de zaf rayan hawayê ênan ê kilmî sey “hev, yek, êk” yeno nûstiş.

(**Cînavkên hemmane/hemwate:** Hem di dimilî û hem jî kurmancî de li gorî cî û mintiqeyan bilêvkirina wan de hinek guhartin çêbe jî, mana wan a esasî nagehere. Dixwazî kiryar û grûba kiryar dîyar be yan jî dîyar nebe, cînavkên hemmane, di cîyê kirdar û grubên kirdar ên cûda de têne gotin. Di kurmancî de gelek caran awayê wan ê kurt wekî “hev, yek, êk” tête nivîsîn).

Zazakî

Yewbin/jewbin¹⁹

Kurmancî

hevûdin/yekûdin/êkûdin

hevûdî/yekûdî/êkûdî

hevûdu/yekûdu/êkûdu

hevdû/yekdû/êkdû²⁰

Mîsal:

Ma yewbin dî.

Me hev dît.

Ma yewbin şinasnenê.

Em hev nas dikin.

(Em hevûdu nas dikin).

Rewîn û Zelale yewbina hez kenê.
Ma firêzeyê yewbin nêdîyo.
Ferzo û Biro qalê yewbin kenê.
Ma şew û roj yewbin pawenê.

Rewîn û Zelal ji hevûdu hez dikin.
Me pirêzeya hev nedîtiye.
Ferzo û Biro qala hev dikin.
Em şev û roj hevûdu dipên.

Wexta ke “hev” a kurmancî bi edatan pawa bêro nûstîş, sey awayê cêrênî tewiyenê:

(Wexta ku “hev” a kurmancî bi tevî edatan bête nivîsîn, wekî awayê li jêrê ditewe):

Kurmancî

bi hev/pev/ bi êk/vêk
ji hev/ jev/ ji êk/jêk
li hev/lêk/li êk

Zazakî

bi yewbin/pê
pê ra/cê ra/ jê ra
yewbin/pê

Xelkê gundan bi hev ketin.
Her du bira ji hev aciz bûn.
Her du şîrîg ji hev cûda bûn.
Kerr û kor li hev hesiyane.

Şarê dewan pê kewtî.
Her di birayî pê ra aciz bî.
Her di şîrîgê pê ra abiryayî.
Kerr û korî pê hesiyayî.

5. Kar (Lêker)

Vateyê (çekûyê) ke têvgêryayene, kerdene, bîyayene û awayê bîyayene goreyê deman û şexis û cayan îfade bikê, ênan ra vajîyeno kar (fiîl). Hem zazakî û hem zî kurmancî de, kê şênê karan di esasan sero cira bikê: Kokê karan û mesderê karan.

Kok yan zî eslê karî: Zazakî de halê demo veyaretewo nîzdî yê karan, kokê karî yo; yan zî mesderê karan ke bîaqityo, qismoke cira pey mend ey ra vajyeno kok yan zî eslê karî. Kokê karî qet nêbedelyeno (nêvuryeno). Zazakî de, halê demo veyarete de, vêşaneya karan bi vengandê /d/ û /t/ qedyenê. No vengê /d/ yê peynîya karan xusûsiyetêko kehan ê zîwanê kurdî yo, lehçeya zazakî û soranî de xo pawito, labelê kurmancî de bîyo sivik û cira kewto. Ay karê ke bi /d/ û /t/ ya qedyenê, goreyê cayan peyçidara /-iş/ û /-en/ gênê, ay karê ke zî bi herfêda vengina qedyenê peyçidara /-yîş, -yayîş/ û /-ene, -yene/ gênê.

(**Lêker:** Peyvên (bêjeyên) ku tevgerîn, karkirin, bûyin û awayê bûyinê li gor dem, şexis û cayan îfade bikin ji wan re dibêjin lêker. Hem di zazakî û hem jî kurmancî de em dikarin lêkeran li ser du esasan ji hev cuda bikin: Kokê lêkeran û mesdarê(raderê) lêkeran. Halê dema raborî (berê) ya nêzîk a lêkeran, kok yan jî eslê lêkerê ye.

Kok yan zî eslê lêkerê: Di zazakî de halê dema raborîya nêzik a lêkeran, koka lekerê ye; yan jî ku mesderê lêkeran jê veqete, ji qismê mayî re dibêjin kok yan jî eslê lêkerê. Koka lêkerê qet naguhere. Di zazakî de, di halê dema raborî(berê) de, piranîya lêkeran bi dengê /d/ û /t/ bi dawî tên. Ev dengê /d/ ya dawîya lêkeran, taybeteke kevnare ya zîmanê kurdî ye, di zaravayê zazakî û soranî de hatiye payin lêbelê di kurmancî de sivik bûye û jê ketîye. Ew lêkerên ku bi /d/ û /t/yê diqedin, li gor herêmên cuda qertafa /-iş/ û /-en/ digrin; ku ev lêker bi tîpeke dengdêr biqedin qertafên /-yîş, -yayîş/ û /-ene/-yene/ digrin).

Zazakî

berd

cawit

kerd

dot

kewt

ravist

rot

vit

vist/eyşt

ramit, karit

rişt

Kurmancî

bir

cût

kir

dot

ket

raxist

firof

wêt

avêt

ajot

rişt

Mesderê karî yan zî peycidarê mesderan: Ay vateyê ke bi şexis û zemanî ya girêdaye nîyê û tenya bi karî ya eleqeder bibê, ênan ra vajîyeno mesder. Zazakî de goreyê mintiqa û cayan di bêj mesderê karan estî: tayê cayan de bi peycidara /-en/ û tayê cayan de zî bi peycidara /-iş-îş/ yenê viraştene. Ke kar bi yew herfêda vengine biqedîyo, herfa /y/a pêbestene dekewena mabeynê ênan û ay wext mesderî zey /-yen/, /-yîş, -yayîş/ nusîyenê. Labelê seba ke zazakî de nêrî û makîya name û karan halê ênan ê sade de zî dîyar benê, peycidara /e/ya makîyey yena peyniya /-en/ û raşteraş zey /-ene/ û /-yene/ yenê nûstene. Tayê cayan de zî herunda /-ene/-yene/ de, formê zey /-êne, -eni, -ine, -en, -inⁿ¹ nusyenê.

Mesdarê /iş/ û /-îş/, tayê mintiqayan de hem zey mesderê karî hem zî zey nameyê karî vajyenê. Kê şênê ênan ra vajê mesderê sivikî zî. Labelê ziwane nûstîşê zazakîya ewroyên de, /-ene/ zey peycidara mesderan, /-iş, -yîş, -yayîş/ zî zey peycidara nameyê mesderan ameyê qebûlkerdiş. “Seba ke ziwane nûstîşî de asanî(rehetî) bibo, ma formê /-ene/-yene/ sey mesderî, formê /-iş/-yîş/î zî cayê nameyê karan de nûsenê.”² Qebûlkerdena enê konsesusê umûmî de, gelek giraneya biryar û pêkerdena Gruba Xebata Vateyî esta. Feqet ayê ke hawayê ca û min-tîqa xo, yanî cadê /-en/ de /iş-îş/ nûsenê zî tayn nîyê.

Miqabilê zazakî, kurmancî de zî, “hetê morfolojî ya di grubê esasî yê masderan estî: mesdarê -in, û -în; û diletê ênan ê ke -an û -ûn reyde virazîyenê.”³

Zazakî de karê alîkerden ê zey /bîyayîş-bîyayen/, /dayîş-dayen/ û /nayîş-nayene/ zî estî. Kurmancî de zî miqabilê ênan karê zey /bûn/, /dan/ û /-andin/ yenê xebitnayene.

(Mesderên lêkeran yan jî qertafên mesderan: Ew peyvên ku bi şexis û demê ve girêdayî nebin, tenê bi lêkerê ve girêdayî bin, ji wan re dibêjin mesder. Di zazakî de li gor cî û herêman du cuda mesderên lêkeran hene: di hinek herêman de mesder bi qertafa /-en/ û di hinek herêman de jî bi qertafa /-iş/-îş/ çêdibin. Dema ku lêker bi tîpeka bideng biqede, tîpa /y/ ya pevkelijandinê dikeve navbera wan û wê demê jî ew mesder wek /-yen/, /-yîş, -yayîş/ têne nivisîn. Lêbelê ji ber ku di zazakî de nêrîtî û makêtîya nav û lêkeran di halê wan ê sade de jî tete diyarkirin, qertafa /-e/ya makêtîyê tê pey/-en/ û rasterast wek /-ene/ û /-yene/ tete nivisîn. Di hinek herêman de jî di ciyê /-ene/-yene/ de formên wekî /-êne, -eni, -ine, -en, -in/ têne nivisîn.

Mesderê /iş/ û /-îş/, di hinek herêman de hem wek mesderên lêkeran û hem jî wek navê lêkeran têne bikaranîn. Em karin wan wek “mesderên sivik” jî binav bikin. Lêbelê di zimanê nivîskî yê zazakî ya evroyên de, /-ene/ wek qertafa mesderan û /-iş, -yîş, -yayîş/ jî wek qertafa navê mesderan ameyê qebûlkerdiş. “Ji bo ku di zimanê nivîskî de hêsanî çêbe, em formên /-ene, -yene/ wek mesder, formê /-iş/-yîş/ jî li şûna navê lêkeran dinivisîn.”² Di qebûlkerina vê kon-

sensusa giştî de gelek giranîya biryar û lihevhatina lêkeran de dinivînin.”² Di qebûlkirina vê konsesusê giştî de, gelek giranîya biryar û lihevkirina Gruba Xebata Vate heye. Feqet ew ên ku bi awayê cî û herêma xwe; yanî di ciyê /-en/ de /-iş,-îş/ dinivînin jî hene.

Miqabilê mesderên zazakî, di kurmancî de jî “ji aliyê morfolojîyê ve du grubên esasî yên mesderan hene: mesderên /-in/ û /-în/; û cewiyê wan ên ku bi /-an/ û /-ûn/ tene çêkin.”³

Di zazakî de lêkerên alîkar ên wekî /bîyayîş-bîyayen/, /dayîş-dayen/ û /nayîş-nayene/ jî hene, di kurmancî de jî li hemberê wan /bûn/, /dan/ û /-andin/ hene).

Zazakî

Kurmancî

Kok/mesder/name

kok/mesder

ame : ame-yene/ ame-yîş

hat : hat-in

berd : bir-in/ berd-iş

bir : bir-in

cawit : cawit-ene/ cawitiş

cût : cût-in

kerd : kerd-ene/ kerd-iş

kir : kir-in

kewt : kewt-ene/ kewt-iş

ket : ket-in

ramit : ramit-ene/ ramit-iş

ajot : ajot-in

rot : rotene/ rotiş

firof : firot-in

vit : vitene/ vitiş

wêt : wêt-in

waşt : waşt-ene/ waşt-iş

xwest : xwest-in

werd : werd-ene/ erfiş

xwar : xwar-in

berma : berma-yene/ berma-yîş

girîn : gir-în

veşna : veşnayene/ veşna-yîş

şewit : şewit-în

pawit : pawit-ene/pawit-iş

pa : pa-y-în

rişna : rişna-yene/ rişna-yîş

rijand : rjand-in

rema : rema-yene/ rema-yîş

reviya : revî-y-an (revîn)

pêşt : pêştene/ pêşt-iş

pêça : pêç-an-din

keliya : keliya-yene/keliya-yîş kelîn

: kelî-y-an (kelîn)

tersa : tersa-yene/tersa-yîş

tirsîya : tirsi-y-an (tirsîn)

ard	: ard-ene/ ard-iş	anî	: an-în
da	: da-yene/da-yîş	da	: da-n (dayîn)
mend	: mend-ene/ mend-iş	ma	: ma-n (ma-yîn)
bî	: bî-yene/bî-yayîş	bûn	: bû-n (bûyîn)
şî	: şîya-yene/ şî-yayîş	çû	: çû-n (çûyin)
deşt	: deşt-ene/deştiş	dirût	: dirûn(dirût-in)
ravist	: ravist-ene/ra-vist-iş	raxist	: ra-xist-in (lêk. hevdûdanî)
vazda	: vazda-yene/vaz-dayîş	bazda	: baz-dan (lêk. hevdûdanî)

Zazakî de karandê pêrabesteyan de formê nûstîşê grûba /-iş/ û /-ene/ seycê nîyê; yê grûba /-ene/ cîya nûsyenê û yê grûba /-iş/ zî pîya nûsyenê.”⁴

(Di zazakî de, “di lêkerên hevdudanî de forma nivîsîna /-iş/ û /-ene/ ne wekhev e; yê gruba /-ene/ cuda têne nivîsandin û yê gruba /-iş/ jî pêve têne nivîsandin.”⁴)

Mîsal: -ene (mesdar)	-iş (name)
germ kerdene	germkerdiş
berz kerdene	berzkerdiş
piro dayene	pêrodayîş
pira dayene	piradayîş

Hem zazakî û hem zî kurmancî de, bîyena karî de hîrê şexisî estî û her yew şexis yewhûmarî û pirhûmarîya ey esta. Wexto ke karî bêrê antiş, goreyê şexisê kerdoxî û zemanê bîyena karî tayê peycidarî pawa benê ke farisî de ênan ra vanê “şinase”. Demo vîyarte de şaxisê hîrin (3.) qethen şinase nêgêno.

(Hem di zazakî û hem jî kurmancî de, di bûyina lêkerê de sê şexis hene û her yek şexis yekhejmarî û pirhejmarîya wî/wê heye. Dema ku lêker bêne tewandin, li gor şexisê kirdar û zemanê bûyina lêkerê hinek qertafan digrin ku faris ji wan re di-

bêjin /şinase/. Di dema borî de şexisê sêyemîn (3.) qethen qertaf nagre).

Zazakî

ez : Ez wanena.

ti : Ti wanenî.

o : O waneno. (nêr.)

a : A wanena. (m.)

ma : Ma wanenê.

şima : Şima wanenê.

ê (yê) : Ê (yê) wanenê.

Kurmancî

ez : Ez dixwînim. (yh.)

tu : Tu dixwînî. (yh.)

ew : Ew dixwîne. (yh.)

ew : Ew dixwîne. (m.)

em : Em diwxînin. (ph.)

hun : Hun dixwînin. (ph.)

ew : Ew dixwînin. (ph.)

Tesnîfkerdena karan

Ziwanê kurdî de karî goreyê viraştene, wezîfe, şekil û kerdaxîye tesnîf benê.

(Dabeşkirina lêkeran: Di kurdî de lêker li gor çêbûn, wezîfe, şikil û kirdariyê têne dabeşkirin).

5.1. Tesnîfkerdena goreyê viraştene

(Dabeşkirina li gor çêbûnê)

5.1.1. Karê sadeyî

Karê sadeyî karê xas î, yew kok û peyçidara mesderî ra virazîyenê.

(Lêkerên sade: Lêkerên sade lêkerên xas in, ji yek kok û qertafa mesder çêdibin).

Zazakî	Kurmancî
werd-ene	xwar-in
berd-ene	bir-in
kerd-ene	kir-in
ame-yene	hat-in
wazt-ene(waşt-ene)	xwest-in
kewt-ene	ket-in
pewt-ene	peht-in
vat-ene	got-in
şit-ene	şûşt-in

5.1.2. Karê pêrabesteyî

Hem zazakî û hem zî kurmancî de karê pêbesteyî, bi yewbîyayena yew kar û yew name, veredat, sîfet û zerfî ra peyda benê.

(Lêkerên hevdûdanî: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de lêkerên hevdûdanî bi hev girtina karek û navek, pêşdaçekek, rengdêr û hokerek peyda dibin).

Zazakî	Kurmancî
akerd-ene	vekir-in
aqetna-yene	veqet-andin
ravist-ene	raxist-in
ronişt-ene	rûnişt-in
piroda-yene	lêxist-in
cêvist-ene	jihevexist-in
raykerd-ene	rêkir-in
girê da-yene	girê-da-n
hewa da-yene	hilgirt-in
vazda-yene	baz-da-n
pîr bî-ya-yene	pîr bûn

awan kerd-ene	ava-kir-in
aw da-y-ene	av-da-n
goşdarî kerd-ene	guhdarî kir-in
derg kerd-ene	dirêj kir-in
mikur ame-y-ene	mikur hat-in
ray kewt-ene	rê ket-in
vela kerd-ene	belavkir-in
bala xo da-yene	bala xwe da-y-in

5.1.3. Karê pêrabeste yê ke bi veredatî ya virazîyenê

Nê bêj karî bi pêrabestena yew veredat, yew name û karan ra peyda benê.

(Lêkerên hevdûdanî yên ku bi pêşdaçêkek çêdibin: Ev cure lêker bi hevduda-nîna pêşdaçêkek, nav û lêkerêk peyda dibin).

Zazakî	Kurmancî
vergirewtene/vergirewtiş	bergirtin
bervistene/bervistiş	beravêtin
bingirewtene/bigirewtiş	bingirtin
bin ra veyartene	ji bin re derbasbûn
dest ra şiyayene	ji dest çûyin
vîrî ra şiyayene	ji bîr kirin
xo ver kewtene	li ber xwe ketin
pê ameyene	pevhatin/li hev hatin
pê kewtene	bi hev ketin
pêpersayen	lihevpirsîn
xo ver kewtene	li ber xwe ketin
bide gêrayene/cêgêrayene	lê gerîyan
fek tira veradayene	dev jê berdan

dest bide kerdene
bawerîya xo pê ardene

dest pê kirin
bawerîya xwe pê anîn

5.1.4. Karê hetkarî

Di bêj karê alîkarî estî; 1- zazakî de bîyayîş/bîyene û kurmancî de zî bûn, bîyayen û rewşa kerdexî dîyar kenê. 2- Zazakî de estbîyene, şênayene û dayene; kurmancî de zî kirin, dan û hatin seba viraştişê karandê pêbesteyan benê alîkar. Seba ke karê alîkarî halê kerdexî dîyar kenê, zazakî de /bîyene-bîyayîş/ û kurmancîde zî /bûn/ her wext kerdexî ra dime yenê.

(Lêkerên alîkar: Du cure lêkerên alîkar hene; 1- di zazakî de bîyene û di kurmancî de jî bûn, hebûn û rewşa kirdar dîyar dikin. 2- Di zazakî de estbîyene, şênayene û dayene; di kurmancî de jî kirin, dan û hatin ji bo çêkirina lêkerên hevdundanî dibin alîkar. Ji ber ku lêkerên alîkar halê kirdar dîyar dikin, di zazakî de /bîyene-bîyayîş/ û di kurmancî de jî /bûn/ her dem ji kirdar şûnde tê).

Mîsal:

Zazakî

Panc boranê ma estî.

Dew de estorê ma estbîyê.

Yew lûlîya darên a bawkaldê mi estbî.

Vateyê şima raşt bî.

Şewe bîya tarî.

Awdayîşê bexçî zahmet nîyo.

“Mi bazarê şara to kerd.”

Ma boranan weye kenê.

Weykerdena heywanan zahmet o.

Kurmancî

Pênc kevokên me hene.

Di gund de hespê me hebûn.

Bilûrek darîn a kalikê min hebû.

Gotina we rast bû.

Şev bûye tarî.

Avdana bexçê zahmet nîne.

“Min bazara şara te kir.”

Em kevokan xweyî dikin.

Xweyîkirina heywanan zahmet e.

Zazakî û kurmancî de goreyê deman antişê karê kerdene:

(Di zazakî û kurmancî de li gor deman kêşandina lêkera kirin):

Zazakî

Demo veyarte

Halo erênî

mi kerd

to kerd

ey kerd/aye kerd

ma kerd

şima kerd

ên(în) kerd

Halo nêyinî

mi nêkerd

to nêkerd

ey nêkerd/aye nêkerd

ma nêkerd

şima nêkerd

ên(în) nêkerd

Demo veyarete yo aşnawite

Halo erênî

mi kerd bî

to kerd bî

ey kerd bî/aye kerd bî

ma kerd bî

şima kerd bî

ên(în) kerd bî

Kurmancî

Dema borî (borîya berdest)

Helê erênî

mi kir

te kir

wî/wê kir

me kir

we kir

wan kir

Halê nêyinî

min nekir

te nekir

wî/wê nekir

me nekir

we nekir

wan nekir

Çiroka dema bihûrî (borîya dûdar)

Helê erênî

min kiribû

te kiribû

wî/wê kiribû

me kiribû

we kiribû

wan kiribû

Halo nêyinî
mi nêkerd bî
to nêkerd bî
ey nêkerd bî/aye nêkerd bî
ma nêkerd bî
şima nêkerd bî
ên nê kerd bî

Demo nikayên (o hera)

Halo erênî
ez kena
ti kenê/ti kena (m..).
o keno(nêr)/ a nêkena. (m..)
ma kenê
şima kenê
ên(în) kenê

Halo nêyinî
ez nêkena.
ti nêkenê/ti nêkena
o nêkeno(nêr)/ a kena(m..)
ma nêkenê
şima nêkenê
ên(în) nêkenê

Çîroka demo nikayênî

Halo erênî
mi kerdênê
to kerdênê

Halê neyinî
min nekiribû
te nekiribû
wî/wê nekiribû
me nekiribû
we nekiribû
wan nekiribû

Dema nûha (ya fire)

Helê erênî
ez dikim
tu dikî
ew dike
em dikin
hun dikin
ew dikin

Halê neyinî
ez nakim
tu nakî
ew nake
em nakin
hun nakin
ew nakin

Çîroka dema nûha

Helê erênî
min dikir
te dikir

ey kerdênê/aye kerdênê
ma kerdênê
şima kerdênê
ên(în) kerdênê

wî dikir/wê dikir.
me dikir
we dikir
wan dikir

Halo nêyinî
mi nêkerdênê
to nêkerdênê
ey nêkerdênê/aye nêkerdênê
ma nêkerdênê
şima nêkerdênê
ên(în) nêkerdênê

Halê neyînî
min nedikir
te nedikir
wî nedikir/wê nedikir
me nedikir
we nedikir
wan nedikir

Demo bêro

Halo erênî
ez do bika⁵
ti do bikê/ ti do bika
o do biko/ a do bika
ma do bikê
şima do bikê
ên(în) do bikê

Dema dahatû

Helê erênî
ez dê bikim (Ezê bikim)
tu dê bikî
ew dê bike
em dê bikin
hun dê bikin
ew dê bikin

Halo nêyinî
ez do nêka
ti do nêkê/ ti do nêka
o do nêko/ a do nêko
ma do nêkê
şima do nêkê
ên(ê) do nêkê

Halê neyînî
ez dê nekim (Ezê bikim)
tu dê nekî
ew dê neke
em dê nekin
hun dê nekin
ew dê nekin

Çîroka demo bêro

Halo erênî

mi do bikerdê

to do bikerdê

ey/ay do bikerdê

ma do bikerdê

şima do bikerdê

ên(în) do bikerdê

Çîroka dema dahatû

Helê erênî

min dê bikira/min ê bikira

te dê bikira

wî/wê dê bikira

me dê bikira

we dê bikira

wan dê bikira

Halo nêyinî

mi do nêkerdê

to do nêkerdê

ey/ay do nêkerdê

ma do nêkerdê

şima do nêkerdê

ên(ê) do nêkerdê

Halê neyinî

min dê nekira

te dê nekira

wî/wê dê nekira

me dê nekira

we dê nekira

wan dê nekira

5.1.5. Karo nêmcet

No kar, cumleyê nameyan de kerdox û kardarî pêwa girêdano û demo ni-kayên de anciyeno. Karo nêmcet name, zemîr û sîfetan ra ciya nûsyeno. Gerek ma naye zî dîyar bikê ke antişê nê karî de, mintiqa ra mintiqa ferq esto⁶, labelê na babete de, konsesusê Gruba Vateyî esas girewto.

(Lêkera nivçe/qertaflêker: Ev lêker, di hevokên navan de kirdar û pêveber bi hev re girêdide û di dema nûka de tête kêşandin. Karê nivçe ji nav, cînavk û rengdêran cuda tê nivîsandin. Divê em vê yekê jî dîyar bikin ku di kêşandina vî lêkerê de li gor herêman cudayî heye⁶, lêbelê di vê mijarê de, konsesusa Grûba Vate esas hatiye girtin).

Zazakî

Eke kardar bi herfa bêvengina biqeyo

Halo erênî

Ez a. : Ez ciwan a.

Ti yî.(n.) : Ti ciwan î.

Ti ya.(m.) : Ti ciwan a.

O yo.(n.) : O ciwan o.

A ya(m.) : A ciwan a.

Ma yî. : Ma ciwan î.

Şima yî. : Şima ciwan î.

Ê yî. : Ê(ên) ciwan î.

Kurmancî

Eke pêveber bi tîpa bêdeng biqede

Halê erênî

Ez im. : Ez ciwan im.

Tu yî. : Tu ciwan î. (n.)

Tu yî. : Tu ciwan î. (m.)

Ew e. : Ew ciwan e. (n.)

Ew e. : Ew ciwan e. (m.)

Em in. : Em ciwan in.

Hun in. : Hun ciwan in.

Ew in. : Ew ciwan in.

Zazakî de demo nikayên de şiklê nêyinî (menfî) yê karan bi cidara /nî/, kurmancî de zî “demo nikayên de bê ke kerdox bêro xebitnayîş, halê ey o menfî bi ne ya virazîyeno û vernîya kerdoxî de nûsyeno.”⁷

(Di zazakî de şiklê neyinî yê vî karî bi qertafa /nî/, di kurmancî de jî “di dema nûha de bê kirdar were bikaranîn halê wê yê neyinî bi ne çêdibe û tê pêşîya kirdar.”⁷)

Halo nêyinî

Ez nîya. : Ez ciwan nîya.

Ti nîyî. (n.) : Ti ciwan nîyî.

Ti nîya (m.) : Ti ciwan nîya.

O nîyo. (n.) : O ciwan nîyo.

A nîya. (m.) : A ciwan nîya. -

Ma nîyê. : Ma ciwan nîyê.

Şima nîyê. : Şima ciwan nîyê.

Ê(ên) nîyê. : Ê(ên) ciwan nîyê.

Halê neyênî

Ne ez im. : Ez ne ciwan im.

Ne tu yî. : Tu ne ciwan î.

- -

Ne ew e. : Ew ne ciwan e.(n.)

-

Ne em in. : Em ne ciwan in.

Nw hun in. : Hun ne ciwan in.

Ne ew in. : Ew ne ciwan in.

Eke kardar bi herfa vengina biqeyo (Eke pêveber bi tîpa dengêr bi-qede)

Halo erênî

Ez xwendî ya.

Ti xwendî yî. (n.)

Ti xwendî ya. (m.)

O xwendî yo. (n.)

A xwendî ya. (m.)

Ma xwendî yê.

Şima xwendî yê.

Ê(ên) xwendî yê.

Halê erênî

Ez xwendî me.

Tu xwendî yî. (n.)

Tu xwendî yî. (m.)

Ew xwendî ye. (n.)

Ew xwendî ye. (m.)

Em xwendî ne.

Hun xwendî ne.

Ew xwendî ne.

Halo nêyinî

Ez xwendî nîya.

Ti xwendî nîyî. (n.)

Ti xwendî nîya. (m.)

O xwendî nîyo. (n.)

A xwendî nîya. (m.)

Ma xwendî nîyê.

Şima xwendî nîyê.

Ê(ên) xwendî nîyê.

Halê neyênî

Ez ne xwendî me.

Tu ne xwendî yî. (n.)

Tu ne xwendî yî. (m.)

Ew ne xwendî ye.(n.)

Ew ne xwendî ye.(m.)

Em ne xwendî ne.

Hun ne xwendî ne.

Ew ne xwendî ne.

5.2. Tesnîfkerdena karan goreyê wezîfe dayene yan zî objeyê ênan

Hem zazakî û hem zî kurmancî de goreyê wezîfeyandê xo, tayê karî vêrdaye (transîtf) yî û tayê zî nevêrdaye (întransîtfi) yî.

(Dabeşkirina lêkeran li gor wezîfe dayin yan jî objeyên wan: Hem di zazakî û hem jî kurmancî de li gor wezîfeyên xwe, hinek lêker têper in û hinek jî ne-têper in).

5.2.1. Karê transîtfî (vêrdayeyî)

Ay karê ke objeyê ênan estî yan zî tesîr sewbîna çîyan kenê, ênan ra vajyeno karê transîtfî. Bi vatişêko bîn, karo ke bêro kerdene, ciwabê persandê /çi, çi çî/ û /kam, kamî/ bido, ay karo vêrdaye yo. Enê karandê anasarênan de vera hereketî ver bi teberî ya û her wext bi awayêko aktîf mana kerdene îfade kenê.

(Lêkerên gerguhêz/têper: Ew lêkerên ku objeyê wan hebe yan zî tesîr li tiştên din dikin, ji wan re dibêjin lêkerên têper. Bi gotineke din, karê ku tête kirin ku bersiva pirsên “çi, çi tişt” û “kî-kê, kîjan” bide, ew lêkera têper e. Di van cuda lêkeran de berê hereketê ber bi derve ye û her wext bi awayekî aktîf mana kirinê îfade dikin).

Zazakî

şimitene/şimitiş

akerdene/akerdiş

kendene/kendiş

vatene/vatiş

dayene/dayîş

girewtene/girewtiş

erînayene/erînayîş

raykerdene/raykerdiş

padayene/padayîş

peyda kerdene/peydakerdiş

vinî kerdene/vinîkerdiş

awan kerdene/awankerdiş

Mi aw şimite.

Mi ard kena.

Ay deyrî vatî.

Kurmancî

vexwarin

vekirin

kolandin

gotin

dan(dayin)

girtin

kirîn

rêkirin(lêkerên hevdûdanî yên gruba yekem)

dadan

peydakirin

(lêkerên hevdûdanî yên gruba duwem)

wendakirin

avakirin

Min av vexwar.

Min erd koland.

Wê stran gotin.

Ey bostan awda.	Wî bostan avda.
Ma firingî erînayê.	Me firingî kîrîn.
To çi wend? Mi kitab wend.	Te çi xwend? Min kitêb xwend.
Cinêke yew name raykerd.	Jinîkê nameyek rêkir.
Zelale heme hîrê paceyê dersxanî akerdî.	Zelalê her sê pencereyên dersxanê vekirin.
Seba viraştene banî, kereste peyda kerd.	Ji bo çêkirina banî kereste peyda kir.
Dewê ke veşay bî, ma newe ra awan kerdî.	Gundên ku şewitî bûn, me ji nû ve ava kirin.

5.2.2. Karê întansîtfî

Ay karê ke objeyê (kerdeyê) ênan çinîyê û yewnayî ser ro tesîr nêkenê, êna ra vajîyeno kerê întansîtfî.

(Lêkerên negerguhêz (têneper): Ew lêkerên ku objeyên wan tune ne û li ser yekê din tesîr nakin, ji wan re dibêjin lêkerên têneper/neggerguhêz).

Zazakî	Kurmancî
ameylene/ameyîş	hatin
bermayene/bermayîş	girîn
firayene/firayîş	firîn
şîyayene/şîyayîş	çûn(çûyin)
merdene/merdiş	mirin
kewtene/kewtiş	ketin
rakewtene/rakewtiş	raketin
remayene /remayîş	revîn
bermayene/bermayîş	girîn
varayene/varayîş	barîn
vazdayene/vazdayîş	bezîn/bazdan
çerayene/ çerayîş	çêrîn/çêrandin
gêrayene/gêrayîş	gerîn

Mîsal:

O vizêr dew ra ame.	Ew do ji gund hat.
Mamoste ame.	Mamoste hat.
Dayika mi qeهران vera bermena.	Dayika min ji ber qeهران digirî.
Mîrçike firena.	Çûk difire.
Ez heta keye vazdaya.	Ez heta malê bazdam.
Dapîra mi merde.	Dapîr min mir.
Doman banî ser ra kewt.	Zarok ji ser banî ket.
Dizd rema.	Diz revî.
Pitik bermeno.	Pitik digrî.
Varan vareno.	Baran dibare.
Ez heta keye vazdaya.	Ez heta malê bezîyam.
Gawan naxir çerêneno.	Gavan naxir diçêrîne.
O, şew û roj gêreno.	Ew, şev û roj digere.

Antişê karandê vêrdaye û nevêrdayeyan, demo nikayên û demo bêro de seycê yî, labelê demo veyarte de qeydeyê antişê ênan seycê nîyo.

Hem dimilî û hem zî kurmancî de karê nevêrdayey şênê hal bedilnê û bibê karê vêrdayey. Seba ey rê dimilî de peynîya kokê karî de çekûya /-nayış, -nayene/ yena û ê kurmancî de zî çekûya /-andin/ yena. Karê ke bi eno hawa virazîyenê û mana aktîfbîyena ênan vêşî bena, ti ra vaj-yeno karê sedemkarî.

(Kêşana lêkerên gerguhêz û lêkerên negerguhêz, di dema niha û dema dahatû de wekhev e, lêbelê di dema borî de qeydeyê kêşandina wan ne wekhev e.

Hem di zazakî û hem jî kurmancî de lêkerên negerhuhêz dikarin hal biguherînin û bibin lêkerên gerguhêz. Ji bo vê yekê, di zazakî de paşqertafa /-nayış, -nayene/ û di kurmancî de jî paşqertafa /-andin/ tê dawîya koka lêkerê. Lêkerên ku bi vî awayî çêdibin û mana aktîfbûna wan zêde dibe, ji wan re dibêjin lêkerên sedemkar).

Zazakî

nêvêrdaye-vêrdaye
birayene/birnayene
remayene/remnayene
vazdayene/vazdnayene
gêrayene/gêrnayene
veşayene/veşnayene
nustene/nûsnayene
rişayene/ rişnayene
dirayene/dirnayene
vindertiş/vindernayîş
recifyayîş/recifnayîş
varayîş/ varnayîş
çerayîş/çerênayîş
tersayîş/tersnayîş
ciwyayîş/ciwênayîş

Kurmancî

negerguhêz-gerguhêz
birîn/birandin
revîn/ revandin
bezîn/ bezandin
gerîn/ gerandin
şewitîn/şewitandin
nivîsîn/nivîsandin
rijîn/rijandin
dirîn/dirandin
rewestin/rawestandin
recifîn/recifandin
barîn/barandin
çêrîn/çêrandin
tirsîn/tirsandin
jiyîn/jîyandin

5.3. Tesnîfkerdena karan goreyê kerdoxî

(Dabeşkirina lêkeran li gor kirdar)

5.3.1. Karê aktîfî

Her karo aktîf mutleqê yew objeyê ey esto û no obje (kerde) raşteraşt bindê tesîrdê kerdoxê karî de yo, yanî kerdox dîyar o û esas kerdox bi xo yo. Her karo aktîf zî karêko vêrdaye yo.

(Lêkerên lebatî: Her lêkera aktîf mutleqê objeyek wê heye û ev obje rasterast di bin tesîra kirdar de ye, yanî kirdar dîyar e û esas kirdar bi xwe ye. Her Lêkerek aktîf heman demî lêkerek gerguhêz e).

Zazakî

Zelale name nust (nuşt).
 Şiwane pesî çerêno.
 Westa xalî virazeno.
 Mamoste ders dano domanan.
 Ferzanî camê dolabe şikit.
 Cinêka dewije rêşta rêseno.

Kurmancî

Zelalê name nivîsand.
 Şivan pesî diçêrîne.
 Hoste xalî çêdike.
 Mamoste ders dide zarokan.
 Ferzanî camê dolabê şikand.
 Jinika gundî teşî dirêse.

5.3.2. Karê pasîfî

Karo pasîf zî raşteraşt tesîr bi kerdeyî(obje) keno, labelê nê karan de kerde û kerdarî/kerdoxî(subje) ca bedilnenê. No sebeb ra etiya de ê muhîm kerdox nîyo, bîyayena karî bi xo ya. Karê pasîfî, bi awayêke karandê aktîfan ra peyda benê; ke zazakî de peynîya halê demewo vêyarte yê karandê aktîfan de vateyê **/-ya/** û **/-eya/** yan zî goreyê deman **/ameyene**⁸ bêro vernîda karî, kar beno pasîf. Kurmancî de zî çekûyê **/bi destê/** yan zî **/ji aliyê/**, bêrê vernîya kerdeyê ke cayê kerdoxî gênê, karo aktîf beno pasîf.

(Lêkerên tebatî: Lêkra pasîf jî raserast tesîr li objeyê dike, lêbelê di ev cure lêkeran de obje û kirde cî diguherin, ji ber vê yekê di vir de yê girîng ne kirde(kir-dar) ye, hebûna lêker bi xwe ye. Lêkerên pasîfî bi xwe jî, ji lêkerên aktîf peyda dibin; ku di zazakî de, di dawîya halê dema borî ya lêkeran de qertafên **/-ya/** û **/-iya/** yan jî li gor deman **/ameyene**⁸ were pêşîya lêkerê, lêker dibe pasîf. Di kurmancî de jî **/hatin/** were pêşîya lêkerên ku ciyê kirde digre, wê demê lêkera aktîf dibe pasîf).

Zazakî

Aktîf	Pasîf
da	diya/ ame dayene
nust	nusîya/ ame nustene
werd	werîya/ ame werdene

Kurmancî

Aktîf	Pasîf
da	hate dayin
nivîst	hate nivîsandin
xwar	hate xwarin

remna	remîya/ ame remnayen	revand	hate revandin
vat	vajîya/ ame vajyayene	got	hate gotin
viraşt	virazîya/ ame virzyayene	çêkir	hate çêkirin
vîna	vinîya/ ame vinayene	dî	hate dîtin
ramit	ramîya/ ame ramitene	ajot	hate ajotin
pewt	pewjîya/ ame pewtene	peht	hate pehtin
vijêna	vijênîya/ ame vijênayene	bijart	hate bijartin

Mîsal:

Vergî mêşna werde.	Gurî mêşin xwar. (aktîf)
Hemşîra darû da nêweşan.	Hemşîre derman da nexweşan. (aktîf)
Domanan keberî şikîfî.	Zarokan derî şikandin. (aktîf)
Mêşna weryaye./Mêşna ameye werdiş.	Mêşin hate xwarin. (pasîf)
Texsî ramiyaye./Texsî ameye ramitene.	Texsî hate ajotin. (pasîf)
Seba mamosteyan xelate diyaye.	Ji bo mamosteya xelat hate dayin. (pas.)
Nêweşan ra gunî gêriyaye.	Ji nexweşan xun hate girtin. (pasîf)

5.3.3. Karê agêrayoxî

Zazakî de agêrayena karî bi vateya xo/xû ya û kurmancî de zî bi xo/xwe ya virazîyeno û xo vernîya karandê aktîf û vêrdeyan de yeno nûstene.

(Lêkerên vegerok: Di zazakî de lêkerên vegerok bi peyva xo/xû, di kurmancî de jî bi peyva xo/xwe, li xwe têne çêkirin û li pêşiya lêkerên aktîf û gerguhêz de tê nivîsîn).

Zazakî

Xo ameyîş./ Xo aqilyayîş.

Xo şinasnayîş.

Kurmancî

Li xwe hatin.

Xwe nasîn

Xo limitîş.

Xwe veşartin.

Xo şitiş.

Xwe şuştin.

Xo vînayene.

Xwe dîtin.

Xo xapênayîş.

Xwe xapandin.

5.3.4. Karê bê kerdoxî

“Nê bêj karî, bi nameyê eleqederan pawa halê kesê yewhûmarê hîrine de yenê xebitnayîş”⁹ .

(Lêkerên bê kirde: “Ev cuda lêker, bi tevî navên eleqeder di halê şaxisê yek-hejmar ê sêymîn de têne bikaranîn”⁹).

Zazakî

Kurmancî

vewre varayene/vewre varayîş

berf barîn

varan varayene/ varan varayîş

baran barîn

va amayene/ va ameyîş

ba hatin

tarî bîyayene/tarî bîyayîş

tarî bûn

Aşama gulane de varayena tabêk varanî, darûyê ziyarî. (z)

Di meha gulanê de barîna tavêk baranê, dermanê ziyana ye. (k)

5.4. Tesnîfkerdena goreyê şikilî

Ziwanê kurdî de karî goreyê şeklê xo benê di şaxî: 1- Karê rêzdarî yan zî karê bi qayde, 2- Karê bêrêzî yan zî karê bê qayde.

(**Dabeşkirina li gor şikilî:** Di zimanê kurdî de lêker li gor şiklê xwe dibin du şax: 1- Lêkerên rêzdar yan jî lêkerên bi qeîde, 2- Lêkerên bêrêz yan jî lêkerên bê qaîde).

5.4.1. Karê bi qayde

Zazakî û kurmancî de vêşaneya karan bi qayde yî, şiklê emirdayena enê karan goreyê qaydeyêk virazîyeno û halê raweya ênan de kokê karî nêbedêlyeno. Labelê gerek ma bizanê ke zazakî û kurmancî de heme karê rêzdarî seycê nîyê: miqabilê tayê karê rêzdarane zazkî, kurmancî de karê bêrêzî yenê; miqabilê tayê karandê kurmancî zî zazakî de tayê karê winayênî estî. Mîsal: Vat/got²³ vaje/bêje... Nê bêj karî zî xo mîyan de benê di şaxî: 1) ayê ke kokê ênan bi yew herfêda vengine qedyenê; 2) ayê ke kokê ênan bi yew herfêda bêvengine qedyenê.

(Lêkerên bi qaîde): Di zazakî û kurmancî de piraniya lêkeran bi qayde ne, şiklê fermaniya van karan li gor qaydeyêk çêdibe û di halê raweyê de koka kar nanguhere. Lêbelê divê em bizanin ku di zazakî û kurmancî de hemû lêkerên rêzdar newekhev in: miqabilê hinek lêkerên rêzdar ên zazakî, di kurmancî de karên bêrêz tên; miqabilê hinek lêkerên kurmancî jî di zazakî de hinek lêkerên winî hene. Mîsal: vat/got □ vaje/bêje, ... Ev cuda lêker jî di nav xwe de dibin du şax: 1) ewên ku koka wan bi tîpeke bideng diqedin; 2) ewên ku bi koka wan tîpeke bêdeng diqedin).

5.4.1.1. Karê bi qayde yê ke bi yew herfa vengina qedyenê:

(Lêkerên bi qayde yên ku bi tîpeka bideng diqedin):

kokê karî/koka lêker demo vêyarte/dema borî halê fermanî

zazakî/kurmancî	zazakî/kurmancî	zazakî/kurmancî
birnayene/birîn	birna/birî	bibirne/bibire
cenayene/jenîn	cena/jenî	bicene/bijene
çerayene/çêran	çera/çêrî	biçere/biçêre
dayene/dayîn	da/da	bidi-bide/bide
ewnîyayene/nihêrîn	ewnîya/nihêrî	biewnîye/binihêre
gêrayene/gerîn	gêra/gerîya	bigêre/bigere
herikyayene/herikîn	herikya/herikî	biherike/biherike

kenayene/kolîn	kena/kola	bikene/bikole
lawayene/reyîn	lawa/reyî	bilawe/bireye
nalayene/nalîn	nala/nalî	binale/binale
remayene/revîn	rema/revya	bireme/bireve
resayene/gehan	resa/geha	birese/bigehe
rişnayene/rijîn	rişna/rijand	birîşe/birije
tehnayene/hêrandin	tehna/hêra	bitehne/bihêre
tersayene/tirsîn	tersa/tirsî	biterse/bitirse
zanayene/zanîn	zana/zanî	bizane/bizane

5.4.1.2. Karê bi qayde yê ke bi yew herfa bêvengina qedyenê:

(Lêkerên bi qayde yên ku bi tîpeke bêdeng diqedin):

mesderê karî/lêker	demo vêyarte/dema borî	halê fermanî
zazakî/kurmancî	zazakî/kurmancî	zazakî/kurmancî
antene/kişandin	ant/kişand	biance/bikişîne
cawitene/cûtin	cawit/cût	bicawe/bicûwe
aşnawitene/bihîstin	aşnawit/bihîst	biaşnawe/bibihîse
cikerdene/jêkirin	cikerd/jêkir	cike/jêke
girotene/girtin	girot/girt	bigîre/bigire
helnayene/helandin	heln/heland	bihelne/bihelîne
hûmartene/jimartin	hûmart/jimart	bihûmare/bijmêre
kiştene/kuştin	kişt/kûşt	bikişe/bikûje
limitene/veşartin	limit/veşart	bilimne/veşêre
merdene/mirin	merd/mir	bimire/bimire
pawitene/parastin	pawit/parast	bipawe/biparêze
pewtene/pehtin	pewt/peht	bipewje/bipêje
peymawitiş/pîvandin	peymawit/pîvand	bipeymawe/bipîve

piştiş/pêçandin	pişt/pêça	bipêşe/bipêçe
eyştene/avêtin	eyşt/avêt	bierze/biavêje
ramitene/ajotin	ramit/ajot	birame/biajo-bajowe
rêstene/rêstin	rêst/rêst	birêse/birêse
şitene/şûştin	şit/şûşt	bişûwe/bişûwe
tefênayene/tefandin	tefêna/tefand	bitefêne/bitêfîne
veşnayîş/sotin	veşa/sot	biveşne/bisote
wendene/xwendin	wend/xwend	biwane/bixweyne
werdene/xwarin	werd/xwar	biwere-bore/bixwe
xemilnayene/xemilandin	xemilna/xemiland	bixemilne/bixemlîne

5.4.2. Karê bê qayde

Goreyê viraştina ênan tayê xûsuyetê enê bêj karan winî yî: Demo verên û halê fermanî yê ênan de kokê karan bedêlyenê û goreyê deman zî berdewamî şikilê karî bedêlyenê.

(Lêkerên bê qayde (bêrêz): Li gor çêbûana wan hinek xûsuyetên ev cuda karan wisa ne: Di dema borî û halê fermanî yê wan de kokê lêkeran diguhere û li gor deman jî berdewamî şiklê lêkerê diguhere).

mesderê karî	demo niha yo hîra	demo vêyarte	halê fermanî
(mesderê lêkerê)	(dema nûha ya fire)	(dema borî)	
zaz. / kur.	zaz. / kur.	zaz. / kur.	zaz. / kur.
ameyene/hatin	yeno/ dihê-tê	ame/hat	bê/were
ardene/anîn	ano/tîne-diîne	ard/anî	bîya/bîne
berdene/birin	beno/dibe	berd/bir	bibi-bibe/bibe
dayene/dayin	dano/dide	da/da	bide/bide
dotene/dotin	doşeno/didoşe	dot/dot	bidoşe/bidoşe
kotene/kotin-kûhtin	kojeno/dikoje	kot/kot-kûht	bikoje/bikoje

mendene/mayin	maneno/dimîne	mend/ma	bimane/bimîne
pewtene/pehtin	pewjeno/dipêje	pewt/peht	bipewje/bipêje
ritiş/maliştin	riweno/dimale	it/malişt	biriwe/bimale
rişnayene/rêtin	rişneno/diriye	rişna/rijand	birişne/birijîne
şiktene/şikandin	şikneno/dişikîne	şikna/şikand	bişikne/bişikîne
şiyayene/çûyin	şino-şono/diçe	şi/çû	şo/biçe-here
vatene/gotin	vano/dibêje	vat/got	vaje/bibêje
vetene/derxistin	vejeno/derdixe	vet/derxist	veje/derxe
vînayîş-vînayene/dîtin	vînenno/dibîne	vîna/ bîna-dît	bivîne/bibîne
viraztiş/çêkirin	virazeno/çêdike	viraşt/çêkir	viraze/çêbike
vistiş/avêtin	arzeno/davêje	vist/avêt	fîne/biavêje-bavêje
wendene/xwendin	waneno/dixwîne	wend/xwend	biwane/bixweyne
werdene/xwarin	weno/dixwe	werd/xwar	bore biwere/bixwe
werzayîş/rabûn	werzeno/dirabe	werza/rabû	biwerze-werze/rabe
kerden-kerdiş/kirin	keno/dike	kerd/kir	bike/bike

5.5. Rawe

Wexto ke ma behsê hukmêk, têvger, tesîr û halê kerdênêk bikê şiklê karî bedêlîyeno, nê her yew şikildê karî ra vajiyo rawe. Tayê karî bî-yayen û peyda bîyayena kardene dîyar kenê, tayê karî zî waztişêk yan zî hereketêko tesawurkerde îfade kenê. Raweyî bi hereketê objeyan gore yenê namekerdiş.

(**Rawe:** Dema ku em behsa hukmek, tevger, kirinek û rewşa ku ji ber wan peyda bûye bikin wê demê şiklê lêkerê jî diguhere û ji wan her yek şiklî re dibêjin rawe. Hinek lêker bûn û peydabûna kirinê dîyar dikin, hinek lêker jî xwestinek yan jî hereketek tesawirkirî îfade dikin. Rawe li gor tevgera objeyan têne binavkirin).

5.5.1. Raweya waztişîye

Seba aşkerekirdîşê çiyê ke bîyayena ênan mutlaq nêbo labelê wazten, tesawir û nîyet kerdena bîyayena ênan mimkun bo, na rawe yena xebitnayîş. No sebeb ra, zaf rayan bi yewna karî pawa yena vatene.

(Reweya xwestekî/bilanî: Ji bo aşkerekirina tiştên ku bûyina wan mutlaq nebe lêbelê xwestin û tesewir û nîyet kirina bûyina wan mimkun be, ev rawe tê bikaranîn. Ji ber vê yekê, gelek caran bi tevî lêkerek din têne gotin).

Raweya waztişî demo nikayên de Reweya xwestekî di dema nûha de

Halo erênî

Helê erênî

(wa) ez bika

(bila) ez bikim

(wa) ti bikê

(bila) tu bikî

(wa) o biko/(wa) a biko

(bila) ew bike

(wa) ma bikê

(bila) em bikin

(wa) şima bikê

(bila) hun bikin

(wa) ên(ê) bikê

(bila) ew bikin

Halo nêyinî

Halê neyinî

(wa) ez nêka

(bila) ez nekim

(wa) ti nêkê

(bila) tu nekî

(wa) o nêko/(wa) a nêko

(bila) ew neke

(wa) ma nêkê

(bila) em nekin

(wa) şima nêkê

(bila) hun nekin

(wa) ên(ê) nêkê

(bila) ew nekin

Wa xebata xo biko, wa bibetilyo.

Bila xebata xwe bike, bila biweste.

5.5.2. Raweya fermanî

No halê rawe, fermanê bîyayena karî dano. Seba viraştina halê fer-

manî yê karan, veredata /bi-/ yeno vernîya kokdê karî. Labelê ke kar bê qaîde bo, tayê karan de halê fermanî bê veredatê /bi-/ zî yeno viraştene. Hem zazakî û hem jî kurmancî de raweya fermanî goreyê di şexisan virazîyena: 1- şexiso yewhumar û didin; 2- şexiso zafhumar û didin.

(Raweya fermanî: Ev halê rawe, fermana bûyina kar dide. Ji bo çêkirina halê fermanî yê lêkeran pêşdaçeka /bi-/ tê pêşiya koka lêkerê. Lêbelê ku lêker bêrêz(bê qaîde) be, di hinek lêkeran de halê fermanî bê pêşdaçeka /bi/ jî tê çêkirin. Hem di zazakî û hem jî kurmancî de raweya fermanî li gorî du şaxisan çêdibe: 1-şaxisê yekhejmarê duyemîn; 2-şaxisê pirhejmarê duyemîn).

Zazakî

seba şexisê yewhumarê 2.

bike

bişikne

bireme

bizane

biwane

binuse

bipewje

bilinme

seba şexisê pirhumarê 2.

bikê

bişiknê

biremê

bizanê

biwanê

binusê

şirênê

bilimnê

Kurmancî

ji bo şexisê yekhejmarê 2.

bike

bişikîne

bireve

bizane

bixweyne

binivsîne

bipêje

veşêre

ji bo şexisê pirhejmarê 2.

bikin

bişikînin

birevin

bizanin

bixweynin

binivsînin

biçin

veşêrin/biveşêrin

5.5.3. Raweya gerekîye

Seba hemin şexisan yena xebitnayîş. Karî eno hal de, bêşaxis û bêhumar yenê antiş. Seba neye, kerdarê karî zî dîyar nîyê.

(Raweya gerekî: Ji bo hemû şexisan tête bikaranîn. Lêker di vî halî de, bê şexis û bê hejmar têne kêşandin. Ji ber vê yekê kirdarê lêkerê jî nedîyar e).

Raweya “gerek”îye demo nikayên de:

(Raweya “gerek”îyê di dema nûha de):

Halo erênî

gerek ez bika

gerek ti bikê(a)

gerek o(a) biko

gerek ma bikê

gerek şima bikê

gerek ên bikê

Helê erênî

gerek ez bikim/ divê ez bikim

gerek tu bikî

gerek ew bike

gerek em bikin

gerek hun bikin

gerek ew bikin

Halo nêyinî

gerek ez nêka

gerek ti nêkê(a)

gerek o(a) nêko

gerek ma nêkê

gerek şima nêkê

gerek ên nêkê

Halê neyinî

gerek ez nekim/ divê ez nekim

gerek tu nekî

gerek ew neke

gerek em nekin

gerek hûn nekin

gerek ew nekin.

5.5.4. Raweya werrekî (xwezîka)

Bîyayîşê karî de nîyaz û xwezîye dîyar kenê, heme zemanan de yenê antiş.

(Raweya xwezîka: Di bûyina lêkerê de nîyaz û xwezîyê dîyar dike û di hemû deman de tê kêşandin).

Raweya “xwezîka” demo nikayên de:

Halo erênî

(werrekî) ez bika

(werrekî) ti bikê/ ti bika.

(werrekî) o(a) biko

(werrekî) ma bikê

(werrekî) şima bikê

(werrekî) ên bikê

Raweya “xwezîka” di dema nûha de:

Helê erênî

(xwezîka)ez bikim

(xwezîka) tu bikî

(xwezîka) ew bike

(xwezîka) em bikin

(xwezîka) hun bikin

(xwezî) ew bikin

Halo nêyinî

(werrekî) ez nêka

(werrekî) ti nêkê

(werrekî) o(a) nêko

(werrekî) ma nêkê

(werrekî) şima bikê

(werrekî) ên nêkê

Halê neyinî

(xwezîka)ez nekim

(xwezîka) tu nekî

(xwezîka) ew neke

(xwezîka) em nekin

(xwezîka) hun nekin

(xwezî) ew nekin

5.5.5. Raweya şertî

No halê karî de, bîyayena yew karî bi şertê bîyayena yewna karî ra girêdaye yo û pêrin zemanan de yeno xebitnayîş. Seba viraştina eno halê karî, zazakî de vateyê “eke, eger” û kurmancî de zî “heke, eke, eger” yenê vernîya karî.

(Raweya şertî: Di vî halê lêkerê de, pêkhatina lêkerek bi şertê pêkhatina lêkerê dî ve girêdayî ye û di hemû deman de tê kêşandin. Ji bo çêkirina vî halê lêkerê, di zazakî de peyvên “eke, eger” û di kurmancî de jî “heke, eke, eger” têne pêşiya lêkerê).

Raweya şertî demo nikayên de

(Raweya şert di dema nûha de)

Halo erênî

eke(eger) ez bika

eke ti bikê

eke o(a) biko

eke ma bikê

eke şima bikê

eke ên bikê

Halê erênî

eke(eger) ez bikim

eke tu bikî

eke ew bike

eke em bikin

eke hun bikin

eke ew bikin

Halo nêyinî

eke(eger) ez nêka

eke ti nêkê

eke o nêko/eke a nêko

eke ma nêkê

eke şima nêkê

eke ên nêkê

Halê neyînî

eke(eger) ez nekim

eke tu nekî

eke ew neke

eke em nekin

eke hûn nekin

eke ew nekin

Eke varan nêvaro, ma şinê dewe.

Eke baran nebare, em diçin gund.

Eger mêrdim nêweş bo, nişêno vazdo.

Eger meriv nexweş be, nikare bazde.

5.5.6. Raweya şênayene

Mana besbîyayen û qîmkerdena hêza bîyayene dano kar û kerdene.

(Raweya karînê: Mana besbûn û qîmkirina hêza bûyinê dide kar û lêkerê).

Raweya “şênayene” demo nikayên de

(Raweya “karîn” di dema nûha de)

Halo erênî

Helê erênî

ez şêna bika
ti şênê bikê/ti şêna bika
o şêno biko/a şêna bika
ma şêna bikê
şima şênê bikê
ên şênê bikê

Halo nêyinî

ez nişêna bika
ti nişênê bikê/ti nişêna bika
o nişêno biko/a nişêna bika
ma nişênê bikê
şima nişênê bikê
ên nişênê bikê

Ez şêna nê barî wegêra.
Ez nişêna zey to vazda.
Ma şênê pêrin persan virazê.
Ma nişênê pêrin persan virazê.
Kê nişênê şarî, ma kê nişênê xo zî?

ez dikarim bikim/ez dişêm bikim
tu dikarî bikî/ tu dişê bikî
ew dikare bike/ ew dişê bike
em dikarin bikin/em dişên bikin
hun dikarin bikin/ hun dişên bikin
ew dikarin bikin/ ew dişên bikin

Halê neyinî

ez nikarim bikim/ez neşêm bikim
tu nikarî bikî/ tu neşê bikî
ew nikare bike/ ew neşê bike
em nikarin bikin/em neşên bikin
hûn nikarin bikin/ hun neşên bikin
ew nikarin bikin/ ew neşên bikin

Ez dikarim vî barî wergirim.
Ez nikarim wekî te bazdim.
Em dikarin hemû pirsan çêkin.
Em nikarin hemû pirsan çêkin.
Meriv nikare xelkê, ma nikare xwe jî?

5.6. Karan de dem

Hem zazakî û hem zî kurmancî de bi giraneye hîrê demî (zemanî) yenê xe bitnayîş: Demo vîyarte, demo nikayin û demo bêro. “Heme têvger û hedîseyê ke mîyandê yew demo dîyarkerde de pê dima benê, bîyena ênan zey helqeyê yew zincîre pêwa girêdaye yî; bîyena tayine “verê” ra, tayine “tira pey” û tayinan zî “ay game” de asenê yanî ma bîyena ênan goreyê zemanî qebûl kenê. Bêguman çîyê ke verê bîyê, tesîr halo ni-

kayên zî kenê û çîyê ke demo bêro de zî bibê, bîyena ênan halo nikayên de teswîr bena. Bi eno hawa “demo nikayên”, navbeyna tebayê ke verê bîyê û tebayê ke bêro de bibê, zey yew helqa zincîre pêwa girêdano. Eger “demo nikayên”, hişdê ma de demo verên û demo bêro ra girêdaye nêbînê, qet yew mana û mûhîmeya ên nêmendê.”¹⁰

Wexto ke nê deman de hadîse û têvgerê beno, ma qalî kenê û çîyêk vanê, goreyê dem û kerde û kerdoxî(kerdarî), vate awa bi awa bedêlyeno; qismêk aye vateyê verênî maneno û qismêk zî bide nêmano. Goreyê deman eno hawa cîyabîyayena vateyan, şiklê îfadekerdena zîwanî zî bedêlînenê ke ey ra vajyeno antena karan (tewang).

(**Di lêkeran de dem:** Hem di zazakî û hem jî kurmancî de bi giranî sê dem têne bikaranîn: Dema raborî, dema niha(nûka) û dema dahatû. “Hemû tevger û he-dîseyên ku di nav demeke dîyarkirî de li pey hev dibin, bûyina wan wek helqeyên zicîrekî bi hev ve girêdayî ne; bûyina hinekan jî “berê” ve, yê hinekan “paqê” û yê hinekan jî di “wê gavê” de xuya dike yanê em bûyina wan li gorî demê qebûl dikin. Bêguman tiqtên ku berê bûne, tesîr li halê nûhayî jî dikin û tiqtên ku di dema dahatû de bibin jî, bûyina wan di halê nûha de teswîr dibe. Bi vî awayî “dama nûha” di navbera tiqtên ku berê bûne û tiqtên ku dahatû de bibin, wek helqeyek zincîrê bi hev re girêdide. Eger “dama nûha”, di hiqê me de bi dema borî û dema dahatû re girêdayî nebûya, qet mane û girîngiyek wan nedima.”¹⁰

Dema ku di van deman de tevger û hadîse dibe, em dipeyivin û tişteki dibêjin, li gor dem û kiryar û kirdar, peyv awa bi awa digorin; qismekê wê dişibe peyva berê û qismekê jî naşibe wê. Li gorî deman ev cudabûna peyvan, şiklê îfadekirina zîman jî diguherîne ku jî wê re dibêjin tewanga lêkeran).

5.6.1. Demo vîyarte

No dem, hem zazakî de û hem zî kurmancî de bi aqetnayena mesderê karan peyda beno û bîyayena karê verê nikayî dîyar keno.

(Dema raborî: Ev dem, hem di zazakî û hem jî kurmancî de bi veqetandina

mesderê lêkeran peyda dibe û bûyina karê berîya vê gavê dîyar dike).

Zazakî

kar: wendene-wendiş (bê qaîde)

Halo erênî

Mi wend.

To wend.

Ey wend./Ay wend.(m.)

Ma wend .

Şima wend.

Ên wend.

Halo nêyinî

Mi nêwend.

To nêwend

Ey nêwend./A nêwend(m.)

Ma nêwend .

Şima nêwend.

Ên nêwend.

Kurmancî

lêker: xwendin (bê qaîde)

Halê erênî

Min xwend.

Te xwend.

Wî xwend./Wê xwend.

Me xwend.

We xwend.

Wan xwend.

Halê neyinî

Min nexwend.

Te nexwend.

Wî nexwend./Wê xwend.

Me nexwend.

We nexwend.

Wan nexwend.

5.6.2. Demo nikayin

No dem, gama qisekerdene de bîyayen û dest pê kerdena yew kar û têvgere dîyar keno û seba îzahkerdena karê ay game yeno xebitnayîş.

(Dema niha: Ev dem, di gava axaftinê de bûyin û destpêkirina tevger û lêkerê dîyar dike û ji bo îzahkirina karê wê gavê tê bikaranîn).

Zazakî

kar: wendene-wendiş

Halo erênî

Kurmancî

lêker: xwendin

Helê erênî

Ez wanena.	Ez dixwînim.
Ti wanênê./Ti wanena. (m.)	Tu dixwînî.
O waneno./A wanena. (m..)	Ew dixwîne.
Ma wanenê.	Em dixwînin.
Şima wanenê.	Hûn dixwînin.
Ên(ê) wanenê.	Ew dixwînin.

Halo nêyinî	Halê neyînî
Ez nêwanena.	Ez naxwînim.
Ti nêwanênê./Ti nêwanena. (m.)	Tu naxwînî.
O nêwaneno./A nêwanena. (m..)	Ew naxwîne.
Ma nêwanenê.	Em naxwînin.
Şima nêwanenê.	Hun naxwînin.
Ên(ê) nêwanenê.	Ew naxwîne.

5.6.3. Demo hîra yo dewamî

No dem, gama dest bide kerdên û dewam bîyayena yew karî û têvgere dîyar keno.

(Dema fire ya dewamî: Ev dem, gava destpêkirin û berdewambûna lêker û tevgerêk dîyar dîke).

<i>Halo erênî</i>	<i>Helê erênî</i>
Ez ha ¹¹ wanena.	Ez dixwînim.
Ti ha wanenê(a).	Tu dixwînî.
O ha waneno/A ha wanena.	Ew dixwîne.
Ma ha wanenê.	Em dixwînin.
Şima ha wanenê.	Hûn dixwînin.
Ê(ê) ha wanenê.	Ew dixwînin.

Halo nêyinî

Ez ha nêwanena.

Ti ha nêwanenê(a).

O ha nêwaneno/A ha nêwanena.(m.)

Ma ha nêwanenê.

Şima ha nêwanenê.

Ê(ê) ha nêwanenê.

Halê neyinî

Ez naxwînime.

Tu naxwînî.

Ew naxwîne.

Em naxwînin.

Hûn naxwînin.

Ew naxwînin.

5.6.4. Demo vîyarteyo nedîyar

Antişê karan no dem de, seba îzahkerdena kar û têvgerê ke verêna dest pê kerdo û tesîrê ênan nika zî dewam keno yo.

(Dema raborîya nedîyar: Di vê demê de kêşandina lêkeran, ji bo îzahkirina kar û têvgera ku ji berê de destpêkirîye û tesîra wan nûha jî dewam dike ye).

Halo erênî

Mi wendo.

To wendo.

Ey/Ay wendo.

Ma wendo.

Şima wendo.

Ênan wendo.

Helê erênî

Min xwendîye.

Te xwendîye.

Wî/Wê xwendîye.

Me xwendîye.

We xwendîye.

Wan xwendîye.

Halo nêyinî

Mi nêwendo.

To nêwendo.

Ey/Ay nêwendo.

Ma nêwendo.

Şima nêwendo.

Ênan nêwendo.

Halê neyinî

Min nexwendîye.

Te nexwendîye.

Wî/Wê nexwendîye.

Me nexwendîye.

We nexwendîye.

Wan nexwendîye.

5.6.5. Demo vîyarteyo dewamî

No dem, îzehatê kar û têvgerê ke verê dewamî bîyê yan zî dibare bîyayena ênan kenê.

(Dema borîya berdewam: Ev dem, îzeheta kar û tevgerên ku berê berdewamî bûne yan jî dubarebûna pêkhatina wan dikin).

Halo erênî

Mi wendênê.

To wendênê.

Ey wendênê./Ay wendênê.

Ma wendênê.

Şima wendênê.

Ênan wendênê.

Helê erênî

Min dixwenda.

Te dixwenda.

Wî dixwenda.

Me dixwenda.

We dixwenda.

Wan dixwenda.

Halo nêyinî

Mi nêwendênê.

To nêwendênê.

Ey nêwendênê./A nêwendênê.

Ma nêwendênê.

Şima nêwendênê.

Ênan nêwendênê.

Halê neyinî

Min nedixwenda.

Te nedixwenda.

Wî nedixwenda.

Me nedixwenda.

We nedixwenda.

Wan nedixwenda.

5.6.6. Demo vîyarteyo nedîyar o verên

Kerdeyê ke demo veyartewo nedîyar de bîyê, îzahkerden û hîkayekerdena ênan a seba nikayî, bi eno dema beno. Qandê neye rê, zazakî de /bî/ û kurmancî de zî /bû/ sey karê alîkerdene yenê peynîya halê demo veyarte yê karan.

(Dema raborîya çîrokî: Kiryarên ku di dema raborî ya nedîyar de bûne, îzahkirin û hîkayekirina wan a ji bo nûha, bi vî demê çêdibe. Ji bo vê yekê, di za-

zakî de lêkera alîkar a /bî/ û di kurmancî de jî /bû/ têne dawîya halê dema raborîya lêkeran).

Halo erênî

Mi wend bî.

To wend bî./A wend bî.

Ey/Ay wend bî.

Ma wend bî.

Şima wend bî.

Ênan wend bî.

Halê erênî

Min xwendibû.

Te xwendibû.

Wî/wê xwendibû.

Me xwendibû.

We xwendibû.

Wan xwendibû.

Halo nêyinî

Mi nêwend bî.

To nêwend bî./A nêwend bî.

Ey nêwend bî./Ay nêwend bî.

Ma nêwend bî.

Şima nêwend bî.

Ênan nêwend bî.

Halê nêyinî

Min nexwendibû.

Te nexwendibû.

Wî/wê nexwendibû.

Me nexwendibû.

We nexwendibû.

Wan nexwendibû.

5.6.7. Demo vîyarteyo nîyetkerde

(Dema raborîya nîyetkirî)

Halo erênî

Mi wend bîya.

To wend bîya.

Ey/Ay wend bîya.

Ma wendbîya.

Şima wendbîya

Ênan wend bîya.

Helê erênî

Min xwendibûya.

Te xwendibûya.

Wî/Wê xwendibûya.

Me xwendibûya.

We xwendibûya.

Wan xwendibûya.

Halo nêyinî

Mi nêwend bîya.

To nêwend bîya.

Ey/A nêwend bîya.

Ma nêwendbîya.

Şima nêwendbîya

Ênan nêwend bîya.

Halê neyinî

Min nexwendibûya.

Te nexwendibûya.

Wî/Wê nexwendibûya.

Me nexwendibûya.

We nexwendibûya.

Wan nexwendibûya.

5.6.8. Demo ameyox

No dem dîyar keno ke kar, gama qisekerdene ra na heta, wextêdo nedîyar de beno yan zî do bibo.

(Dema dahatû ya sade: Ev dem dîyar dike ku lêker, ji gava peyivînê şûnde, di wextekî nedîyar de çêdibe yan jî wê çê bibe).

Halo erênî

Ez do biwana.

Ti do biwanî./Ti do biwana.

O do biwano./A do biwano.

Ma do biwanê.

Şima do biwanê.

Ê do biwanê.

Helê erênî

Ezê (ez dê) bixwînim.

Tuyê (tu dê) bixwînî.

Ewê (ew dê) bixwîne.

Emê (em dê) bixwînin.

Hunê (hun dê) bixwînin.

Ewê (ew dê) bixwînin.

Halo nêyinî

Ez do nêbiwana.

Ti do nêbiwanê./A do nêbiwano.

O do nêbiwano./A do nêbiwano.

Ma do nêbiwanê.

Şima do nêbiwanê.

Ê do nêbiwanê.

Halê neyinî

Ezê (ez dê) nexwînim.

Tuyê (tu dê) nexwînî.

Ewê (ew dê) nexwîne.

Emê (em dê) nexwînin.

Hûnê (hun dê) nexwînin.

Ewê (ew dê) nexwînin.

5.6.9. Demo ameyox o nîyetkerde

(Çîroka dema dahatû)

Halo erênî

Mi do biwendênê.

To do biwendênê.

Ey/Ay do biwendênê.

Ma do biwendênê.

Şima do biwendênê.

Ênan do biwendênê.

Helê erênî

Min dê bixwenda.

Te dê bixwenda.

Wî/wê dê bixwenda.

Me dê bixwenda.

We dê bixwenda.

Wan dê bixwenda.

Halo nêyinî

Mi do nêwendênê.

To do nêwendênê.

Ey/Ay do nêwendênê.

Ma do nêwendênê.

Şima do nêwendênê.

Ênan do nêwendênê.

Halê nêyinî

Min dê nexwenda.

Te dê nexwenda.

Wî/wê dê nexwenda.

Me dê nexwenda.

We dê nexwenda.

Wan dê nexwenda.

6. Zerf (Hoker)

Vateyê (kelîmeyê) ke manaya kar, sifet û sewbî zerfan hetê “çi hal, çi ca, senî, çi qas, çi wext û kotî (kûra)” bîyayene de îfade kenê, ênan ra vaj-yeno zerf (haldar). Zerf û sîfetî biney pê manenê, labelê yewbina ciya yî. Ciyayeya ênan a esasî: sîfetî, halê name û kelîmeyê ke zey naman yenê xebitnayîş diyar kenê; zerfî zî, kar û vateyê ke wezîfeyê karan vînenê bi ênan a yenê xebitnayîş û tayê hetan ra zî hal û çarçova ênan dîyar kenê. Eger zerf û sîfetî, sînor û çarçoveyêk seba vateyandê bînan dîyar nêkerê, ay wext wezîfeyê naman vînenê. Ke di zerfî pêdima bêrê yan zî yew zerf û yew sifet pêdima bêrê, manaya ênan şidîyena.

Zazakî de vateyê zey “tewr, vêşî, pêro, zaf, bêter” wezîfeyê nê şidênayîşey vînenê. Kurmancî de zî miqabilê ênan, vateyê zey “herî, zêde, hemû, zaf, bêtir” yenê xebitnayîş.

(Hoker/rengpîşe: Ew peyvên ku manaya lêker, rengdêr û hokerên din ji aliyê “çi hal, çi çî, çawa, çiqas, çi wext û kû derê (kûrê)” bûyinê de îfade bikin, ji wan re dibêjine hoker. Hoker û rengdêr hinek dişibin hev lêbelê ji hev cûda ne. Cûdahîya wan a esasî: Rengdêr, halê navan û peyvên ku wekî navan têne bikaranîn dîyar dikin; hoker jî, lêker û bi tevî wan peyvên ku wezîfeyê lêkeran dibînin têne bikaranîn da ku ji hinek aliyan ve hal û çarçova wan dîyar bikin.

Eger hoker û rengdêr, ji bo peyvên din sînor û çarçoveyek dîyar nekin, wê demê wezîfeyê navan dibînin. Ku du hoker li pey hev bêne yan jî hokerek û rengdêrek li pey hev bêne, manayê dişidînin.

Di zazakî de peyvên wekî “çi hal, çi çî, çawa, çiqas, çi wext û kûra” wezîfeyê vê şidandinê dibînin. Di kurmancî de jî li hembera wan, peyvên wekî “herî, zêde, hemû, zaf, bêtir û kû derê” têne bikaranîn).

Zazakî

giran/zaf giran.

gird/tewr gird.

pîl (sifet)/tewr pîl (halo şidênaye).

raver/vêşî raver.

rind (sifet)/ zaf rind.

xerab (sifet)/bêter xerab/xerabêr.

Kurmancî

giran/ zaf giran.

gird/herî gird.

mezin/herî mezin.

pêşve/zêde pêşve.

rind/ zaf rind.

xerab/bêtir xerab/xerabtir.

Zazakî û kurmancî de zerfî, goreyê wezîfe û virazyayîşdê xo, sey ke cêr de ameyê nûstîş cêra abiryenê:

(Di zazakî û kurmancî de hoker, li gor wezîfe û çêbûna xwe, wekî li jêr hatine nivîsandin dabeş dibin):

6.1. Zerfê cayî-hetî

Nê bêj zerfî, hem zazakî û hem zî kurmancî de, ca û hetê bîyayena karan(fîilan) û çarçewa ênan nîşan kenê.

(**Hokerên cih-alî nîşandanê:** Ev cûre hoker, hem di zazakî û hem jî kurmancî de cî û alîyê bûyina lêkeran û çarçova wan nîşan dikin).

Zazakî

apey

aver

Kurmancî

berepaş, paşve

berve, pêşve

ay hete	ew alî
bo ver	wê alî
ca ca	cî cî
cêr	jêr
cor	jor/bala
cor ra	ji jor ve
dorme/çoşme	hawîrdor
dûr	dûr
etiya	li vir, vira
ewta/weyta/tiya	ev der
ewca/uca	ew der
heme ca	hemû cî
her ca	her der
kinare	kêlek
miyabên	navbeyn
mîyan	nav
na hete	ev alî
nizdî	nêzîk
no ver	vê alî
pey	paş
peynî	paşî
rî bi rî	rû bi rû
ser	ser
ser ra	di ser ra
seracêr	serbijêr
teber	derve
ver	ber, pêş
ver ra	ji ber ra
ver bi cor	ber bi jor

ver bi cêr
vernî
weca/ewca/ewra
werte
zerre/mîyan

ber bi jêr
pêşî
ew der
nav
hundir

Zazakî

Etiya û ewca pê nêmanenê.
Ver û peya keyedê ma darê mêwî yê.
Zerre û teberê ey sey pê(cê) nîyê.
Werte de weno û kinare de keweno.
Taba varanî ver bi cor şîye.
Çoşmeyê dewda ma bîyo awe.
Wer de vemî de yo, kar de peynî de yo.
No verê çemî ra veyart bo ver.
Enca wareyê bawkalandê ma bî.

Kurmancî

Ev der û ew der lihev namînin.
Ber û paşê xaniyê me darê mêwî ne.
Hundir û derveyê wî newekhev in.
Ji navê dixwe û li kêlekê vedikeve.
Tava baranê ber bi jor çû.
Hawîrdorê gundê me bûye a.
Di xwarinê de li pêşî ye, di kar de li paşî ye.
Ji vê alîyê çem derbasê wê alî bû.
Ev der warê bapîrên me bû.

6.2. Zerfê zeman nîşandayîşî

Ay vateyê ke bîyayen û yew karî hetê zemanî ra dîyar bikê, manaya zemanêko dîyarkerde danê ênan û nê bêj vateyan ra vajyeno zerfê zeman nîşandayîşî.

(**Hokerên zeman nîşandanê:** Ew peyvên ku bûyin û lêkerek ji aliyê zeman ve dîyar bike, manaya zemanek dîyarkirî dide wan û ji ev cûre peyvan re dibêjin hokerên zeman nîşandanê).

Zazakî

anka/nika
ay game
bado (badî)

Kurmancî

nika/ anûka/niha
wê gavê
ji pişt re

bîşew(abîşew)
bîterşew
ca de
emserr
emşew
ewro/eyro
ge ge
gam
gamîna
hema hema
her game
meyşte
na game
newe ra
newe
nêmroj
nêmeyê şew
perarey
perey
rarayan
rew
rojgar
teqeze
tim û tim
timo
şew
şewra
verêna
vîstekê
vizêr

bîşev(şeva çûyî)
bîterşev
cih de
îsal
ev şev/îşev
evro/îro
geh geh
gav
gavek dinê
hema hema
her gav
bêro
vê gavê
ji nû ve
nû
nîvro
nîvê şevê
bitirpêr
pêr
carina
zû/zûka
rojgar
zûzûka, lez û bez
tim û tim
tim
şev
sipêda
ji berê ve
bîstekê
do

Mîsal:

Karê ewroy meverada meyşte.

Karê îro nehêle sibê.

Emşew hewa abîşew ra serdêr o.	Îşew hewa ji bîterşevê sartir e.
Emsar, parî ra weşêr o.	Îsal, ji par xweştir e.
Emsar sarre erey kewte.	Îsal sal dereng ket.
Sernewe vizêr nê perey bî.	Sersal do ne pêr bû.
Ez vîstêk de keye resaya.	Ez di bîstekê de gihîştim malê.
Ey dima meymanî ameyê.	Ji wî şûnda mêvan hatin.
Ma ge ge yewbine vînenê.	Em geh geh hevûdu dibînin.
Qasid verê xwendîyan şîyo.	Qasid berîya xwendîyan çûye.
Gamîna roj şino awan.	Gavek din roj diça ava.
Bîterşew varan zaf vara.	Bîterşev baran pir barî.
Rojgaro ke ziwana peyda bîyo...	Rojgara ku ziman peyda bûye...
Gama ke beno tarî astareyî asenê.	Gava ku tarî dibe stêrk xuya dibin.
Ma newe şamîya xo werde.	Me nû şîva xwe xwar.

Wexto ke zazakî de peycidarê “-ên, -yên” û kurmancî de zî “-în, -yîn” bêrê peynîda zerfandê zemanî, zerfî benê sifet.

(Dema ku di zazakî de qertafên “-ên, -yên” û di kurmancî de jî “-în, -yîn” werin dawîya hokerên zamanê, hoker dibin rengdêr).

Zazakî

emserr/emsarên
ewro/ewroyên
par/ parên
pêrar/pêrarên
vizêr/vizêrên
perey/pereyên

Kurmancî

îsal/îsalîn(evsalîn)
îro/îroyîn
par/parîn
pêrar/pêrarîn
do/doyîn
pêr/pêrîn

Mîsal:

Masto vizêrên.

Mastê doyîn.

Şito ewroyên.

Şîrê îroyîn.

Cewo parên.

Cehê parîn.

Nano bîterşewên.

Nanê bîterşewîn.

6.3. Zerfê vêşaneye û kêmaneye

Wexto ke nê bêj vateyî sifet, kar û zerfandê bînan reyde bêrê nûstene vêşaneye, kemaneye, dereca û mîqdarê ênan dîyar kenê.

(**Hokerên piranî û kêmanî:** Dema ku ev cûre peyv bi tevî rengdêr, lêker û hokerên din bêne nivîsandin piranî, kêmanî, derece û mîqdarê wan dîyar dikin).

Zazakî

Kurmancî

bes

bes

çeharyek

çarek

çend

çend

çiqas

çiqas

gelek

gelek

hende

ewqas

herçî

herçî

kemî

kêm

kemîyêr

kêmtir

kertêk

kertêk

kirtik

kirtik

nême

nîvanî

nixtêk

nixtek

parçe

parçe

pêro

hemû, gişkî

pirr

pirr, tije

qene

qene

ref bi ref

ref bi ref

rişêle bi rêşêle	reşêle bi reşêle
tayn	hindik
taynekî	piçek
tayn tayn	hindik hindik
taynêr	kêmtir, hindiktirîn
temamî	temamî, tevayî
tena	tenê
tikê, tayn	hindik
veng	vala
vêşî, bol	zêde
vêşanîye, piranîye	piranî

Mîsal:

Emsarr varan kemî vara yo.	Îsal baran kêmtir barî ye.
Zelale mi ra taynêr xebityena.	Zelal ji min kêmtir dixebite.
Mamûsa ma hemine ra vat.	Mamosta ji me hemûyan re got.
Nixtêk awe bişime.	Nixtek av vexwe.
Rişêle bi rişêle mîrçikî ameyê.	Rişêle bi rişêle çûk hatin.
Vêşaneyê mêrdeyîye betal kena.	Piranî mêranî betal dike.
Piran ra pîrr û tayinan tayn.	Ji piranî pîr û ji hindikan hindik.
Awa ma rişnaye û sîtilê ma bî veng.	Awa me rijand û sîtilên me bûn vala.
Keye de yew kirtika sabûnî zî nêmena.	Li malê kirtikek sabûn jî nemaye.

6.4. Zerfê texmîn û perskerdişî

Nê bêj zerfî tebeyan, bîyayene û kerdene bi wasîteyê persan dîyar kenê û timo vernîya karan de yenê nûstîş.

(**Hokerên texmîn û pîrskarî:** Ev cûre hoker heyokan(tiştan) bi wesîteyê pîr-san dîyar dîkin û herdem li pêşiya lêkeran têne nivîsandin).

Zazakî

belkî

çi hawa? senî hawa?

çi rê?

çi wext?

çi?

çiqas?

gelo?

kam der?

kamcîn?

key?

kotî ra

kû ra?

qey?

Kurmancî

belkî, belko

çawa? Çawan?

çi ra? Çima?

çi wext?

çi?

çiqas?

gelo?

kî ji wan?

kîjan?

kengî? Kengê?

ji kû?

kû derê? bi kû ve?

qey?

Mîsal:

Gelo domanî çi wext mekteb ra yenê?

Kamcîn rayîr ra şîyê Diyarbekir?

Ti çi rê erey ameyî?

Belkî şîro labelê tam dîyar nîyo.

Şîma key amey keye?

Gelo zarok çi wext ji dibistanê têne?

Di kîjan rê çûne Diyarbekirê.

Tu çima dereng hatî?

Belkî biçe lêbelê tam nedîyar e.

Hun kengî hatin malê?

6.5. Zerfê rewşe

Nê bêj zerfî, wextê kerdên û bîyayena karî de hal û senî bîyayena kerdox, temamker û sewbî zerfan dîyar kenê.

(**Hokerên rewşî:** Ev cûre hoker, di dema kirin û bûyina lêkeran de rewş û çawabûna kirdar, têrker û zerfên din dîyar dikin).

Zazakî

aşkera
bêguman, bêşik
bi nimitikî
biwazê nêwazê
cêracor
derganeye
dima, bado
dostî
feknûr
holî
holêr
kêmî-vêşî
leze
neheqî
nohawa
perîşan
peynî, axir
pîya
qor bi qor
rewarew
rêz bi rêz
rind
teqeze
weşeye
weşî û nêweşî
wina
xemwer
xêrwazeye
xirab

Kurmancî

aşkera
bêguman, bêşik
bi dizî
bivê nevē
jêrejor
dirêjî
paşê
dostanî
devdevkî
başî, qencî
çêtir
kêm-zêde
lez
neheqî
wisan
perîşan
dawî
bi hev re
qor bi qor
zûka
rêz bi rêz
rind
lezgînî
xweşî
xweşî û nexweşî
wisa, wesa, wusa
xemxur
xêrxwazî
xirab

xerabêr	xirabtir
xirabeye/xirabîne	xirabî
zerre ra	ji dil
zerrteng	dilteng
zerrweş	dilxweş

Mîsal:

Bize nimitikî kel wena aşkera zîyena.	Bizin bi dizîka tê keldan û bi aşkera dizê.
Domanî feknûr rakewt bî.	Zarok devdevkî raketibûn.
Mêrdimo xemwer heme çî vera celiyeno.	Mirovê xemxur ji ber her tiştî diqehire.
Emsar parî ra xerabêr o.	Evsal ji parê xerabtir e.
Eresa banî derganeyê ser 200 mîtro ya.	Eresa xanî li ser dirêjayî 200 mîtro ye.
Gerek ma zerre ra biwazê.	Gerek em ji dil bixwazin.
Tengey ra pey tima herayî ya.	Li du tengasîyê her fireyî ye.

6.6. Zerfê waştîş û tesdîqkerdişî

Nê bêj zerfî, manaya waztiş û erêkerdişî danê kerden û bîyayena karî.

(**Hokerên xwestin û tesdîqkirinê:** Ev cûre hoker, manaya xwestin û erêkirinê didin bûyin û kirina lêkeran).

Zazakî	Kurmancî
bêguman	bêguman
belê	belê
beno	dibe
bêşik	bêşik
bîlhesa	xasme
e, erê	e, erê
helbet	helbet
înşallah	înşallah

raşt
vernî de
xo ra
xomîyan
xwezîka, werekîna
zî

rast
nemaze, nexasim
ji xwe
navxwe
xwezîka
jî

Mîsal:

Ti raşt vanê.

Tu rast dibêjî.

Belê meymanî amey.

Belê mêvan hatin.

Bêguman o ma ra vêşêr vazadano.

Bêguman ew ji me bêtir baz dide.

Pîyê keyneke peynîya peynî erê kerd.

Bavê keçikê dawîya dawî erê kir.

Înşallah ma pîya resenê weca.

Înşallah em bi hev re digîjin wê derê.

Werekîna key ma zî sûke de bibînê.

Xwezîka mala me jî di nav sûkê de bibûya.

6.7. Zêrfê neyîye

Nê bêj zêrfî, manaya nêyîye danê kerdên û bîyayena karî.

(**Hokerên neyînî:** Ev cûre hoker, manaya neyînîyê didin bûyin û kirina lêkerê).

Zazakî

ebeden
hîç, hêç
ne
nêbeno
me
qet
qethen
caran

Kurmancî

ebeden
hîç
ne
nabe
me
qet, yekcar
qethen
tu caran

Mîsal:

Ez êdî ebeden nêşina ey hete.

Hîç darûyê mi nêmando.

Ne vano û ne eşaweno.

Qethen nizdîyê ma mebe.

Caran mi nêwaşt ez ey bivîna.

Ez êdî ebeden naçim nik wî.

Hîç dermanê min nemaye.

Ne dibêje û ne dibihîse.

Qethen bila nêzîkê me nebe.

Tu caran min nexwest ez wî bibînim.

6.8. Zerfê diletî

Nê bêj zerfî, bi tekrarkerdena eynî kelîma ya manaya karî şidênenê.

(Hokerên cêwî: Ev cûre hoker, bi tekrarkirina heman peyvê manaya lêkerê di-şidîne).**Zazakî**

kemî-kemî

hêdî-hêdî

hûrdî-hûrdî

tay-tay

rew-rew

ray-ray

hûrdî-hûrdî

Kurmancî

kêm-kêm

hêdî-hêdî

hûr-hûr

hindik-hindik

zû-zû

car-car

hûr-hûr

Mîsal:

Hêdî hêdî birame siwaro!

Tayn tayn nan bore.

Ray ray bê hetê am ra.

Deştene hûrdî hûrdî bike.

Rew rew xo mecigirne.

Hêdî hêdî bajo siwaro!

Hindik hindik nan bixwe.

Car cara were bi alîyê me ve.

Dirûtîne hûr hûr bike.

Zû zû xwe nexetyidîne.

6.9. Zerfê pêrêzbîyayîşî

Nê bêj zerfî, awayê rêzbîyayena nameyan û bîyayena karî dîyar kenê.

(**Hokerên pevrêzbûnê:** Ev cûre hoker, awayê rêzbûna navan û bûyina lêkeran dîyar dîkin).

Zazakî

yew yew

didi didi

pey der pey

pêdima

Kurmancî

yek yek

dido dido

pey der pey

duhev

Mîsal:

Şagirtî yew yew humarenê.

Meymanî pey der pey ameyî.

Temafilî rayîrî sero pêdima vindertî.

Şagirtî didi didi rêz bîyê.

Şagirt yek yek dihejmêrin

Mêvan pey der pey hatin.

Temafil li ser rê duhev sekinîbûn.

Xwendevan dido dido rêz bûne.

6.10. Zerfê mesderan

Nê bêj zerfî sînor û manaya mesderan dîyar kenê.

(**Hokerên mesderî/raderî:** Ev cûre hoker, sînor û manaya mesderan dîyar dîkin).

Mîsal:

Zaf werdene sebebê nêweşî ya.

Leze şîyayene kê betilnena.

Rew ameyene, erey ameyene ra rindo.

“Vêşî wendene nîna mana vêşî zanayene.”¹

Zaf xwarin sebebê nexweşî ye.

Lez çûyin meriv diwestîne.

Zû hatin ji dereng hatinê baştir e.

“Pir xwendin naye mana pir zanîne.”¹

7. Edat (Daçek)

Edatî xo ser qîsekê bê mana yî; ne cayê nameyan, ne cayê sifetan, ne cayê yew kerdene û ne zî cayê yewna kelîma gênê. Wexto ke edatî (pêrabestî), cumle de sewbî name û kelîman reyde yenê nûstîş, ma-bênê ênan de têkilîyêk peyda kenê, manayêk danê ênan yan zî mana ênan şidênenê.

Zazakî û kurmancî de “veredat û peydatî hema hema henda cê yenê xebitnayîş û wexto ke pîya bêrê nûstene, ênan ra “esteyê edatan” vîrazyenê.”¹ Tayê edat û desteyê edatan estî ke “goreyê lehçe û şêweyandê ziwani mana ênan bedêlyena; di manayê ênan peyda benê.”² No bedêlyayîş hem zazakî û hem zî kurmancî di bîyo; miqabilê tayê veredatandê zazakî, kurmancî de peydatî û miqabilê tayê peyedatan zî veredatî yenê. Wexto ke ma edatanê zazakî û kurmancî miqayese bikerê, dîyar beno ke vera tayê edat û desteyê edatandê kurmancî, zazakî de tayê veredat yan zî peydatî kemyayî û bîyê sivik, tayê edatê zazakî zî kurmancî ra bîyê ciya.

Kurmancî de nustîş û cirakerdişê edatan sero fikrê cîyay estî: ayê ke xo bi ekola Hawar û C. Bedirxanî gênê, edatan çekûyan ra ciya nûsenê;

nuştoxê lehça soranî û ayê ke xo bi ekola mamuse Qanatê Kurdo û ekola kurdandê Sovyeta verêne gênê, peyedatanê sey “re/ra, de/da”³ pêwa nûsenê. Kurmancî de halê edatan sero zî fikrê ciyay estî. Sadik Behaeddînê Amêdî vano “di bêj edatî estî: 1- Pêrebestê xwurî(sade): bi, di, ji, li bo, bona, dû, heta, ta, cem, pey, pê, gel, bal, ba; 2- Pêrebestê lêkdayî: ji bo, li dû, heta kû, li cem, li pey, bê ku, di geş, li bal, bi bal, li ba”⁴ Qanatê Kurdo zî vano “kurdî de çehar komeyê edatan estî: 1- Bernavên kevin (edatê kehanî): di, li, bi, ji, bo, bona, ba(bal), dû, pey, cem, bê, tev; 2- Bernavên nû (edatê neweyî): Ser, ber, nav, rex, pêş, paş, bin; 3- Bernavên bi cot(edatê zewncî): ber bi, di gel, ji ber, li ber, li nav, ji nav, li jor, li ser, li jêr, ji jêr, li paş, ji paş, li pêş, ji pêş, li bin, ji bin, li dû, li cem, rû bi, bê, bi tev, li dor; 4- Bernavên bargiranî(edatê bargiranîye): lê, pê/pêda/pêva/pêra, tê/têda/têra, jê/jêra,”⁵ Celadet Bedirxan zî vano “hîrê bejî edatan estî: 1- Veredatî: bi, bê, di, ji, li; 2- Peyedatî: ...de/di...de, re, ji ... re, ve/bi ... ve); 3- Desteyê edatan: li ber..., bi ser ... de, di ser ... re, di bin ... re”

Zazakî de zî edatî çekûyandê bînan ra ciya nûsyenê û hîrê halê ênan estî: tayê vernîya naman û vateyê sey naman de, tayê peynîya ênan de, tayêna zî hem vernî û hem peynîya ênan de nûsîyenê (yenê nûstîş).⁷

(Daçek): Daçek bi serê xwe peyvên bê wate ne; ne ciyê navek, ne ciyê rengdêrek, ne ciyê kirinek û ne jî ciyê peyveke din digrin. Wexta ku edat di cumleyê de bi nav û peyvên din re bête nivîsîn, di navbera wan de têkiliyek peyda dikin, manayek dide wan û yan jî mana wan dişidîne.

Di zazakî û kurmancî de “pêşdaçek û paşdaçek hema hema qasê hev têne bikaranîn û dema ku bi hev re bêne nivîsandin, ji wan “desteyê daçekan” çêdibin”.¹ Hinek edat û desteyên edatan hene ku li gor lehçe û şeweyên ziman mana wan diguhere; du manayên wan peyda dibin.”² Ev guherîn hem di zazakî û hem jî kurmancî de çêbûye; li hemberê hinek pêşdaçekên zazakî, di kurmancî de paşdaçek û li hemberê hinek paşdaçekan jî pêşdaçek têne. Dema ku em daçekên zazakî û kurmancî bidin berhev, dîyar dibe ku li hemberê hinek daçek û desteyê daçekên kurmancî, di zazakî de hinek pêşdaçek yan jî paşdaçek kêmbûne û bûne sivik, hinek daçekên zazakî jî ji yê kurmancî cuda ne.

Di zarava kurmancî de li ser nivîsîn û dabeşkirina daçekan nêrînên cuda hene: Ew ên ku xwe bi ekola Hawar û C. Bedirxan ve digrin daçekan ji peyvê cuda dinivîsîn; nivîsarên zarava soranî û ew ên ku xwe bi mamoste Qanatê Kurdo û ekola kurdên Sovyeta berê digrin, paşdaçekên wekî “re/ra, de/da”³ pêve dinivîsîn. Di kurmancî de li ser dabeşkirina edatan jî nêrînên cuda hene. Sadik Behaeddînê Amêdî dibêje “du cûre daçek hene: 1- Pêrebestê xwurî(sade): bi, di, ji, li bo, bona, dû, heta, ta, cem, pey, pê, gel, bal, ba; 2-Pêrebestê lêkdayî: ji bo, li dû, heta kû, li cem, li pey, bê ku, di geş, li bal, bi bal, li ba”⁴ Qanatê Kurdo jî dibêje “di kurdî de çar komên daçekan hene: 1- Bernavên kevin: di, li, bi, ji, bo, bona, ba(bal), dû, pey, cem, bê, tev; 2- Bernavên nû: Ser, ber, nav, rex, pêş, paş, bin; 3- Bernavên bi cot: ber bi, di gel, ji ber, li ber, li nav, ji nav, li jor, li ser, li jêr, ji jêr, li paş, ji paş, li pêş, ji pêş, li bin, ji bin, li dû, li cem, rû bi, bê, bi tev, li dor; 4- Bernavên bargiranî: lê, pê/pêda/pêva/pêra, tê/têda/têra, jê/jêra.”⁵ Celadet Bedirxan jî dibêje “sê cûre daçek hene: 1- Pêşdaçek: bi, bê, di, ji, li; 2- Paşdaçek: ...de/di...de, re/ji ... re, ve/bi ... ve); 3- Koma(desteyê) daçekan: li ber..., bi ser ... de, di ser ... re, di bin ... re”⁶

Di zazakî de jî daçek ji peyvên cihê têne nivîsandin û sê halê wan hene: hinekê wan li pêşiya navan û peyvên wekî navan, hinekê wan li dawîya navan û hinek jî hem li pêşî û hem jî li paşiya navan têne nivîsandin⁷).

7.1. Veredatî

Goreyê mintiqe û şeweyan telafûz û nûstîşê veredatan bibedêlyo zî, mana ênan seycê ya. Veredatê ke zazakî û kurmancî de yenê xebitnayîş:

(Pêşdaçek: Li gor herêm û şeweyan bilêvkirin û nivîsandina pêşdaçekan biguhere jî, mana wan wekî hev e. Pêşdaçekên ku di zazakî û kurmancî de têne bikaranîn):

7.1.1. Veredatê “bê”

“Bê”ya ke wezîfeyê veredatî bivîno, cîya nûsyena û “bê”ya ke wezîfeyê

prefîksî vînena, pîya nusyena û sifet virazena.

(Pêşdaçeka “bê”: “Bê”ya ku wezîfeyê pêşdaçekê bibîne ciyê tê nivîsandin û “bê”ya ku wezîfeyê paşdaçekê bibîne, pêve tê nivîsandin û wezîfeya rengdêr dibîne).

Zazakî

Bê per û bê bask.

Bê veng û bê hes.

Bê lome bi.

Bê to yew nişêno hewano.

Ez bê domanan nêşino bazar.

Ma bê to şamî nêwenê.

Bê ar û dû.

bêwayîr(sifet)

bêaqil

bêkar

bêbext

bêveng

Kurmancî

Bê per û bê bask.

Bê deng û bê hes.

Bê lome be.

Bê te kes nikare rake.

Ez bê zarokan naçim bazarê.

Em bê te şîvê naxun.

Bê ardû.

bêxwedî (rengdêr)

bêaqil

bêkar

bêbext

bêdeng

7.1.2. Veredatê “bi”

No edat, hem zazakî û hem zî kurmancî de esto. “Bi”, hem sey veredatî û hem zî sey cidarê viraştene sîfetan kar keno. Gerek ma “bi” û “bê”ya ke wezîfeyê veredatîye vînena û “bi” û “bê”ya ke wezîfeyê sifet viraştene vînen, têmîyan nêkê. “Bi”ya ke veredat o, cîya nûsyena, labelê “bi”ya ke rolê prefîksî vînena, çekûyêk ra ver yena û sifet virazena, pîya nusîyêna.”⁸

(Pêşdaçeka “bi”: Ev pêşdaçek hem di zazakî û hem jî kurmancî de heye. “Bi”, hem wek pêşdaçek û hem zî wek qertafê çêkirina rengdêran tête karanîn. Gerek em “bi” û “bê”ya ku wezîfeya pêşdaçekê dibîne, “bi” û “bê”ya ku wezîfeyê qertafan û çêkirina rengdêran dibîne, tevlihev nekin. “Bi”ya ku pêşdaçek e, ciyê

tê nivîsandin, lêbelê “bi”ya ku wezîfeyê çêkirina rêngdêran bibîne, bi hev re tê nivîsandin”⁸).

Zazakî

bi ⁹ ...

Bi roj germ o, bi şew serd o.

Serdile bi qeleme nûst.

Mi na pirtûke bi perandê xo erînaya.

Ez bi dest werê xo wena.

Bi desmale destanê xo ziwa kena.

Ez bi şew û roj xebityena.

Goşt bi kerdî hûrdî(wûrdî)beno.

Bi zerda xo.

biqewt (sf.)

biaqil (sf.)

bimal (sf.)

Kurmancî

bi ...

Bi roj germ e, bi şev sar e.

Serdilê bi qelemê nivîsand.

Min ev pirtûk bi pereyên xwe kirîye.

Ez bi dest xwarina xwe dixum.

Bi desmalê destê xwe zûha dikim.

Ez bi şev û roj dixebitim.

Goşt bi kêrê tê hûrkin.

Bi dilê xwe.

biqewet (rd.)

biaqil

bimal

Ziwanê kurdî de gelekî mana û wesfê “bi” estî: “Bi” manaya emirdayîşê karan, qenaet dîyarkerdiş, terz, pîya, heta, sero û mîyande de zî yena xebitnayîş.

(Di zimanê kurdî de gelek mana û wesfên “bi” hene: “Bi” di mana emirdayîna lêkeran, qenaet dîyarkerin, bi hev re, li ser, terz û alî de jî têtê bikaranîn).

bi ...

Bi hewleye.

Bi no hawa kar nêbeno.

Werê xo bi destê xo haderneno.

Her teyr bi refte xo rey de fireno.

Bi koyan kewt.

Ti bi ya mi bikê.

bi ...

Bi qencî.

Bi vî awayî kar nabe.

Xwarina xwe bi destê xwe amade dike.

Her teyr bi refê xwe re difire.

Bi çiya ket.

Tu bi ya min bikî.

Bi hahaye rey de verg nêterseno.

Bi hahayê gur natirse.

Şamîya xo bi doya werde.

Şîva xwe bi dewê xwar.

7.1.3. Veredatê “pê”

Miqabilê veredatê /pê/yê zazakî, kurmancî de veredatê sey /pê/, /bi wê/ û /bi wî/ yenê xebitnayiş.

(Pêşdaçekên /pê/ bi wê/ bi wî/: Li hember daçeka /pê/ ya zazakî, di kurmancî de daçekên /pê/ bi wê/ bi wî/ pev/ têne bikaranîn).

Zazakî

Kurmancî

O pê hesiya.

Ew pê hesiya./ Ew bi wê hesiya.

Pê qeleme nûşt.

Pê qelemê nivîsand.

Pê paye kewtiş.

Pê paye ketin.

Heta ke ez pê agadar bîya, erey kewt. (z)

Heta ku ez pê (bi wê) agadar bûm, dereng ket. (k)

Ke zazakî de /pê/ bêro vernîda karan, karo pêrabeste virazenê û ay wext miqabilê “pê”ya zazakî, kurmancî de vateyê “li hev, bi hev, hev” yenê.

(Ku di zazakî de /pê/ were pêşiya lêkeran, lêkerên hevduvanî çêdike û wê demê li hemberê /pê/ya zazakî, di kurmancî de peyvên “li hev, bi hev, hev, pev” têne).

Zazakî

Kurmancî

pêameyene

lihevhatin/pevhatin

pêkewtiş

pevketin

pêmişewriyayiş

pevşêwirîn

pêpersayîş

lihevpirsîn

pêkerdene

lihevkirin

7.1.4. Veredatê “**ver bi (be)...**, **vera ...**”

No edat îstiqametê hereketî dîyar keno û kurmancî de miqabilê ey de “ber bi...” yeno.

(Pêşdaçeka “ber bi (be) ...”: Ev daçek îstiqameta hereketê dîyar dike û di kurmancî de li hemberê wê “ber bi...” tê.).

Zazakî

Kurmancî

Ver bi(vera) cêrî

Ber bi jêr.

Ver bi(vera) corî.

Ber bi jor.

Ver bi şewe.

Ber bi şevê.

Ver bi rojava.

Ber bi rojava.

Ver bi rojava.

Ber bi rojava.

Ez şina ver bi Pîran.

Ez diçim ber bi Pîranê.

Ez ver bi to yeno.

Ez ber bi te têm

Awe ver bi cêr herikyena.

Av ber bi jêr diherike.

Ez Amed ra ver bi Hewlêr şina. Ez ji Amedê ber bi Hewlêrê diçim.

7.1.5. Veredatê “**sey/hezey/zey/zê**”

No edat, pêmendîş û miqayese kerdene dîyar keno û kurmancî di miqabilê ey “wek, mîna” yenê.

(Pêşdaçeka “sey/zey/zê”: Ev daçek, lihevmayîn û miqayesekirinê dîyar dike û di kurmancî de li hemberê wê, peyvên ““wek, mîna” têt.).

Zazakî

Kurmancî

Ez sey to jêhatî nîya.

Ez wek te ne jêhatî me.

Çimê ay zî sey ê pîyê xo sîyay bî. Çavên wê jî wek ê bavê xwe reş bûn.

Nan sey kerra bîyo wişk.

Nan wek kevirê bûye hişk.

Na şewe sey rojî bîya roşin.

Ev şev mîna rojê bûye ronahî.

Hezê(zê) mi vaje.

Mîna min bêje.

7.2. Peyedatî

Nê edatî cumle mîyan de seba tamamkerdişê nameyan, dîyarkerdişê zeman, aîdîyet, hal û livê ênan yenê xebitnayîş. Peyedatê esasî yê zazakî û kurmancî nê yî:

(**Paşdaçek:** Ev daçek di nav cumleyê de ji bo tamamkirina navan, dîyarkirina zeman, aîdîyet, hal û livê wan têne bikaranîn. Paşdaçekên esasî yên zazakî û kurmancî ev in):

7.2.1. Peyedatê “di/ de”

No edat, cumle de mana “mîyan, pêwa, wext”î dano û kurmancî de miqabilê eye desteyê edatanê “di ... de/da, bi ... de/da” yenê.

(Paşdaçek: Ev daçek, di cumleyê de mana “hundir, pê ve, pê de, wext” dide û di kurmancî de miqabilê wê desteyê edatên “di ... de/da, bi ... de/da” têne bikaranîn).

Zazakî

Nê rojan de.

Hezîrane de awzêmi peysenê.

Şew ma ser de ameye.

Nîsane de laserî wardenê.

Na dewe de erdê her kesî esto.

Aye keye de zaf xebityena.

Desmala mi awe de şî. (sero)

Kerge hewndê xo de gilgil vînena.

Gemî behre de xerq bî.(mîyan)

Rewîn awe de noq bî.(mîyan)

Kurmancî

Di van rojan de.

Di Hezîranê de avzêmi diçike.

Şev bi ser me de hat.

Di Nîsnê de lehî radibin.

Di vê gundê de erdê her kesî heye.

Ew di malê de pir dixebite.

Desmala min bi avê de çû.

Mirîşk di xewna xwe de garis dibîne.

Gemî di behrê de xerq bû.

Rewîn di avê de noq bû.

Tayê şêweyandê kurmancî de, /di/ya vernî ya desteyê edatê /di ... de/ kewena û tena /de/ya peyêne manena. Bi îhtimalêko gird, dimilî de zî ay /di/ya vernî kewta û tena /de/ya peyêne menda.

(Di hinek şêweyên kurmancî de /di/ ya pêşiya desteyê edatên /di ... de/ dikeve û tenê /de/ ya dawî dimîne. Bi îhtimalek mezin, di zazakî de jî “di”ya pêşiyê ketiye û tenê /de/ ya dawîyê maye).

Mîsal:

Ez mîyanê sûke de roşena.

Ez nava sûkê de rûdinim.

Lajê mi sinifa şeşine de waneno.

Lawê min sinifa şeşan de dxwîne.

Kurmancî de edatê ke hezey /di ... de (mîyan-bêliv)/, /di ... re (mabeyn)/ û /di ... ve (mîyan-biliv)/ nusyenê, sewbî şêwe û cayan de hezey /di... da/, /di... ra/ û /di ... va/ zî yenê nûstiş. Nê bêj desteyê edatan, teniya wayîrê yew mana nîyê, ray rayan mana didine de zî yenê xebitnayene.¹⁰

(Di kurmancî de daçekên ku wek /di ... de(bêliv)/, /di ... re(navbeyn)/ û /di ... ve (hundir-biliv)/ têne nivîsîn, di şêwe û çiyên cuda de wek /di... da/, /di... ra/ û /di ... va/ jî têne nivîsîn. Ev cûre desteyê daçekan, tenê di yek manayê de na, carna di mana duyemîn de jî têne bikaranîn.¹⁰)

Kurmancî

Zazakî

Di bin sîya darê de rûniştibûn.

Binê seyda dare de ronîştibî. (bêliv)

Di wê gavê de.

Ay game de. (bêliv)

“Ez di newalêkê re derbas bûm”.

Ez yew zixur ra vêrarta. (navber)

“Ez di deştê ve hatim”.

Ez deşte ro ameya. (hundir û biliv)

7.2.2. Peyedatê “... der”¹¹:

No edat mana “tede, mîyan de” dano û farisî de zî esto. Kurmancî de miqabilê nê edatî “di...de” yeno.

(Paşdaçeka: “... der”¹¹: Ev edat mana “têde, hundur” dide û di farisî de jî heye. Di kurmancî de miqabilê vê daçekê “di ... de” têtê).

“Lajek keye der o”.

Lawik di malê de ye.

“Keyneke makteb der a”.

Keçik di dibistanê de ye.

7.2.3. Peyedatê “... ra”

Miqabilê nê edatê zazakî, kurmancî de edatê ciya yê sey “ji, li, ji ber, di ber” yenê vatiş û tira manayê ciyayî zî peyda benê.

(Paşdaçeka “... ra”: Miqabilê vê daçeka zazakî, di kurmancî de daçekên cuda yên wekî “ji, li, ji ber, di ber” têne gotin û jê manayên cuda jî peyda dibin).

Zazakî

Keyê mi sûke ra dûrî yo.

Ez pîran ra yena.

“Ez o dew ra yena”.

Aye dew mîyan ra şîye.

Cilê sûrî dayê xo ra.

Tiya ra şinê.

Çinayê dayê xo ra, eba daya xo ra.

Rewîn keydê ma ver ra vêrart.

“Keyneke pexîleye ra bî nêweş”.

Kamaca ra yeno û şino kam ca?

Adirdê girrî ver ra kes nêremeno.

Ênan ra yew.

Ez to ra hes kena

Hengimên tuyan ra şêrînê o.

Keye ra dûrî bikewê.

Kurmancî

Mala min ji bajêr dûr e.

Ez ji Pîranê têm.

Ez ji gund tême.

Ew ji nav gund derbas bû.

Lîbasên sor li xwe kiriye.

Ji vir diçin.

Çi li xwe kirîye, eba li xwe kirîye.

Rewîn di ber mala me derbas bû.

Keçik ji ber pexîlîyê nexweş ket.

Ji kû da tê û kûda diçe?

Ji ber agirê xweş kes nareve.

“Yekî ji wan.”

“Ez ji te hej dikim”. (bireser)

Hingivîn ji tuyan şîrintir e.

Ji mal dûr bikevin.

7.2.4. Peyedatê “... rê”¹²

Miqabilê nê edatê zazakî, kurmancî de desteyê edatê “ji ... re” yeno.

(Paşdaçeka “... rê”¹²: Miqabilê vê edatê zazakî, di kurmancî de desteyê daçeka “ji ... re” têtê).

Zazakî

Dapîre ma rê estanikî vatê.
Rewînî to rê qeleme girewt.
Dixtorî ma rê darû nûşt.
Dewe rê sermîyanêko jêhatî lazimo.
Ez to rê bîya may û pî.

Kurmancî

Dapîrê ji me re çîrok digot.
Rewînî ji te re qelem kirrî.
Dixtorî ji me re derman nivîsand.
Ji gund re serokekî jêhatî lazim e.
Ez ji te re bûm dê û bav.

7.2.5. Peyedatê “... ro”:

Kurmancî de vera nê edatê zazakî, tayê forman de veredatê “li...” û tayê foman de zî desteyê edatandê “di ... re”, “di... ve”, “bi ... re”, “bi ... ve” yenê.

(Di kurmancî de li hemberê vê daçeka zazakî, di hinek forman de pêşdaçeka “li...” û di hinek forman de jî desteyê daçekên wekî “di ... re”, “di... ve”, “bi ... re” têtê.)

Zazakî

“Mar dar ro anciyeno bi cor.”
Cayo ke ray bibo, pêra ro mevêre.
Merre qûlike ro şî.
Ez deşte ro ameya.
“Hewnê şewan xo ro herimnayê”
“Awe rîyê aye ro kenê”
Ma yew zixur ro vêyartî.
“Mêrdek nêrdîwane ro vejîya cor”.

Kurmancî

Mar bi darê ve hilkişya jor.
Ciyê ku rê hebe, di şêverê re derbas nebe.
Mişk di kûnê re çû.
“Ez di deştê ve hatim”.
Xewna şevan li xwe herimandîye.
Avê li rûyê wê dîkin.
“Em di gelîyekî re derbas bûn”.
Mêrik bi derencê re hilkişya.

7.2.6. Peyedatê “ser”:

Miqabilê nê peyedatê zazakî, kurmancî de “li ser” yan zî tena “ser” yeno.

(Paşdaçeka “ser”: Miqabilê ev daçeka zazakî, di kurmancî de “li ser” a koma daçekan yan jî tenê “ser” têtê).

Zazakî

Linge eyşta linge ser.

Dest nayo destî ser.

Pisîke vejîyaya dare ser.

Çaya to serê masî de ya.

Ma serê banî de ronîştî.

Ma şîyê rezan ser.

Leşkeran vist dewe ser.

Dixtorî şîyê nêweşan ser.

Ma vist ênan ser û ênan zî vist ma ser.

Kurmancî

Ling avêtiye li ser lingê.

Dest danîye li ser destî.

Pisîk derketîye li ser darê.

Çaya te li ser masê ye.

Em li ser banî rûniştine.

Em çûne ser rezan.

Leşkeran avêt ser gund.

Dixtor çûn ser nexweşan.

Me avêt ser wan û wan jî avêt ser me.

7.2.7. Peyedatê “... ra na heta”:

No edat, wezîfeyê peymawitişê wext û zemanî ano ca. Kurmancî de miqabilê ey desteyê edatê “ji ... vir de/ve” yeno.

(Paşdaçeka “... ra na heta”: Ev daçek, wezîfeya pîvandina wext û zemanî tîne cî. Di Kurmancî de miqabilê wê desteyê daçeka “ji ... û vir de/ve” têtê).

Zazakî

Ay rojî ra na heta.

Sermewe ra na heta, ma yewbin nêdîyo.

Ehmedê Xanî ra na heta ...

Pîran ra na heta 70 km yo.

Kurmancî

Jî wê rojê û vir de.

Jî sersalê vir de, me hevudu nedîtiye.

Jî Ehmedê Xanî vir de...

Jî Pîranê vir ve 70 km ye.

7.2.8. Peyedatê "... rey de":

No edat, mana "pîya" û "pêwa" bîyayene dano. Kurmancî de miqabilê ey, desteyê edatê "bi ... re/ra" û "pêra" eynî wezîfî anê ca.

(Paşdaçeka "... rey de": Ev daçek, mana "pêra", "pev" û "digel" bûnê dide. Di kurmancî de miqabilê wê, desteyê daçekên "bi ... re/ra", "pêra" û "digel" têne).

Zazakî

Rewîn mi rey de ame.

Zelale dapîrda xo rey de şî.

Gurgîn mi rey de ame.

Mi domanî xo rey de berdî.

Kurmancî

Rewîn bi min re hat.

Zelal bi dapîra xwe re çû.

Gurgîn bi min re hat.

Min zarok digel xwe birin.

7.2.9. Peyedatê "mîyan"

No edat, mana "navbên" û "bêntar" de yeno xebitnayîş û eynî wext de sey "nêm edat"êk¹³ zî wezîfe keno.

(Paşdaçeka "mîyan": Ev daçek, di mana "nav" de têtê bikaranîn û herweha wek "nîv edat"ek¹³ jî wezîfe dibîne).

Zazakî

Ez şîya mîyandê sûke.

Ma kewtî mîyandê vergan.

Ma şîyê mîyandê rezan.

Mîyanê behre.

Ma mîyanê behre de asnaw kerde.

Dizd kewt mîyandê keyî.

Kurmancî

Ez çûm nava sûkê.

Em ketin nava guran.

Em çûn nav rezan.

Nava behrê.

Me nav behrê de avjenî kir.

Diz ket nav malê.

7.2.10. Peyedatê "mîyan de"

Miqabilê nê edatê zazakî, kurmancî de desteyê edatê "di nav ... de" yeno xebitnayîş.

(Paşdaçeka “**mîyan de**”: Miqbilê vê daçeka zazakî, di kurmancî de desteyê daçeka “di nav... de” tê bikaranîn).

Zazakî

Ênan mîyan de.

Keyê ma sûke mîyan de dîyar o.

Şarî mîyan de xo bêqîmet mekê.

Kurmancî

Di nava wan de.

Mala me di nava sûkê de dîyar e.

Di nava xelkê de xwe bêrûmet nekin.

7.2.11. Peyedatê “**mîyan ra**”

No edat, liv û têvgere dîyar keno û kurmancî de miqabilê ey “di nav ... re” yo.

(Paşdaçeka “**mîyan ra**”: Ev daçek, liv û tevgerê dîyar dike û di kurmancî de miqabilê wê daçeka “di nav .. re” tê).

Serokwezîr şeharî mîyan ra vêart.

Serokwezîr di nava bajar re derbas bû.

Marmase awe mîyan ra gêreno.

Marmasî di nava avê de digere.

Bolê vergan dew mîyan ra vêart.

Rivdeyê guran di nava gund re derbas bû.

7.3. Koma edatan

Ayê edatê ke çend veredatî û yew peyedatî ra virazyenê, ênan ra vaj-yeno komeyê edatan. Enî bêj edatî cumle mîyan de mana hete(teraf), zeman, mekan hal, liv û bêlivî dîyar kenê. Zafîya komeyê edatanê zazakî û kurmancî seycê yî û ênan ra tayê zî zemanî mîyan de bedêlî-yayî û sivik bîyê; bîlhesa zî tayê veredat û peyedatê desteyê edatandê zazakî kewtî. No xûsusiyet, kome û desteyê edatandê cêrênan de zî dîyar beno.

(**Koma daçekan**: Ew daçekên ku ji çendek pêşdaçek û paşdaçekek çêdibin, ji wan re dibêjin koma daçekan. Ev cûre daçek di nav cumleyê de mana alî, zeman, mekan, hal, liv û bêlivî dîyar dikin. Di zazakî û kurmancî de gelek des-

teyên edatan wekî hev in û hinek ji wan di nava zemanê de guherîne û sivik bûne; bîlhesa jî hinek pêşdaçek û paşdaçekên desteya daçekên zazakî jê ketine. Ev taybetî di kom û desteyê daçekên jêrîn de dîyar dibe).

7.3.1. **“bi ... ra”** (aîdîyet, pîya) **bi... ve** (aîdîyet, pêra)

Zazakî

Kurmancî

Mamusa bi şagirtandê xo ra ameyê. Mamoste bi şagirtên xwe ve hatin.

Walî bi mudirandê xo ra vejîyayê teffîş. Walî bi mudirên xwe ve derketiye teffîşê.

Maye bi qijekandê xo ra şîyê mekteb. Dê bi zarokên xwe ve çû dibistanê.

Mêwe bi hengurada xo ra wûşke bîya. Mêw bi tirîya xwe ve hişk bûye.

7.3.2. **“bi... ya (a)”**: **“bi ve”**

No edat tayê cayan de sey yew peyedayî û tayêna cayan de zî sey desteyê edatan vajyeno. Kurmancî de vera eye edatê **“bi ve”** yeno.

(Peyedayî **“bi... ya(a)”**: Ev daçek di hinek ciyan de wek paşdaçêkek û hinek ciyên din de jî wek desteyê daçekan tê bikaranîn. Di kurmancî de li hemberê daçeka **“bi ve”** tê.)

Zazakî

Kurmancî

Mirdek bi cinê, laj û keyna xo ya ameyê. Mêrik bi jin, law û keça xwe ve hatin.

Mamuse bi pancas şagirtandê xo ya şîyê. Mamoste bi pêncî şagirtên xwe ve çûn.

Serok bi wezîrandê xo ya ame. Serok bi wezîrên xwe ve hat.

Ko bi honikîya xo ya weş o. Çiya bi hênikîya xwe ve xweş e.

Bize bi lingda xo ya, mêşna bi lingda Bizin bi lingê xwe ve, mêşin bi lingê
xo ya leqyena. xwe ve tê daleqandin

Bawkal bi tornandê xo ya şî. Bavkal bi nevîyên xwe ve çû.

“Bi dizdî ya şono hênî kono qilêrin” “Bi dizî ve diçe kanîyê qirêj dike.”¹⁴

7.3.3. **ver bi ... ra** (het, îstiqamet) **ber bi ...ve**(alî, îstiqamet)

Ver bi mi ra ame.
Ver bi sûke ra şiyê.
Xeçe ver bi koyê Sîpanî ra şî.
Verg ver bi koyan ra rema.

Ber bi min ve hat.
Ber bi sûkê ve çûn.
Xecê ber bi çiyayê Sîpanê ve çû.
Gur ber bi çiyê ve revya.

7.3.4. **ver de ...**(hete de)

Serwîse mektebî ver de vindena.
Birca Beleke çemê Dîjle ver de ya.
Keyedê ma ver de darêk esta.
Wûrdî hembazî berî ver de vindertî.

di ber ... de, li ber (li nik/ li cem)

Serwîs li ber dibistanê de disekine.
Birca Belek di ber çemê Dîjlê de ye.
“Di ber mala me de darek heye”.
Herdu heval li nik derî rawestîne.

7.3.5. **ver ra (hete ra-biliv)**

Qesra Qencoyî ver ra vêartî.
Çemê Dîjle Diyarbekir ver ra vêreno.
Meteorêk dinya ver ra veyarte.
Temafîle mektebî ver ra vêrena.

di ber ... re (li nik/li cem-biliv)

Di ber Qesra Qenco re derbas bûn.
Çemê Dîjlê di ber Diyarbekirê re derbas dibe.
Meteorek di ber dinyayê re darbas bû.
Temafil di ber dibistanê re derbas dibe.

7.3.6. **ser ... ra**

Ma pirdê Malabadî ser ra vêartî.
Balafirê lejî dewda ma ser ra vêartî.
Refê boranan ma ser ra firayê.
Rişêleyê mîrçikan dewe ser ra gêraynê.
Kera dêsi ser ra (ser a) eyşte.

bi ser ... re/ di ser ... re

Em di ser pira Malabadî re derbas bûn.
Balafirên şer bi ser gundê me re derbas bûn.
Refê kevokan di ser me re firyan.
Rişêleyê çûkan di ser gund re digeriya.
“Kevir di ser dîwêr re avêt”.

7.3.7 ser ro(ser o)

Ma pirdê Malabadî ser ro ronîştî.
Mîrçike dare ser ro halên virašto.
Banî sero vewre esta.
Kûrsî ser ro ronîştîş asan o.
Ênan sero îfade da.
Dêsî sero ronîšto.

li ser ... de

Em li ser pira Malabadîyê re rûniştin.
Çûkê li ser darê de hêlîn çêkirîye.
Li ser banî de berf heye.
Li ser kûrsî de rûniştin hêsan e.
Li ser wan de îfade da.
Li ser dîwêr de rûniştîye.

7.3.8. ser de

Dewijî pêro ma ser de ameyê.
Hewrês ma ser de ame.
Zimistan ma ser de ame.
Çiyo nêbîyaye keneke ser de ame.

bi ser ...de

Gundî hemû bi ser me de hatin.
Aşît bi ser me de hat.
Zivistan bi ser me de hat.
Tiştê nebûyî bi ser keçikê de hat.

7.3.9. bin ... de

Dewa ma bindê awe de mende.
Keyê ma bindê hewerêsî de mendî.
Bindê keydê ma de xezîna çinî bî.
Kûrsî bindê mi de şikya.
“Bêrê bindê dare de ronîşê.”¹⁵
Seyidwanî bindê wersî de mendî.

di bin ... de (bêliv)/ li bin (biliv)

Gundê me di bin avê de ma. (bêliv)
Xanîyên me di bin aşîtê de man. (bêliv)
Di bin mala me de xezîne tune bû.
(bêliv)
Kûrsî di bin min de şikest. (bêliv)
“Werin li bin darê rûnin.” (biliv)
Seyidvan di bin aşîtê de man. (biliv)

7.3.10. bin ... ra

Tûtan sereyê xo binê lehêfî ra vet.

ji bin/ ji bin ... ve/ di bin ... re

Zarokan serê xwe ji bin lihêfê derxist.

Gamasî sereyê xo binê aw ra vet.
Bindê pirdî ra ameyê.
Meymanî bindê dew ra ameyê.
Aşme bindê hewrî ra vejîyaye.
Bindê çîman ra mi ra ewnîyanê.
Rayîr bindê keydê ma ra vêrart.
Maseyî bindê awe ra gêrenê.
Awe bindê erdî ra ameya.

Gamasî serê xwe ji binê avê derxist.
“Ji bin pirê ve hatin”.
Mêvan ji bin gund ve hatin.
Hîv ji bin ewran ve derket.
“Di bin çavan re li min dinêrî”.
Rê di bin mala me re derbas bû.
Masî di bin avê re digerin.
Av di bin erdê re hatiye.

7.3.11. **seba... rê**

Seba Homayî rê.
Seba welatê xo rê.
Seba xerabîye rê nê, seba rindîye .
rê vaje

ji bo (ji bona)

“Ji bona xwedê”. (Ji bo Xwedê).
Ji bo welatê xwe.
Ji bo xerabiyê na, ji bo başiyê bêje.

7.3.12. **hete, hetê ... ra**

Mi hete.
Dedê xo hete maneno(a).
Rewîn resayo hetê Mizgefta Girde.
Ma şînê dapîra xo hete.
Şagirtî hetê mektebî ra şîyê.

bal, bal .. ve, bi alî ... ve

Bal min (Ba min./ Bi alî min.)
Bal apê xwe dimîne.
Rewîn gihîştîye bal Mizgefta Gewre.
Em diçin bal dapîra xwe ve.
Şagirt bi alî mektebê ve çûn.

7.3.13. **hete de**

Gurgîn dedê mi hete de maneno.
Homay hete de heq vinê nêbeno.

li cem/li nik

Gurgîn li cem mamê min dimîne.
Li nik xwedê heq wenda nabe.

Mi hete de zexelîye çinîya.
Kitaba mi mamusayî hete de ya.

Li cem min zexelî nîne.
Pirtûka min li nik mamoste ye.

7.3.14. **hete ra**

Gurgîn dedê mi hete ra ameyo.
Mi hete ra warişt şî.
Market hete ra raykewt ame.
Dapîrda xo hete ra ameynê.

ji cem/ ji bal/ ji bal ... ve

Gurgîn ji cem mamê min hatiye.
Ji cem min rabû çû.
Ji cem marketê birêket hat.
Ji bal dapîra xo ve dihat.

7.3.15. **pey ... de**

Dewa ma pey koyî de ya.
(Dewa ma pey koyî de ya).
Mamose ame pey mi de vindert.
Pey hewt koyan û hewt royan de.
Pey tenganîye de herayî ya.

di pişt... de

“Gundê me di pişt çiyê de ye”.
Mamoste hate di pişt min de sekinî.
Di pey heft çiya û heft rûbaran de.
Di pişt tengasîyê de firehî ye.

7.3.16. **pey ... ra**

Pey ey ra gruba ma ameye.
Ferzan pey dêsî ra vazda şî.
Pey mi ra şima sekenê bikê.

di pişt ... re

Di pişt wî re gruba me hat.
Ferzan di pişt dîwêr re bazda çû.
Di pişt min re hun çi dikin bikin.

7.3.17. **bi ... bê/ ebi ... bê**

Lajekî bi dest bê xo kerdo.
Mêrdekî bi fek bê xo vato.
Kê darba ke bi dest bê xo bidê xo

bi ...

Lawk bi destê xwe kirîye.
Mêrik bi devê xwe gotîye.
Mirov derba ku bi destê xwe li ro,

bêdarû ya.

“Keyneke ebi fek bê xo vato”.

xwe bide, bêderman e.

Keçikê bi devê xwe gotîye.

8. Bestoxî (Gihînek)

Vateyê ke naman, karan (fîilan) û cumleyan hem hetê manaya û hem zî hetê şiklê ênan ra pêwa girê bidê, ênan ra vajîyeno bestox (girêdayox) û manaya xoser a bestoxan çinî ya. Eke bestoxî di vateyan yan zî komeyê vateyan pêwa girê bidê, hûrdî kelîmeyê zî hetê wezîfî ra benê seycê; ke di cumleyan pêwa girê bidê û bindê hukmêk de bîyarê pê hete, ya didine pêwa girêdaye yê yewine bena.

(Gihînek/pevgirêk: Ew peyv in ku navan, lêkeran û hevokan hem ji aliyê mana û hem ji aliyê şikil ve bi hev re girê didin. Manaya xweser a gihanekan nîne. Eke gihanek du peyvyan yan jî komên peyvyan bi hev ve girê bidin, herdu peyv ji aliyê wezîfeyê xwe ve dibin wekhev; ku du hevokan bi hev re girê bidin û di bin hukmekê de bînin cem hev, ya duyemîn bi ya yekemîn ve tête girêdan).

Zazakî

Rewîn û Gurgîn şîyê keye.

Hemberyan û hembazê ma hewlî.

Delale amey keye û şamî werde.

Kurmancî

Rewî û Gurgîn çûn malê.

Cîran û hevalên me baş in.

Delal hate malê û şîv xwar.

Ez şîya sûke labelê rew agêraya. Ez çûm sûkê lêbelê zû vegeryam.

Keye û medresa ma bazar ra dîrî yê. Mal û medreseya me ji bazarê dûr in.

Awayê viraştina xo ra bi umûmî hîrê grubê bestoxan estî:

(Ji aliyê çêkirina xwe ve bi giştî sê grubên gihînekan hene):

8.1. Bestoxê sade yan zî yew heceyî

Ayê bestoxê ke tena yew vate ra ameyê pê û parçe nêbenê, ênan ra vajîyeno bestoxê sadeyî. Zazakî de bestoxê sadeyê ke zaf yenê vatiş: “û”, “zî”, “la”, “ya”, “ki/ke”, “eke”, “çi ke”, “ya/yan”, “eger” “gama”, “ama”, “coka” û “him/hem”. Kurmancî de zî “û”, “an”, “lê”, “ya”, “yan”, “da”, “ane/an ne”, “ango”, “gava”, “loma” û “yan/ya” wezîfeyê nê bêj bestoxan vînenê.

(Gihînekên sade yan jî yek kîteyî: Ew gihînekên ku tenê ji peyvek pêk hatine û parçe nabin, ji wan re dibêjine gihînekên sade. Di zazakî de gihînekên sade yê ku pir tene gotin ev in: “û”, “zî”, “la”, “ya”, “ki/ke”, “eke”, “çi ke”, “ya/yan”, “eger” “gama”, “ama”, “coka” û “him/hem”. Di kurmancî de jî peyvên: “û”, “an”, “lê”, “ya”, “yan”, “da”, “ane/an ne”, “ango”, “gava”, “loma” û “yan/ya” wezîfê van cure gihînekan dibînin.)

Zazakî

Kurmancî

û

û

Ez û ti.

Ez û te.

Dar û ber.

Dar û ber.

Şew û roj.

Şev û roj.

Mem û Zîne.

Mem û Zîn

Kesk û sûr.

Kesk û sor.

Cinî û mêrde.

Jin û mêr.

zî

To zî va mi zî va.

Ma zî şî û şima zî şîyê.

Dîk zî waneno û zerenc zî waneno.

jî

Te jî got min jî got.

Em jî çûn hun jî çûn.

Dîk jî dixwîne û kew jî dixwîne.

la, lê

Ti bê la domanan xo de meya.
yîne.

Roj germ o la şewe honik a.

Şewla zîrek a la Bejna hîna zîrek a.

lê

Tu were lê zarokan bi xwe re ne-
yîne.

Roj germ e lê şev hênik e.

Şewla jîrek e lê Bejna hîn jîrek e.

eki/eke/eger,

Eke ti wazenê bê eke ti nêwazenê meye.

Eger ti şî, mi zî xo reyde bere.

Eger hewr bibo varan vareno.

Eke zimistan ame vewre varena.

heke/eke/heger/eger

Eke ti dixwazî were eke tu naxwazî neye.

Eger tu çûyî, min jî bi xwe re bibe.

Eger ewr bibe baran dibare.

Eke zivistan hat berf dibare.

ke (ki, ko)

Çîyo ke ez wazena to hete çinyo.

Heta ke şewe bo, ma resenê keye.

Hêvî kena ke çend rojî ra pey tesîrê
germeye bişikyo.

ku/ko/ki

Tiştê ku ez dixwazim li cem te nîn e.

Heta ku şev be, em digîjin malê.

Hêvî dikim ku ji çend rojan şûnde
tesîra germê bişikê.

Rewînî mi ra vat ke eyro vîstê meng o.

Rewînî ji min re got ku evro bîstê
heyvê ye.

Yan (ya)

Yan ti vaje yan zî ez do vaja.

Yan bike yan meke.

Ya kê roşenê ya şinê.

yan (ya)

Yan tu bêje yan ez dê bêjim

An bike an jî meke.

Ya meriv rûdine ya diçe.

8.2. Bestoxê (girêdayoxê) diletî

Nê bêj bestoxî, bi tekrarkerdena vateyêk ra virazîyenê û wexto ke cumleyê pêrabeste yê rêzkerdey yenê sazkerdiş, vernîya cumleyandê kilman de ca gêne û ênan pêwa girêdanê. Tayê bestoxê diletî:

(**Gihînekên cewî:** Ev cure gihînek, bi tekrarkirina peyvek çêdibin û dema ku hevokên pevgirêdayî yên rêzkerî bêne sazkerin, tene pêşîya kurtehevokan û wan bi hev re girêdidin. Hinek gihînekên cewî):

Zazakî

çi ... çi...

“Çi cinî çi mêrde, heme ameyê.”

Şêr şêr o; çi cinî ya û çi mêrde yo.

Kes nêzano çi wenê û çi piragênê.

Çi laj bo û çi keyna bo, seycê yî.

ge ... ge...

Ge ge şonê û ge ge yenê.

Kurmancî

çi ... çi...

Çi jin çi mêr, hemû hatin

Şêr şêr e, çi jin e û çi mêr e.

Kes nizane çi dixun û çi li xwe dikin.

Çi law be û çi keç be, wekhev in.

ge ... ge.../geh... geh...

Ge ge diçin û ge ge tên.

Ge ez yena ge ti bê.

Ge varan vareno ge vewre varena.

Ge çilmisyena û ge zey gulan geş bona.

ha ...ha...

Ha emsar ha par.

Ha şewe ha roj.

Ha vat ha nêvat.

Awe ha ameya çok û ha ameya noq.

Vate ke vajîya ha zûrî û ha raşte.

hem... hem.../him... him...

Hem mamosteyî hem şagirtî yenê.

Ferzan hem weno hem qalî keno.

Malzemeyê ey hem xilt o hem vay o.

ne... ne...

Ti ne bermenê ne wîyenê.

Ti ne kenê û ne wenê.

Hemberyanê ma ne şonê û ne yenê.

Ne him û ne gim.

Ge ez têm ge tu were.

Ge baran dibare ge berf dibare.

Geh diçilmise û geh wek gulageş dibe.

ha ...ha...

Ha îsal ha par.

Ha şev ha roj.

Ha got ha negot.

Av ha hatiye çok û ha hatiye noq.

Peyv ku hate gotin ha derew û ha rast.

hem... hem...

Hem mamoste hem şagirt têne.

Ferzan hem dixwe hem dipeyve.

Malzemeyê wê hem xilt e hem bûha ye.

ne... ne...

Tu ne digrî ne dikenî.

Tu ne dikî ne dixwî.

Cîranên me ne diçin û ne tên.

Ne him û ne gim.

ray... ray/ray rayan... ray rayan/

hewî....hewî...

Ray awe hênî ra yena ray nîna.

Ray ez ramena û ray o rameno.

Rayrayan ma benê û rayrayan ên benê.

Hewî mi ramit hewî ey ramit.

carna...carna/carek ... carek

Carna av ji kaniyê tê carna nayê”.

Carna ez dajom û carna ew dajo.

Carna em dibin, carna ew dibin.

Carek me ajot carek wî ajot.

ya... ya...

Ya bide ya bigîre.

Lingan sero mevindere ya şo ya roşe.

Şewe biya nême ya werze ya rakewe.

ya... ya...

Ya bide ya bigre.

Li ser lingan mesekine ya here ya danîşe.

Şev bûye nêvî ya rabe ya rakeve.

yan... yan...

Yan ma yenê yan şima bêrê.

Ma yan serkewenê yan vinî kenê.

Zimistanî yan vewre varena yan varan.

yan... yan...

Yan em tên yan hun werin.

Em yan biserdikevin yan wenda dikin.

Zivistanê yan berf dibare yan baran.

tay... tay ...

Tay wîyenê û tay bermenê.

Tay girdî û tay wûrdî yê.

Tayê kenê tayê wenê.

hin... hin...

“Hin dikenin û hin digirîn.

Hin gir in û hin hûr in.

Hin dikin hin dixun.

zî ... zî

Cinêke zî mêrdek zî keye de nîyê.

jî ... jî

Jin jî mêr jî ne li malê ne.

Heyat şehar de zî û dewe de zî
bîyo vay.

Ma zî şima zî seycê yî.

wazenê(a) ... wazenê(a)...

Wazenê şo sûke wazenê keyede roşe.

Wazena ma çay bişimê wazena qehwe.

Wazenê govend bigîre wazenê
maşe bike.

Jiyan di bajar de jî û di gund de jî
bûye bûha.

Em jî hun jî wekhev in.

dixwaze ... dixwaze...

Dixwazî biçe sûkê dixwazî li malê rûne.

Dixwaze em çay vexwin dixwaze qehwe.

Dixwazî govend bigre dixwazî tete-
maşe bike.

8.3. Tayê bestoxê bînî yê ke bi di-hîrê çekûyan virazîyenê

Tayê bestox û edatî yan zî tena bestoxî bi xo, bi tayê vateyandê bînana bêrê vatiş, nê bêj bestoxan virazîyenê û cumle mîyan de mananê ciya ciyayan danê.

(**Hinek gihînekên ku bi du-sê peyvên tene çekirin:** Hinek gihînek û daçek yan jî tenê gihînek bi xwe, bi tevî hinek peyvên din bêne gotin, ev cure gihînek çêdibin û wateyên cuda cuda didin hevokê).

Zazakî

...beno ke...

Roj û şewî vêrartî nêame, **beno ke**
tayê tebayê ey serî ser de ameyê.

Varan bivaro beno ke ma bimanê.

Beno ke verg bo û beno ke kutik bo.

...bes ke...

Çi lazim bo ez do bikera, bes ke
ti biwane.

Kurmancî

...dibe ku...

Roj û şev derbas bûn nehat, **dibe**
ku hin tişt bi serê wî de hatine.

Baran bibare dibe ku em bimînin.

Dibe ku gur be û dibe ku kuçik be.

...bes ku...

Çi pêwîst be ez dê bikim, bes ku
tu bixweyne.

Ez şêna şew û roj bixebitya, bes ke cayê mi xewle bo.

gama ke...

Gama ke aşîk kelibya defe dirneno.

Gama ke şewî derg bibê, roj kilm beno.

Gama ke mamoste yeno, şagirtî werzenê pay.

Es dikarim şev û roj bixebitim, bes ku ciyê min xewle be.

gava ku...

Gava ku aşîq bikelibe def didirîne.

Gema ku şev dirêj bin, roj kin dibe.

Gava ku mamoste tê, şagirt radibin.

... ne ke ...

Ma dest ra nîna ne ke ma nêwazenê.

Xirabeye nêwazena ne ke nişêna bika.

Ez mird a ne ke şamî weş nîya.

... ne ku ...

Ji dest me nayê ne ku em naxwazin.

Xerabî naxwazim ne ku nikarim bikim.

Ez têrim ne ku şîv nexweş e.

coka

Trafiq qelabalix bî coka ma erey kewfî.

Meymanê ma bînê coka ma lez kerd.

Vewre varaya coka serd o.

lewra, ji ber wê/wî

Terafiq qelabalix bû ji ber wê em dereng ketin.

Mêvanên me hebûn ji ber wê me lez kir.

Berf barîye ji ber wê serma ye.

çende ... ehende

Mêrdim çende bixebityo ehende betilyeno.

Ti çende borê madê to hinde hera beno.

Roj çende derg bo, şewe hende kilm bena.

Ez çihende wanena waya mi zî hende wanena.

çiqas ... ewqas

Meriv çiqas bixebite ewqas diweste.

Ti çiqas bixwî madê te ewqas fire dibe.

Roj çiqas dirêj be, şev ewqas kin dibe.

Ez çiqas dixwînim xuşka min jî ewqas dixwîne.

gama...

Gama averî yê tepayê ra rindêr a.

Gama çimê mi aye ginyayê, se ke awa serde mi sere de bikê.

Gama o ame ez ewca de nêbîya. nebûm.

gama ke

Gama ke şima şiyê, ma weca de nêbî.

Gama ke aşik kelibya dawile dirneno.

Gama ke wer bibo her kes şirîg o.

Gama ke ga bimro çerme maneno, mêrdim bimro name maneno.

hem... hem zî

Rewîn hem xebitya û hem zî wend.

Hem ez rakewena hem zî aye.

Hem şew xebityeno hem zî roj.

Hem govende gêna û hem zî deyrî vana.

yan yan zî ...

Yan ti bê etiya yan zî ma bere xo hete.

Yan ti yan zî ez.

Yan şino kar yan zî şino qahwexane.

gava ...

Gava zû ji yê dereng çêtir e.

Gava çavê min li wê ket, wekî ku ava sar di ser min de bikin.

Gava ew hat ez li wê derê

gava ku

Gava ku hun çûn, em li wê derê nebûn.

Gava ku aşiq bikelibe defê diçirîne.

Gava ku xwarin hebe her kes şirîk e.

Gava ku ga bimre çerm dimîne, meriv bimre nav dimîne.

hem... hem jî

Rewîn hem xebitî û hem jî xwend.

Hem ez radikevim hem jî ew.

Hem şew dixebite û hem jî roj.

Hem govendê digerîne hem jî distrê.

yan ... yan jî ...

Yan tu were vira yan jî me bibe cem xwe.

Yan tu yan jî ez.

Yan diçe ser kar, yan jî diçe qahwexanê.

verê ke(ki)

Verê ke zimistan bêro koçerî agêrenê.

Verê ke xwendî bêrê qasid raykerd.

Verê ke şer bikê gizegiza ênan bî.

berî ku (ko/kû)/berîya ku

Berîya ku zivistan were koçer vedigerin.

Berî ku vexwendî werin qasid rêkirin.

Berîya ku şer bikin gizegiza wan bû.

wa... bo

Wa rayîr bo, wa dûrî bo.

Wa xêr bo, wa erey bo.

Wa vêr bo, wa xorîn bo.

Wa varika mi nexşên bo, wa hakan nêko.

bila ... be

Bila rê be, bila dûr be.

Bila xêr be, bila dereng be.

Bila bihûr be, bila kûr be.

Bila varuka min nexşîn be, bila hêkan neke.

Notê Beşê Morfolojî

Beşê nameyan (navan)

1. “Tayê cayan de, herinda “-an”î de “-ûn”, “-on”, “û” yan zî “-o” vajyeno: mangan, mûngûn, mongon, mongo.”Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnûstîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, 2005, İstanbul, r. 22
2. Gruba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 41
3. ç.v., r. 41
4. B. Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, 3. Baskı, 1997
5. Bedir-Xan., Celadet Alî, *Hawar*, hej. 23, r. 606, çapakerdîşê weşanê Nûdem, Stocholm, 1998
6. h.b. r. 607

Beşê sifetan (rengdêran)

1. Formê bînî: enû, nû, enî, inî, ini, in. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, r. 70

2. Formê bînî: ina, hena. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, ç. v., r. 63
3. Formê bînî: nî, enî, inî, inê, na. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, ç. v., r. 63
4. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, r. 70
5. Formê bînî: b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî(zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, r. 70

Beşê zemîran (cînavkan)

1. Formê bînî: to, tu, tû. Bew., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 63
2. Formê bînî: ew, aw, wi, yo, yû, wo, û(ner.), ç. v., r. 63
3. Formê bînî: yi, jey, ê, êy, hî, dey. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî(Zazakî)*, r. 63 Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005. Munzur Çem, *Kirmancca (Zazaca) Gramer*, Deng Yayınları, İstanbul, 2003, r. 107
4. Formê bînî: yay, aya, ay, aya, a. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî(Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 63
5. Formê bînî: sima. Munzur Çem, *Kirmancca (Zazaca) Gramer*, Deng Yayınları, İstanbul, 2003, r. 107
6. Formê bînî: yîn, yînî, yîne, jînî, îna, îne, înû, eyna, ayno. bew., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 63
7. Formê bînî: nû, enû, enî, inî, ini, în. b., ç.v., r. 65
8. Formê bînî: ina, hena. b., ç.v., r. 65
9. Formê bînî: nî, enî, inî, enê, inê. b., ç.v., r. 65
10. Formê bînî: aw, ew, ewi, hew, aw, ay, û. b., ç.v., r. 66
11. Formê bînî: î, ay, eyî, heyî. b., ç.v., r. 66

12. Formê bînî: nê, inî, enê, inê. b., ç.v., r. 65
13. Formê bînî: nay, enay, ina, inay, hena. b., ç.v., r. 65
14. Formê bînî: ay, aya, eya. b., ç.v., r. 66
15. Emîr Celadet Bedirxan & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 117
16. Bi dîtina Kemal Badilî, “kî ji bo nêra ye û kê ji bo mêra ye”. b. *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer (Kurmancca Lehçesi)*, Med Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 1992, r. 92
17. Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, 1997, İstanbul, r. 109
18. ç.v., r. 109
19. Formê bînî: zew, zewbin, jew, jewbin, zû, zûbin, jûbin. Fahri Pamukçu, *Gramerê Zazakî (Ziwanrêznayî)*, Vejiyayîşê Tiji, İstanbul, 2001, r. 133
20. Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997, r. 117

Beşê karan (lêkeran)

1. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnûstîşê Kirmanckî (Zazakî)*, İstanbul, 2005, r. 90
2. ç.v. r. 90
3. Bedirxan, Celadet Alî & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, 2009, İstanbul, r. 122
4. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnûstîşê Kirmanckî (Zazakî)*, İstanbul, 2005, r. 90
5. Dimilî de demo bêro, tayê cayan de bi “do” û tayê cayan de zî bi “ko” ya virazîyeno. Formê “ko” zî winî yo: ez ko bika, ti ko bikê/ti ko bika, o ko biko/a ko biko, ma ko bikê, şima ko bikê, ê ko bikê. Formê bînî: dê. ka, ko, go, ro, o, yo. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnûstîşê Kirmanckî (Zazakî)*, İstanbul, 2005, r. 100
6. b., Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşan-

xaneyê Vateyî, 2005, r. 92

7. Antişê nê karî mintiqa Dêrsimî de wina yo:

Ez ûne. Ma yîme.

Ti ya. Sima yê.

O wo. (n.) Ê/î yê.

A wa. (m.)

8. Bedirxan, Celadet Alî & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, 2009, İstanbul, r. 150

9. Munzur Çem, *Kirmanca (Zazaca) Gramer*, Deng Yayınları, İstanbul, 2003, r. 145

5. A. Balî, *Kürtçe Dilbilgisi*, Alan Yayınları, Birinci Baskı, İstanbul, 1992, r. 185

10. Porzing., Walter, *Dil Denen Mucize (Mucîzeyâ ke tira Vajyeno Ziwan)*, Weşanê Wezareta Kulturî, 1990, Ankara, r. 197

11. Mintiqa ra mintiqa formê “ha” bedêlyeno û zey “hawo, haw, hew; haya, hay, hey; hê, ha, ho; wo, wa, ya, yê, yo” yenê vatiş. b.: Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustişê Kirmanckî (Zazakî)*, weş. Vateyî, İstanbul, r. 100. Mintiqa Çêrmûg de formê nê demî winî yo: Ez o wanena, Tu yê wanenê, A ya wanena, O yo waneno, Ma yê wanenim, Şima yê wanenê, Ê wê wanenê.

Beşê zerfan (hokeran)

1. Dr. Nimet Yıldırım, *Farsça Dilbilgisi*, 2. Baskı, Erzurum, 2000, r. 212

Beşê edat (daçek)

1. Celadeta Alî Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Graber (kurmanci lehçesi)*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2009, r. 242

2. h.b. r. 243

3. Kurdo., Qanatê, *Gramera Zmanê Kurdî (kurmancî-soranî)*, Koral Yayınları, 1991, İstanbul, r. 264, 267

4. Sadiq Behaeddînê Amêdî, *Rêzimana Kurdî (kurmancîya jorî û jêrî ya hevberkirî)*, Dîwan Yayınları, İstanbul, 2012, r. 259
5. Kurdo., Qanat, *Gramera Zmanê Kurdî (kurmancî-soranî)*, Koral Yayınları, İstanbul, 1991, r. 270
6. Celadeta Alî Bedirxan & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer (kurmanci lehçesi)*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2009, r. 242-43
7. b. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*; Munzur Çem, Kirmancca (Zazaca) Gramer; Fahri Pamukçu, *Giramerê Zazaki (Ziwanrêzanayî)*.
8. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 77
9. b. Formê bînî: be, ve, ebi, ebe, eve. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 77
10. Bedirxan., Celadeta Alî & Roger Lescot, *Kürtçe Graber(kurmanci lehçesi)*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2009, r. 243
11. Formê bînî: dir, de ro, derro, dir o. b. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 82
12. Formê bînî: “rî, ri, re, ‘r”. bew. Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnustîşê Kirmanckî (Zazakî)*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2005, r. 79
13. Bedirxan., Celadeta Alî & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer (kurmanci lehçesi)*, Avesta Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, 2009, r. 254
14. Çem., Munzur, *Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî (Zazakî)*, weşanên Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stocholmê, r. 27
15. Celadeta Alî Bedirxan & Roger Lescot, *Kürtçe Graber(kurmanci lehçesi)*, Avesta Yayınları, çapa: 4., 2009, İstanbul, r. 249

Beşê bestoxan (gihînekan)

1. b. Beşê bestoxan ê kitaba Qanatê Kurdo, Gramera Zmanê Kurdî(Kurmancî-Soranî), Celadeta Alî Bedirxan, & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer(Kurmanci Lehçesi)*, Sadiq Behaeddîn Amêdî, *Rêzimana Kurdî (Kurmancîya jorî û jêrî ya hevberkirî)*

2. Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî (kurmancî-soranî)*, Koral Yayınları, İstanbul, r. 276

Goreyê cayandê cîyayan tayê mîsalê şêweyandê zazakî (dimilî)

(Li gor herêmên cihê hinek mîsalên şeweyên zazakî/dimilî)

Çîroka 6.¹

Zemanê veriye yeu mêrde û ceniyyaxoe bî, yeu keyna û yeu lac tera bî. Ceniya ê merd, peynîde mêrde şî yeuna cenî arde. Di serî venêrt, yeu keyna aya cenî ra bîye. Ena ceniye bîye dijmenê lacek û keyneka veryêne.

Keyneke şuêna golikan de; keynek rocekî yêry golikana yena, ek berayî xoe çinu, persena ceniyyaxoe baukî xoe, vana ke: berayî mi çau? Cenêke keynek ra vana ke: berayî tûe şiyu key xalanê xoe.

Keynek aya şu ra kuen'a, hau veyne'a, ek berayî xoe kiştu, eştu zîndan. Sebah warden'a, baukî xoe ra vana: bau mi emşewe yew hau dî, êk'e ceniyyaxoe tûe berayî mi kiştu, eîştû zîndan. Baukî keyneka xoe ra va ke: xeyr bû, sên'îe berayî tûe kişên'û?

¹ Peter J. A. Lerch: *Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldaer. Band I*, r. 80, 81, 82, 83, St. Petersburg 1857. Çîraka 6ine bi vatişê Hesênê Sîwanijî ya ameya nûstiş. Hesên, bi eslê xo dewa Kaşan a Pale ro wo, ke na dewe kewena min-tiqa Sîwanî mîyan.

Keynek va ke: bau mi haunî xoe de dî, beraî mi kîştû, eîştû zîndan, ez ha werzên'a, şûên'a golekan de, yêreyî yên'a keîye, êk'e berayî mi amaû, ez zana weşû, xeyr ke berayî mi namaû ez hênî tûe rî golekan de nê şûên'a, ez etîya nêvendêna'a.

Baukî keyneka xoe ra va ke: eyrûe ti şû'e golekande, ez gêren'a, êk'e mi berayî tûe dî, bizane ke; ek cênîyay mi şima de saxen'a, xeyr

ke mi berayî tûe nêdî, ne ez vendên'a, ne ti vinde.

Keynek werişt şî, golikî xoe vera dayî, şî golekan de. Baukî keyneke ame, gerîa berayî keyneke, êki kiştû, eyştû zîndan, corde zibil û wêl'e kerda lajekî ser. Baukî keynek amey keye, cenîyay xoe ra va ke: tûe qauwî lacî mi kiştû, wayî ceyî bi şewî haunî xoe de dî bî, ek berayî xoe kîştû, amey, bermaye, mi ra va ke: bau berayî mi kîştû, eyştû zîndan. Mi va ke: keyna mi, xeyr bû, meterse, berayî tûe weşû. Keynek mi ra va ke: ez ha eyrue şuen'a golekan de, yerey yen'a keye, ek berayî mi amewû, ez zana weşû, ek nê mewû, ez nê vendena êtiya.

Cenî va mêrdeyê xoe ra: wêrze têra şûe, ti pîsî, ti vatişî keyneke, ti ameyî mi ser, ti mi ra vanî ke: qaûwî tûe lacî kiştû, ez çitau lacekî kişêna.

Mêrdek hêrs bi, şiyê laşê lacekî zîndan ra vête ardi cênî het, va ke cênî ra, keynayî kopekî, la kamî kiştû ên'we lacek? Zuanî cenêki qefelya, cenîye tersaye, hênî nautarayî veng bikeru.

Baukî, lacekî şid, berd mezel, wedêrt, amê keye, sereyî cenîyay xoe terakerd. Berde eyşt zîndan. Way lacekî golekana amey keye. Ek berayî xoe çinu, cenîya baukî xoe çina, şî baukî xoe ra va: bau cenîyay tûe ça ya? Baukî keynek ra va: ez nêzana sera şiya, berayî tûe merdu. Keynek bermaye, amey, şî awkî ver, desmac gerewt, di rekati nemac kerd, va ke: ya rebî, ti mi yeu go'îne kerî. Auca bî yeu go'îne, feraye, şî.

* * *

Kurmancîya çîrokê:

Demên berê mêrek û jina xwe hebûne, keçek û lawekê wan çêbûye. Jina wî mir, dawîyê mêrik çû jineka dî anî. Du sal derbas bûn, qîzek ji wê jinikê çêbû. Ev jinik bû dijminê keç û lawê berê.

Keçik diçe ber golikan; keçik êvara rojekî ji ber golikan tê, ku birayê xwe tune ye. Ji jina bavê xwe dipirse, dibêje: Birayê min li kû ye? Jinik ji keçikê ra dibêje ku: Birayê te çûye mala xalanê xwe.

Keçik wê şevê dinive, di xewna xwe de dibîne ku birayê wê kûştîye û avêtiye zîndanê. Sibehê radibe ji bavê xwe ra dibêje: Bavo min îşev xewnek dî, eke jina te birayê min kûştîye, avêtiye zîndanê. Bavo ji keça xwe ra dibêje ku: Xeyr be, çawa birayê te tê kûştin?

Keçikê got: Bavo min di xewna xwe de dî, birayê min kûştîye û avêtiye zîndanê, ez ha radibim diçim ber golikan, êvarê tîm malê, eke birayê min hatibe, ez zanim ku xweş e, xeyr ku birayê min nehatibe ez êdî ji te ra naçim ber golikan, ez li vê derê nasekinim.

Bavî ji keçikê ra got: Îro tû biçe ber golikan, ez digirim, eke min birayê te dî, bizane ku; eke jina min bi we ra saxen e, xeyr ku min birayê te nedî, ne ez dimînim û ne tû bimîne.

Keçik rabû çû, golikên xwe berdane, çû ber golikan. Bavê keçikê hat, li birayê keçikê gerîya, eke kûştîye û avêtiye zîndanê, ji jor ve zibil û xwelî kirin di ser lawik de. Bavê keçikê hate malê, ji jina xwe ra got ku: Qey te lawê min kûştîye, xuşka wî şev di xewna xwede dî bû, eke birayê wê hatiye kûştin, hate, girya, j imin ra got ku: Bavo birayê min kûştîye, avêtiye zîndanê. Min got ku: Keça min, xeyr be, metirse, birayê te xweş e. Keçikê ji min ra got ku: Ez ha îro diçime ber golikan, êvarê dihême malê, eke birayê min hatibe, ez zanim xweş e, eke nehatibe, ez li vê derê namînim.

Jinikê gote ji mêrê xwe ra: rabe ji vê derê biçe, tû pîs î, tû bi gotina keçikê bi ser min ve tê, tû j imin ra dibêjî ku: Qey te lawik kûştîye, ez çito lawikî dikûjim.

Mêrik hêrs bû, çû laşê lawik ji zîndanê derxist anî nik jinikê, ji jinikê ra got ku, keça kûçik, lê vî lawikî kê kûştîye? Zimanê jinikê qufilî, jinik tirsîya, êdî newêriya deng bike.

Bavî lawik şûst û bir mezela veşart, hate malê, serê jina xwe jêkir. Bir avêt zîndanê. Xuşka lawik ji ber golikan hate malê. Eke birayê wê tune ye, jina bavê wê tune ye. Çû ji bavê xwe ra got: Bavo jina te li kû derê ye? Bavî ji keçikê ra got: Ez nizanim çûye kû derê, birayê te jî mirîye. Keçik girya, hat, çû ber avê, desmêj girt, du rekat nimêj kir, got ku: ya Xuda, tûyê min bikî giyandarek. Li cî da bû giyandarek, firya, çû.

(Wergera ji bo kurmancî: **Seîd VEROJ**)

Dimiliya Sêwreke ²

Rojê rojan di dewên di hawar dekewt. Şarê dew pêro remayê. Dewi miyan di kergên û des leyrekî ca di mendê. Lûyêndo vêşan înan ra peyda bî. Kerg xeylî tersa. Lûy ay rê va:

- Ez do to bora tewrê leyrekan.

Kerg cirê va:

- Heta hewt rojî vindir.

Lûy cirê va:

- Qandê çiçî ?

Kerg cirê va:

- Leyrek bol werdek î.

Lûy zana dew di kes çinyo veng nêkerd, şî. Kerg kewt qesawet. Tew rê leyrekan dew ra vijiya. Şî aryeyî het. Uja aşwançî ê dînay. Kerg hewar kerd, cirê va:

- Ewro lûyên ma ra peyda bî. Min rê va: «Ez do to bora». Min cirê va: «Heta hewt rojî vindir». Lûy şî, veng nêkerd. Ti nika tazî û kutikan ha-dire ki heta Dedi Lûy yenno.

Aşwançî va:

- Bol rind o.

O wext postê lûy neway çeturî kerdê. Aşwançî xeylî pê weş bî. Kergî rê va:

⁹ Celadet Alî Bedir-Xan, *Hawar*, hej. 23, Şam Tara Kurdistan: 16 tîrmeh 1933, çapaker-dişê weşanê Nûdem, cild: 1, Stocholm-1998

- Ezo no meydan di lanên biken. Ezo tewrê kutik û taziyan dekewin. Eger Dedi Lûy ame tenekî ey dir ra kay bike. Odo to rê vajî:

- Ey kergê, kergê, kergê ! Ezo to borî tewrê leyrekan.

Bado ti ci ra vajî: «Ey Dedo Aşwançî, ti bixwe û kutikê qundî bê teber.»

Lûy ame meydan, venda kerg, kerg şî, cirê va:

- Çunkî ti nika mi borî, min rê weş o tenekî kay keran.

Destê jewbînî girewtî. Kerg cirê va:

- Min rê deyrî biki.

Lûy va:

- Ey kergê, kergê nika ezo to bora tewrê leyrekê to.

Kerg va: «Nobeta min a» dest pa kerd:

- Ey Dedi Aşwançî bê teber, ti bixwe û kutikê qundî.

Lûy tersa, va:

- Hunî mevajî, axir ez tersenno.

Qissey tamam kerdî, Dedî Aşwançî vijya. Tazî û kutikan wexto lûy dî-nayî, girewtî û fetisnay. Aşwançî bi lûy, kergi bi leyrekan bî şay.

Dimiliya Palûwî ³

Rwecî rweca dewêkî de hewar kewt. Şarê dew pyero remay. Miyanê dew, ca mend kerg tewlê des lîçikana. Yîne rî lûyek peyda bî zehf veyşan. Kerg zehf tersê. Lûy tira va:

- Ez to borî tewlê lîçikanê tuwiya.

Kerg tira va:

- Vindir heta hewtena rwecî.

Lûy tira va:

- Qey çine ya?

Kerg va:

- Lîçikî zehf qic î.

Lûy zanani dew di çew çîno, veng nikerd, şî. Kerg kot dişmîş biyayîş. Dew ra tewlê lîçikanê xoya vicay, şî arye. Ûca arbançîyê dî. Kerg hewar kerd, tira va:

- Eyro lûyek min rî peyda bî. Min ra va: «Ez to borî». Min tira va: «Vindir hewtna rocî». Lûy şî, veng nikerd. Ti inkey tanzî û bwecî hedre ki heta Apo Lûy yenno.

Arbançî va:

- Zehf hewl o.

In wexti d' postey lûy neway çeturî kerdîyê. Arbançî zehf pê weş bi. Xo hedre kerd, kerg ra va:

³ Celadet Alî Bedir-Xan, *Hawar*, hej. 23, Şam Tara Kurdan: 16 tîrmeh 1933, çapakerdişê weşanê Nûdem, cild: 1, Stocholm-1998

- Ez in meydan di qulêk bikeyn. Tewlê tanzî û bweciyane dekuwî. Eger kî Apo Lûy ame tey cirî bireqisî. Wi tue ra vaco:

- Hey kergê kergê ... Ez to borî tewlê lîçikanê tue ya.

Bacî ti tira vac:

- Hey Apo Arbançî, bê teber, ti bixoy w bwêcî qundî.

Lûy amey meyda, venda kerg da, kerg şî, tira va:

- Qey gî ti inkey min borî min rî weş o ez bineykekî bireqes.

Lûy va: «Hewl o». Destê yobînî gured. Kerg tira va:

- Bineykekî ma rî dêrî biki.

Lûy va:

- Hey kergê, kergê, ez inkey ti w lîçikanê ti piya borî.

Kerg va: «Serey min o»:

- Hey Apo Arbançî bê ti bi xo bwecîy qund ya.

Lûy tersa, va:

- Ano me vac, axirî ez tersenna.

Qalê xo tamam kerdî Apo Arbançî vicya. Tazî w bwêcî hela g'lûy dî, di hal de guret û xeneqney. Arbançî bi lûy, kerg û lîçikan şa bî.

* * *

Kurmancîya herdu şêweyên çîrokê:

Rojekî ji rojan hewar kete gundekî. Xelkê gund hemû revyan. Di gund de mirîşkek bi tevî deh cûcîkên xwe man. Rovîyek birçî li wan peyda bû. Mirîşk gelek tirsîya. Rovî jê re got:

- Ez dê te bixum bi tevî cûcîkên te ve.

Mirîşkê jê re got:

- Hetanî heft rojan bisekine.

Rovî jê re got:

- Ji ber çî?

Mirîşkê got:

-Cûcîk zehf qicîk in.

Rovî dizaniya li gund kes nîne, dengê xwe nekir, çû. Mirîşk kete fikarê. Bi tevî cûcîkên xwe ve ji gund derket, çû nik aşê. Li wê derê aşvan dî. Mirîşkê hewar kir, jê re got:

-Îrov rovîyek li min peyda bû. J imin re got: “Ez dê te bixum”. Min jê re got: “heta heft rojên dî bisekine”. Rovî çû, deng nekir. Tû nûka tajî û kûçikan amade bike ku hetanî Apo Rovî tête.

Aşvanî got:

- Zehf başe.

Wê demê postê rovî nod çeturî dikir. Aşvan zehf pê xweş bû. Xwe amade kir, ji mirîşkê re got:

- Ez li vê meydanê qulekî bikolim. Tevlî tajî û kûçikan bikevimê. Eger ku Apo Rovî hat, hinek ji wî re bireqise. Ew dê ji te re bêje:

- Hey mirîşkê, mirîşkê, mirîşkê! Ezê te bixum tevî cûcîkên te ve.

Paşê jê re bêje: “Hey Apo Arvançî, tû bi xwe û kûçîkê qundî werin devre”.

Rovî hate meydanê, bang kir mirîşkê, mirîşk çû, jê re got:

- Qey tûyê anûka min bixwî, ji min re xweş tête ku hinekî bireqisim.

Rovî got: “baş e”. Destê hevûdu girt. Mirîşkê got:

Em hinek kilaman bêjin.

Rovî got:

- Hey mirîşkê, mirîşkê anûka ez te bi tevlî cûcikên te bixum.

Mirîşkê got: “dora min e”, dest pê kir:

- Hey Apê Arvançî were devre, tû bi xwe û kûçikê qundî ve.

Rovî tirsîya, got:

- Winî nebêje, axir ez ditirsim.

Qiseyên xwe tamam kirin, Apê Arvançî derket. Tajî û kûçikan wexta ku rovî dîtin, di cî de girtin û xeniqandin. Arvançî bi rovîyê, mirîşk bi cûcikên xwe ve şa bû.

(Wergera ji bo kurmancî: **Seîd VEROJ**)

Peynîye:

Peynîya na xebate de, wazena reyna bi kilmayî vaja; armanca na xebate, çarçeweya xusûsîyetê esasî yê grûba ziwandê arî mîyan de cigêrayîşê tayê xusûsîyetanê xas ê ziwandê kurdî û dîyalektanê ênan a. No sebeb ra verê heme çî wazena bi çend vateyan behsê ziwandê û çimewandê xebata ziwandê û dîyalektanê kurdî bika.

Heme çîyo ke aîdê mêrdimî yo û mêrdimî eleqeder keno, bi ziwana îfade beno û tarîxê ey zî reseno dest pêkerdişê peydabîyayena qiseykerdena mêrdiman. Ancax bi wasîteyê ziwandê ma şênê mîras û keda bawkalandê xo (mêrdimandê verê xo) bimusê, bişinasnê û dewrê neslandê neweyan bikê. Her millete zî bi ziwandê xo ya şinasyena, ziwandê hişê millet û komelî yo, ay millete ke ziwandê xo vinî bikê, ray û şopa ênan zî werte ra wedaryena û peynî de yên bi xo zî vinî benê.

Heta ewro hetê cigêrayoxandê xerîban ra ziwandê kurdî ser o zaf xebatî ameyê kerdiş û nê xebatî çimewê muhîm ê xebata ziwandê û dîyalektanê kurdî teşkîl kenê. Labelê gerek ma yew heta zî bi îhtiyat nê eser û xebatan ra bewnîyê. Çimkî zafê “nê eserê ke terefê cigêrayoxandê rojawanî ra ameyê nûstiş, gelekê ênan yan qet ziwandê kurdî nêzanê û yan zî zaf kemî zanê û xebatê ênan zî biteferuat nîyê.”

Peydabîyayena na xebate de, tayê beş û qonaxan de raya (rêbaza) senkronîk, tayê beş û qonaxan de zî raya dîakronîk û teswîrî ameyê taqîbkerdiş. Na çarçewa de, di dîyalektê kurdî; zazakî (dimilî) û kurmancî, hetê tayê xusûsiyetandê dîyalektî, alfabe, fonetîk û morfolojî ra ameyê veracêkerdene. Sebeb çî beno wa bibo, wexto ke yew ziwani ra dîyalektê cîyayî peyda bibê, behsê nîzdîyê û dûrîya ênan, behsê pêmendîşê û cîyayîya ênan zî bena. Hetê esasê dîsiplînê lînguîstîkî ra bi hawayêko objektîf dîyarkerdişê ferqê mabêna her di dîyalektan, gerekîya raya xebata zanistî ya.

Peydabîyayen û bîyayena dîyalektanê cîyayan, rastîyêka tarîxî ya heme ziwanan a. Ziwani kurdî zî bi dîyalektanê xo ya nê ziwanan ra yew o. Tayê kesî, zafbîyayena dîyalektanê kurdî, sey unsurêko negatîf qebûl kenê û vanê kurdî wayîrê ziwani û kultirêko hempar (hevbeş) nîyê. Bawer kena ayê ke winî vanê, yan ziwani kurdî û dîyalektanê eye baş nêzanê û yan zî zaf sivik fikiryenê. Sey heme ziwaniandê dinya, bîyayena dîyalektanê cîyayan ê kurdî, lawazbîyayena ra zafêr, xezîneya bêver û bêpey ya veteyan û zengînîya ziwani kurdî dîyar kenê. Labelê goreyê şertandê ewroyî yew bi yew nê dîyalektan sero xebate kerdiş, veracêkerden û dîyarkerdena xerîteya velabîyayena ênan, bar û wezîfeyêko giran ê ziwanzanayoxan o.

Ewro, ma biwazê nêwazê averşîyayîşê teknolojî û wasîteyê medya modren, yew heta seha nûsten û velabîyena dîyalektan hera kerda û heta bîna zî hîna zaf problemê dîyalektan vetî meydan û dîyalektan ver bi standardbîyen û homojenbîyene benê. Etiya de nûqtêya muhîm a ke ma bala xo bidê û haydarê aye bibê; bêguman pawitena heqê ciwîyena her yew dîyalekte mutlaq o, labelê bi nameyê standartkerdena dîyalektan, gerek ma her yew dîyalekte ra yew ziwaniêko cîya û xoser peyda nêkê.

Wexto ke mesela ziwani milletêk bo, sey ke verê zî ame vatiş; ziwani eserê têkilîya tarîxî ya yew millet o. No sebeb ra, zaf ziwanzani yewbîyayena lînguîstîkî û yewbîyayena etnîkî-kulturî pêra cîya kenê. Na çarçova de wexto ke ma hetê gramer, vate û viraştîşê vateyan, têkilîya

kulturî û tarîxî ra zazakî û kurmancî muqayese bikê, qet şuphe çinî yo ke ferqê mabêna ênan, sey ferqê di dîyalektandê yew ziwani yî. Nê xusûsiyefî, heme ziwani û dîyalektandê grûba hînd-awrupayî mîyan de û ayê bînan de zî estî.

Peynîya na xebate de, ma şênê vajê ke kurdî zî sey heme ziwaniyê dînya xo mîyan de dîyalekt bi dîyalekt cêra abirryena. Bîyayena dîyalektanê cîyayan, seba hemî ziwaniyan rastîyêka tarîxî ya, gerek kê naye sey çîdêk negatîf nê, sey xezîneyêk dewlemend a ziwani bivînê. Ferq û nîzdîyeya ziwani û dîyalektanê bînan û bîlhesa zî yê koma arî çî hend o seke, yê zazakî û kurmancî zî kemî-vêşî ehend o. Bîlhesa wexto ke şîma bala xo bidê beşê fonetîk û morfolojîya na xebate, şîma do bivînê nê her di dîyalektî hetê xezîneya vateyan û nameyan, zemîran, sîfetan, karan, edatan û bestoxana çiqas seycê yî û çiqas yewbîna dûr î. Bêguman nîzdîyeya mabênê dîyalektandê kurdî, ferqê ênan ra zaf vêşî ya. Hetê tarîxî û kulturî ra zî, kok û rîçikê etnîkî yê qiseykerdoxandê nê ziwani û dîyalektandê eye şîno pêser û yew o.

Dawî:

Di dawîyê de dixwazim careka din bi kurtayayî bêjim; armanca vê xebatê, di nav çaçoveya xusûsiyetên esasî yên gruba zimanên arî de lêgerîna hin xusûsiyetên xas ên zimanên kurdî û dîyalektên wî ne. Ji ber vê, berîya her tiştî dixwazim bi çend peyvan behsê ziman û çavkanîyên xebata ziman û dîyalektên kurdî bikim.

Her tiştê ku aîdê mirov e û mirov eleqeder dike, bi ziman îfade dibe û dîroka wî jî digîje destpêka peydabûna axaftina mirovan. Ancax bi wesîteya ziman em dikarin mîras û keda bapîrên xwe (mîrovên berîya xwe) hîn bibin, nas bikin û dewrê neslên nû bikin. Her millet jî bi zimanê xwe tê nasîn, ziman hişê millet û civat e, ew milletên ku zimanê xwe wenda bikin, rê û şopa wan jî ji holê radibe, dawîyê ew bi xwe jî wenda dibin.

Heta îro ji aliyê lêkolîneran ve li ser zimanê kurdî gelek xebat hatine kirin û van xebatan çavkanîyeke girîng ê xebata ziman û dîyalektên kurdî teşkîl dikin. Lêbelê divê em ji aliyekî ve jî bi îhtiyat li van xebat û eseran binêrin. Çinku pîranîya “van eseran ji aliyê lêkolînerên rojavayî ve hatine nivîsîn ku gelekê wan yan qet zimanê kurdî nizanin û yan jî kêm dizanin û xebatên wan jî ne biteferuat in.”

Di pêkanîna vê xebatê de, di hin beş û qonaxan de rêbaza senkronîk, di hin beş û qonaxan de jî rêbaza dîkronîk û teswîrî hatîye şopandin. Di vê çarçoveyê de, du dîyalektên kurdî; zazakî (dimilî) û kurmancî; ji aliyê hin xusûsiyetên dîyalektî, fonetîkî û morfolojî ve hatine hevberkirin. Sebeb çî dibe bilal bibin, dema ku ji zimanekî dîyalektên cuda peyda bibin, behsa nêzîkî û dûrîya wan, behsa mînanîhevbûn û cudayîya wan jî dibe. Ji aliyê esasên dîsîplîna lînguîstîkî ve bi awayekî objektîf dîyarkirina ferqa navbera her du dîyalektan, pêdivîya rêya xebata zanistî ye.

Peydabûn û hebûna dîyalektên cuda, rastîyeke dîrokî ya hemû zimana ye. Zimanê kurdî yek ji wan zimana ye, ku dîyalektên wî yên cuda hene. Hin kes zafbûna dîyalektên kurdî, wek unsurek negatîf qebûl dikin û dibêjin kurd ne xwedî ziman û kulturek hevpar (hevbeş) in. Bawer dikim ew ên ku wisa dibêjin, yan zimanê kurdî û dîyalektên wî baş nizanin û yan jî zaf sivik difikrin. Wekî hemû zimanên dinyayê, hebûna dîyalektên cuda yên kurdî, ji lawazbûnê zêdetir, xezîneya bêber û bêdawî ya peyvan û zengîniya zimanê kurdî dîyar dikin. Lêbelê di şertên îro de yek bi yek li ser van dîyalektan xebatê kirin, hevberkirin û dîyarkirina xerîteya belavbûna wan, bar û wezîfeyekê giran e zimanzanayan e.

Îro, em bixwazin nexwazin pêşveçûna teknolojî û wasîteyên medîya modern, ji aliyê ve seha nivîsîn û belavbûna dîyalektan fireh kirîye û ji aliyê din ve jî problema dîyalektan bêtir derxistiye meydanê û wan ber bi standardbûn û hojmenbûnê ve dibe. Li vê derê nûqtêya girîng a ku divê em ji wê haydar bin û bala xwe bidinê; bêguman parastina mafê jîyandina her yek dîyalektekê mutlaq e, lêbelê divê bi egera standartkirina dîyalektan, em ji her yek dîyalektekê zimanek cûda û serbixwe peyda nekin.

Wexta ku mijar zimanê milletêk be, herwekî ku berê jî hate gotin; ziman berhemê têkilîyên dîrokî ya milletêk e. Ji ber vê yekê, gelek zimanzan yekbûna lînguîstîkî û yekbûna etnîkî-kulturî ji hev cuda dikin. Di vê çarçoveyê de dema ku em ji aliyê gramer, xezîneya peyvan, çêkirin û ristina wan, têkilîya kulturî û dîrokî ve zazakî û kurmancî rûberî hev bikin, qet şik nîne ku ferqên navbera wan qasê ferqê du dîyalektên zimanekî ne. Van xusûsiyetan, di nav hemû ziman û dîyalektê gruba hînd-awrupayî û yên din de jî hene.

Di dawîya vê xebatê de, em dikarin bibêjin ku kurdî jî wekî hemû zimanên dinyayê di nav xwe de dîyalekt bi dîyalekt ji hev cuda dibe. Hebûna dîyalektên cuda, ji bo hemû zimanan rastîyeke dîrokî ye, divê ev yek ne wek tiştek negatîf, wek xezîneyeke dewlemend a zimên bête dîtin. Ferq û nêzîkayîya ziman û dîyalektên din çiqas be, yê zazakî û kurmancî jî kê-m-zêde ewqas e. Bi taybetî dema hun bala xwe bidin beşê fonetîk û morfolojî ya vê xebatê, hun dê bibînin ev her du dîyalekt ji aliyê xezîneya peyv û navan, zemîran, rengdêran, lêkeran, edat û gihînekan ve çiqas wekhev in û çiqas dûrê hev in. Bêguman nêzîkayîya navbera dîyalektên kurdî ji ferqa navbera wan gelek zêdetir e. Ji aliyê dîrokî û kulturî ve jî, kok û rûçikê etnîkî yê axaftvanên vî zimanî û dîyalektên wî diçe ser hev û yek e.

Çimeyî (Çavkanî):

- Aksan, Doğan, *Her Yönüyle Dil*, 5. Baskı, Ankara, 1995
- Aktuğ, Halil, *Gramera Kurdî*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2013
- Alakom, Rohat: *Kurdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmiş (1787-1987)*
- Amêdî, Sadiq Behaddîn, *Rêzimana Kurdî: (Kurmancîya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî)*
- Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 2005
- Andranîk, Dêrsim, *Rêwîtî û Erdnîgarî*, Deng Yayınları, Diyarbakir, 2009
- Aslanoğlu, Osman, *Kolay Farsça*, Kent Işıkları Yayınları, 2. Baskı, İstanbul, 2009
- Aydın, Osman, *Li Kurdistanê Bakur Struktura Demografîk*
- Badıllı, Kemal, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kurmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, İstanbul, 1992
- Bali, A., *Kürtçe Dilbilgisi (Türkçe İzahlı)*, Alan Yayınları, İstanbul, Mart 1992
- Başbuğ, Hayri, *İki Türk Boyu: Zazalar ve Kurmanclar*, Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü, Ankara, 1984
- Bedir Xan, Emîr Celadet & Roger Lescot: *Kürtçe Dilbilgisi*, Doz Yayınları, İstanbul, 1997
- Berz, Koyo, *Na Xumxum a*, weşanên Jîna Nû, Sweden, 1988
- Bilgin, M. Siraç, *Zarahuştira Gathalar*, Doz Yayınları, İstanbul
- Blau, Joye, *Kürtçe Dilbilim ve Sözlük Çalışmaları*, Studia Kurdica, no:1-3, Paris, Nisan 1985
- Bruinessen, Martîn: *Studia Kurdica, Onyedinci yüzyılda Kürtler ve dilleri: Kürt lehçeleri üzerine Evliya Çelebi'nin notları*, no:1-3, 1985
- Bulut., Faik, *Kürt Dilinin Tarihçesi*, 2. Basım, Berfin Yayınları, İstanbul, 2006
- Ceram, C. V., *Tanrıların Vatanı Anadolu*, çeviren: Esat Mermi Erendor, Remzi Kitapevi Yayınları, ikinci bas. Ankara, 1984
- Çem., Munzur, *Kirmanca(zazaca) Gramer*, Deng Yayınları, İstanbul, 2003
- Çem., Munzur, *Antolojîya Hikayanê Kirmanckî(Zazakî)*, Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stokholmê
- Dersimî, Dr. Nûrî, *Kurdistan Tarihinde Dersim*, Doz yayınları, İstanbul, 2004
- El Dahoodi, Zuhdi, *Kürtler: Tarih, Kültür ve Yaşam Mücadelesi*, Deng Yayınları, 1995
- Emîn Zekî Beg, Muhamed, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar Yayınları, İstanbul, 2012

- Eyubođlu, İsmet Zeki, *Dilin Kapısı*, Pencere Yayınları, İstanbul, 2000
- Fischer, Steven Roger, *Dilin Tarihi*, çeviren: Muhtesim Güvenç, Türkiye İş Bankası Yayınları, 2010
- Hadot, Pierre, *Wittgenstein ve Dillin Sınırları*, Doğubatu Yayınları, çeviren: Murat Erşen, Ankara, 2011
- Gunduz, Deniz, *Kirmancca(Zazaca) Dil Dersleri*, Vate Yayınları, 2006
- Gokalp, Ziya, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınları, Nisana 1992
- Gökberk, Macit, *Değişen Dünya Değişen Dil*, YKK Yayınları, 1997
- Izady, Mehrdad R., *Bir El Kitabı Kürtler*, Doz Yayınları, Ağustos 2004
- *İslam Ansiklopedisi*, Cilt:6, MEB, Eskişehir Anadolu Üniversitesi, 1997
- Karaağaç, Prof. Dr. Günay, *Dil, Tarih ve İnsan*, Akçağ Yayınları, 2. Baskı, Ankara, 2005
- Kaya, Korhan, *Hindistan'da Diller*, İmge Yayınları, 2005
- Kesrevî, Armîn, *Xûd Amûzî Xetî Avestayî*, <http://zoroaster7.persianblog.com>
- Kıran, Zeynel, *Dilbilim Akımları*, Onur Yayınları, Ankara, 1996
- Kurdo, Qanat, *Gramera Zimanê Kurdî bi Kurmancî-Soranî*, Koral Yayınları, İstanbul, 1990
- Kuriş, Seyîdxan, *Zazalar ve Zazaca Yazınının Tarihçesi*
- *Kurmancî* (Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê)
- *Kürt Tarihi*, Say: 5, İstanbul, 2013
- Kovara *Hêvî*,
- Lerch, Peter J. A., *Forschungen über die kurden und die iranischen Nordchaldar (1857)*
- Malmisanij, *Ferhengekê Kirdkî-Pewlevkî-Kurmancî*, Weşanên Apec, Sweden, 1997
 - Malmisanij, *Kird, Kirmanc, Dimilî veya Zaza Kürtleri*, Deng Yayınları, Kasım 1996
- Mc. Carus & Minorsky, *Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri*, İstanbul, 1963
- Xasî, Mela Ehmed, *Mewlûdê Nebî*, İstanbul, 1994
- Mîhrî, Mehmed (M. M.), *Mukaddimet-ül İrfan*, Necmî İstikbal Metbası, İstanbul, 1918
- Mukrîyanî, Kurdistan, “*Elif û Bêy Kurdî Wênedar be Tipî Latîni be Zarawekani: Sorani, Badîni, Feyli, Hewramî*”, Çapxaneya Kurdistan, Hewlêr, 1972
- Şahinođlu, M. Nafiz, *Farsça Grameri(Sarf ve Nahiv)*, Kitapevi Yayınları İstanbul, 1997

- Paul, Ludwig, *I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi yayınları, 2011
- Pamukçu, Fahri, *Gramerê Zazakî*, Vejyayîşê Tiji, İstanbul, 2001
- Pîrî, Mohammad, *Farsça Öğrenelim*, 2. Baskı
- S. Veroj -A. Uçaman, *Verheng-Vajname: Kurmancî Hewramî-Dimilî-Senedajî*, War Yayınları, İstanbul, 2000
- Sevgen, Nazmî, *Zazalar ve Kızılbaşlar: Coğrafya-Tarih-Hukuk-Folklor-Teogoni*, Kalan Yayınları, Ankara
- *Studia Kurdica*, Instituta Kurde de Paris, no: 1-3, 2-6, 1990
- Xan, Şeref, *Şerefname*, Hasat Yayınları, 4. Baskı, 1990
- Xeznedar, Dr. Maruf, *Zimanê Kurdî*, www. kovarabir.com
- Word, Paul Van, *Tanrılar, Genler ve Bilinç*, Kozmik Yayınları, İstanbul, 2006

